
Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

https://www.al-feqh.com/ku

Dr. Abdullah Bahmmam





Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Teharet û av

Naverok

Teharet


Teharet di ferhengê de

Pak û paqijbûna ji qirêjan

Teharet di navlêka fiqhê de

Rakirina bêdesmêjîyê û jêbirina necasetê

Pênasîya teharetê





Beşên teharetê

1. Tehareta menewî

Ew paqijbûna qelb e; ji şirk, gunehkarî û hemû tiştên ku dilên mirov perde kirine. Ne mumkin e digel hebûna necaseta şirkê di qelb de teharet çêbibe. Wekî ku Xuda -ezzewecellele- gotiye: {Gelî yên ku bawerî anîne! Müşrik bes ew pîsin, bila pişte vê salê nêzî Mizgefta Heramê nebin. Eger hûn ji xizaniyê bitirsin Xuda -bivê- ji kerema xwe dê we dewlemend bike. Bêguman Xuda ‘Elîm e Hekîm e} [Tewbe, 28]

Pêĝemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Mûmîn necis nabe!» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

2. Tehareta hissî

Ew paqijkirina bedenê ye; ji bêdesmêjî û necasetan

1. Tehareta ji hedesê [bêdesmêjîyê]

Hedes: Ew tişta ku li bedenê peyda dibe; êdî misliman nikare wan îbadetên ku teharet ji wan re şert e, bike. Her wekî nimêjê, tewafa Beytûl Heramê û dîgerên wan jî. Hedes jî du beş e:



Hedes [bêdesmêjî] li ber kirina nimêjê asteng e

Hedesa biçûk e:

Ewa ku desmêjê wacib dike her wekî mîzê, gû û ew tiştên din yên ku desmêjê dişikînin. Tehareta ji hedesê jî bi desmêjê çêdibe. Xuda -ezzewecelle- gotiye: {Gelî yên ku bawerî anîne! Dema we xwest nimêj bikin; rûyê xwe û destên xwe digel anişkan bişon, sere xwe mesih bikin, û lingên xwe digel gwîzekan jî (bişon).} [Maîde, 6]



Desmêj ji bo hedesa biçûk teharet e

Hedesa mezin e:

Ewa ku ğuslê wacib dike. Her wekî cenabetê, heyz û dîgerên van jî.

Tehareta wê bi xwe şûştinê çêdibe. Xuda -ezzewecelle- gotiye: {Eger hûn bi cenabet bin xwe paqij bikin} [Maîde, 6]

Teharet, dema desmêj û xwe şûştin ne mumkin be, ew bi teyemmumê çêdibe. Lewra Xuda -ezzewecelle- gotiye: {We av nedîtibe bi axake paqij teyemmümê bigrin} [Maîde, 6]



Ğusl, ji bo hedesa mezin teharet e

2. Tehareta ji necasetê:

Ew bi jêbirina necasetê ji beden, cil û mekanî çêdibe.

Jêbirina necasetê wacib e. Lewra Xuda -ezzewecelle- gotiye: {Cilê xwe paqij bigire} [Muddessir: 4]

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Pirranîya ezabê qebrê ji mîzê ye.» (Îbnmace rîwayet kiriye). Dîsa pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Dema yek ji we were mizgeftê bila binêre, heke ew di pêlavên xwe de qirêjê yan ezîyetê bibîne, bila wan mesih bike û bila têde nimêj bike.» (Ebûdawud rîwayet kiriye).



Tehareta cih




Tehareta bedenê



Tehareta cilan

Av



Beşên avê

Yek: Ava tahirker

Ewa ku ew bi xwe tahir e û dîgerên xwe jî tahir dike, her wekî:

1. Ava mutleq:

Ew av e ku li ser wî sifetê xwe yê ku li ser hatiye xuliqandin dimîne. Ferq nake; çi ew ji asîmanî hatibe xwarê: Her wekî baran, berf û teyrokê.18 Çi jî ew ji erdê bikişe: Her wekî ava behr, çem, baran û rûbaran. Xuda - ezzewecelle - gotiye; {Me ji jor baraneke paqijker barand} [Furqan, 48] Disa Xuda -ezzewecelle - gotiye; {Û ji jor baranek bi ser we de barand} [Enfal, 11] Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] wiha dûa dikir, digot; «Xudayê min! Bi berf, av û teyrokê ji şaşîyên min bişo.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] di bara ava behrê de jî gotiye; «Ava wê tahirker e, mirarê wê helal in.» (Ehmed û Ebûdawud rîwayet kirine)


Rûbaran


Baranan


Çeman


Behran

2. Ava muste 'mel [bikarhatî]

E wav e ku ji azayên desmêjgirî, yan jî xwe şûştî dikeve. Bikaranîna wê di teheraetê zirar nake; lewra ji Îbnebbas [Xuda jê razî be] sabit bûye ku gotiye; «Hinek ji hevserên Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] xwe di legenekê da şûşt. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] xwest jê desmêj bigre, wê jê re got; ya pêğemberê Xuda! Ez bi cenabet bûm. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] jê re got: (Av bi cenabet nabe).» (Tirmizî rîwayet kiriye)



3. Ew ava ku tişteke tahir tevlî wê bûye

Ew av e ku tişteke tahir tevlî wê bûye; her wekî pelên daran, yan axê, yan zengarê her wekî depoyên avê lêbelê bandoreke ewqas lê neke ku nehêle êdî jê re av were gotin. Lewra Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Heke hûn wê bibînin bi avê yan bi sidrê (Sidr, ew pelên dara sidrê ye, ew tê hêran û di paqijkirinê de tê bikaranîn). wê sê caran, yan jî pênc caran bişo û ya dawiyê jî kafûrê bixe navê.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)



Ew ava ku ax tevlî wê bûye



Zengara depoyên avê



Ew ava ku pelên daran tevlî wê bûne

Guherîna avê

Dema av bi tişteke ku bandorê lê bike, biguhere û wê ji avîtîyê derxîne û bixe tişteke din her wekî çay, doşav û dîgerên wan, teharet pê çênabe. Lewra êdî jê re av nayê gotin.



Şorbe



Çay



Hibr



Doşav


4. Ew ava necaset tevlî wê bûye; lêbelê ew neguherandiye:

Ew av e ku tiştek ji necasetan ketiye nav wê, her wekî mîzê, yan mirar û dîgerên wan lêbelê yekî ji sifetên wê neguherîne. Ev av tahirker e. Lewra Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] di bara bîra Budaê de gotiye; «Av tahirker e, tiştek wê necis nake.» (Ehmed û Tirmizî rîwayet kirine.)

Daxwaz jê ev e; mirovan kewaşe û gemar datanîn kêleka bîrê û baranê jî ew dixistin nav bîrê. Av ji ber pirrbûna wê, ketina van tiştan têde tesîr lê nake û wê naguherîne.

Duyem: Ava necis [pîs]

Ew av e ku tiştek ji necasetan; her wekî mîzê, yan jî mirarê ketiye nav wê û wê necasetê yek ji sifetên wê; bêhna wê, yan te‘ma wê, yan jî rengê wê guherandiye. Ev cure av, bi îcmaê necis e, bikaranîna wê ne durust e.



Mirara ku av guherandiye



Mirara ku av neguherandiye

Çend mijar

1. Di avê de esil teharet e. Naxwe dema avek li wir hebe û neyê zanîn ka ew tahir e, yan jî necis e? Têde esil tahirbûn e, çênabe mirov li ser xwe zehmet bike. Dema mirov di necaseta avekê de bikeve gumanê ku eslê wê necis be, hukmê wê li ser wê eslê wê ye ku ew li serê bûye.

2. Desmêj bi ava Zemzemê çêdibe. Lewra sabit bûye ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] dêwlek26 ji ava Zemzemê xwestibû, ew jê re hatibû anîn, wî jî hem jê av vexwaribû, hem jî pê desmêj girtibû.(Ehmed riwayet kiriye.)



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec





Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Hukmên Necasetan

2 Hukmên Necasetan

Naverok

Pênasîya necasetê

Necaset di ferhengê de

Qirêj e

Necaset di navlêka fiqhî de

Ew qirêja ku şerîetê bi jêbirina wê ferman kiriye.

Cureyên necasetan

1. Mîza însên û mezereta wî

Ji ber ku hedîsa wî mirovê bedewî heye ewê ku di mizgeftê de mîz kiribû. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] jê re gotibû;

«Ev mizgeftên ha, ji bo tiştekê ji vê mîzê û qirêjê çênabin. Ew bes ji bo zikrê Xuda, nimêj û xwendina Qur'anê ne.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)

2. Xwîna heyzê

Lewra sabit bûye ku Xewle keça Yesar hatibû cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin], jê re gotibû; ya pêğemberê Xuda! Min cileke tenê heye û ez têde dikevim heyzê [bila ez çi bikim]? Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] jê re gotibû; «Dema tu paqij bibî, cihê xwînê bişo, paşê têde nimêj bike.» (Ebûdawud rîwayet kiriye.)

Ji bilî xwîna heyzê, ew [xwînên din] tahir e; çi xwîneke rêhtî be, çi ew ne rêhtî be. Lewra sabit «bûye ku mirovekî mûşrik tîrek avêtibû mislimanekî li ser nimêjê û ew lê xistibû. Wî mislimanî ew ji xwe kişandibû, xwîn jê dihat û wî nimêja xwe jî berdewam kiribû.» (Ebûdawud rîwayet kiriye.)

3. Mîz û rîxên heywanên ku goştê wan nayê xwarin

Ji ber hedîsa Îbnmesûd [Xuda jê razî be] heye. Wî gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] çû ser destavê, ji min re got; sê keviran ji min re bîne. Min du kevir peyda kirin û ez li kevirê sêyem jî gerîyam lêbelê min ew peyda nekir. Min rahişt rîxekê û min ew jê re anî. Wî rahişt herdu keviran, ew rîx jî avêt û ji min re got; "Ev necis e."» (Buxarî rîwayet kiriye)

Hukmê mîz û rîxên heywanên ku goştê wan tê xwarin çi ye?

Mîz û rîxên heywanên ku goştê wan tê xwarin tahir e. Lewra sabit bûye ji Enes [Xuda jê razî be] ku hinek mirov hatin Medînê, li wê nexweş ketin, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] ew şandin cem hêştirên sedeqê/zekatê ji bo ji mîzên wan û şîrên wan vexwin. (Buxarî riwayet kiriye)



Mirar



Masî



Kuleh



Mêş

4. Mirar e

Ewê/a ku bêyî serjêkirineke dînî bi ser pozê xwe de miriye. Lewra Xuda -ezzewecelle- gotiye; {Bibêje: ez di ya ku ji min re hatiye agahkirin de, ji nanxwerekî re, rastî tiştekî heramkirî nayem, ji bilî ku mirar be, yan xwîna diherike be, yan goştê beraz be. Bêguman ew pîs in} [Enam, 145]

Ew perçeyê ku berî serjêkirina heywanan hîn bi sağî jê hatibe kirin ew jî dikeve nav necasetê.

Lêbelê ev cureyên ku li jêr tên ji hukmê vê hatine cudakirin:

1. Mirara masî û kulehan e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Ji me re du mirar û du xwîn hatine helalkirin. Herçî herdu mirar in, masî û kuleh e. Herçî herdu xwîn in, kezeb û fatereş e.» (Ehmed rîwayet kiriye)

2. Mirara ku xwîna heriki jê re nîn e, her wekî mêşan e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Dema mêş bikeve firağa yekî ji we, bila wê tevê têde noq bike. Paşê jî wê bavêje. Lewra di perekî wê de şîfa heye. Di perê wê yê din de jî êş heye.» (Buxarî rîwayet kiriye)

5. Goştê beraz e.

Lewra Xuda -ezzewecelle- gotiye; {Bibêje: ez di ya ku ji min re hatiye agahkirin de, ji nanxwerekî re, rastî tiştekî heramkirî nayem, ji bilî ku mirar be, yan xwîna diherike be, yan goştê beraz be. Bêguman ew pîs in.} (Enam, 145)




Beraz

6. Girîza se ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Tahirkirina firağa yekî ji we, dema se wê bileqîne, ew e ku wê heft caran bişûyê û cara pêşîn jî bi axê be.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Leqandin, ew e ku se zimanê xwe bixe nav firağê û têde bibe û bîne, çi jê vexwe, çi jî jê nevexwe.



Girîza se

7. Mezî

Ew aveke sipî, tenik û bi demûş e. Ew li cem pev-leyistin, yan jî bîranîna cîmaê derdikeve, ew ne bi şehwet û verêhtin e, li pey wê sistbûn jî nayê; heta dibe ku mirov hest bi derketina wê jî nake. Lewra dema 'Elî kurê Ebûtalib [Xuda jê razî be] pirsa mezîyê jê kiribû, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] jê re wiha gotibû; «Desmêj bigre û ewretê xwe bişo.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)

8. Wedî

Ew aveke sipî û sitûr e, di piştî mîzê de derdikeve.

Tahirbûna menîyê

Menî, aveke sipî û sitûr e, bi şehwet û verêhtin derdikeve û di piştî wê de jî sistbûn tê, bêhna wê wekî bêhna darên xurmeyan e, nêzîkî bêhna hevîr e, ew tahir e. Lewra heke ew necis bûya, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] dê bi şûştina wê ferman bikira. Heke ew ter be, şûştina wê têrê dike ku wê jêbibe, heke ew hişk be, firikandina wê têrê dike ku wê jêbibe. Aîşe [Xuda jê razî be] di hedîsa xwe de gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] menîya xwe dişûşt, paşê di wî cilê xwe de derdiket nimêjê, min li şûna şûştina li serê dimeyzand.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Di rîwayeta Mûslim de wiha ye: «Wî ez didîtim, min ew ji cilê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] difirikand û wî jî têde nimêj dikir.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)



Şûştin dema ew ter be



Firikandin dema ew hişk be

Alkol

Alkol, digel ku ji hêla menewî ve necis e û vexwarina wê ji gunehên mezin e jî lêbelê; ew ji hêla hissî ve tahir e. Herçî ev gotina Xuda -ezzewecelle- ye: {Geli yên ku bawerî anîne! ‘eraq, qumar, pûtên çikandî û falên bi zaran pîsin, ji karê şeytênin, naxwe xwe ji wan dûr bigirin da ku hûn serfiraz bibin} [Maîde, 90] Daxwaz jê necaseta menewî ye; ne necaseta hissî ye her wekî ku di qumar û pûtan de jî wisa ye.



‘Eraq

Rêyên tahirkirina necasetan

1. Tahirkirina erda necis bûyî

Dema necasetek li erdê bikeve, çi bi avê be, çi jî bi ğeyrê avê be, ew tê zailkirin. Lewra hedîsa wî mirovê bedewî heye, ewê ku di mizgeftê de mîz kiribû. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotibû; «Wî bihêlin, bi ser mîza wî de birijînin dêwleke tije ji avê, yan jî dêwleke mezin44 tije ji avê.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)

Heke necaset herkbar be, ew hişk bibe, ew bi hişkbûnê tahir dibe. Lewra hedîsa Ebûqîlabe [Xuda jê razî be] heye ku gotiye: «Dema erd hişk bibe, ew paqij dibe.» (Buxarî rîwayet kiriye.)



Hişkbûna necaseta diherik e



Necaseta ku li ser erdê diherik e



Hişkbûna necaseta diherik e

2. Tahirkirina ava necis bûyî

Ew bi berdana avê bi ser de heta şûna necasetê zail bibe, ew pê tahir dibe, wekî ku ew bi paqijkirina necasetê bi navgînên teknolojîya modern jî tahir dibe.




Tahirkirina bi zêdekirina avê



Tahirkirina bi navgînên modern

3. Tahirkirina cila necis bûyî

Ew bi avê tê şûştin, tê firikandin û tê guvaştin heta necaset jê here.



Tahirkirina cilên necisbûyî

4. Tahirkirina merşan e

Ew bi avê û bi paqijkerên modern tê şûştin û tê firikandin heta necaset jê here.



Tahirkirina merşan

5. Tahirkirina çermê miraran e

1. Çermê mirara ku goştê wê tê xwarin:

Ev bi debağê tahir dibe. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Dema çerm were debağkirin tahir dibe.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Debağ: Çareserkirina çerman bi hinek maddeyan e heta ew nerm bibe û pîsebêhna pêve heyî jê biçe.

Lêbelê dema heywana ku goştê wê tê xwarin ne mirar be, ew bi rêya usûlên dînî hatibe serjêkirin, hingê ji xwe çermê wê tahir e.



Debağ



Heywanên ku goştê wan tê xwarin

2. Çermê mirara ku goştê wê nayê xwarin e

Ewê/a ku bi serjêkirinê helal nabe, ew bi debağê jî tahir nabe; çendan ew di halê heyatê de tahir be jî.



Heywanên ku goştê wan nayê xwarinê



6. Tahirkirina mîza keçê, yan jî kurikê ku hîn xwarin nexwariye

Mîza keçê tê şûştin. Herçî mîza kurik e, reşandina avê li serê têrê dike. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Mîza keçê tê şûştin. mîza kurik av lê tê reşandinê». (Ebûdawud rîwayet kiriye)



Şûştina ji mîza keçê



Reşandina ji mîza kur

7. Tahirkirina tişta ku se ew leqandibe

Ew heft caran tê şûştin, cara pêşî jî bi axê ye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Dema se firağa yekî ji we bileqîne, tahirkirina wê ew e ku wê heft caran bişûyê, ya pêşî jî bi axê be.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Carek | 6 caran



Tahirkirina bi axê | Tahirkirina bi şûştinê

8. Tahirkirina mezî û wedîyê ye

Ewê ewretê xwe bişûyê û desmêj bigre. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] di hedîsa 'Elî kurê Ebûtalib [Xuda jê razî be] de jê re gotibû; «Desmêj bigre û ewretê xwe bişo.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Herçî tahirkirina cilê ye, têde reşandina avê li ser wî cihê ku mezî yan wedî lê ketibe, têrê dike. Lewra hedîsa Sehl kurê Henîf heye ku wî ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] pirs kiribû, jê re gotibû; ya pêğemberê Xuda! Ewa ku li cilê min bikeve, ezê çawa cilê xwe jê paqij bikim? Ji min re got; «Têra te dike ku tu rahêjî çengek av û devera bibînî ku ew lê ketibe, wê bi ser de birijînî.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

9.Tahirkirina xwîna heyzê ye

Ew, bi avê tê şûştin lêbelê; mayîna şûna wê zirar nake. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Av lê kirin, têra te dike û şûna wê zirarê nade te.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

10. Tahirkirina pêlavan e

Ewê wê bi erdê bihekîne heta şûna necasetê jê here. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Dema yek ji we bi pêlava xwe pêl ezîyetekê bike, ax jê re tahirker e.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)



Tahirkirina pêlavê bi hekandina bi erdê ve

11. Tahirkirina cilê jinê yên dirêj e



Tahirkirina erdê ji bo cilê jinê

Heke necasetek xwe bi dawa cilê jinê ve bigre, meşa wê di mekanê paqij de têra wê dike; erd wê tahir dike. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Ewa piştî wê, wê tahir dike.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

12. Tahirkirina xwarinên hişk e




Rûnê ku mişkê mirî ketibe navê

Ew bi avêtina necasetê û dewrûberên wê tahir dibe û ya mayî li ser eslê teharetê dibe. Lewra sabit bûye ku mişkekî ketî nav rûn de ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] hate pirsîn; ew çawa ye? Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] got; «Wî jê bavêjin, dewrûberên wê jî bavêjin û rûnê xwe bixwin.» (Buxarî rîwayet kiriye)

13. Tahirkirina pehnahîyên cîlakirî, her we ayne û camê ye

Ew tê vemiştin heta şûna necasetê jê here.



Tahirkirina camê bi vemiştinê ye

Hinek mijar di bara necasetan de

1. Esl di tiştan de tahirbûn e; lêbelê dema tişteke ku necaseta wê nîşan bide were, hingê ew cuda ye.

2. Dema necaset bikeve ser tiştekê; lêbelê cihê wê neyê zanîn, hingê temamê wê dê were şûştin.

3. Dema necaset bi tişteke din cih biguherîne- her wekî rîxa kerê bişewite û bibe xwelî- ew pê tahir dibe.




Guherîna rîxê bi xwelîyê wê tahir dike

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Şûnedev

Şûnedev

Pênasîya şûnedevan

Şûnedev
Ewa ku piştî jê hatibe vexwarin di firağê de maye

Naverok

Esl di şûnedevan de teharet e; lêbelê heke delîlek necaseta wê nîşan bide, ew cuda ye. Ew jî wekî yên ku tên e;

1. Şûnedevên tahir

a. Şûnedeva mirovan e:

«Lewra sabit bûye ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] ji şûndeva Aîşe [Xuda jê razî be] vedixwar û ew jî di heyzan de bû û wî devê xwe datanî ser şûna devê wê». (Mûslim rîwayet kiriye)



B. Şûnedeva kitikê ye:


Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] di bara kitika ku ji firağê vexwaribû de gotiye; «Ew ne necis e; ew ji wan sewalan e ku li ser we digerin, diçin û tên.» (Tirmizî rîwayet kiriye)



Şûnedeva kitik

2. Şûnedevên necis

A. Şûnedeva se ye:



Şûnedeva se

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Dema se firağa yekî ji we bileqîne, tahirkirina wê ew e ku wê heft caran bişûyê, ya pêşî jî bi axê be.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

B. Şûnedeva beraz e



Şûnedeva beraz

Şûnedeva beraz necis e; lewra Xuda Teala gotiye; {Yan goştê beraz, bêguman ew pîs in.} [Enam, 145] Yanî ew necis e, tişta ku jê biwelide jî necis dibe.



C. Şûnedevên heywanên ku goştê wan tê xwarin, şûnedeva hêstir [qantir], ker, dehbe û dirindeyên teyran û yên wekî wan e:

Ew tahir in; lewra esl di tiştan de teharet e. Li ser necisbûna wan jî delîlek nîn e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] li keran siwar dibû û di serdema wî de mirov li wan siwar dibûn.



Şûnedeva dirindeyên teyran



Şûnedeva dehbeyan



Şûnedeva kerê



Şûnedeva heywanên ku goştê wan tê xwarin


Tahirbûna însên;

Însan di nefsa xwe de tahir e; hîç ferq nake; çi ew misliman be, lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Mûmîn necis nabe» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.) çi ew kafir be; lewra sabit bûye ku pêğemberê Xuda «dirûd û silavên Xuda li ser wî bin» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.) ji meşka mûşrikekê desmêj girtiye. Herçî ev gotina Xuda ye; {Bes muşrik pîs in} (Tewbe, 28) Daxwaz jê necaseta menewî ye; necaseta îtîqadê ye.

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Firağ

4 Firağ



Naverok

Pênasîya firağê

Firağ

Ew firağên ku av û dîgerên wê di wan de tên parastin.

Bikaranîna firağên zêr û zîv

1. Di xwarin û vexwarinê de

Bikaranîna wan heram e; lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Hûn di firağên zêr û zîv de venexwin û hûn di firağên wan de nexwin. Lewra ew li dinyayê ji wan re ne; li axretê jî ji me re ne.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine) Hem jî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Ewê ku di firağên zîv de vedixwe, ew agirê cehennemê dikişîne zikê xwe.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

2. Di ğeyrê xwarin û vexwarinê de

Bikaranîna wî [zîv] di ğeyrê xwarin û vexwarinê de her wekî desmêj û ğeyrê wê de durust e; lewra ew hedîsa buhurî behsa xwarin û vexwarinê tenê kiriye; hem jî sabit bûye;



Xwarin di firağên zîv de



Xwarin di firağên zêr de

«Ku li cem Ummû-seleme [Xuda jê razî be] firağeke zîvî hebû hinek mû ji pora pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] têde bûn.» (Buxarî rîwayet kiriye)

3. Bikaranîna firağên ku bi zîv hatine lehîmkirin

Bikaranîna firağên ku ji bo îhtiyacê bi zîvê hindik hatibe lehîmkirin durust e; lewra sabit bûye; «Ku qedeha pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] şikest, wî cihê şikestî ji zîv girt.» (Buxarî rîwayet kiriye)



Misînê zîv ji bo desmêjê



Bikaranîna firağên bi zîv lehîmkirî



Li xwe kirina zêr ji bo mêr

Lixwekirina zêr ji bo mêr ne durust e; lewra ji Ebûmûsa el-eşerî [Xuda jê razî be] sabit bûye ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Cilên hevrîşm û zêr li mêrên ummeta min hatiye heramkirin û ew ji jinên wan re hatiye helalkirin.» (Tirmizî rîwayet kiriye)

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec





Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Hukmên destavkirinê



Hukmên destavkirinê

Naverok

Tişta ku li cem destavkirinê wacib e

1. Setrkirina ewretî ji mirovan di dema destavkirinê de ye; lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Setrkirina pêşîya çavên cinan û ewretê mirovan dema yek ji wan biçe avrêjê ev e ku bibêje: Bismillah [Bi navê Xuda].» (Tirmizî rîwayet kiriye)

2. Xwe parastina ji lêketina necasetê li cilên mirov û bedena wî ye; heke tiştek jê lê bikeve, ewê wê bişoyê; lewra sabit bûye ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] di ber du qebran re derbas bû, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] got; «Ew tên ezabdayîn lêbelê ew ne di tişteke mezin de tên ezabdayîn.Herçî ev e, wî xwe ji mîzê nediparast.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

3. Îstinca û îsticmar [xwe paqijkirina bi keviran] e; lewra di hedîsa Enes kurê Malik [Xuda jê razî be] de hatiye ku gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] diket avrêjê min û kurikekî wekî min firağeke avê û enze [sutreya ku didanî pêşîya xwe] hildigirt, wî xwe bi avê paqij dikir.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Ew tiştên ku li cem destavkirinê heram in

1. Dema mirov li çolê destava xwe bike, berê xwe û pişta xwe dayina qiblê heram e; lêbelê di xanîyan de jî ya çêtir terka vê ye; lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Dema hûn biçin cihê destavê; bi gû kirin û mîzkirina xwe berê xwe û pişta xwe nedin qiblê. Lêbelêberê xwe bidin rojhilat yan jî rojava.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

2. Destavkirin di rêyên mirovan, siha wan û cihên kombûna wan de heram e; lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Xwe ji herdu tiştên ku lenetê li xwe tînin biparêzin.» Sehabîyan jê re got; ya pêğemberê Xuda! Ew tiştên ku lenetê li xwe tînin çi ne? Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] ji wan re got; «Ewê ku di rêya mirovan û di sihên wan de destava xwe dike.» (Mûslim rîwayet kiriye)

3. Mîzkirin di ava sekinî de ewa ku naherike, her wekî ava hewzê banyoyê de heram e; lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Bila yek ji we di ava sekinî de mîz neke ha! Paşê jî ew xwe jê bişoyê.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

4. Bi Qur'anê re ketina banyoyê heram e;

Tişta ku li cem destavkirinê musteheb e.

1. Li cem destavkirina li sehrayê xwe dûrkirina ji mirovan e.


2. Ewê li cem ketina avrêjê bibêje; «Xudayê min, ez bi te xwe ji şeytanên nêr û mê diparêzim.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

3. Ewê li cem ketina avrêjê pêşî lingê rastê bavêje hundur û li cem derketina ji avrêjê jî pêşî lingê çepê bavêje derve.

4. Ewê li cem derketinê jî bibêje; «Ez lêbûrîna te dixwazim.» (Ebûdawud rîwayet kiriye) .


Ketina bi lingê çepê


Derketina bi lingê rastê



Destavkirin li sehrayê


Xwe xalîkirin ji rêya mirovan

Mîzkirin di ava sekinî de

Sabit bûye ku mîz di ava sekinî de serdide nexweşîya "Belharsîya" ewa ku di encama kirdeyekî nexweşkar de peyda dibe. Ew cureyek ji kurm e ku jê re "Qelşên birînan" tê gotin. (Tibba Nebewî di siha îlmê nûjen de ya "Ğiyas Ehmed)


Tişta ku li cem destavkirinê mekrûh e

1. Heke ne ji bo îhtiyacê be, li ser destavkirinê xeberdan û peyivîna bi dîgeran re mekrûh e; lewra hedîsa Îbnûmer [Xuda jê razî be]; «Heye ku zilamek di ber pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] re derbas bûbû, wî jî destava biçûk dikir, wî silav lê kir; lêbelê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] silava wî nevedabû.» (Mûslim rîwayet kiriye)

2. Ketina nav avrêjê bi tiştekê ku têde zikrê Xuda hebe, mekrûh e, lêbelê heke bitirse ku ew were dizîn û tiştên wekî wê çêbibin, hingê ew ğem nake ku bi xwe re bibe avrêjê.

3. Bi destê rastê destana ewretê xwe, yan pê îstincakirin, yan îsticmarkirin mekrûh e; lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Bila yek ji we li ser mîzê bi destê rastê xwe ewretê xwe negire û bila ew di avrêjê de jî xwe bi destê rastê xwe venemale.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

4. Mîzkirin di şeqt û qulan de mekrûh e; ji bo heywan zirarê nedin wî, yan ew zirarê nedin wan.



Axaftin li ser destavkirinê



Çûna avrêjê bi tiştekê ku zikrê Xuda li serê hebe



Mîzkirin di qulan de




Çûna avrêjê bi Mûshefê



Ji pêya mîzkirin

Dema zilam ji peşkên mîza xwe ewle be ku ewê lê nekevin, jê re duruste ku ji pêya mîz bike. Lewra hedîsa Hûzeyfe heye ku gotiye; «Kewaşe-avêjê qewmekî hate cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] û ji pêya mîz kir.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Îbnûlmûnzir gotiye; Rûniştî mîzkirin bi min çêtir e, lê ji pêya jî mûbah e.





Îstinca û Îsticmar

Îstinca

Bi ava tahirker jêbirina şûna tişta ku ji pêşî û paşîya însên dertê.

Îsticmar

Bi kevir û tiştên wekî wî, jêbirina şûna tişta ku ji pêşî û paşîya însên dertê.

Hukmê îstinca û îsticmarê

Îstinca rewa ye. Lewra hedîsa Enes kurê Malik [Xuda jê razî be] heye ku gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] diket avrêjê, min û kurikekî wekî min firağeke avê û enze [sutreya ku didanî pêşîya xwe] hildigirt, wî xwe bi avê paqij dikir.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine).

Bi du şertan îsticmar tenê caiz dibe;

Divê mîz û gû ji cihê derketina xwe ya adetî belavî cihên din nebûbe. Heke na, hingê divê av têde were bikaranîn.

Divê îsticmar bi sê paqijkirinan û zêdetirî wan be, ji bo temîzkirina pêşî û paşîyê ji şûna necasetê hasil bibe.

Hikmet ji îstinca û îsticmarê

1. Tahirkirin û jêbirina necasetê ye.

2. Paqijî û xwe dûrkirin ji sebebên nexweşîyan e.

Şertên tiştên ku pê îsticmar çêdibe

A. Divê ew tahir be; ew bi tiştên necis ne sehîh e.

B. Divê ew mûbah be; ew bi tiştên heram ne sehîh e.

C. Divê ew cihê necasetê paqij bike.

D. Divê ew ne hestî û rîx be. Selmanê Farisî [Xuda jê razî be] «gotiye; ji bo kirina gû, yan mîzê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] li me qedeğe kiribû ku em berê xwe bidin qiblê û ku em bi destê rastê xwe îstinca bikin û ku em bi kêmtirî sê keviran xwe paqij bikin û ku em xwe bi rîxê yan jî hestî îstinca bikin». (Mûslim rîwayet kiriye).

E. Divê ew ne tişteke xwedan rêz be, her wekî xwarinê, yan jî kağezên ku têde tişteke xwedan rêz hatibe nivîsîn.

Îsticmar bi kevirê paqij, desmal, perên paqij û qumaş caiz e.



Isticmarkirin bi qumaşan



Isticmarkirin bi hestîyan



Isticmarkirin bi destmalan



Isticmarkirin bi xwarinê



Isticmarkirin bi keviran



Isticmarkirin bi perên xwedan rêz

Hinek feyde

1. Ji ber derketina bayê [tirr û fisan] îstinca ne hewce ye.

2. Îstinca ji îsticmarê çêtir e; lewra ew paqijtir û temîztir dike.

Îstincakirin bi destê rastê


Îstincakirin bi destê rastê ne caiz e; lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Bila yek ji we di ser mîzê de bi destê rastê xwe ewretê xwe negire û bila di avrêjê de jî xwe bi destê rastê xwe paqij neke ha.» (Mûslim rîwayet kiriye)



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Sunnetên Fitretî/Aferandinî

6 Sunnetên Fitretî/ Aferandinî

Naverok

Pênasîya sunnetên Fitretî

Sunnetên Fitretî/Aferandinî

Xeslet û taybetmendîyên ku Xuda însan li serê aferandine, ewên ku însan bi wan mukemmel dibe heta dibe xwedan sifetên çêtirîn û sûretê ciwantirîn.

Ji Aîşe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] got; «Deh tişt ji sunnetên fitretî ne: Qusandina simbêlan, berdana rihê, sêwak, av li poz werdan, jêkirina neynokan, şûştina nav telîyan, jêkirina binçengan, kurkirina rûv, hindik bikaranîna avê û av li dev werdan e.» (Mûslim rîwayet kiriye) .

1. Sêwak e

Sêwak

Darek yan yekî wekî wî ji dara Erakê ye. Ew di diranan de tê bikaranîn, ji bo jêbirina bêhnê û xwarinên ku bi wan ve mabin.



Sêwak

Sêwak di her wext û demê de sunnet e; lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Sêwak dev paqij dike û Rebb jî razî dike.» (Ehmed rîwayet kiriye)

Lêbelê sewaba bikaranîna wê di van cihên tên de zehftir e:

1. Li cem desmêjê ye:

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Heke ne ji ber ku zehmetî dê ji ummeta min re çêbibe bûya, min dê li cem her desmêjê bi sêwakê ferman li wan bikira.» (Ehmed rîwayet kiriye)

2. Li cem nimêjê ye:

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Heke ne ji ber ku zehmetî dê ji ummeta min re çêbibe bûya, min dê li cem her nimêjê bi sêwakê ferman li wan bikira.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

3. Li cem ketina nav malê ye:

Ji Miqdam, wî jî ji bavê xwe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; min ji Aîşe [Xuda jê razî be] got; «Dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] diket nav mala xwe pêşî bi çi dest pê dikir? Wê ji min re got; wî bi sêwakê dest pê dikir.» (Mûslim rîwayet kiriye)

4. Li cem şîyarbûna ji xewê ye:

Ji Hûzeyfe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] bi şevê radibû sêwakê li devê xwe dixist û têde dibir û dianî.» (Buxarî rîwayet kiriye)

5. Li cem xwendina Qur'anê ye:

Ji 'Elî [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin ku wî bi sêwakê ferman kir û got; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Dema evd devê xwe sêwak bike, paşê rabe nimêj bike, melek li pişt wî radibe, li xwendina wî guhdarî dike û nêzîkî wî dibe -yan jî peyveke wekî wê got- heta devê xwe datîne ser devê, hingê çi tişta ku ji Qur'anê ji devê wî derdikeve, ew dikeve nava wî melekî, naxwe ji bo Qur'anê devên xwe paqij bikin.» (Bezzar rîwayet kiriye)



Hinek feydeyên sêwakê

Hinek ji feydeyên sêwakê ev in: Ew li dinyayê dev paqij dike,. Ew li axretê Xuda razî dike. Ew diranan xurt dike. Ew pirûyan dişidîne. Ew deng paqij dike û mirov çalak dike.

2. Av li dev û poz werdan e

Av li dev werdan


Av xistina dev û livandina wê ye.

Av li poz werdan

Bi nefesê di poz de kişandina avê ye.



Av li dev werdan



Av kişandina poz

3. Îstinca ye

Îstinca


Bi avê, jêbirina şûna tişta ku ji pêşî û paşîya însên derdikeve.

a. Qusandin û kurkirina simbêlan e

Daxwaz jê; zêde zêde qusandina wan e; lewra di vê de sipehîtî, paqijî û dijîtîya kafiran heye.

b. Berdana rihê ye

Berdana wê û dest jê berdan e.



Qusandina rihê

Qusandina rihê heram e; lewra ferman bi berdan û destjêberdana wê hatiye.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Simbêlan kur bikin, rihê berdin (yanî rihê bihêlin û bi guherandinê dest nedin wê) û di vê mijarê de dijîtîya mecûsîyan bikin.» (Mûslim rîwayet kiriye).

4. Qusandina rûv e

Qusandina rûv

Qusandina mûyên ku li dora ewretê însên hene.

Hinek feydeyên rûv qusandinê

Bi awayekî îlmî tesbît bûye ku rûv qusandin sihheta bedenê, xurtî û selametiya wê diparêze. Lewra pirrbûna mûyan di vê deverê de dibe sebebê gellek îltîhabên cidî, ewên ku zirarê didin bedenê.

5. Sunnetkirina mêr û jinan e

Sunnetkirina ewretê mêr

Jêkirina wî çermê li ser serê sitrê mêr e.

Sunnetkirina jinê

Birrîna goştê zêde yê li ser cihê ku sitrê mêr dikeviyê ye.

Sunnetkirina mêr û jinê heye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] ji Ummûetîyye re gotiye; «Wî nizm bike û nebirre; lewra ew rû geştir dike û bêhtir şens dide mêr.» (Hakim rîwayet kiriye)

Sunnetkirin li ser mêran wacib e, li ser jinan jî sunnet e.

Hikmeta sunnetkirina mêran; paqijkirina sitrê mêr e, ji wê necaseta ku di çermê li ser sere sitr heye. Herçî sunnetkirina jinê ye, ew rûyê wê geş û xweş dike.



6. Jêkirina neynokan e

Ew birrîna wan e ku mirov nehêle ew dirêj bibe.



Jêkirina neynokan

7. Hilkirina mûyên binçengan e

Jêkirina mûyên ku têde şîn dibin. Lewra bi jêkirina wan ew paqij dibe û ew bêhnên ne xweş yên ku bi van mûyan re kom dibin.



Hilkirina binçengan

8. Şûştina navbera telîyan e

Beracîm; qermiçonk

Movikên telîyan e ku di zahirê mistê de ne.

Hinek aliman ew qirêjên ku di guh, stû û hinek cihên bedenê de kom dibin jî li ser wan jimartine.



Qermiçonk

Çil rojan


Zêdetirî çil rojan terkkirina neynokan, her wiha binçeng, rûv û simbêlan mekrûh e. Ji Enes kurê Malik [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] di qusandina simbêlan, jêkirina neynokan, qusandina rûv û hilkirina binçengan de dem ji me re diyar kir ku em ji çil rojan zêdetir wan terk nekin.»

(Müslim rîwayet kiriye)

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec





Dr. Abdullah Bahmmam

Review

Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro

Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Desmêj

7 Desmêj

Pênasîya desmêjê

Desmêj di ferhengê de

Sipehîtî û paqijî

Desmêj di navlêka fiqhî de

Bikaranîna avê di hinek azayên xusûsî de bi nîyeta paqijkirinê ye.

Hukmê desmêjê

Desmêj, yan wacib e, yan jî musteheb e:

A. Desmêj ji bo sê tiştan wacib e

1. Nimêj e:

Xuda - ezzewecelle - gotiye; {Gelî yên ku bawerî anîne! Dema we xwest nimêj bikin; rûyê xwe û destên xwe digel anişkan bişon, sere xwe mesih bikin, û lingên xwe digel gwîzekan jî (bişon)} [Maîde, 6]



Desmêj ji bo nimêjê

Naverok

2. Tewafa Ke'bê ye:

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Heta tu tahir nebî, tu tewafa Ke'bê neke.» (Buxarî rîwayet kiriye)



Desmêj ji bo Tewafê

3. Destdana Mûshefê ye:

Xuda Teala gotiye; {Ji yên paqij pêve tu kes dest nadê.} [Waqîe: 79]



Desmêj ji bo destdana Mûshefê



Desmêj ji bo zikrê Xuda



Desmêj li cem xewê



Desmêj li cem xwendina Qur'anê

B. Desmêj di ğeyrê van de musteheb e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Yê ku ne mûmîn be, xwe li ser desmêjê nagire.» (Ehmed rîwayet kiriye)

Mustehebbûn, "li cem nûkirina desmêjê ji bo her nimêjê, desmêja ji bo zikrê Xuda û dûa, li cem xwendina Qur'anê, berîya xewê, berîya xwe şûştinê, ji bo hilgirtina mirî û piştî her bêdesmêjbûnê çendan qesda nimêjê neke jî" zehf çêtir e.



Desmêj di piştî hilgirtina mirî-meyît de



Desmêj di piştî hilgirtina mirî-meyît de

Fezîletên desmêjê

1. Sebebê hezkirina Xuda ye:

Xuda ezzewecelle - gotiye; {Bêguman Xuda ji yên tobedar hez dike û ji yên xwe paqij dikin jî hez dike} [Beqere, 222]

2. Elametê ummeta Mûhemmed e [dirûd û silavên Xuda lê bin] lewra ew roja qiyametê çalebeş [enîya wan sipî ye û bazinên dest û pîyên wan jî sipî ne] tên.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Ummeta min ji ber şûna desmêjê roja qiyametê enî-sipî, dest û ling-sipî tên. Naxwe kî ji we bixwaze sipîtîya xwe zêdetir bike, bila wê bike.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

3. Ew ji bo guneh û xeta jêbirin e.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Kî, desmêj bigre û desmêja xwe sipehî bigre, xetayên wî ji bedena wî derdikevin, heta ew ji bin neynokên wî jî derdikevin.» (Mûslim rîwayet kiriye)

4. Ew dereceyan bilind dike:

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] gotiye; «Ma ez tişteké ji we re bibêjim ku Xuda pê xeta jê dibe û pê dereceyan bilind dike?" Sehabîyan got; belê, ya pêğemberê Xuda! Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda li ser wî bin] got; "di germ û sermayê de sipehî desmêj girtin e, ber bi mizgeftê ve pirr gav avêtin e, ("el-Mekarih" ew karên ku li xweşîya însên naçin û pê giran tên) piştî nimêjê dîsa çavnêrîkirina nimêjê ye. Ha ev e robedarîya we.»(Mûslim rîwayet kiriye)

Sifetê desmêjê

1. Hazirkirina nîyetê di qelb de ye.

2. Besmele ye, yanî mirov dê bibêje; bismillah [bi navê Xuda desmêj digrim]

3. [Sê caran] şûştina herdu mistan e.

4. Sêwakkirin e, cihê wê li cem mezmezê [av li dev werdanê] ye.

5. [Sê caran] Mezmeze, îstinşaq û îstinsar e

Mezmeze; av li dev werdan e. Îstinşaq; av li poz werdan e. Îstinsar; av derxistina ji poz e.

6. [Sê caran] şûştina rû digel ji hev vekirina rihê ye.

7. [Sê caran] ji serên telîyan heta digel enîşkan şûştina destê rastê ye, paşê jî wisan şûştina yê çepê ye.

8. Mesha serî ye; bi şilkirina dest bi avê dibe. Paşê meshkirina pêşîya serî heta bi patikê ye. Paşê yek cara din vegerandina heta bi pêşîya serî ye.

9. [Careke tenê] Meshkirina nava guhan bi telîya şehdê û zahirên wan jî bi telîya girdê ye.

10. [Sê caran] şûştina lingê rastê digel gwîzekan e, her wiha ye lingê çepê jî.

11. Piştî valabûna ji desmêjê dûakirina bi vê gotinê ye: «Ez şehde didim ku Xuda yek e, bê şirîk e. Ez şehde didim ku Mûhemmed evdê wî û qasidê wî ye.» (Mûslim rîwayet kiriye)

«Xudayê min! Min bike ji tobedaran û min bike ji xwe paqijkeran.» (Tirmizî rîwayet kiriye)

«Xudayê min! Ez te ji hemû kêmasîyan pak didêrim û hemdê te dikim. Ez şehde didim ku ji te pê ve ti îlah nîn in. Ez lêbûrîna xwe ji te dixwazim û li be rte tobe dikim.» (Nesaî rîwayet kiriye)





Sifetê desmêjê



[Sê caran] Şûştina herdu mistan



[Sê caran] av li dev werdan



[Sê caran] av li poz werdan



[Sê caran] Îstinsar e,



[sê caran] Şûştina rû



Ji hev vekirina rihê



[Sê caran] Ji serên telîyan digel enîşkan şûştina herdu destan e.



Mesha serî



(Carekê) mesihkirina nava guhan



[Sê caran] Şûştina lingan digel gwîzekan

Şertên desmêjê

1. Divê av tahirker be.

2. Divê av mûbah be; wek nimûne: Ne ava dizî be.

3. Jêbirina dohn û yên wekî wan e; ewên ku nahêlin av bigihîje çermê însên.

4. Desmêj-girtineke mukemmel e.

Ferzên desmêjê

1. Nîyet e: Cihê wê dil e; ew wê bi ziman jî nabêje. Heke bêyî nîyeta desmêjê bi qesda xwe hînik-kirinê, yan xwe paqijkirinê azayên desmêjê bişoyê, ew desmêj çênabe.

2. Şûştina rû ye. Av li dev û poz werdan jî ji wê ye.

3. Şûştina herdu destan digel enîşkan e.

4. Meshkirina serî tevî ye; herdu guh jî ji wî ne.

5. Şûştina herdu lingan digel gwîzekan e.

6. Tertîba di navbera azayên desmêjê de ye.

Sunnetên desmêjê

1. [Sê caran] şûştina herdu mistan di serê desmêjê de ye.

2. Sêwak li dev werdan e.

3. [Sê car sê car] şûştina azayên desmêjê ye; lêbelê serî û herdu guh ne, ew mesha wan ji carekê zêdetir nake.

4. Teyamun e: Di azayên desmêjê de destpêkirina bi azayên rexê rastê ye.

5. Îtaletut Tehcîl e: Di şûştina enîşk û gwîzekan de şûştina zêdetirî cihên ferz e.

6. Texlîlûl-lehye ye: [Telî derbaskirina di nav rihê de ye] ji bo av bigihîje çermê rû.


7. Şilkirina navbera telîyên destan û lingan e.

8. Bi destan şûştana azayên desmêjê ye; av lê reşandinê tenê têrê nake.


9. Neîsrafkirina avê ye; lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Di nav vê ummetê de hinek însan dê werin, ewê di ava desmêjê de îsrafê bikin.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

10. Piştî desmêjê dûakirin e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; “kî ji we desmêja xwe sipehî bigre, paşê bibêje; «Ez şehde didin ku Xuda yek e, bê şirîk e. Ez şehde didin ku Mûhemmed evdê wî û Qasidê wî ye. Xudayê min! Min bike ji tobedaran û min bike ji xwe paqijkeran.» (Tirmizî rîwayet kiriye) Her heşt derîyên cennetê jê re tên vekirin, ew di kîjanî de bixwaze, têde diçe cennetê.”

11. Kirina du reket nimêj di piştî desmêjê de ye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Kî wekî vê desmêja min desmêj bigre, paşê rabe du reket nimêj bike û têde bi xwe re neaxive, gunehên wî yên buhurî jê re tên efûkirin.» Buxarî û Mûslim rîwayet kirine



Jêbirina dohn



Sêwak li dev werdan



Ferehkirina devera şûştina rû û lingan



Telî di nav hev re derbaskirin

Newaqidên [şikînerên] desmêjê:

1. Her tiştên ku ji pêşî û paşîya însên derkeve, her wekî mîz, gû û bayê, ew desmêjê dişikîne. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Dema yek ji we bêdesmêj bibe, heta ew desmêj negire, Xuda nimêja wî qebûl nake.» (Mûslim rîwayet kiriye)

2. Ew xewa ku demekê dewam bike, ewa ku pê re îdrak [têgihiştin] nemîne. Ew jixweçûn û tevizîna temam dikevin hukmê xewê.

3. Xwarina goştê hêştiran e. Lewra hedîsa Cabir kurê Semûre heye ku zilamekî pirseke wiha ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] kir; «Ma em ji goştê hêştiran desmêj bigrin?" Jê re got; "erê, desmêj bigrin.» (Mûslim rîwayet kiriye)

4. Bê perde yekser bi dest destdana ewret e. Lewra hedîsa Busre keça Sefwan heye ku wê ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bihîst ku digot: "Kî, dest bide ewretê xwe, bila desmêj bigre." (Ebûdawud rîwayet kiriye)



Xwarina goştê hêştiran



Xewa mûsteğriq

Hinek mijar

1. Dema misliman ji xewa xwe rabe û xwest ji firağekê desmêj bigre, heta ew destên xwe sê caran neşoyê, bila destê xwe têde noq neke. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Dema yek ji we ji xewa xwe şîyar bibe, bila destê xwe di firağê de noq neke heta wî sê caran neşoyê. Lewra ew nizane destê wî li çi ketiye.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)


2. Divê mirov hewl bide avê bigihîne ser her azayê ku şûştina wî wacib e. Bi taybetî jî navbera telîyên destan û lingan, navbera rihê, guhan, her wiha ye enîşkan, gwîzekan û pehnîyan jî. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Ji ber [ketina] êgir xwelî li xwediyên wan pehnîyan be.» (Mûslim rîwayet kiriye)

3. Esl, avakirin li ser yeqînê ye. Heke bi desmêjbûna xwe yeqîn bike, paşê di şikestina desmêja xwe de bikeve gumanê, ewê [emelê xwe] li ser yeqînê ava bike, ew jî bi desmêjbûna wî ye. Heke bêdesmêjbûna xwe yeqîn bike, paşê bikeve gumanê; gelo min desmêj girt yan na? Yeqîn ev e ku ew bê desmêj e.

4. Dema misliman desmêj bigre, hinek ji azayên xwe yên desmêjê carekê bişo, hinekan ji wan du caran bişo û hinekan ji wan jî sê caran bişo, desmêja wî sehîh e; lêbelê wî terka ya çêtir kiriye.

5. Kî xwe ji bîr bike, bêdesmêj nimêj bike, dema were bîra wî divê di cih de nimêja xwe ewde bike.

6. Dema mirov desmêj bigre, paşê necasetek lê bikeve, ewê necasetê jê bibe lêbelê desmêj nagire. Lewra ev ne bêdesmêjbûn e.



Navbera rih û guhan



Noqkirina dest di firağê de piştî rabûna ji xewê



Derbaskirina telîyên destan di navbera telîyên lingan de



Pehnî

> **Desmêj û tendurustiya giştî**
>
> Di meqalekeke ku di kovara Sûrs ya ku neteweyên yekbûyî wê derdixin de hatiye weşandin, metina wê wiha ye: "Xwe şûştina birêkûpêk û desmêja ji bo nimêjê di civakên îslamî de ew zehf bûye arîkar ji bo tixûb deyne û nehêle nexweşîya "Teraxûma" belav bibe, ewa ku ji bo korbûnê di alema sêyem de sebeba sereke tê jimartin. Li cîhanê nêzî 500 mîlyon mirov hene ku bi vê nexweşîyê ketine. Ew dikarin xwe ji korbûnê biparêzin dema rêya îslamî di bara paqijîya li ser her mislimanî berîya nimêjê wacib bişopînin. Di civakên îslamî yên pêbendê dînê xwe de nizmbûna rêjeya ketina bi vê nexweşîya hatiye tesbîtkirin; heta ew gihaye dereceya tinebûnê." (Ettibûn-Nebewî fî dew'îl îlmîl hedîs ya Ğiyas el-Ehmed).

Ne mûnasib e!

1. Eşkere gotina nîyetê li cem desmêjê ye.

2. Îsrafkirin di avê de ye.

3. Zêdetirî sê şûştinan di desmêjê de ye;

lewra hatiye rîwayetkirin ku bedewîyek hate cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] pirsa desmêjê jê dikir. Wî sê car sê car desmêj nîşanî wî da. Paşê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got; «Wiha ye desmêj. Kî, li ser vê zêde bike, wî xirab kiriye, zêdegavî kiriye û zulm kiriye.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

Lêbelê heke azayên desmêjê bi sê car şûştinan paqij nebin, mûbah e ku ew li wan caran hinekên din jî zêde bike. Her wekî wî yê ku dohn û dîgerên wî li destên wî ketibin.



Îsrafkirin di avê de

4. Sipehî negirtina desmêjê ye:

Hatiye rîwayetkirin ku zilamekî desmêj girtibû lêbelê; bi qasî cihê neynokekê li ser lingê xwe [ziwa] hiştibû, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew cih dît û jê re got; «Vegere, desmêja xwe sipehî bigre.» (Mûslim rîwayet kiriye) Ew zilam vegerîya, [desmêja xwe sipehî girt]paşê nimêj kir.

Ev haletên ha tev dikevin çerçoveya sipehî negirtina desmêjê:

a. Neşûştina herdu gwîzekan e.

b. Neşûştina herdu enîşkan e; bi sebeb tengbûna zendikan.

c. Neşûştina sipîtîya navbera guh û mûyên rihê [cenikê] ye.

e. Neşûştina mista destê çepê digel destê çepê ye.

f. Kî desmêj bigre û li ser wî deqên dohn hebin.

g. Desmêjgirtina jinê ye ku li ser telîyên wê zîneta wê hebe, nehêle av bigihîje çermên wan.

h Şilnekirina telîyên lingan dema av di navbera wan de derbas nebe.

5. Mesihkirina stû ye;

ew bi ti awayan ne ji desmêjê ye. Lêbelê heke îhtiyaca wê bi mesihkirinê hebe; bila ew berî yan jî piştî temambûna desmêjê wê mesih bike.

6. Gotina hinek zikran e ku ew di şerîetê de nehatine gotin;

her wekî dûayeke taybet ku li dev şûştina her azayekî were gotin. Yan jî “bila zemzem be” ji bo mirovê ku desmêj digre.

7. Îadekirina desmêjê ji bo ewê ku weswese pê re heye:

Ev leystika Şeytan e, ew bi mirov dileyize. Ew weswesê jê re çêdike; desmêja te çênebûye, yan jî ew nuqsan e!! Ew dike ku însan di îstincayê de mûbaleğe dike, zehf azayên desmêjê dişoyê, heta ew ji îbadetê aciz dibe.






Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Mesha li ser xufikan, goran, cebîre, kincên li ser birînê hatin pêçan û

8 Mesha li ser xufikan, goran, cebîre, kincên li ser birînê hatin pêçan û tiştên ku bi birînê ve hatine kirin

Xufik

Ew çermê ku li ser ling tê wergirtin.

Gore

Ewên ku ji pembû û yên wekî li ser ling tên wergirtin.

Naverok

Hukmê mesiha li ser herdu xufik û goran

Ji bo gellek hedîsan mesiha li ser xufik û goran durust e. Yek ji wan ev e: Hatiye rîwayetkirin ku dema pirsa mesiha li ser xufikan ji Enes kurê Malik [Xuda jê razî be] hate kirin, wî got; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] mesih li ser wan dikir.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)

Şertên mesihkirina li ser xufik û goran

1. Piştî temambûna desmêjê wergirtina wan e. Ji Mûğîre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Ez li seferekê bi pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re bûm, min xwe tewand jib o herdu xufikên wî ji lingên wî bikişînim. Wî ji min re got; dest ji wan berde. Lewra min ew herdu tahir xistibûn lingên xwe û wî li ser herduyan mesih kir.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine).

2. Divê ew herdu xufik lingan heta bi gwîzekan binixumînin. Mesih li ser berjêrtirê ji gwîzekan. nayê kirin. Lewra ew herdu ne ji ling e.

3. Divê herdu xufik ji tişteke tahir hatibin çêkirin.

4. Divê ew herdu xufik mûbah bin. Divê ew ne ji tişteke wekî hevrîşm ji mêran re heram be.

5. Divê mesih di esnaya wî muddetê sînordarkirî be. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji bo mesihê muddeteke sînordarkirî diyar kiriye [ji bo mirovê li mal be şev û rojek e. Ji bo rêwîyan sê roj in]; derbaskirina wî muddetî ne durust e.

https://www.al-feqh.com/ku

6. Divê mesih di bêdesmêjîya biçûk de be; ne bêdesmêjîya mezin [cenabet]. Ji Sefwan kurê ‘Essal [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Dema em rêwî bûn, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman li me dikir ku em sê rojan li ser xufikên xwe mesih bikin; em wan ji lingên xwe nekin ji bo bêdesmêjbûna ji gû, mîz û xewê; lêbelê ne ji cenabê.» (Buxarî rîwayet kiriye).

Yanî ew mirovê ku bi cenabe bûbe, divê ji bo xwe şûştinê wan ji lingên xwe bixe. Paşê careke din wan bixe lingên xwe.





Awayê mesiha li ser xufik û goran

Mirov bi herdu destên xwe yên ji avê şil, careke tenê jora xufikên xwe mesih dike; ji telîyên lingên xwe [dest pê dike] heta bi alîyê paqa xwe; lingê rastê bi destê rastê tê mesihkirin û lingê çepê jî bi destê çepê tê mesihkirin.

Jêra xufikan û kenarên wan nayên mesihkirin. ‘Elî [Xuda jê razî be] gotiye; «Heke dîn bi dîtinnêrînê bûya, mesihkirina jêra xufikê dê ji jora wê baştir bûya! Min pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dît ku jora xufikên xwe mesih dikir.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)



Mesih bi herdu destên xwe



Mesiha jêra xufikê



Mesiha kenarê

Mûddetê mesiha li ser xufik û goran

Ji bo mirovê li mal roj û şevek e; ji bo mirovê rêwî sê şev û sê roj in.

Delîla vê, ev gotina 'Elî [Xuda jê razî be] ye: «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] mûddetê mesihê ji bo rêwî sê roj û şev û ji bo yê limal jî rojek û şevek dîyar kiriye.» (Nesaî rîwayet kiriye).



Hesabkirina mûddeta mesihê

Mûddetê mesihê ji serê mesiha piştî bêdesmêjbûnê dest pê dike. Naxwe dema herdu gore li ser desmêjê xistin lingên xwe, paşê bêdesmêj bû, paştir ji bo cara yekem mesih kir, ji vê mesihê şev û rojek [bîst û çar saet] tê hesabkirin.

Nimûneya wê wekî vê ye; zilamek desmêj girt, herdu lingên xwe şûştin, paşê herdu gorên xwe xistin lingên xwe, nimêja sipêdê kir, di saeta 10ê sipehê de bêdesmêj bû; desmêja wî şikest, dema saeta 11a sibehê hat, demêj girt ji bo nimêja danê tavê bike, li ser herdu gorên xwe mesih kir. Ha li vir, jê re durust e, heta saeta 11a sibeha roja dinê li ser wergirtina goran û mesihkirina li ser wan berdewam be. Ev ji bo yê li malê ye. Herçî rêwî ye, ji bo wî jî sê roj û sê şev in.

Betalkerên mesiha li ser xufik û goran

1. Bi dawîbûna mûddeta mesihê ye.

2. Derketina yekî ji wan yan jî herduyan ji lingên wî ye.

3. Çêbûna bêdesmêjîya mezin e. Lewra ji Sefwan kurê 'Essal [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Dema em rêwî bûn, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman li me dikir ku em sê rojan li ser xufikên xwe mesih bikin; em wan ji lingên xwe nekin ji bo bêdesmêjbûna ji gû, mîz û xewê; lêbelê ne ji cenabê.» (Tirmizî rîwayet kiriye).



Derketina gorê mesihê betal dike

Mesiha li ser cebîre, îsabe, lisûqê

Pênasîya cebîre, îsabe û lisûqê

Cebîre

Ew dês, dep û yên wekî wan ku li ser cihê şikestî tê şidandin.




Îsabe

Ew qumaş û yên wekî wî ku pê birîn û cihê şewitî tê pêçan ji bo tedawîyê.



Lisûq

Ew tişta ku ji bo dermankirinê bi birînê ve tê kirin.



Delîla meşrûîyeta mesiha li ser cebîrê

Ji Cabir [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; « em derketin seferekê, kevirek li zilamekî ji me ket û serê wî şikand, paşê şeytan pê kenî. Wî ji hevalên xwe pirs kir, got; gelo hûn ji min re ruxsetê dibînin ku ez teyemmum bigrim? Jê re gotin; em wê ruxsetê ji te re nabînin. Lewra tu dikarî avê bikarbînî. Wî jî xwe şûşt û mir. Çi dema em hatin cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ev rewş jê re hate vegotin, wî got; «Wan ew kuştiye, Xuda jî wan bikuje! Çima wan pirs nekir, dema wan nezanîbû?! Lewra dermanê nezanînê pirsîn e. Têra wî dikir ku teyemmum bigirta, yan li ser birîna xwe kincek şidandiba, -ango şeka ji rîwayetkarî ye- lê bipêçaya, paşê mesih li ser bikira û bedena xwe ya mayî jî bişûşta.» (Ebûdawud rîwayet kiriye).

Şertên mesiha li ser cebîre, îsabe û lisûqê

1. Di îsabe û cebîrê de şert e; ew ji wî cihê ku dermankirina wî tê xwestin û derdora wî ya ku ji bo bicihkirina van tiştan îhtiyac pê heye, derbas nebe.

2. Ne şert e ku cebîre û îsabe li ser teharetê hatibe danîn; wekî ku ji bo vê mûddetek jî ne şert e, madem ji bo mayîna wê îhtiyac hebe. Lewra ji bo wî durust e, ew mesihê li ser wê bike di esnaya tahirbûna ji herdu bêdesmêjîyan [ya biçûk û ya mezin] de. Kengê îhtiyaca wî pê nema, hingê divê ew wan ji serê rake û li cem desmêjê jî wî azayî bişoyê.

3. Di lisûq û îsabe û yên wekî wan de; ji wan tiştên ku rakirina wan û îadekirina wan hêsan dike, wiha tê nêrîn:

a. Heke bê zirar lê ketin û bê dereng ketina şîfayê rakirina wan û şûştina cihê bin wan hêsan be; ewê wan rake, cihê bin wan bişoyê û paşê wê îade bike [deyne ser wan].

b. Heke bê zirar lê ketin û dereng ketina şîfayê rakirina wan û şûştina cihê bin wan ne hêsan be, ewê li cem şûştina azayê ku ew li serê ne, ewê li ser wê mesih bike [wan ji ser cihê birînê raneke].

Awayê mesiha li ser cebîre û îsabê



Awayê mesiha li ser îsabê




Awayê Meshkirina Li Ser Cebîrê



Awayê Mesiha li ser paçikê li ser birînan



Awayê hesabkirina mûddetê mesihê




Zilamekî desmêj girt, herdu lingên xwe şûştin, paşê herdu goreyên xwe wergirtin, nimêja sipêdê kir, di saeta 10ê sibehê de jî bê desmêj bû, wî desmêja xwe şikand. Çi dema saeta 11ê sibehê hat, wî desmêj girt ji bo nimêja dûha [danê tavê] bike û li ser goreyên xwe mesih kir. Ha li vir, ji wî re cewaz heye ku li ser wergirtina goran û mesihkirina li ser wan berdewam be; heta saeta 11ê sibeha roja piştî wê were.

Ev ji bo yê li malê ye. Herçî rêwî ye, ji bo wî jî sê roj û sê şev in.

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec




Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Ğusl

9 Ğusl

Naverok

Pênasîya ğuslê

Ğusl di ferhengê de

Derbaskirina avê li ser temamê tiştê ye.

Ğusl di navlêka fiqhê de

Şilkirina temamê bedenê bi sifetekî xusûsî; bi qesda îbadetkirina ji Xuda Teala re ye.



Wacibkerên ğuslê

1. Derketina menîyê

Menî: Aveke sipî û sitûr e, ew bi şehwet û verêhtin derdikeve û li pey wê jî westin û sistbûn tê, bêhna wê dişibihe hêka xirabûyî. Lewra Xuda Teala gotiye; {Eger hûn bi cenabet bin xwe paqij bikin.} [Maîde, 6] Hem ji bo gotina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ya ji 'Elî [Xuda jê razî be] re ye: «Dema te av [menî] bi verêhtin derxist, xwe bişo.» (Ebûdawud rîwayet kiriye).

Hinek mijar

1. Heke di xew de şeytan bi mirov bikene û menî ji mirov neyê, şûştin li ser mirov nîn e. Lêbelê heke di piştî şîyarbûna wî de menî derket, hingê divê ew xwe bişoyê.

2. Heke mirov menîyê bibîne û neyê bîra wî ku şeytan pê kenîbû dîsa wacib e ku ew xwe bişoyê. Lewra menî derketiye. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Av ji avê ye.» (Mûslim rîwayet kiriye) Yanî şûştin ji derketina menîyê ye.

3. Heke hest pê bike ku menî veguhezî ewretê wî; lêbelê jê derneket, hingê ti şûştin li ser wî nîn e.

4. Heke menî ji ber êşekê, yan jî nexweşîyê bê şehwet jê hat, dîsa ti şûştin li ser wî nîn e.

5. Dema yek bi cenabet be û xwe bişoyê, paşê di piştî şûştinê de menî jê were, dubarekirina şûştinê ne wacib e. Lewra ew bi pirranî bê şehwet derdikeve. Lêbelê jê re baş e ku ji bo îhtiyatê ew desmêj bigre.

6. Dema mirovê razayî ji xew şîyar bû, şilahî dît lê ti sebebê wê jî nehate bîra wî, ew ji yekî ji sê haletan xalî nabe;

a. Ew yeqîn bike ku ew menî ye; hingê ji wî re şûştin wacib e. Çi îhtîlam [şeytan pê kenîn] were bîra wî, çi jî neyê bîra wî.

b. Ew yeqîn bike ku ew ne menî ye. Hingê şûştin ji wî re nîn e. Hukmê wê jî hukmê mîzê ye.

c Ew bikeve gumanê; gelo ew menî ye, yan jî na? Divê ew xweş li serê bifikre; heke hate bîra wî ku ew menî ye, ji xwe ew menî ye. Heke hate bîra wî ku ew mezî ye, ji xwe ew mezî ye. Heke tiştek nehate bîra wî, hingê ji bo îhtiyatê divê ew xwe bişoyê.

7. Dema mirov menîyê bibîne, lêbelê nehate bîra wî, kengê ew îhtîlam bûye, hingê şûştin li ser wî wacib e. Hem jî ji xewa xwe ya dawîn pê ve divê ew nimêjên xwe jî [tevan] îade bike.

2. Cîma'

Ew e ku ewretê mêr û ewretê jinê li hev bikevin û cîmaa bi ketina serê kîr tev di quz de, dibe; çendan hatina menîyê hasil nebe jî. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Dema cihê sunnetkirî di cihê sunnetkirî re derbas bibe, şûştin wacib dibe.» (Tirmizî rîwayet kiriye).

3. Mislimanbûna yê kafir e

Lewra dema Qeys kurê 'Asim misliman bû, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re fermankir; «Xwe bişo.» (Ebûdawud rîwayet kiriye).

4. Qutbûna xwîna heyzê û çêl

Lewra hedîsa Aîşe heye ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji Fatima keça Ebû-hûbeyş re got; «Dema heyz berê xwe bide were, dest ji nimêjê berde û dema ew pişta xwe bide, here, xwe bişo û nimêj bike.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine). Bi îcmaê çêl jî wekî heyzê ye.

5. Mirin e

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di hedîsa şûştina keça xwe Zeyneb ya dema wê wefat kiribû de gotiye; «Heke hûn mûnasib bibînin wê sê caran, yan pênc caran, yan jî hîn zêdetir bişon.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)



Sifetê şûştinê

Ya wacib, di şûştinê de bi çi awayî dibe bila bibe, bi nîyeta şûştinê şilkirina temamê bedenê ye. Lêbelê musteheb e ku mirov sifetê şûştina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji xwe re bike nimûne. Dêya mûmînan Meymûne [Xuda jê razî be] awayê şûştina wî wiha vegotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] av ji bo cenabê danî cih, du caran, yan jî sê caran destê rastê xwe bi ser yê çepê de bir. Paşê wî ewretê xwe şûşt. Paşê du caran, yan jî sê caran destê xwe li erdê, yan jî li dîwarî da. Paşê wî av li devê xwe werda û av li pozê xwe jî werda. Wî destên xwe û herdu zendên xwe şûştin. Paşê wî av bi ser serê xwe de rijand. Paşê wî bedena xwe şûşt. Paşê wî xwe da paş, herdu lingên xwe jî şûştin. Ew dibêje; min kincek jê re anî, wî ew red nekir û pê destê xwe ziwa bike.» (Buxarî rîwayet kiriye).

Naxwe awayê şûştinê wiha ye:

1. Mirov du caran, yan jî sê caran mistên xwe dişoyê.

2. Mirov ewretê xwe dişoyê.

3. Mirov du caran, yan jî sê caran destê xwe li erdê, yan jî li dîwarî dixe.

4. Mirov eynî wekî desmêja ji bo nimêjê desmêj digre; lêbelê şûştina lingê xwe tenê dihêle paşîyê.

5. Mirov avê bi ser serê xwe de dirijîne.

6. Mirov bedena xwe ya mayî jî dişoyê.

7. Mirov xwe dide paş û lingên xwe jî dişoyê.











Hinek feyde

- Li ser jinê ne wacib e ku ew kezîyên xwe veke ji bo şûştina cenabê yan jî heyzê. Lêbelê têra wê dike ku ew avê bi ser wan de birijîne heta av bigihîje binê koka wan.

- Dema jin xwe ji heyzê, yan jî ji çêl bişoyê jê re musteheb e ku ew perçekek ji pembû yan jî tişteke wekî wî bigre, miskê yan jî bêhneke xweş li wî bike, paşê wî bi ser şopa xwînê de bibe.

- Dema însan xwe ji cenabê bişoyê bi vê şûştinê nimêjkirin jê re sehîh e; çi wî nîyeta desmêjê anîbe, çi jî neanîbe.

Tiştên ku li ser mirovê/a bi cenabe heram in

1. Nimêj e:

Lewra Xuda Teala gotiye; {Gelî yên ku bawerî anîne! Dema hûn serxweşbin nêzî nimêjê nebin.} [Nîsa, 43]



Nimêj

2. Tewafa Beytul Heramê ye:

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Tewafa Beytê heram e.» [Nesaî rîwayet kiriye].



Tewafa Beytê

3. Destdana Mûshefê ye:

Lewra Xuda Teala gotiye; {Ji yên paqij pêve tu kes dest nadê.} [Waqîe, 79]

Hem jî gotina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye: «Ewê ku ne tahir be, dest nade Mûshefê.» (Malik di el-Mûwetteê de rîwayet kiriye).



Destdana Mûshefê

4. Xwendina Qur'anê ye:

Ji 'Elî [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji avrêjê derdiket, ji me re Qur'an dixwend û bi me re goşt dixwar. Ji cenabê pê ve tiştekê ew ji Qur'anê asteng nedikir.» (Tirmizî rîwayet kiriye).



Xwendina Qur'anê

5. Sekna li mizgeftê ye; lêbelê rêbiwar ne têde ye.

Lewra Xuda Teala gotiye; {Gelî yên ku bawerî anîne! Dema hûn serxweşbin nêzî nimêjê nebin, heta hûn bizanin ka hûn çî dibêjin. Dema hûn bi cenabet bin jî -ji bilî yê rêwî- heta hûn xwe neşon.} [Nîsa, 43]



Sekna li mizgeftê

Şûştinên musteheb

1. Xwe şûştina ji bo înê ye:

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Kî, xwe ji bo înê desmêj bigre, wî xwe bi ya qenc girtiye. Lêbelê kî xwe bişoyê, ji xwe şûştin çêtir e.» (Ebûdawud rîwayet kiriye).

2. Xwe şûştina li cem ihram li xwe kirina ji bo umrê, yan jî hecê ye:

Ji Zeyd kurê Sabit [Xuda jê razî be] «hatiye rîwayetkirin ku wî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dît ku wî xwe ji bo îhlala xwe xwerû kir û xwe şûşt.» (Tirmizî rîwayet kiriye).

3. Xwe şûştina di piştî şûştina mirî de ye:

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Kî, mirîyekî/ê bişoyê,bila ew jî xwe bişo.» (Îbnmace rîwayet kiriye)

4. Xwe şûştin di piştî her cîmaê de ye:


Ji Ebûrafî [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin; «ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] rojekê li ser hevserên xwe gerîya, xwe li cem vê dişûşt û xwe li cem wê jî dişûşt. Ew dibêje; min jê re got; ya pêğemberê Xuda! Çima tu wê nake şûştineke tenê? Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: "Ev paktir e, xweştir e, paqijtir e."» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

Ne mûnasib e

1. Derengxistina şûştina cenabê heta wextê nimêjê derkeve.

2. Terkkirina jinê ji bo nimêja li ser wê wacib kengê ji heyzê paqij bû. Heke jin paqij bû berî derketina wextê nimêja nîvroyê bi qasî reketekê, hingê li ser wê wacib e ku ew xwe bişoyê û nimêja nîvroyê bike. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Kî bigihîje reketeke sibehê berî tav derkeve, ew gihaye sibehê. Kî bigihîje reketeke esrê berî roj here ava, ew gihaye esrê.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine).


https://www.al-feqh.com/ku



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Teyemmum

10 Teyemmum

Naverok

Pênasîya teyemmumê

Teyemmum di ferhengê de

Qesd û berê xwe dana tiştekê ye.

Teyemmum di navlêka fiqhî de

Mesiha rû û herdu destan e, bi axa paqij, bi nîyeta teharetê ye.

Hukmê teyemmumê

Dema av nebe, yan jî bikaranîna wê zor be, teyemmum wacib e; ji bo wan tiştên ku desmêj ji wan re wacib e, her wekî nimêjê û ew musteheb e, ji bo wan tiştên ku ji wan re [desmêj] musteheb e, her wekî xwendina Qur'anê.

Delîlên meşrûîyeta teyemmumê

1. Xuda -ezzewecelle- gotiye; {We av nedîtibe bi axake paqij teyemmümê bigrin, rûyê xwe û destên xwe bi wê axê mesih bikin} [Maîde, 6]

2. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Pênc tişt ji min re hatine dayîn, ew berîya min ji ti kesî re nehatine dayîn: Qunağa heyvekê bi tirsê arîkarîya min hatiye kirin. Erd ji min re bi mizgeft û paqij hatiye kirin. Naxwe kîjan zilam ji ummeta min nimêj bigihîje wî, bila nimêj bike.» (Buxarî rîwayet kiriye).

Hikmet ji meşrûîyeta teyemmumê

1. Hêsankarî ye ji ummeta Mûhemmed [dirûd û silavên Xuda lê bin] re.

2. Rakirina zirarê ye, ewa ku di hinek rewşan de dibe ku bi karanîna avê hasil bibe her wekî nexweşîyê yan dijwarbûna sermayê û yên wekî wan.

3. Berdewambûna peywendîya bi îbadetê re ye; jê qutnebûna bi qutbûna avê ye.

Teyemmum kengê meşrû dibe?

1. Li cem nebûna avê ye.

Lewra Xuda - ezzewecelle - gotiye; {We av nedîtibe teyemmüm bigrin} [Maîde, 6]

Heta însan li avê negere, nayê hesabkirin ku av nîn e.



Ewê ku ava wî nîn e

2. Li cem nekarîna bikaranîna avê ye, çendan ew hebe jî.

Her wekî yê nexweş û ew yextiyarê ku nikare tevbigere û li cem wî jî kes nîn e, ji bo desmêjê arîkarîya wî bike.



Ewê emr mezin



Yê nexweş

3. Li cem tirsa zirardîtinê ji bikaranîna avê ye.

Ev jî ji wan e:

a. Ew nexweşê ku avê bikar bîne, nexweşîya wî dê zêde bibe.

b. Ew şexsê ku di dijwarîya sermayê de ye û li cem wî tiştek nîn e ku pê avê germ bike û zena wî ya xurt ev be ku heke ew xwe bişoyê, ewê nexweş bikeve. Lewra «sabit bûye ku dema wî ji ber dijwarbûna sermayê bi teyemmumê li pêşîya hevalên xwe nimêj kiribû, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew ji 'Emr kurê 'As re iqrar [qebûl] kiribû.» (Ebûdawud rîwayet kiriye).

c. Dema ew li cihekî dûr be, li cem wî aveke hindik hebe, ji bo vexwarinê îhtiyaca wî jî pê hebe û ew nikare dîgerê wê jî hazir bike.

Sifetê teyemmumê

1. Ewê careke tenê destê xwe li axê bide.

2. Paşê ewê pif bike wan da ku tozê ji wan sivik bike.

3. Paşê ewê bi wan careke tenê rûyê xwe mesih bike.

4. Paşê ewê zahirê destên xwe mesih bike; paşê ewê bi batinê destê çepê zahirê rastê xwe mesih bike. Paşê bi batinê destê çepê zahirê çepê mesih bike.

Delîla sifetê teyemmumê:

Hedîsa 'Emmar [Xuda jê razî be] ku gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] herdu destên xwe li erdê dan, pif kir herduyan, paşê bi herduyan rûyê xwe û herdu destên xwe Mesih kirin.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine).

Ferzên teyemmumê

1. Nîyet e.

2. Mesiha rû ye.

3. Mesiha herdu destan e.

4. Tertîb e; ewê bi mesiha rû dest pê bike, paşê jî destên xwe.

5. Peyhevbûn e; ewê piştî mesiha rû yekser herdu destên xwe mesih bike.

Betalkerên teyemmumê

1. Hebûna avê ye.

2. Peydabûna tiştekê ye ji yên ku desmêjê dişikînin her wekî derketina bayê.

3. Peydabûna tiştekê ye ku ew şûştinê wacib dike, her wekî îhtîlamê.

4. Nemana wî uzrî ye ku ji bo wî teyemmum hatiye danîn her wekî nexweşî û yên wekî wê ne.



Hebûna avê ye

Bi awayê îlmî îsbat bûye

Axa erdê di navbera zerreyên xwe de maddeyeke tahirker dihewîne. Ev madde, dikare bi her cureyên wan ve mîkroban ji holê rake. Ew dikare her mîkrob û vîrûsê ji holê rake.

Hinek mijar

1. Nimêja bi teyemmumê -li cem nekarîna bikaranîna avê- ji wê nimêja ku mirov bi desmêjê nimêj bike û di xwe de jî mîz û gû hebs bike, çêtir e.

2. Teyemmum li ser dîwar, seccade û yên wekî wan ne caiz e; heke li ser wan ax nebe.

3. Ji bo mirovê bi teyemmum mûbah e ku ew bi teyemmumekê heta bive, nimêjên ferz û nafîle bike; heta tiştеke ku wê bişikîne, neyê.

4. Ewê bi desmêj sehîh e ku li pey yê bi teyemmum nimêj bike; lewra «dema wî ji ber dijwarbûna sermayê bi teyemmumê li pêşîya hevalên xwe nimêj kiribû, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew rewş ji 'Emr kurê As re iqrar kiribû». (Ebûdawud rîwayet kiriye).

5. Ewê teyemmum bigre û pê nimêj bike, paşê berîya derketina wextê avê bibîne, ewê nimêja xwe îade neke.

Lewra ji Ebû-seîd el-Xudrî [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Du zilam derketibûn seferekê, dema nimêjê hatibû, bi wan re av jî nebû. Herduyan bi axa tahir teyemmum girtibû û nimêj kiribû. Paşê di wextê wê de wan herduyan av dîtibû, yekî ji wan desmêj û nimêj îade kiribû û yê din jî ew îade nekiribû. Paşê ew herdu hatibûn cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û ew jê re vegotibûn. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji wî zilamê ku îade nekiribû re got; "te tam wekî sunnetê kiriye. Nimêja te ji te re çêbûye." Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji wî zilamê ku desmêj û nimêj îade kiribû re jî got; "ji te re du caran sewab heye.» (Ebûdawud rîwayet kiriye).

6. Kî teyemmum bigre, paşê berî yan jî di esnaya nimêjê de avê bibîne, li ser wî wacib e ku bi wê avê desmêj bigre. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «axa paqij ji mislimanî re tahirker e; çendan ew deh salan jî avê nebîne. Dema ew avê bibîne, bila wê bide çermê xwe. Lewra ew jê re xêr e.» (Tirmizî rîwayet kiriye).

7. Caiz e derengxistina teyemmumê ji bo dawîya wextê ji bo însanê ku hêvîya wî ji dîtina avê hebe. Lêbelê dema ew ji hebûna wê bêhêvî be, jê re musteheb e ku ew di serê wextê de teyemmum bigre. Lewra nimêja qenc, nimêja di serê wextê wê de ye.

8. Dema însan ji derketina wextê nimêjê bitirse, dema ew avê bibîne û karibe wê bikarbîne, teyemmum bi kêrî wî nayê. Lêbelê çendan wextê nimêjê derkeve jî wacib e ku ew desmêj bigre.

9. Tiştek nikare nehêle misliman nimêj bike; heke av nebe, yan jî bikaranîna wê zor be, ewê teyemmum bigre. Heke îmkana teyemmumê jî nebe, ewê bêdesmêj jî nimêjê di wextê wê de bike û ewê wê îade jî neke. Ji vê re "faqîdût-tehûreyn=desmêj û teyemmum herdu nîn in" lewra Xuda Teala gotiye; {Heta ji we were, xwe ji Ellah biparêzin.} [Teğabun: 16]



Sifetê teyemmumê



1 Bi derbeke tenê destê xwe li axê dixe



2 Pifkirina axê



3 Mesihkirina rû



4 Mesihkirina destê rastê bi destê çepê




5 Mesihkirina destê çepê bi destê rastê



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Cihê nimêjê û hukmê wê



Cihê nimêjê û hukmê wê

Naverok

Pênasîya nimêjê

Nimêj di ferhengê de

Dûa ye.

Nimêj di navlêka fiqhî de

Îbadetkirina ji Xuda Teala re bi hinek gotin û kirinên xusûsî; bi tekbîrê dest pê dike û bi selam-dayînê bi dawî dibe.

Cihê nimêjê di îslamê

Nimêj ruknê duyem ji ruknên îslamê ye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Îslam li ser pênc bingehan hatiye avakirin; şehde dayîna ku ji Xuda pê ve ti îlah nîn in, Mûhemmed jî evdê wî û pêğemberê wî ye, kirina nimêjê ye.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Nimêj ji hemû emelan çêtir e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Emelê ji hemû emelan çêtir nimêja di ewwelê wextê wê de ye.» (Tirmizî rîwayet kiriye)

Nimêj navbirra navbera îslam û kufrê ye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Di navbera însên û şirk û kufrê de terka nimêjê ye.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Nimêj sitûna îslamê ye. Îslam di piştî tewhîdê de li ser wê ava dibe. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Serê vî karî [dînî] îslam e, sitûna wî jî nimêj e.» (Ehmed rîwayet kiriye)

Fezîleta nimêjê

Nimêj ji xwediyê xwe re nûr e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Nimêj nûr e.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Nimêj ji xetayan re kefaret e. Lewra Xuda [ezzewecelle] gotiye: {Di herdu rexên rojê de, ji şeve jî di demen nêzî rojê de nimêj bike, bêguman qencî gunehan dibin, ev bîranîneke ji boy ê ku dibîra xwe bînê} [Hûd: 114] Hem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî gotiye: «De ka ji min re bibêjin, heke çemek li ber derîyê yekî ji we hebe, ew rojê pênc caran xwe ji wê bişoyê, qey tiştek ji qirêja wî dimîne?!» Sehabîyan jê re got; tiştek ji qirêja wî namîne. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Ev nimûneya pênc nimêjan e, Xuda bi wan xetayan jêdibe.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Nimêj ji bo çûna cennetê sebeb e. Lewra çi dema Rebîe kurê Ke‘b hevaltiya li cennetê jê xwest, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got: «Naxwe tu jî bi zehf kirina sicûdan arîkarîya min li ser nefsa xwe bike». (Mûslim rîwayet kiriye)

Hukmê nimêjê

Her pênc nimêj bi kîtab, sunnet û îcmaê wacib in.

Kîtab e. Xuda [ezzewecelle] gotiye: {Nimêjê eda bikin, zekatê bidin û bi nimêjkeran re nimêj bikin}. [Beqere; 43]

Sunnet e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Îslam li ser pênc bingehan hatiye avakirin; şehde dayîna ku ji Xuda pê ve ti îlah nîn in, Mûhemmed jî evdê wî û pêğemberê wî ye, kirina nimêjê, dayîna zekatê, hecca Beytê û rojîya Remezanê ye.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Ji Telhe kurê Ebdûllah hatiye rîwayetkirin, gotiye; zilamekî ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] îslam pirs kir; ew çi ye? Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got: «Pênc wext nimêj di şev û rojê de ne.» Wî jê re got; ma ji bilî van ti nimêjeke din li ser min heye? Got; «Na! Lêbelê ku tu sunnetan bikî, tu karî wan bikî.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Îcma ye. Lewra temamê ummetê îcma kiriye ku her pênc wext nimêj di şev û rojê de wacib in.

Nimêj li ser kî wacib e?

Nimêj li ser her mislimanê baliğ û biaqil; çi mêr be, çi jin be, wacib e.

Qezaya nimêjê

Mirovê kafir, dema misliman bibe ferman lê nayê kirin ku ew nimêjên xwe yên berî mislimanbûnê lê çûne, qeza bike.



Hukmê tarîkûs-selatî [bênimêjî]

1. Tarîkûs-selat, ewê ku wacibbûna wê înkar dike:

Tê zanîn; heke ew cahil be, heke [piştî hînbûna wê jî dîsa] ew li ser înkara xwe israr bike, ew kafir e, ew Xuda û pêğemberê wî û îcmaa mislimanan tekzîb dike.

2. Tarîkûs-selat, ewê ku ji tenbelîya xwe nimêj nake;

Kî bi qesd û ji tenbelîya xwe terka nimêjê bike, ew kafir dibe. Divê karbidest wan gazî nimêjê bike û mûddetê sê rojan tobê li wî erz bike. Heke ew tobe ji xwe rind e. Heke na, ewê wek mûrted were kuştin. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Ehda [ferqa] ku di navbera me û wan de heye nimêj e. Kî wê terk bike, ew kafir dibe.» (Tirmizî rîwayet kiriye)

Hem jî dîsa pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «di navbera însên û şirk û kufrê de terka nimêjê heye.» (Mûslim rîwayet kiriye)



Nimêja yê biçûk

Mirovê biçûk, dema bigihîje heft salîya xwe, jê re tê gotin; nimêj bike, ji bo li ser kirina wê perwerde bibe. Dema ew bigihîje deh salîya xwe, ji bo kirina wê dê were lêxistin lêbelê ne lêdaneke ku wî biêşîne. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema zarokên we heft salî bibin, ji wan re bibêjin nimêj bikin. Dema ew deh salî bibin [heke nimêj nekin] ji bo nimêjê li wan jî bidin.» (Ebûdawud rîwayet kiriye).






Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet	Nimêj	Rojî	Zekat	Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review


Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro

Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Ezan [Bang] û Qamet

Beşa Nimêjê

2



Ezan [bang] û Qamet

Naverok

Pênasîya Ezan û Qametê

Ezan di ferhengê de;

Ragihandina hatina wextê nimêjê bi zikrekî taybet e.

Qamet di ferhengê de;

Ragihandina rabûna ji bo destpêkirina nimêjê bi zikrekî [vegotineke] taybet e.

Hukmê ezan û qametê

1. Di bara cemaetê de

Ji bo her pênc nimêjên ferz tenê çi li seferê be, çi jî hederê [li malê] be bi cemaetî-kirin ferzûl kîfaye ye. (Ferzûl kîfayet; ew îbadet e, heke hinek mirovên ku têra wê dikin pê rabin, wê eda bikin, guneh ji ser yên mayîn jî radibe). Lewra ew ji şîarên eşkere yên îslamê ne, terka wan ne durust e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema wextê nimêjê were, bila yek ji we ji we re bang bide, paşê bila mezintirînê we li pêşîya we îmamtîya we bike.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

2. Di bara yê mûnferid [bi tena serê xwe] de

Ew sunnet e. Ji Ûqbe kurê ‘Amir [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; min ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bihîstiye ku digot; «Rebbê te ji şivanê pez ecêbmayî dimîne ku ew li navsera çîyayekî ye, bang dide û nimêj dike. Xuda -ezzewecelle- dibêje; de li vî evdê min binêrin, bang dide û nimêj dike, ew j imin ditirse. Ez li evdê xwe bûrîm û mine w xistiye cennetê.» (Nesaî rîwayet kiriye)



Hikmet ji ezanê

1. Îlamkirina [îlana] hatina wextê nimêjê û cihê wê ye.

2. Teşwîqkirina nimêja bi cemaetî ye.

3. SHişyarkirina ğafilan û dibîrxistina jibîrkeran e; ji bo edakirina nimêjê, ewa ku ji hemû nîmetan mezintir û xweştir e.

Ezan kengê meşrû bûye û sebebên wê?

Ezan di sala yekema hicrî de meşrû bûye. Sebebê wê jî ev û; çi dema îhtîyac bi danîna elametekî çêbû ku tev pê hatina wextê nimêjê nas bikin, mislimanan di vê mijarê de bi hev re îstîşare kir. Çi dema bû şev, Ebdûllah kurê Zeyd di xewna xwe de zilamek dît, wî naqosek hildigirt, wî jê re got; “ma tu vê naqosa xwe difiroşî?” Wî zilamî jê re got; “Tu dê çi jê bikî?” Ebdûllah jê re got; “Emê pê ji bo nimêjê gazî bikin.” Wî zilamî jê re got; “Ma ez tişteke jê çêtir nîşanî te bidim?” Ebdûllah jê re got; “Belê.” Wî zilamî ew hînî ezana naskirî kir, paşê qamet jî hînî wî kir. (Daremî rîwayet kiriye)

Ebdûllah got: Çi dema li min bû sibeh, ez hatim cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin], min xewna xwe jê re vegot, wî got: «Xuda hez bike, ew xewneke heq e. Digel Bilal rabe ser xwe, wan jê re bibêje, lewra dengê wî ji dengê te bilindtir e.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

Fezîleta Ezanê

1. Her tiştê ku dengê mûezzinî gihabîyê ew roja qiyametê li cem Xuda [ezzewecelle] jê re dibe şahid. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Çi cin be, çi însan be, çi tişteke din be ku dengê mûezzin bibihîze, her ew roja qiyametê jê re şehde dide». (Buxarî rîwayet kiriye)

2. Heke mirovan fezîleta ku ezanê de heye bizanîyana, ewê ji bo wê bi hev re biketana pêşbirkê. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Heke însanan sewaba ku di ezan û sefa pêşîn de heye, bizanîyana, paşê ew bê qurekirin bidest wan neketana, wan dê ew qure bikirana». (Buxarî rîwayet kiriye)

Şertên sehîhbûna Ezanê

1. Divê muezzin misliman, mêr û eqilmend be.

2. Divê ezan bi tertîb be.

3. Divê ew li pey hev be, di navbera peyvên wê de navbireke mezin nebe.

4. Divê ew li cem hatina wextê nimêjê be.

Sunnetên Ezanê

1. Îstiqbala [berê xwe dana aliyê] qiblê ye.

2. Divê muezzin ji herdu bêdesmêjîyan paqij be.

3. Divê muezzin di herdu hey‘eleteynan: Hey ‘eles-selah û hey‘elel felah de li milê rast û çepê xwe bifetile.

4. Divê muezzin herdu telîyên xwe yên şehdê bixe guhên xwe.

5. Divê muezzin xwedan dengekî xweş û xurt be.

6. Divê ezan bi tertîl [tecwîd] û hêdî hêdî were xwendin.



Mûezzin telîyên xwe dixe guhên xwe

Sîğeya/raweya Ezan û Qametê

1. Sîğeya ezanê: “Ellahu ekber, Ellahu ekber, Ellahu ekber, Ellahu ekber. Eşhedû ellaîlahe îllallah, Eşhedû ellaîlahe îllallah, eşhedû enne Mûhemmeder-resûlûllah, eşhedû enne Mûhemmeder-resûlûllah. Heyye‘eles-selah, Heyye‘eles-selah, Heyye‘elel-felah, Heyye‘elel-felah, Ellahû ekber, Ellahû ekber, la îlahe îllellah.” (Mûslim rîwayet kiriye)

2. Sîğeya qametê: “Ellahu ekber, Ellahu ekber, eşhedû ellaîlahe îllallah, eşhedû enne Mûhemmeder-resûlûllah, Heyye‘eles-selatî, Heyye‘elel-felah, Qed qametîs-selatû, qed Qametîs-selah, Ellahû ekber, Ellahû ekber, laîlahe îllellah.”

Kî ezanê bibihîze, çi jê re mûsteheb e?

1. Mûezzin çi dibêje, ewê jî wê bibêje. Lêbelê dema mûezzin bibêje; «Heyye‘eles-selah heyye‘elel-felah» [Werin nimêjê, werin xilasîyê] ewê jî bibêje: «La hewle wela quwwete îlla billah» (Buxarî rîwayet kiriye) [Heke ne bi Xuda be ji me re ti plana vegerîna ji gunehan û ti hêza me nîn e!]

2. Ewê di piştî ezanê de bibêje; «Eşhedû laîlahe îllallah wehdehû la şerîkeleh, we enne Mûhemmeden ‘ebdûhû weresûlûhû, redîtû billahî rebben, webi Mûhemmedin [sellellahû ‘eleyhî wesellem] resûlen, webil Îslamî dînen» (Mûslim rîwayet kiriye) [Ez, Xuda ji xwe re Rebb, Mûhemmed ji xwe re pêğember û îslamê ji xwe re dîn qebûl dikim]

3. Ewê piştî ezanê selewatan li ser pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bide. Paştir jî ewê wiha bibêje: «Ellahûmme! Rebbe hazihîd-de‘wetit tamme, wes-selatil qaîme, atî Mûhemmeden el-wesîlete, welfedîle, web‘eshû meqamen Mehmûdenil lezî we‘edtehû» (Buxarî rîwayet kiriye) [Xudayê min! Rebbê vê doza tam û nimêja ku tê edakirin, wesîle û fezîlê bide Mûhemmed û wî bişîne meqamê mehmûd, ewê ku te jê re soz daye]

4. Ewê di navbera ezan û qametê de ji xwe re dûa bike. Lewra dûayên di wê wextê de bê bersiv namînin. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dûa di navbera ezan û qametê de nayê vegerandin.» (Ehmed rîwayet kiriye)

Hinek ji hukmên Ezan û Qametê

1. Heke du nimêj: Her wekî nîvro û esrê bên cem [kom] kirin, ji bo wan ezaneke tenê têrê dike. Lêbelê ji bo her yekî ji wan qametek dê were kirin.

2. Dema ji bo nimêjê werê qametkirin, piştre destpê kirina bi wê were texîrkirin, cara duduyan jî ji bo îadekirina qametê îhtiyac nîn e.


3. Divê mûezzin xwe ji ğeletkirina lefzên ezanê biparêze. Hinek ji wan wiha ne:

a. Gotina: “A’llahu ekber?” bi pirsnîşanê.

b. Gotina: “Ellahu ekbar” bi a-yeke piştî b-ayê.

c. Gotina: “Ellahu ekber” bi zêdekirina w-awê.

4. Dema qamet were kirin, dest bi nimêja nafîle [sunnet] nayê kirin. Lêbelê dema qamet were kirin û dest bi nafîlê hatibe kirin, heke hindik mabe, ewê were temamkirin, heke ew gellek mabe, bê selam dayîn, ewê were qutkirin û ewê digel îmam bikeve nimêja ferz.



5. Ezana zarokê mûmeyyîz jî sehîh e.

6. Ezan û qamet ji bo nimêja ku bi xew û jibîrkirinê bûbe qeza jî meşrû dibe. Lewra ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] sabit bûye ku dema sehabe heta hilatina tavê razabûn û nimêja sipêdê li wan çûbû, «Ferman li Bîlal kir, wî ezan da. Paşê wan desmêj girt û du reketên [sunnetên] sipêdê kirin. Paşê ferman li Bîlal kir, wî ji bo nimêjê qamet kir û wî jî li pêşîya wan nimêja sipêdê kir.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

7. Ewê ku li mizgeftê be, piştî ezanê jê dernakeve; heke ne ji bo uzrekî be. Lewra ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman li me kir: "Dema hûn li mizgeftê bin û ji bo nimêjê ezan were dayin bila yek ji we ji mizgeftê dernekeve heta nimêj neke!» (Ehmed rîwayet kiriye)

8. Ji mûezzinî re meşrû ye ku ew dengê xwe di herdu şehadetan de nizm bike, paşê dîsa dengê xwe di "heyye 'eleteynan" de bilind bike. Lewra ew di sunnetê de sabit bûye. (Ebûdawud rîwayet kiriye)

Nayê xwestin;

1. Ezan dayîn, bi awayê melodî û stranbêjî bi şeklê ku herf, hereke, sekinan biguherîne û têde kêmkin û zêdekirinan çêke.

2. Bi dengê bilind gotina selat û selamê di piştî ezanê de.

3. Gotina hinekan ji wan li cem bihîstina: "Qed qametis-selatû" [nimêj tê kirin] gotina: "Eqamehellahû we edameha" [Xuda wê bide kirin û bide dewamkirin]

Ezana fecrê

Ji bo fecrê du ezan meşrû ne. Ezana yekem; berî hatina wextê nimêjê dibe. Ezana duyem; ji bo îlankirina hatina wextê nimêjê dibe. Di ezana yekem de meşrû ye ku mûezzin du caran bibêje; "Es-selatû xeyrûn mînen-newm" [nimêj ji xewê çêtir e!] Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema tu ezana yekema sibehê bidî, bibêje; es-selatû xeyrûn mînen-newm! es-selatû xeyrûn mînen-newm» (Ebûdawud rîwayet kiriye) [Nimêj ji xewê çêtir e! Nimêj ji xewê çêtir e!]



Ezan Şeytên diqewitîne

Ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Dema ji bo nimêjê ezan were dayîn, Şeytan pişta xwe dide û jê re tirr heta ezanê nebihîze. Dema ezan xilas bibe dîsa ew berê xwe dide û tê. Dema ji bo nimêjê were qamet kirin ew pişta xwe dide û diçe. Dema qamet xilas bibe” ew berê xwe dide û tê heta dikeve navbera însên û nefsa wî bi xwe û jê re dibêje: Vê û wê bîne bîra xwe, tişta ku wî nedianî bîra xwe heta dibe ku însan nizane çend reket nimêj kiriye. Dema yek ji we nizanibe çend reket nimêj kiriye; gelo sê yan jî çar bila rûniştî du sicûdan bibe.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Hinek feyde

1. Piştî ezanê û berî qametê derketina ji mizgeftê ne durust e. Lewra hedîsa Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] heye; dema zilamekî zilamek dît ku piştî ezanê dikir ji mizgeftê derkeve û derbas bibe, wî got; herçî evê ha ye, wî bêemrîya Bavê Qasim [dirûd û silavên Xuda lê bin] kir.

2. Ji bo ti nafîleyan, ji bo nimêjên herdu îdan, ji bo nimêja baranê, jib o nimêja cenaze, ji bo nimêja roj-xirabbûnê ezan nayê dayîn û nayê qametkirin. Lêbelê mirov di roj-xirabbûnê de dibêje: «Es-selatû camîe» [rabin nimêja bi cemaet, bi kom]

3. Mûezzin di baran û sermaya dijwar de piştî «heyye ‘elel-felah» ê [werin xilasîyê] dibêje: «Ela sellû fî rîhalîkum.» [Li malên xwe nimêj bikin!]

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec





Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Şertên sehîhbûna nimêjê

Şert û mercên sehîhbûna nimêjê

Naverok

1. Hatina wextê ye.
2. Tahirbûna ji bêdesmêjîyê ye.
3. Tahirbûna cil, beden û mekanî ye.
4. Serta [nixumandina] ewretî ye.
5. Îstiqbala [berê xwe dana] qiblê ye.

Ya yekê; hatina wextê

Ji bo nimêja ferz wextek heye. Nimêj, -heke ne ji ber uzrekî be- berî wî wextî û piştî wî wextî jî ne sehîh e. Lewra Xuda [ezzewecelle] gotiye: {Lewra nimêj, li ser bawermendan ferzeke xwedî-dem e} [Nîsa, 103]

Yanî ferzeke di wextên diyarkirî de ye.

Hem jî ji Ebûmûsa [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «mirovek hate cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin], pirsa wextên nimêjê jê dikir? Wî ti bersiv nedayê. Dema fecr duşeq bû, ew rabû nimêja fecrê, hîn însanan hev nas nedikir. Paşê dema tav zaîl bû, ferman lê kir, ew rabû nimêja nîvroyê kir. Wî mirovî digot; naveroj tam bi nîvî bûye. Wî ji wan bêhtir pê dizanîbû. Paşê dema tav bilind bû, ferman lê kir, wî nimêja esrê kir. Paşê dema tav ket [winda bû] ferman lê kir, wî nimêja meğribê kir. Paşê dema şefeqa sor winda bû, ferman lê kir, wî nimêja eşayê kir. Paşê sibeya din, nimêja fecrê texîr kir; heta jê silav da, wî mirovî digot; roj derket, yan jî dike derkeve. Paşê wî nimêja nîvroyê texîr kir, heta nêzîkî wextê esrê yê doh bû. Paşê wî nimêja esrê texîr kir, heta jê silav da, wî mirovî digot; tav sor bûye. Paşê wî meğrib texîr kir, heta li cem ketina şefeqê [a sor] bû. Paşê nimêja eşayê texîr kir heta bû sêyeka şevê ya yekê. Paşê bû sibeh, gazî wî mirovê pirsker kir û jê re got; "wext di navbera van herduyan de ye.» Di rîwayeteke din de gotiye: «Di roja duduyan de wî berî şefeqa sor winda bibe, nimêja meğribê kir.» (Mûslim rîwayet kiriye).

Wextên nimêjê ev in:

1.Wextê fecrê:

Wextê wê, ji derketina fecra sadiq- ew sipîtahîya ku ji alîyê meşriqê [rojhilatê] di ufûqan [asoyan] de dibe- heta bi derketina tavê ye.

2.Wextê nîvroyê:

Wextê wê, ji zewala tavê heta piştî siha ku tav li sere zaîl bûye, siha her tiştê bibe bi qasî wê ye. Lewra tav, dema derkeve ji bo yê ku sabit dinêre siha aliyê meğribê [rojava] çêdibe. Paşê çiqas tav bilind bibe, ev sih her kêm dibe, heta paşê ev sih radiweste. Paşê ew dîsa dest bi zêdebûnê dike. Dema ew dest bi vê zêdebûnê bike, ev wextê zewalê ye.

3. Wextê esrê [berêvarê]:

Wextê esrê, ji xilasbûna wextê nîvro ye, heta siha her tiştê du caran bi qasî wî bibe; piştî wê siha ku tav li serê zaîl bûye.

4. Wextê meğribê:

Wextê meğribê, ji çûna ava ya tavê heta bi windabûna şefeqa sor e. Şefeqa sor, ew rohnîya sor e ku li cem çûna ava ya tavê di ufûqan [asoyan] de çêdibe.

5. Wextê eşayê:


Wextê eşayê, ji xilasbûna wextê meğribê heta bi nîvê şevê ye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Wextê nimêja eşayê heta bi nîvê şevê yê navê ye.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Di vê serdemê de, mûmkin e mirov bi rêya teqwîmê/roj-jimêrê wextên nimêjê bi hêsanî nas bike.





Nimêja fecrê [sipêdê]



Nimêja Nîvro



Nimêja Esrê [berêvarê]



Nimêja Eşayê



Nimêja Meğribê [roj bi-avaçûnê]

Nayê xwestin;

- Nimêj di cilên teng de; ewên ku ewretî kufş dikin, yan di ew cilên tenik û şefaf de, yan ew nimêja ku ewret vekirî be, yan jî nimêja ku tu eda bikî û tu kirasê xwe dirêj bikî, heta cil xwe berdin heta bi binê gwîzekan, nayê xwestin.

- Nimêj di cilên ku li ser wan wêne [fotoğraf] hebin, yan jî nimêj di cihên ku di wan de fotoğraf xwedan rûhan hebin, yan jî li ser sicadeyeke ku têde fotoğraf û nexş hebin, nayê xwestin!

- Nimêj di mizgeftên ku di wan de qebr hebin. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Bila xebera we jê hebe, ew ummetên berîya we qebrên pêğemberên xwe û salihên xwe ji xwe re dikirin mizgeft! Zinhar, hûn qebran ji xwe re nekin mizgeft! Ez wê li we qedeğe dikim.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Hinek feyde

1. Kî, berî derketina wextê bigihîje reketekê ew gihaye wê nimêjê. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî, bigihîje reketekê ji nimêjê, bêguman ew gihaye wê nimêjê.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

2. Dema bi xewê yan jî bi jibîrkirinê nimêj li mirov biçe, bilezûbez edakirina wê nimêjê wacib e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî, nimêjekê ji bîr bike, dema ew were bîra wî bila wê nimêjê di cih de bike. Ji bilî kirina wê kefaretekî wê yê din nîn e.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Ya duduyan; tahirbûna ji hedesê [bêdesmêjîyê]

1.Tahirbûna ji bêdesmêjîya biçûk e:

Ew bi desmêjê dibe. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema yek ji we bêdesmêj bibe, heta desmêj negire, Xuda nimêja wî qebûl nake.» (Buxarî rîwayet kiriye).



2.Tahirbûna ji bêdesmêjîya mezin e:

Ew bi xwe şûştinê dibe. Lewra Xuda [ezzewecelle] gotiye: {Heke hûn bi cenabet bin, xwe [bi şûştinê] tahir bikin!} [Maîde, 6]



Kî, di nimêja wî de were bîra wî ku ew êdesmêj e, yan jî ew di nav nimêja xwe de bêdesmêj bûye, nimêja wî betal bûye. Divê ew ji bo desmêjê bêyî selamdayîn ji nimêjê derkeve. Lewra nimêja wî qut bûye lê ew temam nebûye. Herçî selam e, ew dawîya nimêjê ye.

Ya siséyan; tahirbûna cil, beden û mekanî ye:

1.Tahirbûna cilan e:

Lewra Xuda Teala gotiye: {Cilê xwe tahir bike.} [Mûddessir, 4]



Tahirbûna cilan

2.Tahirbûna bedenê ye:

Lewra sabit bûye ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di ber du qebran re derbas bû û got: «Ew herdu tên ezabdayîn. Lêbelê ew di [gunehekî] mezin de tên ezabdayîn. Herçî evê ha ye, wî xwe ji mîzê paqij nedikir , nediparast.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

3.Tahirbûna mekanî ye:

Lewra hedîsa wî yê bedewî heye, ewê ku di mizgeftê de mîz kiribû, vêca pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî gotibû: «Dest jê bedrin, nîv dêwl av yan jî dêwleke tije av bi ser mîza wî de birijînin.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)



Tahirbûna mekanî

Nimêj û necaset [pîsîtî]

Kî nimêj bike û necasetek li ser wî hebe lêbelê wî pê nizanîbe, yan jî ew ji bîr kiribe, nimêja wî sehîh e. Lewra sabit bûye «ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] nimêj kir û herdu pêlavên xwe ji pêyê xwe kirin, ji lewma sehabîyan jî pêlavên xwe ji pêyên xwe kirin. Çi dema wî silav da, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji wan re got: "Çima we pêlavên xwe ji pêyên xwe kirin?" Wan jê re got; ya pêğemberê Xuda! Me tu dîtî, te ew ji pêyên xwe kirin, ji lewma me jî ew ji pêyên xwe kirin. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: "Cibraîl hate cem min, ji min re vegot, bi wan ve pîsîtî heye! Naxwe dema yek we were mizgeftê, bila pêlavên xwe biqulibîne û bil ali wan binêre; heke bi wan ve pîsîtîyê bibîne, bila wê bi erdê bimale, paşê bil adi wan de nimêj bike.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

Kî, di nav nimêjê de pê bihese ku necasetek li ser wî heye, jêbirîna wê necasetê li ser wî wacib e. Paşê ewê di nimêja xwe de berdewam be û ewê nimêja xwe li ser reketên ku kiribû, wê ava bike. Lewra hedîsa derbasbûyî delîla vê ye. Heke ew nikaribe wê necasetê jêbibe, nimêja wî betal bûye.

Erd tev mizgeft e.

Erd tev mizgeft e, têde nimêj sehîh e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Erd ji min re bi mizgeft û tahûr [paqij] hatiye kirin, naxwe kîjan mirov ji ummeta min nimêj bigihîje wî, bila nimêj bike.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Lêbelê ji erdê hinek cih hene nimêjkirin li wan cihan hatiye qedeğekirin. Her wekî nimêja di goristan û hemamê [avrêjê] de (Nimêja cenaze ji wê hatiye îstisnakirin). . Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Erd, tev mizgeft e; ji bilî goristan û hemamê.» (Tirmizî rîwayet kiriye) û hevşîyê hêştiran jî. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Di hevşîyên hêştiran de nimêj nekin.»

«E'tanûl îbîl» (Tirmizî rîwayet kiriye). ew cih e ku bi şev têde hêştir radizin û têde dihewin. Yanî hevşî ye.



Nimêj li hemamê [av êjê]



Nimêj li nav qebran

Ya çaran; setra [nixumandina] ewretî ye:

Ewretê mêr: ji navikê heta bi kabê ye.

Ewretê jinê di nimêjê de; ji bilî rû û herdu mistên wê temamê bedena wê ye.





Nixumandina milan

Divê nimêjker cileke wisan li xwe bike ku ew navbera zendên wî û stûyê wî binixumîne. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Bila yek ji we di cileke tenê de nimêj neke ku tiştek jê li ser stûyê wî nebe.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Ya pêncan; îstiqbala [berê xwe dana] qiblê ye:


Qible, K'eba mûşerref e. Lewra Xuda [ezzewecelle] gotiye: {Naxwe berê xwe bizivirîne aliyê mizgefta pîroz. Hûn li kuderê dibin bibin berê xwe her bizivirînin aliyê Ke'bê} [Beqere, 144]

Divê mirov hinek karûbaran li ber çavan bigre: Ewê ku di nava mizgefta heramê de nimêj dike, dive berê xwe bide Ke'bê bi xwe. Lêbelê ewê ji Ke'bê dûr nimêj dike, ewê berê xwe bide rexê wê. Lewra dibe, ew nikaribe berê xwe bide wê bi xwe. Ji ber vê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Navbera Şerq û Ğerbê qible ye.» (Tirmizî rîwayet kiriye).

Nimêja nafîle ji mirovê siwar: Heta jê were, ewê di serê pêşîn de bide xwe ji bo berê xwe bide qiblê; heke ew nikaribe vê bike, siwareka [merkeba] wî berê wî bide kîjan alî ewê bi wî alîyî ve nimêj bike. Lewra sabit bûye «ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li ser heywana xwe berê wî bi kîjan alî ve diket, bi wî alî ve nimêja sunnet dikir û li serê witr jî dikir. Lêbelê li ser wê nimêja ferz nedikir». (Ebûdawud rîwayet kiriye)



Ewê ku li nava Heremê nimêj bike



Ewê ku qiblê nizanibe, bila ew çi bike?

Ewê ku qiblê nas neke, heke ew di xanîyan de be, yan jî li nêzîkê wî hinek însan hebin, ewê qiblê ji wan bipirse, yan ewê qiblê ji mihrabên mizgeftan, yan bi pisûla, yan bi roj û heyvê û yên wekî wan nas bike. Heke ew nikaribe, ewê bi zena xurt emel bike. Lewra Xuda Teala gotiye: {Heta hûn karibin xwe ji hêrsa Ellah biparêzin.} [Teğabun, 16]



Ewê ji Ke 'bê dûr nimêj bike



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec







Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Sutreya nimêjker



Sutreya nimêjkerî

Pênasîya sutreya nimêjkerî

Sutreya nimêjkerî

Sutre, tişteke nimêjker wê datîne pêşîya xwe, dixe navbera xwe û yên ku di pêşîya wî de derbas bibin.

Meşrûîyeta sutreya nimêjkerî

Danîna sutrê, hem li male, hem li seferê, hem di nimêjên ferz de, hem di nimêjên sunnet de, hem li mizgeftê hem jî di ğeyrê mizgeftê de jî meşrû û rewa ye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema yek ji we nimêj bike, bil ali ber sutrê nimêj bike û bila nêzîkî wê jî bibe.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

Ji Wehb [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye: «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li Minayê li pêşîya me îmamtî kir, li pêşîya xwe enze [covekî kurt e] di erdê de çikand û li pêşîya m edu reket nimêj kir.» (Ehmed rîwayet kiriye)

Naverok

Hukmê sutreya nimêjkerî

Sutre wacib e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hem ji bo îmam, hem jî ji bo mûnferid, bi danîna sutrê ferman kiriye û ew teşwîq kiriye. Ji ber vê tê xwestin ku dema misliman nimêj bike, ew sutrekê deyne pêşîya xwe û nehêle însan di navbera wî û sutreya wî de derbas bibin. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Heke sutre li pêşîya te ne be nimêj neke û nehêle ti kes jî di pêşîya te re derbas bibe; heke ew hewl bide ku her derbas bibe, hingê tu şerrê wî jî bike» (Îbnxûzeyme rîwayet kiriye)

Hikmet ji sutreya nimêjkerî

Sutre ji bo nimêjkerî, ji bo gellek tiştan hatiye meşrûkirin. Hinek ji wan ev in:

Nehiştina derbasbûnê di pêşîya nimêjkerî de ye ku ew derbasbûn xuşûa [tirs û edeba] wî qut dike.

Derfet-dayîna nimêjkerî ye ji bo ew di nimêja xwe de tefekkur bike û bi dîgerên wê nelebike.

Xwe parastina ji qutbûna nimêjê ya bi derbasbûna jinê, yan se, yan jî kerê di pêşîya nimêja wî de ye. Lewra hedîsa Ebûzerr [Xuda jê razî be] heye, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Dema yek ji we rabe nimêj bike, dema li pêşîya wî wekî pişteka kurtan hebe, ewê wî setr bike. Heke li pêşîya wekî pişteka kurtan ne be, ker, jin û seyê reş dê nimêja wî qut bike.” Min got; ya Ebûzerr! Çi rewşa seyê reş ji seyê sor û seyê zer heye? Wî got; kurê birayê min! Min wekî te j imin pirs kirî, ew ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] pirs kir, wî ji min re got: “Seyê reş şeytan e!» (Mûslim rîwayet kiriye)

Hinek ji hukmên sutreya nimêjkerî

1. Sutre-danîn, ji bo îmam û mûnferid [ewê bi tena serê xwe] dibe. Herçî memûmî [ewê li pey îmam sef digre] ye, sutreya îmamî ji wî re jî sutre ye. Ji Îbnebbas [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «ez li makerekê siwar bûm û min berê xwe bi pêş ve da, ew roj ez nêzîkî îhtîlamê [şeytan pê kenînê] bûbûm, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî li Mînayê li pêşîya sehabîyan nimêj dikir. Ez di pêşîya hinek sefê de derbas bûm, ez peya bûm, min makera xwe berda, ew diçêrî û ez jî ketim nav sefê, ti kesî ji min re negot, wê neke» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine).

2. Derbasbûn di pêşîya nimêjkerî de ne durust e, û ewê derbas dibe jî pê gunehkar dibe. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin]





gotiye: «Heke ewê k udi pêşîya nimêjkerî de derbas dibe bizanîya çi guneh jê re heye, ew bibûya ku heke çilan rawestîya jê re çêtir e ku ew di pêşîya nimêjkerî de derbas bibe.” Ebûn-nedr gotiye; “ez nizanim, gelo wî got; çil roj, yan meh, yan jî sal.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Lêbelê heke nimêjker sutre nedanîbe pêşîya xwe, derbasbûn ji pişt sutreya wî bibe; yan jî ew ji pişt cihê sicûda wî, ji wî dûr derbas bibe, ğem nake

3. Divê nimêjker nehêle ti kes di pêşîya wî de derbas bibe.



Lewra ji Ebûseîd el-Xudrî [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; min ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bihîst ku digot: «Dema yek ji we li ber tişteke ku wî ji mirovan setr dike, nimêj bike û yek jî bixwaze di pêşîya wî re derbas bibe, bila nehêle ew derbas bibe, heke ew bizav her ji bo derbas bibe, bila şerrê wî bike. Lewra ew şeytan e.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine).

4. Hinek ehlê îlmê Mescîdûl Heram ji vî hukmî îstisna [cuda] kirine, ji mirovan re ruxset dane ku têde di pêşîya nimêjkeran re derbas bibin. Lewra delîl di rakrina tengasîyê de gelemper in. Lewra di menkirina derbasbûna di pêşîya nimêjkeran de bi pirranî tengasî û zehmetî heye.

5. Sutre, bi nimêjkirina li ber dîwar, yan sitûnekê ji sitûnên mizgeftê, yan jî dolabekê hasil dibe; yan jî bila nimêjker tişteke wekî kopalekî deyne pêşîya xwe û li berê nimêj bike.

6. Di navbera sutre û nimêjkerî de bi qasî miqdarê derbasbûna pezekê mesafe dibe.

Lewra hedîsa Sehl [Xuda jê razî be] heye, dibêje; «di navbera nimêjgeha pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û dîwarî de bi qasî cihê derbasbûna pezekê mesafe hebû.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)






Jin nimêjê qut dike

Di hedîsa derbasbûyî: “Nimêjê... qut dike.” de şibihandina jinê bi kerê, yan jî seyê reş nîn e. Hebûna her sêyan di yek sîyaqê de nayê vê meneyê; ew di îlletên [sedemên] xwe yên qutkirina nimêjê de jî wekhev in. Yanî nake lazimê xwe ew sedemê ku seyê reş nimêjê qut dike, û ew sedemê ku ker û jin jî nimêjê qut dikin, ew heman sedem û yek bin.
Ji lewma bi şeytan bûna seyê reş wekî ku hedîsê ew vegotiye, meneya wê ne ev e ku ker yan jî jin şeytan in. Dibe ku ev her sê sedemên wan yên cuda cuda hebin, çendan sîyaq wan bîne berhev jî. Çendan îlletê [sedemê] se di nessa derbasbûyî de ness li serê hebe û li ser yên din ne be jî. Ev jî nîşan dide ku se ji herduyên din cuda ye û ew ne wekî wan e.
Mûmkin e, mirov îlletê [sedemê] qutkirina jinê ji bo nimêjê bi derbasbûna wê yan jî nêzîkbûna wê di pêşîya nimêjkerî de fehm bike ku ew bala mêr dikişîne ser xwe û dibe ku ew wî ji nimêjê jî derxîne. Ji lewma bi pirranî derbasbûna jinê di pêşîya nimêja mêr de ji derbasbûna mêrekî di pêşîya nimêja mêrekî de bêhtir bala wî dikişîne ser xwe. Xuda bêhtir pê dizane lêbelê bi îhtîmaleke mezin ji lewma danîyarî [şerîetsazî] derbasbûna jinê di pêşîya nimêja mêr de kiriye sebebê qutbûna nimêja wî. Bi vî awayî da ku xuşûa nimêja wî were parastin.

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet	Nimêj	Rojî	Zekat	Hec



Dr . Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Sifetê nimêjê

6 Sifetê/awayê nimêjê

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Wekî hûn min dibînin ez nimêj dikin, hûn jî wisan nimêj bikin.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Ji Aîşe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] nimêj bi tekbîrê û xwendina el-hemdû lillahî rebbil alemîn dest pê dikir. Dema ew diçû rikûê serê xwe bi jorê ve ranedikir û ew rast jî nedikir lêbelê di navbera herduyan de bû. Dema wî serê xwe ji rikûê radikir jî heta jipêya pişta wî tam rast nedibû, ew nediçû sicûdê. Dema wî serê xwe ji sicûdê radikir, heta rûniştî tam rast nebûya nediçû sicûdê. Wî di her du reketan de ettehîyyatû digot. Wî pêyê xwe yê çepê radizand û pêyê xwe yê rastê radikir. Wî li ser pehnîyê rûniştina şeytên men dikir û razandina mêr ya zendên xwe her wekî razandina direndeyan jî men dikir. Wî bi selamê dawî li nimêja xwe dianî.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Naverok

1- Îstiqbala [berê xwe dana] qiblê û tekbîra îhramê ye

2- Îstiftah [weccehtû] û xwendina Fatîhê ye

3- Rikû û rabûna jê ye

4- Sicûd û rabûna jê ye

5- Teşehhud [et-tehîyyat] e

6- Et-Teslîm [silav dayîn] e

7- Zikrên [tesbîhatên] piştî nimêjê ne

Îstiqbala [berê xwe dana] qiblê û tekbîra îhramê

- Ewê ku bixwaze nimêj bike, ewê berê xwe bide qiblê, ewê di nimêja xwe de bi tirs be û ewê hest bi sekna xwe ya li pêşberî Xuda Teala bike.

- Paşê ewê bi dilê xwe nîyetê li nimêjê bîne. Nîyet, cihê wê qelb e. Bi dev gotina nîyetê ne caiz e. Lewra ew bid‘et e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Emel bes bi nîyetan e. Kî, nîyeta çi kiribe bes ew jê re heye.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine).

-Paşê ewê destên xwe heta bi dehma herdu milên xwe yan jî guhên xwe bilind bike û ewê bibêje: "Ellahu ekber" (Mûslim rîwayet kiriye) [Xuda ji hemû tiştan mezintir e]

-Paşê ewê di bin singa xwe de destê xwe yê rastê deyne ser destê xwe yê çepê û ewê destê çepê xwe bi destê rastê xwe bigre.



Îstiftah û xwendina Fatîhê




-Nimêjker, serê xwe nizm dike û li cihê sicûda xwe dinêre (Buxarî rîwayet kiriye) Paşê ew dibêje: «Xudayê min ez te ji hemû kêmasîyan pak didêrim û hemdê te dikim, navê te pîroz e, mezinatîya te bilind e, ji bilî te ti îlah nîn in.» (Mûslim rîwayet kiriye)

-Paşê ew di piştî wê de dibêje: «Ez bi Xuda, xwe ji şeytanê qewitî diparêzim!" "Bi navê Xudayê dilavanê dilovîn» (Mûslim rîwayet kiriye)

-Di piştî wê de ew Fatîhê dixwîne (Buxarî rîwayet kiriye), paşê ew «Amîn» dibêje, yanî bersiv bide.

-Nimêjker di herdu reketên pêşîn de di piştî Fatîhê de sûretekî din, yan jî ji Qur'anê çi bizane, dixwîne. Ew di nimêja fecrê û herdu reketên pêşîn yên meğrib û eşayê de bi eşkerehî dixwîne.

Rikû û rabûna jê




Nimêjker herdu destên xwe radike, tekbîr tîne û dice rikûê, ew herdu destên xwe datîne ser kabên xwe, ew telîyên xwe vedike, wekî yê ser wan digre, ew pişta xwe û serê xwe rast dike, paşê sê caran dibêje: «Xudayê min yê mezin, ez te ji hemû kêmasîyan pak didêrim!» (Tirmizî rîwayet kiriye)

Paşê [îmam û mûfred ji rikûê] radibe û dibêje: «Kî hemdê wî bike, Xuda jê qebûl bike» (Tirmizî rîwayet kiriye) û [tev] dibêje: «Xudayê me, bi qasî tijebûna asîmanan û tijebûna erdê, tijebûna navbera herduyan û tijebûna tişta ku piştre tu bixwaze, hemd her ji te re be!» (Tirmizî rîwayet kiriye) mûsteheb e, ew destê xwe deyne ser singa xwe, wekî ku berî rikûê, di qiyama [jipêya] xwe de jî wisan kiribû.

Sicûd û rabûna jê

-Nimêjker, tekbîr tîne, paşê jî diçe sicûdê. Pêşî ji wicûda wî herdu kabên wî dikevin ser erdê, paşê jî herdu destên wî (Ebûdawud rîwayet kiriye) , paşê enîya wî û bêhvila [pozê] wî. Ew herdu mistên xwe li dehma guhên xwe yan jî milên xwe li ser erdê vedike, ew telîyên xwe bi cîhetê qiblê ve datîne, ew herdu zendên xwe (Buxarî rîwayet kiriye) ji erdê radike, ew herdu bazûyên xwe ji teniştên (Mûslim rîwayet kiriye) xwe û zikê xwe ji herdu rehnên xwe dûr dike û sê caran dibêje: «Ez Xudayê xwe yê bilindtirîn ji hemû kêmasîyan pak didêrim!» (Mûslim rîwayet kiriye) Ew di sicûdênxwe de jî zehf dûayan dike.



- Paşê ew bi tekbîrê re serê xwe radike û destên xwe ranake, ew bi îftîraşkî; pêyê xwe yê çepê radizîne (Tirmizî rîwayet kiriye) û pêyê xwe yê rastê radike, ew berê telîyên pêyên xwe dide cîhetê qiblê, ew destên xwe vekirî datîne ser rehnên xwe, berê telîyên xwe jî dide cîhetê qiblê û dibêje: «Xudayê min, li min bibûre, li min were rehmê, jidestçûyên min li min vegerîne, min bîne ser rêya rast û rizqê min bide.» (Buxarî rîwayet kiriye).

- Paşê ew tekbîr tîne û wekî ya yekê diçe sicûdê.

- Paşê ew tekbîr tîne û serê xwe radike û rûniştineke sivik dike jê re rûniştina îstîrahetê tê gotin. Lewra hedîsa Malik kurê Hûweyris [Xuda jê razî be] di bara sifetê nimêja pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] heye dibêje: «Heta rûniştî tam rast nebûya, ranedibû.» (Buxarî rîwayet kiriye). Paşê ew tekbîr tîne û ji bo reketa duduyan radibe û birha xwe berdide ser destên xwe.

-Paşê ew wekî reketa yekê, reketa duduyan jî nimêj dike; lêbelê ew dûaya îstiftahê naxwîne.

Teşehhud/et-tehîyyat

Dema nimêjker ji herdu reketên pêşîn vala [xilas] bike, ewê ji bo teşehhuda yekê rûne; pêyê xwe yê çepê radizîne û pêyê xwe yê rastê radike, ew destên xwe datîne ser rehnên xwe, destê xwe yê çepê vedike, telîyên qelîç û bapelîçê ji destê xwe yê rastê digre, ew bi telîya navê digel ya girê heleqê çêdike û ew telîya şehdê jî radike. Ew bi telîya şehdê jî li cem teşehhudê îşaret dike û bi çavên xwe lê dinêre û dibêje: «Her xweşî ji Xuda re be, selewat, pakî jî. Selam, rehma Xuda û bereketa wî li ser te be, ey Pêğember! Selam li ser me be û li ser evdên Xuda yên Salih bin. Ez şehde didim ku ji Xuda pê ve ti îlah nîn in û ez şehde didim ku Mûhemmed evdê wî û pêğemberê wî ye.» (Buxarî rîwayet kiriye)

- Paşê ew tekbîr tîne û radibe-heke nimêj ji du reketan zehftir be-; ewê bi tekbîrê re destên xwe rake û di reketên mayî de ji Fatîhê pê ve naxwîne.

- Ew di tehîyyata dawîyê de bi tewerrukî rûdine. Tewerruk; (Ebûdawud rîwayet kiriye) mirov pêyê xwe yê çepê radizîne û ji alîyê rastê ve derdixe û li ser cihê rûniştina xwe rûdine û pêyê xwe yê rastê jî radike, ew dûayên ku di tehîyyata yekê de hatine dixwîne û vê jî lê zêde dike û dibêje: «Xudayê min! Meqamê Mûhemmed û ehlê Mûhemmed mezin û bilind dike, wekî ku te meqamê Îbrahîm û ehlê Îbrahîm jî mezin û bilind kiriye. Lewra tu ehlê pesn û sena yî. Xudayê min! Bereketa xwe li Mûhemmed û ehlê Mûhemmed bike, wekî ku te bereketa xwe li Îbrahîm û ehlê Îbrahîm jî kiriye. Lewra tu ehlê pesn û sena yî.» (Buxarî rîwayet kiriye)

-Paşê ew dibêje: «Xudayê min! Ez bi te, xwe ji ezabê cehennemê, ji ezabê qebrê, ji fitna sağ û mirîyan û ji şerê mesîhê Deccal, diparêzim.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Selam

Di dawîya nimêjê de nimêjker ji rexê milê xwe yê rastê ve selam dide û dibêje: «Silav û rehma Xuda li we be.» (Mûslim rîwayet kiriye) her wiha ew wisan selam dide mile xwe yê çepê jî.





Tekbîra îhramê



Xwendina Fatîhê



Rikû û rabûna jê



Siû d û rabûna jê



Rûniştina di navbera herdu
ṡ û dan de



Rûniştina ji bo tehîyyata dawîn



Selam

Hinek zikrên [tesbîhatên] piştî nimêjê

-[Sê caran] «Ez lêborîna xwe ji Xuda dixwazim." "Xudayê min tu selam î, selam ji te ye. Hey xwediyê mezinatî û keremê, tu pîroz û bilind î.» (Mûslim rîwayet kiriye)

- «Ji Xuda pê ve ti îlah nîn in, ew yek e, ti şirîkê wî nîn in, desthilatî ya wî ye, hemd ji wî re ye û ew li ser kirina her tiştê kare ye. Xudayê min! Tu çi bidî ti kes nikare jê re bibe asteng û tu çi nedî jî ti kes nikare wê bide, tu xwedan merdî?! feyde nade, merdî her ji te ye.» (Buxarî rîwayet kiriye)

- «Ji Xuda pê ve ti îlah nîn in, ew yek e, ti şirîkê wî nîn in, desthilatî ya wî ye, hemd ji wî re ye û ew li ser kirina her tiştê kare ye. Ti plan û hêza me nîn e, heke ne bi Xuda be. Ji Xuda pê ve ti îlah nîn in, em ji wî tenê re her îbadet dikin, nîmet ya wî ye, kerem ya wî ye, senayê sipehî ji wî re ne. Ji Xuda pê ve ti îlah nîn in, em dilxalîsane jê re îbadet dikin çendan bi kafiran ne xweş be jî.» (Mûslim rîwayet kiriye)

- [Sih û sê (33) caran] «Ez Xuda ji hemû kêmasîyan pak didêrim, hemd her ji Xuda re be, Xuda ji hemû tiştan mezintir e." "Ji Xuda pê ve ti îlah nîn in, ew yek e, ti şirîkê wî nîn in, desthilatî ya wî ye, hemd ji wî re ye û ew li ser kirina her tiştê kare ye.» (Mûslim rîwayet kiriye)

- «Xudayê min, li ser kirina zikrê te, şukrê te û îbadetê te yê sipehî, arîkarîya min bike.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

- Xwendina Ayetûl kursî, sûretê Îxlas, Feleq û Nas. (Nesaî rîwayet kiriye).

Mijarek

Di sifetê nimêjê de bê ferq û cudahî jin jî her wekî mêr e.






Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet	Nimêj	Rojî	Zekat	Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Hukmên nimêjê

Hukmên Nimêjê

1.Nimêja mirovê rûniştî

a. Di nafîleyan de

Nimêja mirovê rûniştî di nafîleyan de sehîh e û jê re nîvê sewaba mirovê jipêya heye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Heke ew, jipêya nimêj bike, ew çêtir e. Kî, rûniştî nimêj bike, jê re nîvê sewaba mirovê jipêya heye. Kî, razayî [gêrkirî] nimêj bike, jê re nîvê sewaba mirovê rûniştî heye.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Lêbelê heke ew ji ber uzrekî xwe rûniştî nimêj bike, jê re sewaba temam heye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema însan nexweş bikeve, yan jî biçe seferê, jê re wekî emelê ku dema li mala xwe û tendurust dikir, sewab heye.» (Buxarî rîwayet kiriye)

b. Di ferzê de

Nimêja mirovê rûniştî di ferzê de ne sehîh e; heke ew karibe jipêya raweste.

Naverok

- Nimêja mirovê rûniştî
- Nîyet,
- Xwendina Fatîhê,
- Et-Tamîn [amîn gotin],
- Seketatên [huşbûnên] îmamî,
- Cehr [eşkere xwendin] di halê qezakirina ferz û nafîleyan de,
- Rakirina herdu destan,
- Îdraka [gihiştina] reketê,
- Et-tuma'nîne, [tedîla ruknan],
- Tehrîka lîsan [livandina zimên],
- Hey'eta [awayê] sicûdê,
- Îşareta bi telîyan



2.Nîyet e.

Hinek ji hukmên nîyetê

Di nav nimêjê de qutkirina nîyetê ne durust e. Naxwe kî nîyeta qutkirina nimêjê bike, nimêja wî qut dibe, li ser wî wacib e, ew ji serî ve dest pê bike.

Kî, bi nîyeta sunnetê nimêj bike, ji wî re ne durust e, ew di nav nimêjê de wê vegerîne nimêja ferzê.

Kî, bi mûnferid [tena serê xwe] nîyeta xwe li nimêja ferz anîbe, paşê cemaetek were, ji wî re durust e, ew nîyeta xwe vegerîne sunnetê, wê du reket temam bike, paşê silav bide û bi wê cemaetê re nimêja xwe bike.

3.Xwendina Fatîhê ye

Xwendina Fatîhê li ser nimêjkerî wacib e; çendan ew nimêjeke cehrî [fatîha bi eşkerehî bê xwendin] memûmî be jî. Lewra ji Ubade kurê Samit [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Em di nimêja fecrê de li pişt pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin]. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] xwend, xwendin lê giran hat. Çi dema wî nimêj xilas kir, got: “Dibe ku hûn li pey îmamê xwe dixwînin?” Me got; belê, ev e, ya pêğemberê Xuda! Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: “Hûn ji bilî fatîha kitêbê, wisan nekin. Lewra ewê ku fatîhe nexwendibe, jê re nimêj nîn e.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

4.Te’mîn [amîn gotin] e.

Te’mîn: Gotina nimêjkerî: “Amîn” e. Ew jib o her nimêjkerî sunnet e; çi imam be, çi memûmî be, çi mûnferid be, çi nimêja ferz be, çi jî nimêja sunnet be, çi nimêja fatîhe têde bidizîkahî be, çi jî fatîhe têde bi eşkerehî be. Lêbelê di cihên fatîhe têde bi dizîkahî be de ew jî bi dizîkahî dibe û di cihên têde fatîhe bi eşkerehî be, ew jî bi eşkerehî dibe.

Delîla vê jî gotina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye: «Dema îmam amîn bibêje, hûn jî amîn bibêjin. Lewra ewê ku amîna wî li amîna melaîketan rast were, jê re gunehên wî yên bûrî tên efûkirin.» (Buxarî rîwayet kiriye)

5.Seketata îmam e

Sektetek [huşbûnek] di navbera tekbîr û xwendinê de ye, ji bo dûaya îstiftahê.

Di sunnetê de sekteteke ji bo îmam di navbera xwendina Fatîhê û sûretê piştî wê de tesbît nebûye.

Sektetek piştî bi dawîkirina ji xwendinê ya berî rikûê jî heye.



6.Cehr [eşkere xwendina fatîhê] di halê qezakirina ferzê de û di nafîleyan de ye

Dema nimêj li mirov biçe û mirov jî bixwaze wê qeza bike, gelo mirov dê bi dizîkahî, yan jî bi eşkerehî fatîhê bixwîne? Nirxandina vê bi nimêjê ye, ne bi wextê qezakirinê ye. Naxwe heke mirov nimêja cehrî [ewa ku xwendina fatîhê têde bi eşkerehî tê xwendin] di naverojê de jî qeza bike, mirov têde bi eşkerehî dixwîne.

Sunnet bi dizîkahî xwendina di nafîleyan de ye. Lêbelê ji nav sunnetan ewa ku di bara wê de bi eşkerehî xwendinê delîlek hatibe, her wekî terawîh û xusûfê, di wê de bi eşkerehî tê xwendin.

7.Rakirina herdu destan e


Herdu dest di van cihên tên de tên rakirin:

Tekbîra îhramê.

Tekbîra rikûê.

Li cem rabûna ji rikûê.

Li cem rabûna ji tehîyyeta yekê.



8.Îdraka [gihiştina] reketê ye

Dema memûmî bi îmamî re bigihîje rikûê, ew digihîje wê reketê. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî, bigihîje rikûê, bêguman ew gihaye wê reketê.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

9.Tum'anîne [tedîla rukna] ye


Tum'anîne di temamê ruknên nimêjê de ruknek ji ruknan e; bêyî wê nimêj sehîh nabe. Lewra Ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] çû mizgeftê, zilamek jî çû mizgeftê û nimêj kir. Paşê ew hat û silav li pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] kir. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] silava wî veda û got: "Vegere, nimêj bike. Lewra te nimêj nekiriye." Ew zilam vegerîya, wekî ku nimêj kiribû, dîsa wisan nimêj kir, paşê hate cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û silav lê kir. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got: "Silav l ite be jî." Paşê jê re got: "Vegere, nimêj bike. Lewra te nimêj nekiriye." Heta wî ew sê caran kir û wî got; ez bi wî kim ku tu bi heqîyê şandî, ez ji vê sipehîtir nizanim, min hîn bike. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got: "Dema tu rabî nimêjê, tekbîra xwe bîne, paşê bi te re çi ji Qur'anê hebe, wê bixwîne. Paşê here rikûê heta tu di rikûê de mutmeîn bibî, paşê rabe heta pişta te jipêya tam rast bibe. Paşê here sicûdê, heta tu di sicûdê de tam mutmeîn bibî, paşê rabe heta tu rûniştî tam mutmeîn bibî, tu vê di temamê nimêja xwe de bike.» (Buxarî rîwayet kiriye)

10.Tehrîka [livîna] zimanî ye

Di xwendina Qur’anê, tekbîran û zikran de xwendina di dilê xwe tenê de têrê nake. Lêbelê divê mirov wan bi zimanê xwe jî bilêv bike. Kêmtirîna wê bi xwendinê livandina ziman û herdu lêvan e.

11.Heyeta sicûdê ye

Sicûd li ser heft azayan dibe. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema însan biçe sicûdê, pê re heft teref diçin sicûdê; rûyê wî, herdu mistên wî, herdu kabên wî û herdu pêyên wî.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine).



12. Îşaretkirina bi telîyan e



Sunnet, îşaretkirina bi telîyan di tehîyyatê de ye. Lewra hedîsa Waîl kurê Hucr [Xuda jê razî be] heye dibêje: «Paşê telîya xwe rakir, min ew dît, wî ew dilivand û pê dûa dikir.» (Nesaî rîwayet kiriye)



Nayê xwestin;

- Eşkere gotina nîyetê û gotina wacibbûna pêrekirina wê digel tekbîra îhramê.

- Zêdekirina peyva "şukr jî" li cem gotina "Xudayê me hemd her ji te re be" ev zêdehî ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] nehatiye îsbatkirin.

- Zêdekirina peyva "seyyîdîna" di tehîyyatê de yan jî di selatdayîna ser pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di nimêjê de.

- Li cem selamdayînê bi destê rastê îşaretkirina rexê rastê û bi destê çepê jî îşaretkirina rexê çepê.

- Bi destê hev girtina nimêjkeran û gotina yekî ji wan: "Bila Herem be!" Yê din jî "Ji me tevan re" û tiştên wekî vê.

- Eva ku hinek di piştî nimêjê de dikin, yek ayetul kursî dixwîne, paşê dibêje; subhanellah! Ewên din jî pê re dibêjin, subhanellah...


Bi destê xwe maliştina rû di piştî dûa û zikr de



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Ruknên nimêjê, wacibên wê û sunnetên wê

8 Ruknên nimêjê, wacibên wê û sunnetên wê

Ya yekê; ruknên nimêjê

Ruknên nimêjê

Rukn, perçeyên esasî ne, ku nimêj ji wan pêktê; terka wan bi ti awayan û di ti rewşan de ne durust e, ew bi qesd û bi sehwê [bêhemdî] jî nakevin; lêbelê di halê îczê [nekarînê] tenê de dikevin.

1. Nîyet e.
2. Qiyam [jipêyabûn] e, di ferzê de ji bo yê ku karibe.
3. Tekbîra [Ellahu ekber] îhramê ye.
4. Xwendina Fatîhê ye.
5. Rikû ye.
6. Rabûna ji rikûê ye.
7. Sicûda li ser heft azayan e.
8. Rûniştina di navbera herdu sicûdan de ye.
9. Rûniştina ji bo tehîyyata dawîn e.
10. Xwendina Tehiyyatu di runiştina dawî de
11. Selewata li ser pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] e, di tehîyyata dawîn de.
12. Selam dayîn e.
13. Tuma’nîne ye, di hemû ruknan de.
14. Tertîba di navbera ruknan de ye.

Naverok

Ewê ku terka ruknekê ji ruknên nimêjê bike, bila ew çi bike?

1. Ewê ku bi qesd terka ruknekî bike, nimêja wî betal dibe û divê wê dîsa îade bike.

2. Ewê ku bi sehwê [bêhemdî] terka ruknekî bike, ew jî ji du haletan xalî nabe;

a- Heta ew negihîje reketa piştî wê nayê bîra wî ku terka vî ruknî kiriye; li vir, ew reketa bûrî ya ku wî têde terka vî ruknî kiribû, jê re qîmet nîn e; ev reket dikeve cihê wê ya ku têde sehw kiribû, paşê ewê ji bo sehwê biçe sicûdê.

Nimûneya wê wiha ye: Zilamek di reketa duduyan de li cem xwendina Fatîhê tê bîra wî ku wî di reketa yekê de fatîhe nexwendibû. Li vir, ewê vê reketê ji xwe re bike reketa yekê û ewê reketa bûrî jî îlğa [pûç] bike.

b- Ew berî bigihîje cihê reketa piştî wê tê bîra wî ku ruknek ji vê reketa xwe ji bîr kiriye. Li vir, di cih de divê vegere ji bo vî ruknî eda bike.

Nimûneya wê wiha ye; zilamekî ji bîr kir neçû rikûê, paşê dema xwendina xwe temam kir, çû sicûdê, paşê di sicûdê de hate bîra wî ku ew neçûye rikûê. Li vir, li ser wî wacib e ku rabe qiyamê, here rikûê, paşê jî nimêja xwe temam bike.

Ya duduyan; wacibên nimêjê

Wacibên nimêjê

Ewên ku sicûda sehwê cihê kêmasîya wan tije dike û ew bi jibîrkirinê jî dikevin.

1. Tekbîrên guhestinê yên di navbera hey'etên nimêjê de ye.

2. Gotina "Subhane rebbîyel 'ezîm"e, di rikûê de.

3. Gotina "Semîellelû lîmen hemîdeh" ji bo îmam û mûnferid, ew ji bo memûmî ne meşrû ye.

4. Gotina "Rebbena we lekel hemd" di îtîdala ji rikûê de ye.

5. Gotina "Subhane rebbîyel 'ela" di sicûdê de ye.

6. Gotina "Rebb îğfir lî" di navbera herdu sicûdan de ye.

7. Rûniştina ji bo tehîyyata yekê ye.

8. Teşehhuda [tehîyyata] yekê ye.

Ewê ku terka wacibekê ji wacibên nimêjê terk bike, bila ew çi bike?

Ewê ku bi qesd terk bike, nimêja wî betal dibe û divê ew wê îade bike.

Ewê ku bi sehw [bêhemdî] terk bike, nimêja wî sehîh e, ewê biçe sicûdên sehwê.



Ya sisêyan; sunnetên nimêjê

Ji bilî şertên nimêjê, ruknên wê û wacibên wê, her tiştê ku di bara sifetê nimêjê de hatiye vegotin, ew sunnet e; terka wî di sehîhbûna nimêjê de tesîr nake û ji bo terka wî jî sicûda sehwê ne wacib e.

Sunnetên nimêjê du cure ne. Ew gellek in, hinek ji wan ev in:

Ya yekê: sunnetên qewlî [bi gotinê]

1. Îstiftah e; ew dûa ye ku berî xwendina Fatîhê tê gotin.

2. Et-Te'ewwuz e; ew gotina "Eûzû billahî mîneş-şeytanir-recîm"

3. Besmele ye; ew gotina "Bismillahîr-rehmanir-rehîm."

4. Tişta ku zêdetirî carekê were gotin di tesbîhên rikû û sicûdê ye.

5. Tişta ku zêdetirî carekê were gotin di gotina "Rebbî îğfir lî" di navbera herdu sicûdan de ye.

6. Tişta ku zêdetir be li ser gotina "Rebbena welekel hemd" piştî rabûna ji rikûê ye.

7. Tişta ku ji xwendina fatîhê zêdetir be.

Ya duduyan; sunnetên fiêlî

Ew gellek in, hinek ji wan ev in:

1. Rakirina herdu destan e, bi tekbîra îhramê re, li cem rikû, li cem rabûna jê, li cem qiyama reketa sisêyan.

2. Danîna destê rastê li ser destê çepê ye, di esnaya qiyamê de berî rikû û piştî wê jî.

3. Nêrîna li cihê sicûdê ye.

4. Ji hev dûrkirina herdu destan e, ji zik û teniştê di esnaya sicûdê de.

5. Îftîraş e; ew rûniştin e ku mirov pêyê rastê radike û pêyê çepê radizîne û berê telîyên herduyan jî dide cîhetê qiblê û wisan li ser wan rûdine. Ev awayê rûniştinê di hemû rûniştinên nimêjê de sunnet e, ji bilî teşehhuda dawîyê ji nimêjên ku ji du reketan zêdetir bin.

6. Tewerruk e; ew rûniştin e ku mirov pêyê xwe yê rastê radike, berê telîyên wî dide cîhetê qiblê û pêyê çepê jî di bin paqên pêyê rastê re derbas dike, li ser cihê rûniştina xwe rûdine û birha xwe berdide ser kemaxa çepê. Ev awayê rûniştinê ji bo teşehhuda dawîyê ji nimêjên ku ji du reketan zêdetir bin.





Îftîraş



Tewerruk

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet	Nimêj	Rojî	Zekat	Hec






Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Mûbahên nimêjê, mekrûhên wê û betalkerên wê

Mûbahên nimêjê, mekrûhên wê û mûbtîlatên wê



Naverok

Ya yekê; mûbahên nimêjê

1. Birêveçûna di nimêjê de ye, ji bo sedemekî ku peyda dibe wekî vekirina derîyê li cîhetê qiblê, bi şertê ku berê wî ji qiblê venegere.

2. Hilgirtina zarokan di nimêjê de ye.

3. Kuştina mar û dûpişk di nimêjê de ye.

4. Fetilîna di nimêjê de ji bo îhtiyacê ye.

5. Girî di nimêjê de ye.

6. Subhanellah gotin ji bo mêran û tesfîq [zikê destê rastê li pişta destê çepê xistin] ji bo jinan e.

7. Fetha [vekirina] ji îmam re ye.

8. Îşaretkirina bi telî û dest [ewê berê mista xwe bide erdê û berê pişta wî jî bide jorê] ji bo vegerandina selamê di nimêjê de ye.

9. Îşareta mûfhîm [bide fehmkirin] e ji nimêjkerî ji bo îhtiyaceke ku rûbirû dibe.

10. Kirina hemdê Xuda ye, dema ew tişta ku wê dixwaze, bibîne.

11. Tifkirin û lîk û belğem avêtina bi rexê çepê ve di nimêjê de ye.

12. Nehiştina derbasbûnê di pêşîya nimêjkerî de ye.

Ya duduyan; mekrûhên nimêjê

1. Ketina nav nimêjê, dema fikra mirov mûşeweş be, yan li cem mirov yan li pêşîya mirov tiştek hebe ew mirov ji nimêjê ğafil bike, her wekî mirov bi kotekî mîza xwe, yan gûyê xwe, yan jî tirr û fisên xwe bigre, yan mirov birçî be û tî be û li pêşîya mirov jî xwarin hebe û dilê mirov jî biçe wê, yan jî mirov li tiştekê binêre û ew mirov ji nimêjê ğafil bike.

2. Xwe meşğûlkirina bi tiştên pûç, ew jî kirina tiştên ku di nimêjê de xuşû û îtmînanê tine dikin. Her wekî: Hereketên bê îhtiyac pê hebe, leyistina bi rih, cil, ğetre, saet, qirçandina telîyan û di hev re derbaskirina wan û yên wekî van e.

3. Bi rûyê xwe fetilandina di nimêjê de ye bê yî ku îhtiyac pê hebe, ew jî bi şertê ku bedena wî ji qiblê nezîvire, heke na, nimêja wî betal dibe.



4. Texessur e, ew e ku mirov destên xwe deyne ser kêlekên xwe. Xasîre, ew nîvê însên e, ewa ku ser kemaxan tenik dibe. Lewra ev ji kirina cihûyan e.

5. Nixumandina dev û bêhvilê di nimêjê de ye.

6. Teşmîra [şidandina] cil û kum û yên wekî wan e.

7. Menkirina porê, komkirina wê û bi kezîkirina wê ji bo mêran, hingê ew dibe wekî wî girêdayîyê ku destê xwe bi pişt xwe ve girêdabe, dema ew biçe sicûdê jî pora wî pê re naçe sicûdê.

8. Belğem avêtina bi cîhetê qiblê ve yan jî bi rexê rastê nimêjkerî ve ye.

9. Rakirina çavan bi jorê ve ye.

10. Miçkirin û girtina çavan e, heke ne ji bo îhtiyacê be.

11. Razandina herdu zendan di sicûdê de ye.

Ya siséyan; mûbtîlatên nimêjê

1. Kirina tiştekê ye, ku ew bi şertekê ji şertên nimêjê re çênabe; her wekî hasilbûna tişteke ku teharetê betal dike, yan jî bi qesd vekirina ewretî, yan bi temamê bedena xwe ve ber vegerîna ji qiblê, yan jî qutkirina nîyetê.

2. Bi qesd terka ruknekî yan jî wacibekî di nimêjê de ye.

3. Emelê pirr têde ye, dema ew ne ji cinsê nimêjê be, hem jî ne ji bo zerûretê be, wekî rêveçûn û zehf hereketkirin e.

4. Ken û qehqehe ye.

5. Axaftina bi qesd e.

6. Xwarin û vexwarina bi qesd e.

7. Zêdekirina reketekê yan jî ruknekî bi qesd e.

8. Selamdayîna memûmî bi qesd berî îmamê xwe ye.

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec







Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Sicûda sehwê, şukr û tîlawetê

10 Sicûda sehwê, şukrê û tîlawetê

Naverok

Ya siseyan; sicûda sehwê

Sicûda sehwê

Ew ji du sicûdan pêktê, nimêjker wan dike; ji bo tijekirina kêmasîya ku di nimêja wî de hasil bûye ji bo sehwê.

Sebebên sicûda sehwê

Sebebên sicûda sehwê sê ne: Şek, zêde û kêmasî.

1. Şek e:

Şek

Ew dudilî ya di navbera du tiştan de ye, gelo kîjan ji wan bûye.

Şek bi nisbet nimêjê du beş e:

1.Şeka piştî nimêjê ye:

Ev şeka ha, li ber çavan nayê girtin.

Nimûneya wê wiha ye; zilamek di piştî nimêja fecrê de ketiye şekê; gelo wî nimêja fecrê du reket kiriye yan jî sê reket? Eva ha jî, li ber çavan nayê girtin; lêbelê heke ew wê yeqîn bike, hingê ewê bi yeqîna xwe emel bike.

2.Şeka di nav nimêjê de ye

Ev şek jî, ji du haletan xalî nabe:

a. Yek ji herdu tiştan li cem wî girantir e:

Li vir, ewê bi ya ku li cem wî giran be, emel bike û ewê piştî selamê jî biçe sicûda sehwê. Nimûneya wiha ye; zilamek nimêja nîvroyê dike, ew di reketa xwe de kete şekê; gelo ew reketa duduyan e, yan jî ya sisêyan e? Lêbelê li cem wî zena xurt ew reketa sisêyan e. Evê ha, wê dixe reketa sisêyan û nimêja xwe temam dike, piştre ew di piştî selamê de dice sicûda sehwê.

Delîla vê jî ev gotina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye: «Dema yek ji we di nimêja xwe de bikeve şekê, bila li ya rast bigere, paşê bila selam bide, paştir bila du sicûdan bibe.» (Îbnhibban rîwayet kiriye)



Ew s lam dide

Ew ji bo s hwê die s û dê

b. Yek ji herdu tiştan li cem wî giran nayê:

Li vir, ewê li ser ya hindik ava bike; ewê nimêja xwe temam bike û berî selamê ji bo sehwê biçe sicûdê.

Nimûneya wê wiha ye: Zilamek nimêja nîvroyê dike, di reketa xwe de kete şekê, gelo ew ya duduyan e, yan jî ya sisêyan e, lêbelê li cem wî yek ji wan jî giran nehat? Evê ha, emelê xwe li ser ya hindik ava dike, wê reketa duduyan qebûl dike, nimêja xwe temam dike û berî selamê jî jib o sehwê dice sicûdê.

Delîla vê jî ev gotina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye: «Dema yek ji we di nimêja xwe de bikeve şekê, nezanî çend reket nimêj kirine, gelo sisê yan jî çar, bila şekê bavêje û bila ew wê li ser yeqîna xwe ava bike. Paşê berî selamê du sicûdan bibe.» (Mûslim rîwayet kiriye)



Ew ji bo s hwê die s û dê

Ew s lam dide

2. Zêdehî ye:

Ew e ku nimêjker di nimêja xwe de rikûekê yan jî sicûdekê.. zêde bike.

Zêdehî jî ji du haletan xalî nabe:

a. Nimêjker di esnaya kirina wê de wê bibîr tîne.

Li vir, divê ew jê vegere û nimêja xwe temam bike. Paşê, ewê di piştî selamê de ji bo sehwê biçe sicûdê.

Nimûneya wê wiha ye: Zilamek nimêja nîvro dike û rabûye ji bo reketeke pêncan jî bike, paşê di esnaya reketê de hate bîra wî. Li vir, divê ew di cih de rune, nimêja xwe temam bike, paşê di piştî selamê de ji bo sehwê biçe sicûdê.

b. Nimêjker di piştî kirina wê de wê bibîr tîne.

Evê ha, nimêja xwe temam dike, paşê di piştî selamê de diçe sicûda sehwê. Delîla vê, hedîsa Îbnmesûd [Xuda jê razî be] e, dibêje;«pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] nimêja nîvroyê pênc reket kirin, jê re hate gotin; ma di nimêjê de zêdehî çêbûye? Wî got; “ew çi ye?” Jê re got; te nimêj pênc reket kir. Wî jî piştî selamê du sicûd birin». (Buxarî rîwayet kiriye)

3.Kêmasî ye:

Ew e ku nimêjker, ruknekî yan jî wacibekî ji rukn û wacibên nimêjê kêm bike.

1.Kêmkirina ruknekî ye:

Dema ev rukn tekbîra îhramê be, ji xwe ew nimêj betal e. Lewra ew hîç nehatiye destpêkirin. Heke rukn, ji bilî tekbîra îhramê ruknekî din be, ew jî ji du haletan xalî nabe:

a. Nimêjker piştî bigihîje cihê wê ji reketa piştî wê, wê bibîr tîne.

Li vir, ew wê reketa ku ew rukn jê terk kiribû, îlğa [pûç] dike û wê reketa piştî wê dixe cihê wê.

Nimûneya wê wiha ye; zilam di reketa yekê de rikû ji bîr kir, paşê di reketa duduyan de di rikûê de ew hate bîra wî ku wî di reketa yekê de rikû ji bîr kiriye. Evê ha, ewê vê reketa xwe reketa yekê qebûl bike û qîmet nade reketa bûrî, ewê nimêja xwe temam bike, paşê di piştî selamê de ji bo sehwê biçe sicûdê.



Ew e lam dide | Ew ji bo e hwê die s û dê

b. Nimêjker, berî bigihîje cihê wê ji reketa piştî wê, wêbibîr tîne.

Li vir, divê ew li ruknê metrûk [devjêberdayî] vegere, wî û yên piştî wî jî bike, nimêja xwe temam bike, paşê piştî selamê jî ji bo sehwê here sicûdê.

Nimûneya wê wiha ye; zilamek sicûda duduyan û rûniştina berî wê ji reketa yekê ji bîr kir, ew piştî rabû rikûa reketa duduyan hate bîra wî, ewê lê vegere, rûne û biçe sicûdê. Paşê ewê nimêja xwe temam bike, piştî selamê jî ewê ji bo sehwê biçe sicûdê.

2.Kêmasîya wacibekî ye:

Dema nimêjker wacibekî ji wacibên nimêjê ji bîr bike, lewra ew ji sê haletan xalî nabe:

a. Berî ew ji cihê wê yê ji nimêjê veqete, ew tê bîra wî

Li vir, ew wê dike û tiştek jî li ser wî nîn e.

b. Piştî ew ji cihê wê yê ji nimêjê vediqete, berî ew bigihîje ruknê piştî wê tê, ew tê bîra wî.

Li vir, ew vedigere, wê dike, paşê nimêja xwe temam dike, ew piştî selamê jî, ji bo sehwê diçe sicûdê.

c. Ew piştî gihiştina ruknê pey wê, ew tê bîra wî.


Li vir, ew di nimêja xwe de berdewam dike, lê venagere û berî selamê jî ew ji bo sehwê diçe sicûdê.

Nimûneya wê wiha ye; zilamek di reketa duduyan de ji sicûda duduyan radibe ji bo reketa sisêyan û tehîyyata yekê ji bîr kir, berî rabe hate bîra wî ku tehîyyat ji bîr kiriye. Evê ha, dê rûniştî bisekine û tehîyyatê bixwîne, paşê ewê nimêja xwe temam bike û tiştek li ser wî nîn e.

Heke piştî rabe berîya tam jipêya piştrast bibe, hate bîra wî, ew rûdine, tehîyyat dixwîne, paşê nimêja xwe temam dike û piştî selamê jî ji bo sehwê diçe sicûdê.

Heke piştî jipêya tam piştrast bû, hate bîra wî, tehîyyat jê dikeve, ew lê venagere, ew nimêja xwe temam dike û berî selamê jî ji bo sehwê diçe sicûdê.

Delîla vê hedîsa Ebdûllah kurê Bûheyne [Xuda jê razî be] heye, dibêje; «pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li pêşîya wan nimêja nîvro kir, ew di herdu reketên pêşîn de rabû û nerûnişt, sehabe jî pê re rabûn, heta dema wî nimêj temam kir, sehabîyan çavnêrîya selama wî kir, ew rûniştî bû û tekbîr anî, berî selam bide, du sicûd birin, paşê selam da». (Buxarî rîwayet kiriye)




Sifetê sicûda sehwê

Sicûda sehwê, wekî sicûda di nimêjê bi xwe de ye, di tekbîra li cem sicûdê, rabûna jê, tişta ku têde di halê sicûdê û navbera herdu sicûdan de jî tê gotin.



Tekbîra îhramê



Ew ji bo sehwê diçe sicûdê

Hinek mijar

Dema nimêjker berî temambûna nimêjê selam bide û heta piştî demeke dirêj jî neyê bîra wî, ewê ji nû ve wê nimêjê îade bike. Lêbelê heke piştî demeke hindik were bîra wî her wekî du deqîqeyan yan sê deqîqeyan, ewê nimêja xwe temam bike û piştî nimêjê ji bo sehwê biçe sicûdê.

Divê memûmî di sicûda sehwê de bibe peyrew û tabîê îmamê xwe; çendan ew piştî sehwkirinê jî gihabe wî.

Dema nimêjker du sehwan bi hev re bike, cihê yekê ji wan berî selamê be û cihê ya duduyan jî piştî selamê be, ewê berî selamê ji bo sehwê careke tenê biçe sicûdê.

Ya duduyan; sicûda şukrê ye

Sicûda şukrê

Sicûda şukrê ji bo Xuda, li cem hasilbûna nîmetekê, yan karekî keyfxweşker, yan jî rakirina nexweşîyekê û yên wekî wan, tê birin.

Delîla meşrûîyeta sicûda şukrê: Hedîsa Ebûbekre [Xuda jê razî be] ye, dibêje; «Herçî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bû, dema karê keyfxweşîyê, yan jî mizgînîyek jê re dihat, ew ji bo şukrê Xuda diçû sicûdê.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

Sifetê sicûda şukrê

Ji bo sicûda şukrê desmêj ne şert e. Lêbelê ew tekbîr tine û dice sicûdê û dibêje; “Subhane rebbîyel ‘ela” ewê hemdê Xuda bike, jib o nîmetên ku dane wî jî şukrê Xuda bike, paşê ewê ji sicûdê rabe, tekbîr nayêne û selam jî nade.

Ya sisêyan; sicûda tîlawetê

Sicûda tîlawetê

Ew sicûdek e, xwendevan dema ayeteke ku têde sicûd hebe, derbas bibe, ew diçe sicûda tîlawetê.

Delîla meşrûîyeta tîlawetê; ew hedîs e ku ji Îbnûmer [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, dibêje; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji me re sûret dixwend ku têde sicûd hebû, ew diçû sicûdê û em jî diçûn sicûdê.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Sicûda tîlawetê, dema xwendevan di nimêjê de di ber ayeteke ku têde sicûd hebû de derbas bibe, ew diçe sicûdê; çi ew nimêja sirrî be, çi jî cehrî be, yan jî çi li derveyî nimêjê be. Ji bo sicûda tîlawetê jî desmêj ne şert e.

Sifetê sicûda tîlawetê

Xwendevan, yan jî guhdarê Qur’anê ji bo sicûdê tekbîr tîne û dibêje; “Subhane rebbîyel-‘ela” û ewê dûa bike û bibêje; «Rûyê min ji Xudayê ku bi plana xwe û hêza xwe ew aferandî, guhê wî û çavên wî şeq kirin re çû sicûdê.» (Tirmizî rîwayet kiriye)

«Xudayê min! Ji min re bi wê li cem xwe sewabekê binivîse, bi wê ji ser min gunehekî deyne, wê li cem xwe ji min re bike zexîre û wekî ku te ew ji evdê xwe Dawud qebûlkirî wê ji min jî qebûl bike.» (Tirmizî rîwayet kiriye)

Paşê ewê tekbîr bîne û ji sicûdê rabe -heke ew di nav nimêjê de be- ji xwe heke ew ne di nav nimêjê de be, ewê bê tekbîr û selam ji sicûdê rabe.

Ayetên ku sicûdên tîlawetê di wan de hene, ev in:

Sûretê ‘Eraf, ayeta 206’an	
Sûretê Re‘ad, ayeta 15’an	Sûretê Nehl, ayeta 49’an
Sûretê Îsra, ayeta 107’an	Sûretê Meryem, ayeta 58’an
Sûretê Hecc, ayeta 18’an	Sûretê Hecc, ayeta 77’an
Sûretê Furqan, ayeta 60’an	Sûretê Neml, ayeta 25’an
Sûretê Secde, ayeta 15’an	Sûretê Sad, ayeta 24’an
Sûretê Fussîlet, ayeta 37’an	Sûretê Necm, ayeta 62’yan
Sûretê Înşîqaq, ayeta 21’an	Sûretê Eleq, ayeta 19’an

Hinek mijar

Rêwîyê li ser heywana xwe siwar, dema ayeta sicûdê bixwîne, ewê ji heywana xwe peya bibe û ji bo tîlawetê [xwendinê] biçe sicûdê. Heke ev jê re hêsan nebe, ewê ji bo sicûdê bi serê xwe îşaret bike.

Dema xwendevan ayeta sicûdê dubare bike, sicûdeke tenê têra wî dike.

Di wan wextên ku menkirina nimêjê têde hatiye kirin de jî sicûda tîlawetê çêdibe.

Dema xwendevan neçe sicûda tîlawetê, guhdar jî naçe sicûdê, lewra wî bi wî îqtîda kiriye û ew di tîlawetê de peyrew û tabiê wî ye.


Ewê ku bê qesda guhdarîkirinê li xwendevanî guhdarî bike, her wekî wî yê ku di ber de derbas dibe, yan jî ew jê meşğûl be, ew di sicûdê de nabe peyrew û tabiê wî. Lewra wî di tîlawetê de li pey wî nîyet neanîye û îqtîda pê nekiriye.



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec




Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Nimêja cemaetê

Nimêja bi cemaetî



Hukmê nimêja bi cemaetî

Danerê şerîetê, nimêja bi cemaetî li zilamên ku karibin ferman kiriye û ew ji terka wê şîyar kirine. Hem jî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hewl daye ku ewên beşdarî wê nabin jî bişewitîne. Wî îzna terka wê nedaye mirovê korê nebîn jî.


Delîla wê jî ev ayeta ha ye,


1. Xuda [ezzewecelle] di bara nimêja tirsê de dibêje: {Dema tu li nav wan bî, tu li pêşiya wan nimêj bikî, bila grûbek ji wan digel te rabe nimêj bike} [Nîsa, 102]

Lewra Xuda [ezzewecelle] di halê tirs û seferê de jî bi nimêja cemaetî ferman kiriye, naxwe di halê ewlehî û li malê de hîn lipêştir û lazimtir e.

2. Hedîsa Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] heye ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Ji mûnafiqan re nimêja ji hemû nimêjan girantir nimêja eşa û nimêja fecrê ye. Heke wan sewaba ku têde heye bizanîya ewê bihatana wan çendan bi çarlepkî jî bûna!Min xistibû dilê xwe ku bi nimêjê emr bikim, ew were qametkirin, paşê li zilamekî ferman bikim ew li pêşîya mirovan nimêj bike. Piştre ez jî hinek zilaman bi xwe re bibim em êzingan kom bikin herim koma wan mirovên ku beşdarî nimêjê nabin, em xanîyên wan bi êgir bi ser wan de bişewitînim!» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine). Ji ber ku nimêja bi cemaetî wacib e, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê

Naverok





bin] xistiye dilê xwe ku yên ji nimêjê li paş mane, bişewitîne. Her wiha ji ber ku ew wacib e, ewên ku jê manej î bi nîfaqê hatine wesifkirin.

3. Hedîsa wî mirovê kor e, dema wî îzn ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] xwest ku ew li mala xwe nimêj bike û ti kes nebû ku bi destê wî jî bigre û wî bîne, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got: «Ma tu banga ji bo nimêjê dibihîzî?» Wî got; belê, jê re got; «Naxwe bersiv bide» (Mûslim rîwayet kiriye)

4. Ji Îbnmesûd [Xuda jê razî be] sabit bûye ku gotiye; «Kî, pê xweş be ku sibe misliman çav li Xuda bikeve, bila parêzgarîyê li van nimêjan bike dema ji bo wan bang tê dayîn. Lewra Xuda ji pêğemberê we [dirûd û silavên Xuda lê bin] re sunnetên [şopên] hîdayetê danîne. Ev nimêj jî ji sunnetên hîdayetê ne. Heke hûn li malên xwe nimêj bikin her wekî vî yê ku ji nimêjê li paş dimîne, nimêj dike, hingê hûn sunneta pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] terk dikin. Heke hûn sunneta pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî terk bikin, hûnê ji rêya heq bikevin. Kîjan mirov desmêja xwe sipehî bigre, paşê qesda mizgeftekî ji van mizgeftan bike, Xuda jê re bi her gaveke ku ew diavêje, heseneteke dinivîse, pê dereceyeke wî bilind dike û pê xetayekê jê dibe. Me xwe didît ku ji bilî mûnafiqekî nîfaqa wî pêzan kes jê li paş nedima. Zilam hebû di navbera milên du mirovan de dimeşî û dihate nimêjê û di nav sefê de jipêya dihat rakirin» (Mûslim rîwayet kiriye)



Hikmeta nimêja bi cemaetî û fezîleta wê

1. Hevnasîya birayan û hevdostan ji bo Xuda ye û sağlemkirina peywendîyên hezkirinê di navbera wan de ye. Ewa ku ne bi wê hevhezîyê be, îman nameşe. Lewra bêyî hezkirina ji bo Xuda Teala însan nabe mûmîn û naçe cennetê jî.

2. Ew kesê çil rojan li ser hev bigihîje tekbîra îhramê, ji nîfaqê û êgir bêrî dibe. Lewra Enes [Xuda jê razî be] rîwayet kiriye, gotiye; pêğemberê we [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Kî, çil roj ji Xuda re bi cemaetî nimêj bike û bigihîje tekbîra yekê, jê re du beraet tên nivîsandin: Beraetek ji êgir e, beraetek jî ji nîfaqê ye.» (Tirmizî rîwayet kiriye)

3. Kombûna cemaeta mislimanan e, berhevbûna qelbên wan li ser xêr û qencîyê ye.

4. Palpiştîya mislimanan û hevkarîya wan di navbera wan de ye.

5. Îzharkirina şîara dîn û xurtbûna wî ye.

6. Bi yek-kirina dilên mislimanan e. Lewra di yek sefê de mirovên reş û sipî, Ereb-nijad û ne-ereb-nijad, mezin û biçûk û xizan û dewlemend li kêleka hev di yek mizgeftê de li pey yek îmamî û di yek wextî de kom dibin, ew tev berê xwe didin yek qiblê û berê xwe didin yek-alîyî.

7. Hêrskirina dijminên Xuda ye; lewra misliman her xurt û asê ne, heta ew di mizgeftan de li ser nimêjê miqate bin.

8. Xîçkirina [jêbirina] xetayan û bilindkirina dereceyan e. Lewra ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Ma ez tişta ku Xuda pê xetayan xîç dike û dereceyan bilind dike, ji we re nîşan bidim?» Sehabîyan got; belê, ya pêğemberê Xuda! Wî got; «Sipehî desmêjgirtina di serma û germê de ye, pirr gav-avêtina di çûna mizgeftan de ye, û çavnêrîkirina nimêjê di piştî nimêjê de ye. Ha ev e, nobet!» (Mûslim rîwayet kiriye)

9. Nimêja bi cemaetî bi bîst û heft dereceyan ji nimêja bi tena serê xwe çêtir e. Lewra Ebdûllah

kurê Ûmer [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Nimêja bi cemaetî bi bîst û heft dereceyan ji nimêja bi tena serê xwe çêtir dibe.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Nimêja bi cemaetî li malê

Ji ti kesî û ti cemaetê re ne sipehî ye, ew li mala xwe nimêj bikin û mizgeft jî nêzîkî wan be! Lêbelê heke mizgeft ji wan dûr be û dengê bangê jî nebihîzin, ji wan re ti asteng nîn e ku ew bi cemaetî li mala xwe nimêj bikin.



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec





Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Îmamet û îtîmam

Îmamtî û îtîmam



Ewê ku ji bo îmamtîyê heqtir e

Bi tertîb wiha ye:

Yê yekê; ewê ku zehftir kitêba Xuda xwendibe; ewê ku zehftir ew jiber kiribe û hukmên wê bêhtir zanibe fehm bike.

Yê duduyan; ewê ku zehftir sunnetê zanibe; ewê meneyên hedîsê û hukmên wê zehftir zanibe.

Yê sisêyan; ewê ku di hicretkirinê de lipêştir be. Ewê ku pêşî ji welatê kafiran hicret kiribe û hatibe welatê îslamê. Heke li wir hicret nebe, ewê ku pêşî tobe kiribe û terka gunehan kiribe.

Yê çaran; ewê ku bi temenê xwe mezintir be; ev jî wiha ye, dema ew di xusûsên bûrî de wekhev bin.

Delîla vê xusûsa bûrî jî ev hedîsa Îbnmesûdê [Xuda jê razî be] ensarî ye, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Ji nav cemaetê kî zehftir kitêba Xuda xwendibe ewê îmamtîya wan bike. Heke ew di xwendinê de wekhev bin, kî ji wan zehftir sunnetê zanibe. Heke ew di sunnetê de wekhev bin, kî ji wan pêşî hicret kiribe, heke ew di hicretkirinê de wekhev bin, kî ji wan pêşî misliman bûbe, ewê îmamtîya wan bike.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Ev tertîb [rêz] li ber çavan tê girtin, dema mirov bixwaze îmamê mizgeftekê dîyar bike, yan jî îmamekî bi meaş ji cemaetekê re dîyar bike. [Îmamê bi meaş ew îmam e ku bi heqdest ji bo nimêja li mizgeftekê hatiye teyînkirin] Lêbelê dema ji cemaetê re îmamekî bi meaş hebe, yan jî îmam xwediyê malê be, yan jî yek ji wan kesan be ku desthilatî jê re hebe, ew ji dîgerên xwe lipêştir e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Zilam di cihê desthilatîya zilamî de nabe îmamê wî û di mala wî de bêyî destûra wî li ser mindera wî narûne.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Sekngeha îmam û memûmîyan

1. Dema memûmî [ewê ku li pey imam nimêj dike] yek mirov be, sunnet e, ew li hîza [dehma] wî li rexê rastê wî bisekine. Lewra hedîsa Îbnebbas [Xuda jê razî be] heye, dibêje; «Min şevekê bi pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re nimêj kir, ez li rexê çepê wî rabûm jipêya, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji pişt min ve bi serê min girt û ez anîm rexê rastê xwe.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

2. Dema cemaet du kes û zêdetirî wan be; îmam li nîvê sefê li pêşîya wan radiweste. Lewra hedîsa Cabir û Cebar [Xuda ji wan razî be] heye, dibêje; «Yek ji wan li rexê rastê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] sekinî û yê din jî li rexê çepê wî. Cabir dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi destê me tevan girt û em dehf dan heta em li pişt wî rabûn jipêya.» (Mûslim rîwayet kiriye)

3. Nimêja mûnferidî [ewê bi tena serê xwe] li pişt sefê ne sehîh e, heke uzrekî wî nebe, her wekî ku sef temam bûbe û din av sefê de cihê xwe nebîne.

Sekingeha jinan

1. Dema jin bi cemaetî nimêj bikin, sunnet e, îmama wan di nîvê sefa wan de di nav sefê de raweste û ew nakeve pêşîya wan.

2. Dema îmamê jinê zilam be, ewê li pişt wî bisekine. Dema jin bi mêran re nimêj bike, ewê li pişt sefê nimêj bike.

3. Dema jin bi cemaetî digel mêran nimêj bikin, sunnet e, ew ji mêran li paş bin û sefên wan jî dê wekî sefên mêran bin. Lewra ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Çêtirîn sefên jinan ya paşîya wan e, xirabtirîna wan jî ya pêşîya wan e!» (Îbnmace rîwayet kiriye)



Nimêja jinan



Ĵ n li nêẑ kî mêran

Hinek ji hukmên îqtîdaya bi îmamî

1. Ji bo ewê li mala xwe be, ne durust e, ew ji bihîstina dengê îmamî ji tekbîrgehê, yan jî ji bihîstina radîyoyê pê îqtîda bike û nîyeta xwe pê re bîne.

2. Dema sef bi hev û din ve bin, sehîh e ku însan ji derveyî mizgeftê jî îqtîda bi îmam bike û nîyeta xwe pê re bîne.

3. Sehîh e, memûmî bi îmamî îqtîda bikin û niyeta xwe li pey wî bînin; çendan ew li ser banê mizgeftê bin, yan jî ew jê nizmtir bin, tabîî dema dengê wî bibihîzin.

4. Ewê ku nimêja xwe ya ferz eda bike, sehîh e, ew îqtîdaya xwe bi yê nimêja nafîle dike, bike û li pey wî nîyeta xwe bîne. Her wiha ye, ewê nimêja

nafîle dike jî jê re sehîh e, ew nîyeta xwe li pey mirovê ku nimêja ferz dike û li dûv wî nimêj bike. Her wekî nimêja eşayê li pey îmamê ku nimêja terawîhan dike, yan jî nimêja digel ewê ku nimêja ferz lê çûbe ji bo jê re sewaba bi cemaetî hasil bibe. Lewra ji Cabir kurê Ebdûllah [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Mûaz bi pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re nimêj dikir, paşê ew dihate cem qewmê xwe, li pêşîya wan jî nimêj dikir.» (Buxarî rîwayet kiriye)


Îqtîdakirin ji derveyî mizgeftê

Ketina pêşîya îmam

1. Ji memûmî re meşrû ye ku ew mûtabeeta îmamê xwe bike, ew piştî hereketa îmamê xwe yekser wê bike. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Îmam bûye îmam ji bo îqtîda pê were kirin. Naxwe dema ew tekbîra xwe bîne, hûn jî tekbîra xwe bînin. Dema ew biçe rikûê hûn jî herin rikûê. Dema ew biçe sicûdê hûn jî biçin sicûdê.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

2. Ji bo memûmîyan ketina pêşîya îmamê xwe heram e. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di vê xusûsê de bi kirp li ser sekiniye û gotiye; «Ma yek ji we ji vê natirse ku dema ew berî îmam serê xwe rake, Xuda serê wî bixe serê kerekî, yan jî sûretê wî bixe sûretê kerekî.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

3. Kî bi sehw bikeve pêşîya îmamê xwe li ser wî wacib e ku ew vegere û dîsa bibe tabîê wî.



Nimêj li pey bêdesmêjî


Nimêj li pey mûhdisî [bêdesmêjî] (Bêdesmêj, yan jî mûhdis; ew kes e ku teharet û desmêja wî nîn e) ne sehîh e; lêbelê heke ew heta piştî xilasbûna nimêjê bi bêdesmêjîya wî nizanibe, hingê di vê rewşê de nimêja memûmî sehîh e; lêbelê divê îmam dîsa nimêja xwe îade bike.



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review

Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro

Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Nimêja xwedan uzran

13

Nimêja xwedî uzran

Uzr

Nexweşî, sefer/rêwîtî, tirs

Naverok

1.Nimêja nexweşî

Nexweş, bi qasî karibe divê nimêja xwe eda bike. Heke ew wekî mirovê tendurust û sağlem dikare nimêja xwe eda bike, divê ew wê eda bike. Heke ew wê nikaribe, ewê bi qasî jê tê, wê bike. Divê nexweş jipêya nimêj bike, heke karibe jipêya bike. Heke ew nikaribe jipêya bike, ewê rûniştî nimêj bike. Heke ew nikaribe rûniştî nimêj bike, ewê li ser tenişta xwe nimêj bike û berê rûyê wî dê li qiblê be. Heke ew nikaribe li ser tenişta xwe nimêj bike, ewê li ser pişta xwe nimêj bike û heke jê re hêsan be, berê lingên wî dê li qiblê be. Heke ew vê jî nikaribe, ewê li gorî rewşa xwe nimêj bike.

Delîla vê jî ev gotina Xuda [ezzewecelle] ye: {Heta hûn karibin xwe ji hêrsa Ellah biparêzin.} [Teğabun, 16]

Hem jî delîla wê ev gotina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye: «Jipêya nimêj bike. Heke tu nikaribî rûniştî nimêj bike, heke tu nikaribî li ser teniştê nimêj bike.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Hinek ji hukmên nimêja nexweşî

1. Dema nexwe rûniştî nimêj bike û karibe biçe sicûdê, sicûd li ser wî wacib e.

2. Dema ew rûniştî nimêj bike û nikaribe biçe sicûdê, ewê bi bedena xwe rikû û sicûdê îşaret bike û sicûda wî dê ji rikûa wî nizmtir be. Heke îşaretkirina bi bedena wî jê re zehmet be, ewê bi serê xwe îşaret bike. Her wiha dema ew li ser pişta xwe jî nimêj bike, ewê bi serê xwe îşaret bike.

3. Dema desmêjgirtin ji bo her nimêjê ji nexweşî re zehmet be, yan jî nimêj di wextên wan de jê re zehmet bin, jê re cema [bi hev re kirina] nîvro û esrê û meğrib û eşayê di wextê pêşîn de, yan jî di wextê duduyan de -kîjan jê re hêsan be- heye.

4. Bi ti awayan nimêj ji ser nexweşî nakeve; heta eqlê wî li serê wî be. Naxwe ji nexweşî re ne sipehî ye, ew bi behaneya nexweşîyê sistahîyê di bara nimêja xwe de bike. Heta ew karibe bila bide xwe ji bo nimêja xwe eda bike.

5. Dema nexweş çend rojan ji xwe biçe û paşê bi hişê xwe were, ewê bi qasî karibe dema bi hişê xwe hat, nimêj bike û qezakirina wan nimêjên ku di halê jixweçûna wî de lê çûbûn jî li ser wî ne wacib e. Lêbelê heke jixweçûna wî hindik be wek nimûne; her wekî rojekê, yan du rojan be, hingê kengê jê re hêsan bibe, divê ew wan qeza bike.



1 Tekbîr



2 Xwendin



4 Sicûd



3 Rikû

2.Nimêja mûsafirî/rêwîyî

Ji mûsafirî/rêwîyî re meşrû ye ku ew nimêjên xwe yên çar-reketî [nîvro, esr û eşayê] bi du reketî kurt bike. Lewra Xuda [ezzewecelle] gotiye: {Dema hûn li erdê derkevin rêwîtiyê û hûn endîşe bikin ku kafir dê zerarê bidin we hingê, ti guneh ji we re nîn e ku hûn, hindek nimêjan bi kurtî bikin. Bi rastî kafir, ji bo we neyarne eşkere ne} [Nîsa, 101]

Hem jî ji Enes kurê Malik [Xuda jê razî be] sabit bûye, gotiye; «Em bi pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re ji Medînê derketin û diçûn Mekkê, heta em vegerîyan wî li pêşîya me nimêj bi du-reketî dikirin.» (Nesaî rîwayet kiriye)

Meqsûd ji seferê/rêwîtîyê

Li gorî urfa mirovan ji çi re "sefer" were gotin, ew sefer e, têde nimêj tê kurtkirin.



Kurtkirina nimêjê

1. Ji bo mûsafirî piştî ew cih û warê welatê xwe yê ku lê dimîne bicih bihêle, hingê kurtkirina nimêjê dest pê dike. Li cih û warê îqametgeha wî jê re kurtkirina nimêjê ne durust e. Lewra sabit nebûye ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] nimêj kurt kiribe; heta ew derneketibe seferê.

2. Dema mûsafir bigihîje welatekî û bixwaze çar rojan yan hîn zêdetir lê bimîne, divê ew nimêja xwe bi temamî eda bike. Lêbelê heke ew ji çar rojan kêmtir nîyeta îqametê li wî welatî bike, jê re kurtkirina nimêjê durust e. Heke ew nîyeta îqameteke mûeyyen neke lê jê re hinek armanc hebin, kengê ew xilas bibe, ewê vegere welatê xwe, evê ha heta vegere cih û warê xwe jî jê re kurtkirina nimêjê durust e; çendan ew mayîna wî li wir ji çar rojan zêdetir be jî.

3. Dema mûsafir li pey îmamekî mûqîm [ne rêwî] nimêj bike, divê ew nimêja xwe temam bike; çendan ji reketeke tenê pê ve jî negihabe wî.

4. Dema mûqîm [ne rêwî] li pey mûsafirekî ku bi kurtînî nimêja xwe eda dike, nimêj bike, hingê divê ew piştî selam-dayîna îmamê xwe, nimêja xwe temam bike.



Cem‘a [bi hev re kirina] du nimêjan

1. Ji mûsafir û nexweşî re cema [bi hev re kirina] nîvro û esrê di wextê yekê ji wan de û meğrib û eşayê jî di wextê yekê ji wan de durust e. Vêca dema ew wan di wextê nimêja pêşî de cem bike, ew dibe cemû-teqdîm, dema ew wan di wextê nimêja duduyan de cem bike, ew dibe cemû-texîr.

2. Ji bo mirovê ku li mizgeftê nimêj dike cem‘a nimêjê durust e; ji bo hatina baranê ku bi sedem wê zehmetî û tengasî jê re çêbibe. Lêbelê ewên kul i mala xwe nimêj dikin her wekî jinan, ruxseta cem‘ê [bi hev re kirinê] ji wan re ne durust e.

3. Ne lazim e ku cem û qesr [kurtkirin] bi hev re bin. Dibe ku mirov cem û qesrê bike û dibe ku mirov cem bike û qesrê neke.

Nimêja mûsafir di otobûsê de

1.Dema ew nimêj nafîle be:

Ew bi uzr û bê uzr jî her sehîh e. Lewra sabit bûye ku «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li ser heywana xwe; berê wê biketa kuderê jî nimêja nafîle dikir.» (Buxarî rîwayet kiriye)

2. Dema ew nimêja ferz be:

Dema ew ji bo nimêjê nikaribe li ser erdê peya bibe, yan jî dema ew peya bibe jî, ewê nikaribe siwar bibe, yan jî ew ji dijminekî bitirse û ev di rewşên wekî van de, nimêj [di otobûsê de] sehîh e. Ji vê re jî çendîn awa hene. Hinek ji wan ev in:

a- Ew dikare berê xwe bide qiblê û ew dikare biçe rikû û sicûdê jî, her wekî dema ew gemîyê de be, divê ew nimêja xwe bi awayê wê yê adetî eda bike. Lewra ew dikare wê bike.

b- Ew dikare berê xwe bide qiblê lêbelê nikare biçe rikû û sicûdê, hinge li cem tekbîra îhramê divê ew berê xwe bide qiblê, paşê otobûs berê wî bide kîjan alîyî ewê nimêj bike û ewê jib o rikû û sicûdê jî îşaret bike.



3. Nimêja [Xewfê] Tirsê

Nimêja tirsê di her şerrê mûbah de hem li hederê [malê], hem jî li seferê meşrû û rewa ye. Hem kitêb hem jî sunnet meşrûîyeta wê nîşan didin:

1- Ji kitêbê [Qur’anê] ev ayet wê rewa nîşan dide. Lewra Xuda [ezzewecelle] dibêje: {Dema tu li nav wan bî, tu li pêşiya wan nimêj bikî, bila grûbek ji wan digel te rabe nimêj bike, bila ew çekên xwe jî wergirin. Dema herin sicûdê, herdu sicûdên xwe ji qama pêşî qedandin, bila bi lez qama duduyan xweser biqedînin û biçine paş we; pasevanîyê bikin. Bila grûba din ya ku nimêj nekiribûn jî, were û bi te re qamekê nimêj bike. [bila qama din jî xweser bike] Bila ew jî rahêjin çekên xwe û tedbîra xwe bistînin.} [Nîsa, 102]

2- Ji sunnetê jî kirina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew bi sehabîyên xwe re kiriye û sehabîyên wî jî [Xuda ji wan razî be] piştî wî ew kirine.

Sifetê nimêja tirsê

Bandora tirsê li ser hijmara reketan nîn e. Heke ew li hederê [malê] be, nimêj bi awayê xwe yê normal tê edakirin. Heke ew li seferê [rêwîtîyê] be, nimêj bi qesrê [kurtînî] tê edakirin. Lêbelê awayê wê cuda ye. Di bara awa û sifetê wê de jî çendîn awa hatine, hemû jî durust in.

Ew tirsa ku vê nimêjê îcab dike jî ji du haletan xalî nabe:

Haletê yekê; haletê tirsa ji êrîşkirina dijmin e:

Ewê nimêjê bi awayekê ji wan awayên ku ji pêğemberê we [dirûd û silavên Xuda lê bin] hatine, eda bike. Meşhûrtirîna wan, ev e, ya ku di hedîsa Sehl kurê Ebûhesme [Xuda jê razî be] hatiye; «Ew awa jî wiha ye: Îmam wan dixe du taîfe [kom], taîfeyek li pêşberî dijmin radiweste û pasevanîyê dike. Taîfeya din jî pê re reketek nimêj dike. Dema îmam rabe reketa duduyan, ew nîyeta mûfareqetê [jê veqetînê] dike, ji xwe re nimêja xwe temam dike, selam dide, paşê jî ew ji bo pasevanîyê diçe pêşberî dijmin. Taîfeya pêşîn jî tê, ew bi îmam re reketa duduyan nimêj dike. Dema îmam ji bo tehîyyatê rûne, ew radibin, ji xwe re nimêja xwe temam dikin û îmam jî çavnêrîya wan dike. Dema ew rûnin û tehîyyatê bixwînin, ew bi wan re selam dide.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Ev awa, dema nimêj li seferê be, yan jî li hederê [malê] be; ew di nimêja fecrê de dibe. Lêbelê dema ew li cih û warê xwe be, yan jî di meğrîbê de be, ewê bi taîfeya yekê re du reketan nimêj bike. Paşê ew taîfe nîyeta mûfareqeta [jê veqetînê] wî dike, ew ji xwe re reketa mayî temam dike û selam dide. Paşê ew diçe. Taîfeya duduyan tê, îmam reketa mayî bi wan re nimêj dike. Paşê ew nîyeta mûfareqetê [jê veqetînê] jê dike; dema ew ji bo tehîyyata dawiyê rûne, ewê ji xwe re nimêja xwe temam bike û îmam çavnêrîya wan dike, heta dema ew ji bo tehîyyata dawiyê rûnin, ewê bi wan re selam bide.

Haletê duduyan; tirs dijwar dibe, ew nikarin bi awayê wê yê ku hatî, nimêj bikin:

Di vî halî de ew peya û siwar berê xwe didin qiblê û nimêj dikin, heke karibin, heke na, bi kîjan rexî ve be, ewê berê xwe bidinê û wisan nimêj bikin. Wekî ku Îbnûmer [Xuda jê razî be] gotiye; «Dema tirs ji vê dijwartir bibe, hingê ewê jipêya, peya li ser lingên xwe, yan jî siwar ber li qiblê, yan jî ber li ğeyrê qiblê nimêj bikin» (Buxarî rîwayet kiriye)

Ewê ji bo rikû û sicûdê îşaret bikin, ewê hem bimeşe û nimêj bike, yan jî ewê li gorî halê xwe li firoka xwe yan jî li tenka xwe siwar bibe û nimêj bike. Her wekî di rabûna cengê û dijwarîya şerrî de, yan jî ğeyrê vê de, ew halê ku mirov nikare nimêjê bi awayê wê yê normal eda bike. Ev gotina Xuda [ezzewecelle] wê nîşan dide: {Heke hûn bitirsin, çi peya bin, çi jî siwar bin nimêj bikin.} [Beqere, 239]





Ew di firokê de nimêj dike




Ew di gemîyê de nimêj dike



Ew di tenkê de nimêj dike

Hêsanbûna şerîetê


Mûsamehekarî, hêsankarî û rakirina tengasîyê ji giringtirîn taybetmendîyên şerîeta îslamê ne, ku wê ji şerîet û nîzamên din vediqetînin. Ev di şerîetê de qaîdeyekî gelemper e: “Zehmetî hêsankarîyê bi alîyê xwe ve dikişîne.”



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Nimêja înê



Nimêja cumûê/înê

Hukmê nimêja înê

Nimêja înê, li ser her mislimanê baliğ, biaqil û dêmanî [mûstewtin] ku jê re di terka wê de uzr nebe, ferzûl eyn e[yanî divê her kes wê ji ber xwe ve eda bike].

Ev ayet û hedîsên ha, ferzûl-eynbûna wê nîşan didin:

1. Xuda [ezzewecelle] dibêje: {Gelî yên ku îman anîne! Dema roja înê banga nimêjê were kirin di cih de bi lez herin nimêjê, herin zikrê Ellah û dest ji kirîn-firotinê berdin.} [Cumûe, 9]

2. Ev gotina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye: «Yan hinek mirov dê dev ji terk-kirina înan berdin, yan jî Xuda dê mohrê li ser qelbên wan bixe, paşê jî ewê bibin ji ğafilan.» (Mûslim rîwayet kiriye).

Ewên ku în li ser wan ne wacib e

Çûna înê li ser jinê, yê biçûk, yê rêwî û yê nexweş; ewên ku bi çûna wê zehmetîyeke pirr dijwar digihîje wan, ne wacib e. Lêbelê dema evên ha biçin nimêja înê digel ğeyrên xwe sehîh e, ji wan re çêdibe. Heke ew neçin înê jî, ewê nimêja xwe ya nîvroyê bikin.

Naverok

Yê rêwî



Yê biçûk





ĳ n



Yê nexweş

Fezîleta roja înê

Roja înê ji hemû rojên hefteyê çêtir e. Piştî ummetên din ji ser wê rêwind bûn, Xuda ew ji vê ummetê re terxan kiriye. Di bara fezîleta wê de gellek hedîs hatine.

Hinek ji wan ev in:

1. Ev gotina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye: «Çêtirîn roja ku tav li serê derketîye roja înê ye. Têde Adem hatiye xuliqandin, têde ew çûye cennetê û têde jê hatiye derxistin.» (Mûslim rîwaye kiriye)

2. Ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Kî xwe bişoyê, paşê were înê û bi qasî jê re hatibe nivîsandin, nimêj bike. Paşê huş bibe heta îmam ji xutbeya xwe vala bibe, paşê pê re nimêj bike, jê re gunehên navbera wê înê û îna din û sê rojên zêdetir jî tên efûkirin.» (Mûslim rîwayet kiriye)

3. Ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] digot: «Her pênc nimêj, în heta bi înê û remezan heta bi remezanê gunehên navbera xwe didin efûkirin; dema xwe dûrkirina ji gunehên mezin were kirin.» (Mûslim rîwayet kiriye)

4. Ji Hûzeyfe kurê Yeman hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Xuda ummetên berî me ji înê rêwinda kirin. Roja şemîyê ji cihûyan re bû. Roja yekşemê ji krîstîyanan re bû. Xuda em jê re anîn. Xuda em ji roja înê re anîn ser rêya heq. Wî în, şemî û yekşem çêkirine. Her wiha ew roja qiyametê li pey me tên. Em ji ehlê dinyayê yên paşîyê ne û roja qiyametê jî em yên pêşî ne, berî mexlûqan ji wan re hukm tê kirin.» (Mûslim rîwayet kiriye)

5. Ji Nûman kurê Beşîr hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di herdu îdan û înê de Sebîhisme Rebbîkel ‘ela û Hel etake hedîsûl ğaşiyetî dixwendin.” Wî gotiye; “dema roja îd û înê diketin rojekê, ew herdu di herdu nimêjan de dixwendin.» (Mûslim rîwayet kiriye)

6. Çêtirîn roja ku tav li serê derketiye roja înê ye. Têde Adem hatiye xuliqandin, têde jê hatiye derxistin, têde tobeya wî hatiye qebûlkirin, ew têde miriye, têde roja qiyametê radibe û heywanek nîn e ku ew roja înê neyê guhdarîkirin; ji dema sibeh vedide heta tav derdikeve ji tirsa saetê [qiyametê] lêbelê cin û însan na. Têde saetek heye kîjan însanê misliman nimêj bike û li wê saetê pirsa îhtiyaca xwe ji Xuda rast bîne, Xuda her dê wê bide wî. Ke‘b gotiye; ew di her salê de rojek e? Min jê re got; na, ew di her înê de ye. Wî got; Ke‘b Tewrat xwend û got; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] rast gotiye! Ebûhûreyre gotiye; paşê ez çav li Ebdûllah kurê Selam ketim, min behsa rûniştina xwe digel

Ke‘b jê re kir. Ebdûllah kurê Selam got; ez dizanim ew kîjan saet e. Ebûhûreyre got; min jê re got; Wê j imin re vebêje. Ebdûllah kurê Selam got; Ew saeta dawîn ya roja înê ye. Min jê re got; Çawa ew saeta dawîn ya roja înê ye, halev e ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Kîjan însanê misliman di wê saetê de nimêj bike» halev e ku însanê misliman di wê saetê [dawîya roja înê] de nimêj nake? Ebdûllah kurê Selam got; ma pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] negot; «Kî li dîwanekê rûne û çavnêrîya nimêjê bike, heta ew nimêj bike jî ew her di nimêjê de ye? Wî got; min jê re got; belê, wî jî got; ew jî ew e» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

7. Çêtirîn rojên we roja înê ye. Têde gellek selewatan li ser min bidin. Lewra selewatên we li min tên erzkirin. Wî got; sehabîyan got; ya pêğemberê Xuda! Selewatên me çawa li te tên erzkirin halev e ku tu rizîyî? Wî got; ew dibêjin, tu rizîyî. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got; «Xuda tebareke weteala bedenên pêğemberan li ser erdê heram kiriye.” Selatên Xuda lê bin» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

Şertên sehîhbûna înê

1. Wext e: Ew berî wextê xwe û piştî derketina wextê wê jî, her wekî nimêjên ferz, ne sehîh e. Wextê wê jî wekî wextê nimêja nîvro ye.

2. Divê cemaetek beşdarî wê bibin: Ew ji mirovekî mûnferid ne sehîh e. Kêmtirînê cemaetê sê kes in.

3. Îstîtan [dêmanîbûn] e: Ew niştecihbûna li gundekî ava ye. Gundê ava, ew gund e ku însan çi havîn be, çi zivistan be, mala xwe jê bar nakin. Herçî ehlê çol û konan yên koçer in, ji wan nimêja înê sehîh e, lê li ser wan ne wacib e.

4. Divê li pêşîya wê du xutbe hatibin xwendin e: Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li ser wê dewam kiriye.



Ehlê çolê



Wex ê nimêjê



Ew bi e maetî nimêj dike

Sifetê nimêja înê

Nimêja înê, du reket e. Ew têde fatîhê bi cehrî [eşkerehî] dixwîne. Sunnet e, di reketa yekê de piştî fatîhê sûretê Cumûê û di reketa duduyan de jî piştî fatîhê sûretê Mûnafîqûn yan jî di reketa yekê de ‘Ela û di reketa duduyan de jî Ğaşiye bixwîne. (Mûslim rîwayet kiriye)

Herdu xutbe

Hukmê herdu xutbeyan

Herdu xutbe wacib in. Ew ji bo sehîhbûna înê şert in. Heke pirranîya beşdaran zimanê Erebî fehm bikin û di meneyên wê yên di nav cumle de bigihin, herdu xutbe jî dê bi Erebî bên xwendin. Ji bo hînkirina zimanê Erebî û mûxalefet nekirina bi rêça

pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] re. Lêbelê heke pirranîya beşdaran zimanê Erebî fehm nekin, ğem nake, mirov dikare wan bi zimanên din jî bixwîne. Lewra di xutbê de esl; fêrkirin û rê nîşandan e; ne xutbe xwendin bi tenê ye. Tabîî heke mûmkin be, divê ayet bi zimanê Erebî bên xwendin, paşê meneya wan were tercûmekirin.

Temamkerên xutbê

Xutbeya înê jê re rukn nîn in; lêbelê li gorî urfê, ew bi tişteke ku navê xutbê lê were kirin, hasil dibe. Lêbelê ji kemal û temamkera xutbê ye ku xutbexwên wiha bike:

1. Hemdê Xuda bike.

2. Herdu şehadetan bibêje.

3. Selewatan li ser pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] bide.

4. Wesîyeta bi teqwaya Xuda bike.

5. Xwendina tiştekê ji Qur'anê.

6. We'izan bike.

Mûstehebên xutbê

1. Bila Xutbe li ser mînberê were xwendin.

2. Dema xetîb [xutbexwên] hilgere ser mînberê, bila selamê li xelkê bike.

3. Bila bi rûniştineke sivik navberê bixe navbera herdu xutbeyan.

4. Bila herdu xutbeyan kurt bibirre.

5. Bila di herduyan de dûa bike.

Ew tiştên ku di nimêja înê de hatine qedeğekirin

1. Roja înê, dema îmam xutbê dixwîne, axaftin heram e. Lewra pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema roja înê îmam xutbê dixwîne, tu ji hevalê xwe re bibêjî, «huş be!» te leğû kir» (Buxarî rîwayet kiriye)

2. Mekrûh e, mirov xwe di ser stûyê mirovan re biqevêze. Lêbelê heke ew îmam be, yan jî ew xwe biqevêze cihekî vala ku ne bi wê be, nabe, hingê ew ğem nake.



Îdraka [gihiştina] înê

Divê misliman lezê li nimêja înê bike û pêşwext here wê. Heke ew ji nimêjê dereng bimîne û di reketa duduyan de digel imam bigihîje rikûê, ewê wê nimêja înê temam bike. Lêbelê heke ew negihîje reketa duduyan, ewê nimêja xwe nîvro temam bike. Her wiha ewê ku ji bo xew û dîgerên wê nimêja înê lê biçe, ewê wê nimêja nîvro bike; yanî ewê wê çar reket nimêj bike.

Roja înê çi mûsteheb e

1. Roja înê xwendina sûretê Kehf e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî, roja înê sûretê Kehf bixwîne, ew jê re navbera du înan rohnî dike.» (Hakim rîwayet kiriye)

Zehf kirina selewatan li ser pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye. Lewra ji Îbnmesûd el-ensarî [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Roja înê zehf selewatan li ser min bidin. Lewra roja înê kî selewatan li ser min bide ew ji min re tên erzkirin.» (Hakim rîwayet kiriye)

3. Xwe şûştin û bêhna xweş li xwe kirin e: Lewra pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «kî, roja înê xwe bişoyê û heta karibe xwe tahir bike, ji dohnê xwe li xwe li bide yan ji bêhn-xweşîya mala xwe bêhna xweş li xwe bike. Paşê ew derkeve û xwe li navbera du mirovan nexe, wan ji hev neveqetîne, paşê bi qasî ku jê re hatibe nivîsîn nimêj bike, paşê dema îmam biaxive, ew huş bibe, jê re gunehên navbera wê û îna din jî tên efûkirin.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Mekrûh e, mirov xwe di ser stûyê mirovan re biqevêze. Lêbelê heke ew îmam be, yan jî ew xwe biqevêze cihekî vala ku ne bi wê be, nabe, hingê ew ğem nake.

Hinek mesele di bara înê de

1. Sunnet e, mînber sê pêpeling bin. Lewra mînbera pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî wisan bû.



Mînber ê pêpeling e

2. "Sûretê Cumûê" ne sunnet e. Lewra berî înê nimêjker rûdinin, li xwendevanî guhdarî dikin, ew jî heta banga înê ji wan re hinek ayetên Qur'anê dixwîne, yan jî ew bi dengê tekbîran hinek beyt û zikrên bi kom dikin. Dema îmam li ser mînberê rûne ezaneke tenê meşrû ye. Lewra di serdema pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] û serdemên Ebûbekr û Ûmer [Xuda ji wan razî be] jî wisan bû. Ji xwe naskirina hatina wextê hêsan e; ji lewma îlletê [sebebê] meşrûîyeta ezana Osman [Xuda jê razî be] ji holê rabûye. Lewra li bazara Medînê bangek dihate dayîn ji bo xelk zanibin wextê nimêjê hatiye.



3. Dema nimêjker were mizgeftê û îmam jî li ser mînberê xutbe dixwend, hingê ew berî rûne bila du reketên sivik nimêj bike. Lewra pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema roja înê yek ji we were û îmam jî xutbe dixwend, bila ew du reket nimêj bike û bila di wan de derbas bibe.» (Îbnxûzeyme rîwayet kiriye)

4. Xutbexwên bi telîya xwe ya şehdê dûa dike û ew di halê dûayan de destên xwe ranake. Lêbelê di îstisqayê [baran xwestin], yan jî di dûaya ji bo rawestina baranê de destên xwe radike. Lewra ji Hûsayn kurê Ebdûrrehman [Xuda jê razî be] hatiye

rîwayetkirin, gotiye; «Min pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] dît ku xutbe dixwend, dema dûa dikir -bi telîya xwe ya şehdê îşaret kir - wiha digot.» (Ehmed rîwayet kiriye)


Ew bi telîya xwe îşaret dike

5. Ti sunneteke berî nimêja înê nîn e. Lewra mûsteheb e, mirov berî bangê sunnetên mûtleq bike. Lewra pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî, roja înê xwe bişoyê û heta karibe xwe tahir bike, ji dohnê xwe li xwe li bide yan ji bêhn-xweşîya mala xwe bêhna xweş li xwe bike. Paşê ew derkeve û xwe li navbera du mirovan nexe, wan ji hev neveqetîne, paşê bi qasî ku jê re hatibe nivîsîn nimêj bike, paşê dema îmam biaxive, ew huş bibe, jê re gunehên navbera wê û îna din jî tên efûkirin.» (Daremî rîwayet kiriye)

6. Sunneta piştî înê jî du reket nimêj tê kirin. Lewra Îbnûmer [Xuda jê razî be] rîwayet kiriye, gotiye; «Pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] piştî înê li mala xwe du reket nimêj dikir.» (Cemaet rîwayet kiriye) Yanî mirov çar reket nimêj bike. Lewra pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Ji we kî, piştî înê nimêj bike, bila çar reket nimêj bike.» (Mûslim rîwayet kiriye) Baştir e, mirov wan sunnetan li mala xwe bike.

7. Dema îd û în li hev rast bên, ji bo îhtîyatê bila mirov hem nimêja îdê hem jî înê bike. Heke nimêja îdê bike, ji hindikahî ve divê ew nimêja nîvroyê bike. Ji xelkê bajarên dûr re ruxset heye ku dema ew nimêja îdê bikin, ew ji bo nimêja înê venegerin. Lewra ji Îyas kurê Ebûremle eş-Şamî hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Min Mûawiye dît, wî ji Zeyd kurê Erqem pirs kir; tu bi pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] re hazirî du îdan bûyî ku ew ketibin rojekê? Wî got; belê. Wî serê naverojê nimêja îdê kir, paşê di bara înê de ruxset da û got; “kî bixwaze wan bi hev re kom bike, bila wan kom bike.» (Ehmed rîwayet kiriye)



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec











Dr. Abdullah Bahmmam


Review

Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro

Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Nimêja tetew'î

15 Nimêj tetewi‘ê



Nimêja tetewi`ê

Nimêja meşrû, ya ne wacib

Fezileta nimêja tetewi‘ê

1. Nimêja tetewi‘ê dibe sebeb ku Xuda pê ji evdê xwe hez bike. Lewra di hedîsa qudsî de hatiye ku Xuda Teala dibêje: «Evdê min bi nafîleyan her xwe nêzî min dike, heta ez jê bikim. Dema ez jê hez bikim jî ez dibim ew guhê wî yê ku ew pê dibihîze, ez dibim ew cave wî yê ku ew pê dibîne, ez dibim ew destê wî yê ku ew pê werdigre, ez dibim ew lingê wî yê ku ew pê dimeşe, heke ew ji min bixwaze ezê bidim wî û heke ew xwe bi min biparêze, ezê wî biparêzim» (Buxarî rîwayet kiriye)

2. Nimêja tetewi‘ê kêmasîya ferzan tije dike. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Însan, roja qiyametê ji karên xwe pêşî hesabê nimêjê ji wan tê pirsîn. Xudayê me ezzewecelle ji melaîketan -ji xwe ew ji wan bêhtir pê dizane- re dibêje; «li nimêja evdê min binêrin, gelo wî ew temam kiriye, yan jî ew kêm kiriye?» Heke wî ew temam be, jê re temam tê nivîsîn. Heke wî tiştek jê kêm kiribe, ji wan re dibêje; «binêrin ka ji evdê min re tetewi‘î hene?» Heke jê re tetewi‘î hebin, ji wan re dibêje; «ji evdê min re ferza wî ji tetewi‘ê wî temam bikin» Paşê kar li ser wê tên wergirtin.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

Nimêja tetewi‘î li malê çêtir e

Nimêja tetewi‘ê li malan ji mizgeftan çêtir e. Lêbelê ew tetewi‘ên ku di wan de bi cemaetî meşrû be, her wekî terawîhan di remezanê de, ew li mizgeftan ji male çêtir e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Çêtirîn nimêja mirov, ya li mala mirov e, lêbelê ya ferz na!» (Buxarî rîwayet kiriye).

Naverok



Cureyên nimêja tetewi‘ê

Gellek cureyên tetewi‘an hene. Mûhîmtirînê wan ev in:

Ya yekê; sunnetên rewatib in

(Rewatib; geljimareya ratib e. Ew, tişta sabit û daîmî ye)

Ew sunnet in ku bi ferzan re tên edakirin. Ew sunnet mûekked in. Temamê sunnetên rewatib deh yan jî diwazdeh reket in. Ew jî ev in:

- Du reket berî nimêja fecrê hene.

- Du reket yan jî çar reket berî nimêja nîvro û du reket jî piştî wê hene.

- Du reket piştî meğribê hene.

- Du reket piştî eşayê hene.

Lewra ji Îbnûmer [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Min deh reket ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] girtine. Du reket berî nîvro û du reket piştî wê, du reket piştî meğribê li mala wî û du reket piştî eşayê li mala wî û du reket berî nimêja sibehê.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Rîwayeteke wekî vê ji Aîşe [Xuda jê razî be] jî sabit bûye. Lêbelê wê berî nîvroyê behsa çar reketan kiriye. (Mûslim rîwayet kiriye)

Sunnetên berî nimêjê	Nimêjên ferz:	Sunnetên piştî nimêjê:
Du reket	Fecr,	——
û çar reket in	Nîvro,	Du reket
——	Esr,	——
——	Meğrib,	Du reket
——	Eşa.	Du reket

Çêtirîn sunnetên rewatib yên ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hem li malê hem jî li seferê li ser kirina wan dewam kiriye, herdu reketên fecrê ne. Lewra hedîsa Aîşe [Xuda jê razî be] heye, dibêje: «Bi qasî ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li ser herdu reketên fecrê bi israr bû, li ser ti nafîleyên din ewqas ne bi israr bû.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Sunnet e, mirov wan sivik bike, lê bêyî nuqsankirina wacibên wan. Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] sabit bûye, gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] herdu reketên berî fecrê ewqas sivik dikirin heta min ji xwe re digot, gelo wî maka kitêbê [fatîhe] xwend?» (Buxarî rîwayet kiriye)

Qezakirina sunneta fecrê jî durust e:

1. Piştî nimêja fecrê, heke wî ew nekiribe. Lewra ji Qeys kurê Emr sabit bûye, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] zilamek dît, wî piştî nimêja fecrê du reket nimêj dikir. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got: «Nimêja sibehê du reket e.» (Ebûdawud rîwayet kiriye) wî zilamî

got; min herdu reketên berî wê nekiribûn, mine w vêga kirin. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] tiştek jê re negot.

2. Piştî derketina tavê, lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «kî herdu reketên fecrê nekiribin, piştî tav derkeve bila wan bike.» (Tirmizî rîwayet kiriye)

Hinek mesele

- Fezîleta çar reketên piştî nîvroyê sabit bûye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî berî nîvro çar reket û piştî wê jî çar reket nimêj bike, Xuda wî li êgir heram dike.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

- Çar reket sunnet berî esrê jî ne mûekked in, lê mûsteheb in. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Rehma Xuda li wî kesî be ku berî esrê çar reket nimêj bike.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

- Sunnetên ne mûekked berî esr, meğrib û eşayê jî hene. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] sê caran gotiye; «Di navbera herdu ezanan [bang û qametê] de nimêjek heye. Di cara sisêyan de jî got: Ji bo yê ku bixwaze.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine) Ji herdu ezanan meqsûd; bang û qamet e.

- Qezakirina sunnetan di wextên kîrahetê de jî caiz e; dema mirov bi xewê, yan jî bi jibîrkirinê ji wan meşğûl bibe. Lewra sabit bûye ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji wan meşğûl bûbû, sunnetên xwe yên piştî nîvro piştî nimêja esrê kirine.

Ya diduyan; nimêja witrê

Hukmê witrê û fezîleta wê

Witr, sunneteke mûekked e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Xuda witr [kit] e. Ew ji witrê hez dike. Gelî ehlê Qur'anê! Naxwe hûn jî witran bikin.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hem li malê hem jî li seferê li ser witrê miqate bû.

Sifetê witrê

1. Hindiktirîn witr, yek reket e. Pirrtirîn witr jî yazdeh, yan jî sêzdeh reket e. Mirov wan du reket, du reket eda dike, paşê bi reketeke tenê jî witr nimêj dike.

2. Hindiktirînê kemala wan sê reket e. Mirov du reket nimêj dike, paşê selam dide, paştir reketeke din nimêj dike û selam dide. Mirov dikare wan bi hev û din ve bi tehîyyateke tenê nimêj bike. Mûsteheb e, mirov di reketa yekê de piştî fatîhê sûretê 'ela û di reketa duduyan de piştî fatîhê sûretê Kafîrûn û di reketa sisêyan de jî sûretê Îxlas bixwîne.

Lewra ji Ubeyy kurê Ke'b [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di reketa yekê ya witran de "Sebîhîsme Rebbîkel ela", di reketa duduyan de "Qulya eyyûhel Kafîrûn" û di reketa sisêyan de jî "Qul huw-ellahû ehed" dixwend.» (Nesaî rîwayet kiriye)



Wextê witrê

Ji piştî nimêja eşayê heta bi vedana fecrê ye. Edakirina wê di sêyeka dawî ya şevê çêtir e. Lewra hedîsa Cabir heye, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî bitirse ku ew dawiya şevê ranebe, bila di serê wê de witran bike.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Ew careke din jî witran nake. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Di şevekê de du witr nîn in.» (Ebûdawud rîwayet kiriye) «Kî, hêvîya wî hebe ku ew di dawîyê de rabe, bila di dawiya şevê de witran bike. Lewra nimêja dawîya şevê jê re şahid hene, ew jî çêtir e.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Dûa di witrê de

Dûa di witrê de di reketa paşîyê de berî rikûê (Ebûdawud rîwayet kiriye) yan jî piştî rabûna jê (Buxarî rîwayet kiriye) meşrû ye. Mirov destên xwe radike û bi dûayên ku hatine, dûa dike. Yek ji wan dûayan ev e: «Xudayê min! Min di nav mirovên ku te ew hîdayet kirin de, hîdayet bike, di nav yên ku tee w tendurust kirin de min tendurust bike, tu di nav yên ku te xwedîtî li wan kiriye de xwedîtîyê li min bike, ji min re bereketê bixe nav tiştên ku te ew dane min, min ji xirabîya ku te hukm lê birrîye, biparêze. Lewra tu hukm dibirrî û hukm lit e nayê birrîn. Bêguman ew mirovê ku tu xwedîtîyê lê bikî, reben nabe û yê ku tu dijminahîya wî bikî, ew ezîz nabe. Xudayê me! Tu pîroz û bilind î.» (Tirmizî rîwayet kiriye)

Îmam dê qunûtê bixwîne û memûmîyên li pey wî jî di dûayan de; ne sena û pesnên Xuda de, amîn bibêjin. Pesn û sena wekî vê cumlê ye: “Bêguman tu bi heqiyê hukm dikî” li vir, memûmî huş dibin.

Hinek mesele

1. Sunnet e, mirov piştî nimêja witrê sê caran bibêje: “Subhanel Melîkîl Quddûs” (Ehmed rîwayet kiriye) [Ez xwedîyê pak ji hemû kêmasîyan pak didêrim] ew dengê xwe dirêj dike û ewê di cara sisêyan de jî bilind bike.

2. Ne rewa ye, mirov di piştî dûayê de, ne di witrê de, ne di ğeyrê wê de jî bi destê xwe rûyê xwe bimale. Lewra ev yek ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] nehatiye.

3. Qunût di dirêjahîya salê tevî de durust e; ew ne xasê nîvê paşî yê remezanê ye. Qunût di temamê ferzan de, li cem hatina felaket û karesatan di temamê nimêjan de mûsteheb e.

4. Dûaya xetima Qur’anê di nimêjê de ne rewa ye.

Qezakirina witrê di naverojê de

Qezakirina witrê di naverojê de rewa ye û ew cot tê qezakirin. Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] sabit bûye ku dema ji ber êşê û dîgerên wê nimêja şevê li pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] diçû, wî di naverojê de ew diwazdeh reket nimêj dikirin. (Mûslim rîwayet kiriye)



Ya sisêyan; nimêja terawîhan

Terawîhan; nimêja şevê ye di remezanê ye. Çima jê re "terawîh" hatiye gotin? Lewra wan ji bo dirêjbûna nimêjê têde xwe di navbera çar reketan de rehet dikirin.

Fezîleta nimêja terawîhan


Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dibêje: «Kî bi îman pêanîn û sewaba wê li cem Xuda hesab kirin remezanê sağ bike, gunehên wî yên bûrî jê re tên efûkirin.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Hukmê Nimêja Terawîhan

Terawîh, sunneteke mûekked e, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew di meha Remezana mûbarek de meşrû kiriye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] çend şevan ew nimêj bi sehabîyên xwe re kiribû, paşê ji tirsa ku ew li ser wan ferz bibe, terk kiribû. Sehabîyên wî jî [Xuda ji wan razî be] piştî wî [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew nimêj kirine.

Hijmara reketên nimêja terawîhan

Ya çêtir di terawîhan de yazdeh reket e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi pirranî ew nimêj yazdeh reket kiriye. Hem jî gotina Aîşe [Xuda jê razî be] heye, dema jê hate pirsîn; nimêja pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di Remezanê de çawa bû? Wê got; «pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ne di Remezanê de, ne jî di ğeyrê wê de zêdetirî yazdeh reketan nimêj nedikir.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)



> **Nimêja terawîhan bi nîyeta eşayê**
>
> Kî, ji nimêja eşayê dereng bimîne, dema ew were nimêjê jî bibîne ku wa ye, mirov nimêja terawîhan dikin, bila ew jî bi niyeta nimêja eşayê bikeve nav wan. Lêbelê dema îmam selam bide, bila ew rabe nimêja xwe temam bike.

Hinek mesele

1. Rabûna nimêja şevê di temamê salê de sunneteke mûekked e; terka rabûna nimêja şevê jî mekrûh e.

Lewra ji Ebdûllah kurê Mesûd [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; li cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] behsa zilamekî hate kirin û hate gotin; ew heta sibehê razayî bû û ranebûye nimêja sibehê. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Şeytan di guhê wî de mîz kiriye!» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine) Mekrûh e, mirov rabûna şevê ya ku ji xwe re kiribe adet terk bike.

Lewra ji Ebdûllah kurê 'Emr kurê 'As [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Ya Ebdûllah! Tu wekî filan kes nebe. Ew radibû şevê, paşê rabûna şevê terk kir.»


Şîyarbûna ji bo nimêjê

2. Mûsteheb e mirov li cem razanê nîyeta rabûna şevê bike. Ji bo mirovê ku şîyar bibe jî sunnet e bi zikrên ku hatine Xuda zikr bike û çavê xwe ji xewê bifirikîne û sêwakê li devê xwe bide;

Lewra ji Hûzeyfe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi şevê radibû» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine) sêwak li devê xwe dida Li asîmanî binêre û her deh ayetên dawîya sûretê Alî Îmran bixwîne.

Lewra ji Îbnebbas [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; ez bi şevê li cem Meymûne -ew xaleta wî ye- mam, min xwe li ser ferehîya palgehekî gêr kir û pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û malbata xwe jî xwe li ser dirêjahîya wî xwe gêr kirin. Ew razîya heta şev bi nîvî bû, yan jî nêzîkî binîvîbûnê bû, ew şîyar bû, ji xewê çavên xwe difirikand -di rîwayeteke din de rûnişt, li asîmanî meyzand- paşê deh ayet ji Alî Îmran xwendin -di rîwayeteke din de; paşê deh ayet ji dawîya sûretê Alî Îmran xwendin-. «Dema zilam ji bo nimêja şevê şîyar bibe, jê re mûsteheb e, ew jina xwe jî şîyar bike. Her wiha jin jî bila mêrê xwe şîyar bike. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: "Dema zilam bi şevê jina xwe şîyar bike û herdu bi hev re -yan ew nimêj bike- du reket nimêj bikin û ew di nav zilamên zikrkar û jinên zikrkar de tên nivîsîn.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

3. Ew kesê ku di nimêja şevê de xew zorê lê bike, bila ew terka wê bike û raze heta xew ji ser çavê wî here.

Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Dema yek ji we di nimêjê de bipûnije, bila raze heta xew ji ser çavê wî biçe. Lewra dema yek ji we bipûnije û nimêj bike, dibe ku ew diçe lêborîna xwe bixwaze, lêbelê çêrî xwe dike.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

«Xuda di sêyeka şevê ya dawîyê de peya dibe tê asîmanê dinyayê û dibêje; ma yek heye gazî min bike, ez jî bersiva wî bidim? Ma yek heye tiştekê ji min bixwaze, ez jî wê bidimê? Ma yek heye lêborîna xwe ji min bixwaze, ez jî li wî bibûrim.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Ya çaran; selatûd-dûha [nimêja tavê]

Ew nimêj di wextê dûha-danê tavê de meşrû dibe.

Wextê Dûhayê:

Wextê dûha ji derketina tavê û bi qasî rimekî bilindbûna wê destpê dike - ev bilindbûna wê kêmzêde di tixûbê sêyeka saetekê de dibe- heta berî zewala tavê bi çaryekekê yan jî sêyeka saetekê dewam dike. Çêtirîn wextê wê jî dema dijwarbûna germahîya tavê ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dibêje: «Nimêja ewwabînan wextê ji germê şewitîna simên golikên hêştiran e.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Fezîleta nimêja tavê

Lewra Xuda Teala di hedîsa qudsî de gotiye; «hey kurê Adem! Di serê naverojê de çar reket nimêj ji min re bike, ezê di paşîya wê de jî têra te bikim.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Hijmara nimêja tavê

Durust e, mirov du reketan, yan çar, yan şeş yan jî heşt reketan bike. Ya sehîh, bila mirov du reket nimêja tavê bi selamekê bike. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew wisan kiriye.

- Ew ji ber sedeqe dayîna her movikekê ve çêdibe. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema sibeh li ser her movikeke we vedide, sedeqeyek lê dikeve. Her subhanellahek sedeqeyek e. Her el-hemdûlîllahek sedeqeyek e. Her laîlahe-îllellahek sedeqeyek e. Her Ellahûekberek sedeqeyek e. Şîreteke qencîyê sedeqeyek e. Menkirina mûnkerekê sedeqeyek e. Ji ber van ve du reketên tavê ku tu bikî, çêdibe.» (Mûslim rîwayet kiriye)

- Kî çar reket nimêja tavê bike, wê rojê ew têra wî dike. Lewra ji Nûeym kurê Hemmar el-Ğetefanî ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] rîwayet kiriye, wî jî ji Xudayê xwe tebareke weteala rîwayet kiriye ku gotiye: «Hey kurê Adem! Di serê naverojê de çar reket nimêj ji min re bike, ezê di paşîya wê de jî têra te bikim.» (Ehmed ew di Mûsneda xwe de rîwayet kiriye)

-Kî nimêja sibehê bi cemaetî bike û heta tav derkeve zikrê Xuda bike û paşê nimêja tavê jî bike, jê re sewaba hec û ûmreyeke tam heye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî nimêja sipêdê bi cemaetî bike, paşê rûne heta tav vede zikrê Xuda bike, paşê du reket nimêj bikejê re wekî sewaba hec û ûmrekê heye.» (Tirmizî rîwayet kiriye. Albanî jî ew di Sehîha el-Camîî [6346] de sehîh dêrîyaye)

Ya pêncan; nimêja tehîyyetûl mescid [hedîya mizgeftê]

Mirovê biçe mizgeftê berî ew rune, jê re du reket nimêj meşrû ye.

Hukmê wê,

ew sunneteke mûekked e. Delîla wê ev gotina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye: «Dema yek ji we biçe mizgeftê berî ew rûne, bila ew du reket nimêj bike.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Ji ber wê ve sunneta ratib yan jî ferz jî çêdibe. Wek nimûne; kî ji bo nimêja nîvro biçe mizgeftê, sunneta nîvroyê bike, jê re çêdibe, li ser wî nimêja tehîyyetûl mescid nîn e.



Tehîye tûl meis d

Ya şeşan; nimêja îstîxar

Ew du reket e. Dema mirov di karekî xwe de biheyîre, berî dest pê bike, wê nimêjê dike. Nimêja îstîxare du reket e. Dema mirov di karekî xwe yê îxtîyarî [tercîhkirinê] de biheyîre, berî ew dest pê bike, wê nimêjê dike. Piştî wê dûa rewa ye. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] wekî ku sûretek ji Qur'anê hînî wan dikir, wisan nimêja îstîxare jî hînî wan dikir.

Dûaya îstîxare

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema yek ji we kirina karekî bixe dilê xwe, bila ji bilî ferzê du reket nimêj bike, paşê jî bibêje: "Xudayê min, ez bi zanîna te îstîxarê j ite dikim, ez ji qudreta te qudretê dixwazim, ez kerema te ya mezin dixwazim. Lewra tu dikarî û ez nikarim, tu dizanî û ez nizanim, tu yî zanayê nependîyan. Xudayê min, heke tu dizanî ku ev kar, di bara dînê min û jîyana min û paşîya karê min de -ango; ji bo karê min yê acil û dereng de- ji min re qenctir e, wî ji min re teqdîr bike, wî j imin re hêsan bike û paşê j imin re bereketê bixîyê. Lêbelê heke tu dizanî ku ev kar, di bara dînê min û jîyana min û paşîya karê min –ango; di karê min yê acil û dereng de- ji min re xirab e, wî ji min vegerîne û min ji ser wî vegerîne û xêr li kuderê be, wê ji min re teqdîr bike, paşê min pê razî bike. Got; paşê jî ewê navê îhtiyaca xwe jî vebêje.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Elametê îstîxarê

Di dubarekirina îstîxarê de ti zirar nîn e. Ne şert e, îstîxarekar xewnekê jî bibîne, ew wî karê ku wî bijartibû jê re eşkere bike. Lêbelê ewê dest bi wî karê ku wî bijartibû û Xuda ew jê re bijartiye, bike; heke têde guneh yan jî qutkirina lêzimtîyê nebe. Heke ew bi dest wî ve were, ew xêr e; heke ew bi dest wî ve neyê jî, dîsa ew e, xêr.

Ya heftan; du reket nimêj piştî desmêjê

Lewra ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] sabit bûye ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li cem nimêja fecrê ji Bîlal re got: «Ya Bîlal! Ew emelê kut e di îslamê de kiriye û hêvîya te zehf jê heye, ji min re vebêje, ew çi ye? Lewra min li pêşîya xwe di cennetê de teptepa pêlavên te bihîstiye.” Bîlal jê re got: “Emelê ku min kiriye û ez jê zehf bi hêvî me, ev e; çi naveroj be çi jî şev be, ez kengê desmêj bigrim, Xuda çi qeder nimêj ji min re nivîsîbe ez bi wê desmêjê nimêj dikim.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Ya heştan; tetewi‘ên mûtleq

Tetewi‘a mûtleq, ew nimêj e ku bi zeman û sebebekî ve negirêdayî ye. Nimêja tetewi‘a mûtleq di her wextî de meşrû ye; lêbelê di wan wextên ku di wan de ji nimêjê nehî [men] hatiye kirin.

Hinek nimûne, ji bo tetewi‘a mûtleq

Qiyamûl leyl [rabûna şevê]

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «piştî ferzê nimêja çêtirîn nimêja şevê ye.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Dîsa pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Li cennetê hinek ode hene, derveya wan ji nava wan ve û nava wan jî jo derveya wan ve tê dîtin» Bedewîyek rabû ser xwe, got; ya pêğemberê Xuda! Ew ji bo kê ne? Jê re got: «Kî, xeberdana xwe xweş bike, xwarinê bide xelkê, rojîyê bigre û dema însan jî razayîbin, ew bi şev ji Xuda re nimêj bike, ew ji bo wî ne». (Tirmizî rîwayet kiriye)

Rabûna şevê di tibbê de

Rabûna şevê serdide derxistina hormona kortîzolê. Ew kortîzyona siriştî ya wicûdê ye, bi taybetî berî şîyarbûna piştî çend saetan. Ew jî li zemanê wextê seherê rast tê. Seher sêyeka dawî ya şevê ye. Ew jî mirov ji zêdebûna nagihan ya di sewîya şekirê xwînê de diparêze. Zêdebûna nagihan jî ji nexweşîya şekirê re xeterê çêdike.



Nimêjên xwedî sebeb di wextên qedeğekirî de

Nimêjên xwedî sebeb -ewên ku ji wan re sebebek heye, her wekî tehîyetûl mescid û nimêja cenaze- di wextên qedeğekirî de jî tên kirin.




Wextên ku di wan de nimêj hatiye qedeğekirin

1. Ji piştî nimêja fecrê heta derketina rojê û bi qasî rimekê jî bilindbûna wê ye. Ew di tixûbê sêyeka saetekê de dibe.

2. Ji stûnbûna tavê heta ew meyl bide.

3. Ji nimêja esrê heta tav biçe ava ye.


Delîla van ev hedîsa Ûqbe kurê ‘Amir e, ew dibêje; «Sê saet [wext] hene, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di wan de nimêj, yan jî definkirina mirîyên me li me men dikir. Dema roj derkeve heta bilind bibe. Dema mirovê nîvroyê radibe heta roj meyl bide. Dema roj ji bo çûna ava meyl dide heta biçe ava.» (Mûslim rîwayet kiriye)



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

[Nimêja îstisqayê [baran-xwestinê



Selatûl îstisqa'ê

Baran xwestin

Li cem hişkesalî û kêmbûna baranê xwestina avdanê ji Xuda Teala ye.

Delîla meşrûîyeta nimêja îstisqayê

Nimêja îstisqayê sunneteke mûekked e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew kiriye. Wekî ku ev di hedîsa Ebdûllah kurê Zeyd [Xuda jê razî be] de hatiye, gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] derket nimêjgehê, baran xwest, berê xwe da qiblê, kurkê xwe wergerand û du reket nimêj kirin.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Wextê nimêja îstisqayê

Dema erd hişk bibe, baran neyê, ava kehnî û rûbaran kêm bibe yan jî çem biçikin û tişteke wekî van çêbibe, nimêja îstisqayê yanî baranê meşrû dibe. Mûsteheb e nimêja piştî hilatina tavê û bi qasî, rimekê bilindbûna wê, were kirin. Kêm-zêde bila ew wekî nimêja îdê piştî derketina rojê bi sêyeka saetekê be.

N a v e r o k

Cihê nimêja îstisqayê

Sunnet e, ew di nimêjgehê de were edakirin; ne li mizgeftê. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew li nimêjgehê eda kiriye. Lêbelê heke îhtiyac pê hebe, ew li mizgeftê jî tê kirin.



Sifetê nimêja îstisqayê

1. Nimêja baranê, du reket e. Ew bê ezan û qamet tê kirin. Fatîhe têde bi eşkerehî tê xwendin.

2. Nimêjker di reketa pêşî de piştî tekbîra îhramê heft tekbîran dide, di reketa duduyan de jî ji bilî tekbîra rabûna ji sicûdê pênc tekbîran dide.

3. Nimêjker bi her tekbîrê re destên xwe radike, di navbera tekbîran de jî hemdê Xuda dike, pesnê wî dide û selewatan li ser pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dide.

4. Îmam piştî nimêjê xutbeyeke tenê dixwîne, têde zehf îstiğaran dike û zehf ayetên Qur'anê dixwîne. Paşê ew dûayên mesûr dike û di dûayan de îlhahê dike, nizmî, xizanî û rebenîya xwe li ber Xuda Teala îzhar dike, ew destên xwe bilind dike û di vê de zêde mûbaleğe dike.

5. Îmam berê xwe dide qiblê û ebayê xwe werdigerîne, ew alîyê li ser rexê rastê tîne rexê çepê û alîyê li ser rexê çepê jî tîne ser rexê rastê û di navbera xwe û Xudayê xwe de dûa dike.

Hinek ji hukmên nimêja baranê

1. Bila îmam berîya nimêja baranê weizan li xelkê bike, tobeya ji gunehan û derketina ji mezaliman bi vegerandina wan li xwediyên wan di bîra xelkê bîne ji bo dilên wan nerm bike. Lewra mesîyet û gunehkarî sebebê nehatina baranê ne. Tobe, îstiğfar [lêborîn xwestin] û teqwa sebebê qebûlbûna dûa û xêr û bereketê ne. Bila îmam xelkê ji bo sedeqeyan jî teşwîq bike; lewra ew sebebê rehmê ne.

2. Bila îmam rojekê ji bo derketina nimêjê dîyar bike da ku însan jê re hazirîya xwe bikin.

3. Sunnet e, mirov bi dilnizmî, xuşû, zarzar û rebenî û îzharkirina xizanîya xwe li ber Xuda derkeve nimêja baranê. Ji bo vê nimêjê xwe sipehîkirin û bêhna xweş li xwe dan jî ne meşrû ne.

4. Lewra Îbnebbas di bara sifetê derketina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji bo nimêja baranê de gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi xwe rebenkirin225, xwe nizmkirin û bi zarzar û laklak derket heta hate nimêjgehê.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

Bila îmam destê xwe rake û di xutbeya îstisqayê [baran xwestinê] de zehf îstiğfar û dûayan bike.

Ya mûsteheb li cem hatina baranê

Mûsteheb e, mirov di serê hatina baranê de li ber baranê raweste û xwe bide berê. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] wisan kiriye. Wekî ku ev yek di hedîsa Enes [Xuda jê razî be] de hatiye, gotiye; «Em bi pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re bûn baran li me hat. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] cilê xwe vekir heta baran lê hat. Me jê re got; ya pêğemberê Xuda! Te, çima ev kir? pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: "Lewra dema wê bi Rebbê wê Teala re taze ye.» (Mûslim rîwayet kiriye)



Baran ji kerema Xuda tenê ye


“Divê misliman bawer bike ku baran ji kerema Xuda û rehma wî ya li mexlûqên wî dibare. Ne wekî ku hinek dibêjin; “bi vê stêrê û wê stêrê baran li me barî!” Xuda me jê biparêze, ev şirk e!”



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Nimêja xusûf û kusûfê

17

Nimêja kusûf û xusûfê



Naverok

Kusûfa tavê

Çûna rohnîya tavê, yan jî hinek ji rohnîya wê di naverojê de ye.

Xusûfa heyvê

Çûna rohnîya heyvê yan jî hinek ji wê di şevê de ye.

Hikmet ji kusûf û xusûfê

Ew du nîşan ji nîşanên Xuda ne. Xuda bi wan evdên xwe ditirsîne da ku lê vegerin.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Roj û heyv ji bo mirina ti kesî û ji bo jîyana wî jî xirab nabin. Lêbelê ew du nîşan ji nîşanên Xuda [ezzewecelle] ne, ew bi wan evdên xwe ditirsîne. Naxwe dema ew xirab bibin, bi nimêjê hawara xwe bigihînin.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

Nimêja kusûf û xusûfê

Hukmê nimêja kusûf û xusûfê

Ew sunneteke mûekked e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Roj û heyv du nîşan ji nîşanên Xuda ne. Ew ji bo mirina ti kesî û ji bo jîyana wî jî xirab nabin. Naxwe dema hûn wê bibînin, bangî Xuda bikin, tekbîran bînin, nimêj bikin û sedeqeyan bidin.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Wextê nimêja kusûf û xusûfê

- Wextê nimêjê ji destpêka xirabbûna rohnîya wan heta bi vebûna wan e.

- Nimêjker nimêja xwe temam dike heta çendan kusûf û xusûf cube jî. Dema ew nimêja kusûf û xusûfê biqedîne û hê jî ew neçûbe, ew nimêja wan dubare nake. Lêbelê misliman dê li ser kirina dûa û îstiğfaran dewam bikin.

Sifetê nimêja kusûf û xusûfê

Ji Aîşe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Di serdema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] de roj xirab bû, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li pêşîya mirovan nimêj kir; rabû qiyamê û qiyama xwe dirêj kir. Paşê ew çû rikûê û wî rikûa xwe jî kir. Paşê ew rabû qiyamê û ew qiyama wî kêmtirî qiyama pêşî bû. Paşê ew çû rikûê û rikûa xwe dirêj kir lêbelê kêmtirî rikûa pêşîn bû. Paşê ew çû sicûdê û sicûda xwe jî dirêj kir. Paşê wî wekî ku di reketa yekê de kiribû di reketa duduyan de jî kir. Paşê dema wî selam da roj xuya bû, ji însanan re xutbe xwend, hemdê Xuda kir û pesnê wî da, paşê jî got: «Roj û heyv du nîşan ji nîşanên Xuda ne. Ew ji bo mirina ti kesî û ji bo jîyana wî jî xirab nabin. Naxwe dema hûn wê xirabbûnê bibînin, bangî Xuda bikin, tekbîran bînin, nimêj bikin û sedeqeyan bidin». (Buxarî rîwayet kiriye)

Li ser vî esasî, dema kusûf û xusûf çêbibe:

1. Banga ji bo nimêjê bi "Es-selate camîe" tê dayîn.

2. Dema însan kom bibin, îmam dê li pêşîya wan du reketên dirêj bike, ewê di wan de qîraetê bi cehrî bike [bi eşkerehî bixwîne]. Ewê di reketa pêşî de fatîhê, piştî wê jî sûretekî dirêj bixwîne, paşê biçe rikûê û rikûa xwe dirêj bike. Paşê ewê ji rikûê rabe û bibêje; "Semîellahû lîmen hemîdeh, rebbena welekel hemd" Paşê ewê fatîhê û sûretekî ji yê pêşî kurttir bixwîne, paşê ewê biçe rikûê û rikûa xwe dirêj bike lê ji rikûa pêşî kurttir bike. Paşê ewê ji rikûê rabe û bibêje; "Semîellahû lîmen hemîdeh, rebbena welekel hemd." Paşê ewê biçe sicûdê, ewê du sicûdên dirêj bibe, ewê di navbera wan de rûne û rûniştina xwe dirêj nake. Paşê ewê ji sicûda duduyan bi tekbîr anîn rabe û ewê reketa duduyan jî bi qiyama wê, rikûa wê û sicûda wê wekî reketa yekê bike. Lêbelê ewê di miqdarê de kêmtirî wê be. Paşê ewê rûne, tehîyyetê bixwîne û selam bide.



Sunnetên nimêja kusûf û xusûfê

1. Sunnet e, ew bi cemaetî were edakirin, lê heke ew bi ferdî jî were edakirin, ğem nake.

2. Ewê di mizgeftê de be, li pêşîya jinan ti asteng nîn e, ew jî dikarin herinê.

3. Ewê bi qiyama xwe, rikûa xwe û sicûda xwe ve were dirêjkirin. Lêbelê heke kusûf û xusûf xuya bibin, ewê wê sivik bike.

4. Reketa duduyan bi qiyama xwe, rikûa xwe û sicûda xwe ji reketa yekê kurttir e.

5. Ewê piştî nimêjê weizan li xelkê bike, qudreta Xuda di bîra wan bîne, ji wan re hikmeta kusûf û xusûfê eşkere bike û wan li ser kirina taetan û terka mûnkîratan teşwîq bike.

6. Ewê zehf dûa, îstiğfar, zarezar, sedeqe û emelên salih yên wekî van bikin heta Xuda wê tarîtîyê ji ser mirovan rake û bibe.

Di kusûfê de ji bo dûa rakirina destan durust e.

7. Lewra hedîsa Ebdûrrehman kurê Semûre [Xuda jê razî be] heye, dibêje: «Ez hatim cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew di nimêjê de jipêya bû û herdu destên xwe jî rakiribûn.» (Mûslim rîwayet kiriye)



Hinek tewcîhat û areste

1. Heke xusûf û kusûf neyên zanîn, heta xirabbûna wan neçe, hingê nimêja wan nayê qezakirin.


2. Naskirina îlmê hedîsê ji bo sebebê xusûf û kusûfê, ew du nîşanbûna ji nîşanên Xuda pûç nake. Ji ber ku Xuda pê evdên xwe ditirsîne, divê misliman xwe bi îbadet û zarzarkirina li ber Xuda meşğûl bike; ne ku xwe bi nêrîn û çavdêrîya li xusûf û kusûfê meşğûl bike.

Lewra ji Ebûbekre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; “di serdema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] de roj xirab bû, ew derket û ebayê xwe dikişand..” Ev tirsa zehf ya pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] nîşan dide.

3. Gihiştina reketê di nimêja kusûfê de bi gihiştina rikûa pêşî dibe. Naxwe rikûa pêşî li kî biçe û ew bigihîje ya duduyan ew reket lê çûye, divê ew piştî selama îmamê xwe wê bi sifetê wê temam bike.

4. Nimêja kusûfê heta di wextên qedeğekirî de jî tê edakirin.


5. Heta kusûf û xusûf bi eyanî neyên dîtin, nimêja kusûf, yan jî xusûfê bi xeberê tenê meşrû nabe.



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec




Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Nimêja herdu îdan

Nimêja herdu îdan



Naverok

Xuyahîyên îdê

Îdên mislimanan du îd in: Îda fitrê, piştî meha Remezanê û îda edha [qurbanê] piştî roja Erefê ye. Xuda ew herdu îd di şûna îdên cahilîyetê û hemû îdên peydakirî de dane me.

Lewra ji Enes kurê Malik [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; ji bo ehlê cahilîyetê di her salê de du roj hebûn, ew di wan de dileyistin. Çi dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hate Medînê, got: «Du rojên we hebûn, hûn di wan de dileyistin. Xuda di şûna wan de du rojên ji wan çêtir: Roja fitrê û roja edhayê dane wan.» (Nesaî rîwayet kiriye)

Pîrozkirin, yan jî beşdarbûna di cejnên kafiran de ne durust e. Lewra ew eşkeretirîn nîşanên olî û bariztirîn şerîet û rêbazên ola wan e.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Di şûna heqiya ku ji te re hatiye de nede dûv hewesên wan. Me, ji her yekî ji we re şerî‘et û rêbazek daniye.} [Maîde, 48]

Xuda di herdu îdan de nimêjek meşrû kiriye jê re nimêja îdê tê gotin. Ew ji mûhîmtirîn xuyahîyên wê ne.

Hukmê nimêja îdê

Nimêja îdê ferzûl kîfayet e. Dema hinek mirovên ku têra wê dikin pê rabin, guneh ji ser yên mayî radibe. Çendan fermana bi kirina wê mûekked be jî lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi edakirina wê ferman kiriye; heta ferman kiriye ku ji bo edakirina wê jin û biçûk û mezin jî werin deranîn; heta jinên di heyzan de jî çendan ew nimêj nekin jî. Ev jî ji ber fezîleta wê û bi kirp rawestina li serê ye. Delîla ferzîyeta wê jî ev in:

1. Gotina Xuda Teala ye: {Vêca ji Xudayê xwe re nimêj bike û qurbanê serjêke.} [Kewser, 2]

2. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman bi edakirina wê kiriye, heta fermana jinan jî bi edakirina wê kiriye.

Lewra ji Ummû-etîyye [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman li me kir ku em di îda fitr û qurbanê de keçên nû-gihayî, yên di heyzan de û keçên di goşeyên xwe de jî derxînin. Herçî yên di heyzan de bûn, wan xwe ji nimêjê dûr dikir û hazirî xêr û gazîya mislimanan dibûn.» (Buxarî rîwayet kiriye)



Wextê nimêja herdu îdan

Wextê nimêja îdê, bi nêrîna çavan; ji bilindbûna tavê miqdarê rimekê heta zewala wê ye. Miqdarê rimekê; çaryeka saetekê ye, piştî derketina tavê.

Sunnet e, mirov nimêja îda qurbanê zû bike ji bo wext têra serjêkirina qurbanê bike. Sunnet e, mirov nimêja îda fitrê jî dereng bike ji bo wext têra derxistina zekata fitrê bike.

Sifetê nimêja herdu îdan

Nimêja herdu îdan du reket e, bê ezan û qamet e, îmam têde qîraetê bi eşkerehî dixwîne. Ew wiha tê edakirin:

1. Mirov di reketa yekê de piştî tekbîra ihram û îstiftahê û pêşîya eûzû û xwendinê heft tekbîran dide.

2. Mirov eûzû û besmelê dibêje û dest bi xwendina fatîhê û sûretekî piştî wê dike. Sunnet e, mirov di reketa yekê de piştî fatîhê sûretê Ela û di reketa duduyan de jî piştî fatîhê sûretê Qemer bixwîne.

3. Mirov di reketa duduyan de jî piştî tekbîra întîqalê pênc tekbîran dide. Ya sehîh, mirov bi her tekbîrekê re destên xwe ranake.

4. Mirov di navbera tekbîran de hemdê Xuda dike, pesnê wî dide û selewatan li ser pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dide.

5. Dema îmam ji nimêjê selam bide, hildigere ser mînberê, du xutbeyan dixwîne û di navbera herdu xutbeyan de jî bi rûniştineke sivik rûdine.

6. Xutbexwên di herdu xutbeyên îdê de li ser mijara mûnasibê halê wê radiweste û di herdu xutbeyên îda qurbanê de jî li ser hukmê qurbanê û mijarên mûnasibî meqamê wî radiweste.

Cihê nimêja herdu îdan

Sunnet e, nimêja herdu îdan li nimêjgehê were edakirin; ne li mizgeftê. Lêbelê heke îhtiyac pê hebe, di mizgeftê de jî ğem nake.

Mûstehebên nimêja herdu îdan

1. Mûsteheb e, mirov xwe bi cilên xwe yên sipehî xweşik bike. Lêbelê bila jin bêyî xwe sipehîkirin û bêhna xweş li xwe dayîn biçin nimêja îdê.

2. Bila memûmî pêşwext hazir bibe û di sefên pêşîn de cihê xwe bigre.

Heke ev mûmkin be, bila mirov bi meşa li ser pêyan di rêyekê de biçe nimêjgehê û di rêyeke din de jî vegere male.

3. Lewra ji Cabir [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «dema roja îdê bû, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] rêya xwe diguherand.» (Buxarî rîwayet kiriye)

4. Berî mirov derkeve here nimêja îda fitrê, bila mirov hinek xurmeyan bixwe û bila hijmara wan jî ket be [bila sê, yan jî pênc bin], bila mirov di îda qurbanê de jî tiştekê nexwe heta ji nimêjê venegere.

5. Mûsteheb e, îmam nimêja îda fitrê dereng bixe; ji bo misliman bikare zekata fitrê bide û wê bigihîne mûsteheqên wê; bila nimêja îda qurbanê jî zû eda bike.

Hinek hukmên herdu îdan

1. Berî nimêja îdê û piştî wê jî kirina sunnetan di cihê wê de mekrûh e; lêbelê heke ew di mizgeftê de were edakirin, hingê mirov li cem çûna mizgeftê tehîyyetûl mescidê eda dike.

2. Ji bo mirovê nimêja îdê lê çûbe, yan jî hinek jê lê çûbe, sunnet e, ew wê bi sifetê wê qeza bike; yanî ewê du reket nimêj bi tekbîrên wê eda bike û ewa ku lê çûbe jî, ewê wê bi sifetê wê, wê temam bike.

3. Mirov dê tekbîran bide. Tekbîr bi peyva: “Ellahû ekber, Ellahû ekber, la îlahe îllellah, wellahû ekber, Ellahû ekber, welîllahîl hemd” dibe. Her wiha bi vê peyvê jî: “Ellahû ekber, Ellahû ekber, Ellahû ekber kebîren” dibe.

4. Ji bo mêran deng bilindkirina bi tekbîran sunnet e. Herçî jin in, ewê dengê xwe bi tekbîran nizm bikin; lewra ferman li jinan hatiye kirin ku ew dengê xwe nizm bikin.

5. Tekbîr, di îda fitrê de ji fecra roja îdê heta derketina îmam ji bo nimêjê dest pê dike. Tekbîr, di îda qurbanê de ji sibeha roja Erefê dest pê dike heta dawîya rojên teşrîqan [roja sêzdehan] berdewam dibe. Mirov di rêya çûna nimêjgehê de û di esnaya rûniştina têde jî tekbîran dide heta îmam hazir bibe, mirov di piştî nimêjên ferz yên ku bi cemaetî tên edakirin de, di bazaran û malan û ğeyrên wan de jî tekbîran didin.

Tewcîhat û areste

1. Mûsteheb e, misliman îdê li hev pîroz bikin. Bila ji hev re bibêjin; “Xuda wê ji me û ji te qebûl bike.”

2. Mûsteheb e, mirov bi îdê keyfxweş bibin, vê keyfxweşîya îzhar bikin û misliman îdê li xizmên xwe, li hezkirîyên xwe, li dostên xwe û birayên xwe yên misliman pîroz bike.

3. Îd firsend e, divê mirov wê di gihandina têkilîyên qut yên xwedîtîyê û lihevanîna mirovên nelihev de binirxîne.

4. Di îdê de zîyareta qebran ne meşrû ye; lêbelê ew ji bo keyfxweşî û şadmanîya ku di îdê de heye, mûxalif e.

5. Di herdu îdan de meşrû ye ku mirov li ser malbata xwe hem di cilan de, hem di cihûwar de hem jî di şadkirina wan mesrefê bike. Lewra herdu îd rojên keyfxweşî, dilşadî û rûkenîyê ne.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Bibêje: Ew bes, bi kerem û rehma Ellah e. Vêca bila ew bi wê keyfxweş bibin. Ew, ji wî malê ku dicivînin hîn çêtir e.} [Yûnûs, 58]


6. Ne durust e, di îdan de keyfxweşîya mislimanan tiştên dijberên hînkarîyên îslamê û edebên wê di nav xwe de bigre. Wek nimûne; bila misliman xwe ji tevlîhevbûna mêr û jinan, lixwebirina nimêjan, leystikên heram, guhdarîkirina li stranan û heramên wekî van dûr bigre.



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Nimêja cenaze

Nimêja cenaze



Techîza meyît

Mûsteheb e, hazirbûna li cem wî kesê ku li ser wî elametên mirinê xuya bibin û bi gotina «La îlahe îllellah» di bîrxistina wî. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «La îlahe îllellah li cem mirîyên xwe bibêjin.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Dema ew bimire, bila çavên wî bigrin, wî bi cilekî binixumînin, li techîzkirina wî lezê bike, li ser nimêj bike û wî defin bike.

Hukmê teğsîla meyît, techîza wî û definkirina wî

Teğsîla [şûştina] meyît, kefinkirina wî, hilgirtina wî, nimêjkirina li serê û definkirina wî ferzûl kîfayet e. Dema hinek mirovên ku têrê dikin pê rabin guneh ji ser yên mayî radibe.



Naverok

Hukmê şûştina meyît

1. Divê mirov ji bo şûştina meyît, mirovê pêbawer, emîn, adil û bi hukmên şûştinê zana, bibijêre.

2. Di şûştinê de ewê ku meyît wesîyet kiribe, li pêş tê, paşê yê nêzîktir û yê nêzîk; dema bi hukmê şûştinê zana be. Heke na, ji bilî wî yekî ku bi hukmên şûştinê zana be, dê bikeve pêşîya wî.

3. Mêr mêran dişoyê û jin jî jinan dişon. Mêr dikare jina xwe bişoyê û jin jî dikare mêrê xwe bişoyê. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji Aîşe [Xuda jê razî be] re got: «Zirar nade te, heke tu berî min bimrî, ez te bişom, kefen li te bikim, li ser te nimêj bikim, paşê ez te defin bikim.» (Îbnmace rîwayet kiriye)

Her mêr û jin dikare zarokên kêmî heft-salî bişoyê. Jin û mêrê misliman nikarin kafiran bişon, cenazeyên wan hilgirin, wan kefen bikin û li ser wan nimêj bikin çendan wekî bavê nêzîkê wan be.

4. Şehîdê cengê nayê şûştin, nayê kefenkirin û nimêj li serê nayê kirin; lêbelê ewê di cilên xwe de were definkirin.

5. Dema seqt -ew cenîn e ku berî temambûna wî ji ber dêya diçe, çi kur be, çi keç be- bigihîje çar mehan, ewê were şûştin, kefenkirin û nimêj jî li sere tê kirin. Lewra ew piştî çar mehan dibe însan.

6. Şert e ku ew ava ku meyît pê tê şûştin tahirker be, mûbah be. Divê meyît li cihekî nixumandî were şûştin . Divê ewê ku elaqeya wî bi şûştina meyît re nebe jî neçe wir.

Sifetê şûştina meyît

1. Meyît li ser textê şûştina wî tê danîn. Paşê ewretê wî tê nixumandin, paşê cilên wî jê tên kirin, ew di odeyekê û cihên wekî wê de ji ber çavên mirovan tê nixumandin.

2. Mûsteheb e, mirîşo di halê şûştinê de kincekî li destê xwe bipêçe.

3. Mirîşo serê meyît radike heta nêzîkê rûniştina wî. Paşê destê xwe di ser zikê wî de dibe û tîne û wî diguvêşe, paşê pêşî û paşîya wî paqij dike û necaseta li ser wan dişoyê.

4. Ew nîyeta şûştinê tine û nave wî dibêje.

5. Mirîşo wekî desmêja ji bo nimêjê desmêja meyît digre; lêbelê mezmeze [av li dev werdan] û îstinşaqê [av li poz werdan] na, mesihkirina dev û poz têrê dike.

6. Mirîşo serê meyît û riha wî bi ava sidrê, yan sabûnê yan jî ğeyrê wan bişoyê.

7. Mirîşo pêşî aliyê rastê meyît paşê jî alîyê çepê wî dişoyê, paşê cihê mayî ji bedena wî dişoyê.

8. Mûsteheb e, mirîşo kafûrê bixe nav şûştina paşîyê.

9. Meyît tê ziwakirin.

10. Pora jinê bi kezî tê kirin û ew ji pişt wê ve tên berdan.

Tenbîhat/ hişyarî-pêdan

- Di şûştina meyît de şûştineke tenê wacib e; dema pê paqijbûn hasil bibe. Lêbelê ya mûsteheb, sê şûştin in, çendan paqijbûn hasil bibe jî.

- Dema şûştina meyît ne mûmkin be, ji ber nebûna avê, yan jî bi şewatê û tiştên wekî wê wicûda wî perçe bûbe, bi axê teyemmuma wî tê girtin.

- Ji bo mirovê ku meyîtek şûştibe mûsteheb e, ew jî piştî şûştina meyît xwe jî bişoyê.





Meyît li ser textê şûştina xwe tê danîn



Mirîşo kincekî li destê xwe dipêçe



Mirîşo wekî desmêja jib o nimêjê desmêja meyît digre.



Mirîşo bi ava sidrê ser û riha meyît dişoyê



Mirîşo sere meyît radike



Mirîşo bi destê xwe zextê li zikê meyît dike û wê diguvêşe



Mirîşo rexê rastê meyît paşê jî rexê çepê wî dişoyê



Mirîşo meyît ziwa dike

Kefenkirina meyît

1. Sunnet e, mêr di sê lefaîfên sipî yên ji pembû, ji cilan de were kefenkirin ku ew çermê wî nedin xuyakirin, temamê bedena wî binixumînin û ne zehf biha-giran bin.

Sunnet e, jin di pênc cilên ji pembû de were definkirin. Ewê îzarek, xumarek, qemîsek û du lefaîf bin.

Sunnet e, zarok jî di cileke tenê de were kefenkirin. Lêbelê mûbah e, ew di sê cilan de jî were definkirin. Keça biçûk jî di qemîs û du lefaîfan de tê kefenkirin.

2. Meyît di sê lefaîfan de tê kefenkirin û buxûr jî lê tê kirin. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema hûn buxûrê 240li meyît bikin, wê bi kit bikin.» (Îbnhibban rîwayet kiriye)

3. Ev lefaîf tên takekirin û hinek ji wan li ser hinekan tên danîn û li navbera wan bêhna xweş her wekî enber, kafûr û miskê û yên wekî wan tên kirin. Lêbelê heke meyît di îhraman de be, buxûr li cilên wî nayê kirin û bêhna xweş li wî nayê kirin. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Bêhna xweş lê nekin» (Buxarî rîwayet kiriye)



Bêhna xweş li ser lefaîfan danîn

4. Meyît li ser van lefaîfan bi ser piştê de tê danîn. Paşê alîyê wî yê bilind ji terefê çepê bi ser alîyê rastê vet ê vegerandin. Paşê terefê rastê bi ser terefê çepê de tê vegerandin. Paşê cara duduyan û cara sisêyan jî wiha tê kirin. Paşê ya zêde li cem sere wî tê danîn, paşê ew bi bendekî tê girêdan ji bo ji hev veneqete û li cem definkirinê ew bend tê vekirin.



Mirî bi ser piştê vê tê danîn

5. Di kefenkirinê de, ya wacib; nixumandina temamê bedenê ye. Heke ji cileke kurt pê ve tiştеke din peyda nebe ku ew jî têra temamê bedenê neke, sere wî tê nixumandin û hinek ji îzxîrê243 jî li ser herdu lingên wî tê danîn.

Lewra Xebbab di qisseya kefenkirina Mûseb kurê Ûmeyr [Xuda jê razî be] de dibêje; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman li me kir ku em serê wî binixumînin û em hinekê ji îzxîrê jî deynin ser lingên wî.» (Buxarî rîwayet kiriye)



Ni mandina temamê bedenê



6. Ewê ku di îhraman de miribe, ewê di îhramên xwe de were kefenkirin û serê îhramwergirê mêr nayê nixumandin. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Wî bi av û sidrê bişon, wî di du cilan de kefen bikin, henûtê nexin nav kefenê wî û serê wî bi terhîyê nenixumînin. Lewra ew roja qîyametê mûlebbî» (Buxarî rîwayet kiriye) [bi lebbeyke gotinê] tê şandin.”

Nimêja cenaze

Ruknên nimêja cenaze

1. Ewê ku karibe divê wê jipêya eda bike.

2. Çar tekbîran tîne.

3. Xwendina fatîhê ye.

4. Selewatdayîna li ser pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] e.

5. Dûakirina ji mirî re ye.

6. Tertîb [li pey hev edakirina van ruknan] e.

7. Selamdayîn e.

Sunnetên nimêja cenaze

1. Eûzû berî xwendina fatîhê ye.

2. Dûakirina hem ji xwe re hem jî ji mislimanan re ye.

3. Bi dizîkahî xwendin e [a fatîhê û dûa ye].

4. Zehfkirina sefan e; bila sefan bixe sê û hîn bêhtir jî.

Sifetê nimêja cenaze

Îmam li ber serê meyît radiweste; heke ew mêr be. Ew li cem nîvê meyît radiweste; heke ew jin be. Memûmî jî li pişt imam radiwestin, eynî wekî nimêjên din, paşê ew çar tekbîran tînin.

Tefsîlata wan jî wiha ye:

1. Ew tekbîra yekê dide, ew tekbîra îhramê ye. Ew eûzûyê dibêje, bismillah dibêje, dûayên îstiftahê nabêje, paşê fatîhê dixwîne.

2. Ew tekbîra duduyan tine, selewatan li ser pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dide, wekî sifetê nimêja li serê de di tehîyyata dawîyê de.

3. Ew tekbîra sisêyan tîne, ew hem ji meyît re, hem ji xwe re hem jî ji mislimanan re dûa dike.

Di vê xusûsê de ev dûa heye: «Xudayê min! Lê bibûre, rehmê lê bike û wî efû bike. Qedrê mêvantîya wî bigre, cihê wî fereh bike, wî bi av, berf û teyrokê bişo. Wî ji xetayan paqij bike, wekî kut e cila sipî ji qirêjê paqij kiriye. Xanîyekî ji xanîyê wî çêtir û malbateke ji malbata wî çêtir û jineke ji jina wî çêtir bide wî. Wî bixe cennetê û wî ji ezabê qebrê û ezabê êgir biparêze.» (Mûslim rîwayet kiriye) Dema meyît jinê be, ewê di dûayan de cînavka jinê bikarbîne.

Heke meyît zarok be, yan jî jiberçû be, bila mirov bibêje: «Xudayê min! Wî ji dê-bavên wî re bixe zexîre, pêşeçû, ecr, şefaetkar û arzû-meqbûl» (Buxarî rîwayet kiriye)

“Xudayê min! Pê şehînên wan giran bike, pê ecra wan mezin bike, wî bigihîne salihê selefê mûmînan û wî bixe ber kefaleta Îbrahîm û bi rehma xwe wî ji ezabê cehîmê biparêze.”

4. Ew tekbîra çaran tîne û ew piştî wê piçekê radiweste, paşê ew selameke tenê dide rexê rastê xwe yan jî du selaman dide.





Hilgirtina meyît, bi oğirkirina wî û definkirina wî

Dema nimêja li ser meyît bi dawî bibe, sunnet e, mirov lezê lê bike, wî hilgire û bibe qebra wî. Mûsteheb e, ewên ku li pey cenaze diçin di hilgirtina wî de beşdar bibin. Sunnet e, ewê ku meyît dixe qebra wî, bibêje; «Bismillah, we ela millet resûlûllah» (Tirmizî rîwayet kiriye) û ewê wî bixe bergorê 254li ser tenişta wî ya rastê û berê wî bide rexê qiblê, paşê ewê bendên kefen veke, paşê jî serdevê bergorê bi herîyê binixumîne.

Sunnet e, ewê beşdarî define bibe, çengên xwe tije ax bike û wê sê caran bavêje ser qebrê. Paşê ew qebrê bi axê binixumîne û ew ji erdê bi qasî bostekê were rakirin û ziğur û kevir bên danîn, av li serê were reşandin û ğem nake mirov ji bo elametê qebrê kêlekê yan jî du kêlan di ber serî û pêyê wî de biçikîne.


Beşdarbûn di hilgirtina cenaze de


Lehd [bergor]


Ew çengên xwe ji axê tije dike û diavêje ser qebrê


Elamet li ser qebrê

Tezîye

Tezîye'ya ehlê meyît mûsteheb e. Lewra di tezîyê de teselîkirina wan, dilxweş-kirina wan, sivikkirina mûsîbeta wan û teşwîqkirina wan li ser sebrê heye.

Tezîye bi her peyva ku wê mebestê îfade bike, çêdibe. Her wekî ew bibêje; «Xuda çi bistîne û çi bide, jê re heye, her tişt li cem wî bi ecelekî diyarkirî ye. Bila ew sebr bike û xêra xwe hesab bike.» (Îbnmace rîwayet kiriye)

Heke ew bibêje: «Xuda, ecra te mezin bike, tezîya te sipehî bike û li meyîtê te bibûre.» Her wiha cumleyên wiha ne.

Derketina jinan bi cenazeyan re

Derketina jinan bi cenazeyan re karekî ne rewa ye. Lewra ji Ummû-etîyye [Xuda jê razî be] sabit bûye, gotiye; «Li pey çûna cenazeyan li me hatibû qedeğekirin; lêbelê zehf li ser me israr nedihat kirin.» (Îbnmace rîwayet kiriye)

Zîyareta qebran

Zîyareta qebran, bi qesda îbret-girtin û dûakirin ji mirîyan re, ji mêran re sunnet e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Min zîyareta qebran li we qedeğe kiribû, ji niha û pê de wan zîyaret bikin; lewra ew axretê tîne bîra we.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Li cem zîyaretkirina qebran ev dûa warid bûne: «Selam li ser we, gelî mala qewmê mûmînan! Xuda hez bike, em jî digihin we.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Yan jî: «Selam li ser ehlê xanîyên mûmînan û mislimanan, rehma Xuda li yên berî me çûne û li yên piştî me bên jî be. Xuda hez bike, em jî digihin we.» (Mûslim rîwayet kiriye)

«Ez ji me û we re afîyetê dixwazim.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Heke ew ji wan re ji bo rehm û meğfîretê û yên wekî wan dûa bike, ew jî durust e.

Mehzûrên [qedeğeyên] cenazeyan

1. Şîn kişandin, qîrewîrkirin, xuyakirina kederê û hêrsbûna ji qeza û qedera Xuda qedeğe ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Jina ku dixe qîrewîr, dema ew berî mirina xwe tobe neke, roja qiyametê ew radibe û kirasekî ji qetranê li ser wê heye.» (Mûslim rîwayet kiriye)

2. Qelaştina cilan, kulm li gurmikên xwe dan, hawar-kirin û kişandin û qusandina porê qedeğe ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî li gurmikên xwe bide, berîkên xwe biqelêşe û gazî û hawara cahilîyetê bike, ew ne ji me ye» (Mûslim rîwayet kiriye)

3. Rohnîkirina qebran qedeğe ye.

Lewra ji Îbnebbas [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] lenet li wan jinan anîye ku qebran zîyaret bikin, qebran bixin mizgeft û wan rohnî bikin» (Tirmizî rîwayet kiriye).

4. Rûniştina li ser qebran, boyaxkirina wan û avahî-çêkirin li ser wan qedeğe ye.

Lewra ji Cabir [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi dêsê çêkirina qebran, rûniştina li ser wan û avahî çêkirina li ser wan qedeğe ye» (Mûslim rîwayet kiriye)

5. Teberruka bi qebran, tewafa wan û gazîkirina mirîyan qedeğe ye. Ev şirk e; heke bawer bike ku ew feyde didin wî yan jî zirarê ji ser wî radikin. Lewra ji bilî Xuda ti kesî din kar û zirarê nade.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Bibêje: Ez, ji tişta ku Ellah xwestibe pê ve nikarim feydeyekê bidim xwe û ti zerarê ji ser xwe bidim alî} [Eraf, 188]

6. Definkirina mirîyan di mizgeftan de, yan avakirina mizgeftan li ser qebran, yan jî nimêjkirina li ber qebran qedeğe ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Laneta Xuda li cihû û krîstîyanan be, wan qebrên pêğemberên xwe ji xwe re kirin mizgeft!!» (Buxarî rîwayet kiriye)



Rohnîkirina qebran û boyax kirina wan ne durust e



Tewafa qebran ne durust e

Hinek ji hukmên cenazeyan

1. Ewê ku nimêja li ser cenaze lê çûbe, ew dikare berî definkirinê û piştî definkirinê jî li cem qebrê li serê nimêj bike.

Lewra di bara qisseya wê jina ku mizgeft paqij dikir de ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] sabit bûye kul i ser qebra wê li serê nimêj kiriye. (Buxarî rîwayet kiriye)

2. Mûsteheb e, xwarin ji ehlê meyît re were hazirkirin. Lewra ew bi mûsîbeta xwe lebikîne, ji hazirkirina xwarinê meşğûl bûne.

Lewra hatiye rîwayetkirin ku li cem ehlê Cafer mirovek miribû, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotibû: «Xwarinekê ji ehlê Cafer re hazir bikin. Lewra karek hatiye serê wan; ew ji xwarinê meşğûl kirine.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

3. Girî li ser meyît, bê ğeyd, bê deng-bilindkirin û bê kul û ğem durust e.

Lewra dema kurê wî Îbrahîm miribû, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotibû: «Hêstir ji çavên me dibarin, dilê me ğemgîn dibe û ji bilî tişta ku Xudayê me pê razî bibe, em tişteke din nabêjin, hey Îbrahîm, bi rastî em bi cudabûna te ğemgîn in!» (Buxarî rîwayet kiriye)

4. Şehîdê cengê di cilên xwe yên ku têde şehîd ketî de tê kefenkirin, nayê şûştin û nimêj li ser nayê kirin.

Lewra sabit bûye ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman kiribû; bila şehîdên Uhudê bi xwînên xwe ve werin definkirin û ew nehatin şûştin. (Buxarî rîwayet kiriye).

5. Dema ewê ku îhramên hec û ûmrê li xwe kirin, bimre, ew tê şûştin, bêhna xweş lê nayê kirin, serê wî nayê nixumandin û li serê nimêj tê kirin.

Lewra sabit bûye ku dema zilamek di îhramên hecê de miribû, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di bara wî de gotibû: «Wî bi av û sidrê bişon, wî bi du cilan kefen bikin, henûtê nexin nav kefenê wî, bi terhîyê serê wî nenixumînin. Lewra ew roja qîyametê bi lebbeyke gotin tê şandin.»



Hazirkirina xwarinê ji ehlê meyît re


Şehîd di cilên xwe de tê kefenkirin

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review

Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro

Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Fezîleta rojîyê û hukmê wê

1 Fezîleta rojîyê û hukmê wê

Naverok

Rojî, di ferhengê de;
Xwe girtin û dûrkirina ji tiştekê ye

Rojî, di navlêka fiqhê de;
Ji vedana fecrê heta roj biçe ava, xwe girtina ji xwarin, vexwarin û çûyîna nivînê, bi niyeta îbadetkirina ji Xuda Teala re ye.



Fezîleta rojîyê

Xuda di bara fezîleta rojîyê de dibêje: {Gelî yên ku îman anîne! Rojîgirtin, wekî ku li ser ummetên beriya we hetibû ferzkirin, her wisa li ser we jî hatiye ferzkirin; da ku hûn xwe ji sûcan biparêzin. Rojî girtin çend rojên bijimar in. Kî ji we nexweş be, yan jî rêwî be, bila bi qasî rojên ku xwariye, di rojên din de rojî bigire. Ewên ku [ji ber kalîtî û nexweşiyê] nikarin rojî bigirin, divê ji ber her rojekê ve fîdyekê; xwarina belengazekî bidinê. Kî bi dilê xwe zêdetir bide, ew jê re çêtir e. Heke hûn zanibin, rojî-girtin ji we re çêtir e. Meha Remezanê, ew meh e ku têde Qur'an hatiye xwarê; ewa ku ayetên wê ji bo mirovan rêber in û ji bo cudakirina heqîyê ji batilî delîlên eşkere ne. Naxwe kî ji we hazirî wê mehê bibe, bila rojîya wê bigre û kî nexweş be, yan jî rêwî be, bila bi qasî wan rojên ku di wan de rojî negirtibe, di rojên din de rojî bigre. Ellah rehetiya we dixwaze; ji bo we zehmetiyê naxwaze, da ku hûn jimara Remazanê temam bikin û ji ber ku wî hûn anîne ser rêya rast û durust, Ellah mezin bidêrin; da ku hûn spasiya wî bikin.} [Beqere, 183-185]

Ji rojîyê re fezîleteke mezin, sewabeke zehf û qat bi qat zêde heye. Xuda ji bo şeref-dan û mezinkirina wê gotiye, rojî ji bo min e.

Lewra di hedîsa qudsî de ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Her emelê kurê Adem jê re tê zêdekirin, qencîyek bi dehan e; heta bi heftsedan zêde dibe. Xuda [ezzewecelle] gotiye: 'Lêbelê rojî na, lewra ew ji bo min e, ezê mûkafata wê bidim; lewra ew şehweta xwe û xwarina xwe ji bo min terk dike.' Ji rojîyê re du keyfxweşî hene: Keyfxweşîyek li cem îftarê ye û keyfxweşîyek jî li cem çavpêketa Xudayê wî ye. Qemûşka devê wî li cem Xuda ji bêhna miskê xweştir e.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Hikmeta meşrûîyeta rojîyê

Bicihkirina teqwatîya Xuda bi bersivdana fermana wî û xwe stûxwehrkirina ji şerîeta wî re ye. Lewra Xuda [ezzewecelle] gotiye: {Hûn xwe ji sûcan biparêzin.} [Beqere, 183]

Xwe hînkirina sebrê, xurtkirina îradeya xwe di serkeftina li hemberî şehwetan de ye.

Ji xwe re bi adetkirina qencîyê, şefqetkirina li mûhtac û feqîran e. Lewra dema mirov birçîbûnê te'am bike, dil û hesta mirov li hemberî birayên xwe yên mûhtac nerm û tenik dibe.

Bicihkirina rehetîya bedenê û sağlemkirina wê bi rojîyê ye.

Hukmê rojîyê

Rojîya ku Xuda Teala ew meşrû kiriye, dibe du beş:

1. Rojîya wacib e

Ew jî du texlît e:

a- Ew rojî ye ku Xuda ew ji destpêkê de li ser evdê xwe wacib kiriye. Ew jî rojîya remezanê ye. Rojîya remezanê ruknek ji ruknên Îslamê ye.

b- Ew rojî ye ku evd bi xwe wê li ser xwe wacib dike, wekî rojîya nezr û rojîya kefaretan e.

2. Rojîya mûsteheb e

Ew jî her rojî ye ku Xuda hez dike evd wê bigre. Her wekî rojîya duşem û pêşemê û rojîya sê rojan ji her mehê, rojîya aşûrayê, rojîya dehekên zîlhiccê û rojîya Erefê ye.

Şertên wacibbûna rojîyê

1. Îslam [mislimanbûn] e; ew li ser yê kafir ne wacib e.

2. Baliğbûn e. Ew li ser biçûkan ne wacib e. Lêbelê dema taqeta wan jê re hebe, mirov ji wan re dibêje; rojî bigrin da ku girtina wê ji wan re bibe şêwe û adet.

3. Biaqilbûn e; ew li ser yê dîn ne wacib e.

4. Karîn e; ew li ser yê nikaribe bigre, ne wacib e.

Rojîya Remezanê

Rojîya Remezanê, ruknek ji ruknên Îslamê û ferzeke esasî ye, Xuda ew li ser evdên xwe ferz kiriye:

Lewra Xuda Teala dibêje: {Gelî yên ku îman anîne! Rojîgirtin, wekî ku li ser ummetên beriya we hetibû ferzkirin, her wisa li ser we jî hatiye ferzkirin; da ku hûn xwe ji sûcan biparêzin.} [Beqere, 183]

Hem jî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Îslam, li ser pênc esasan hatiye avakirin» (Buxarî rîwayet kiriye) û wî «Rojîya remezanê» jî yek ji wan vegot.

Hinek ji fezîletên Remezanê

1. Rojî û îbadetê remezanê, gunehên derbas bûne didin efûkirin. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî rojiya Remezanê bigre; îmana wî pê hebe û sewaba xwe ji Xuda hêvî bike, gunehê wî yên ku derbas bûne, tên efûkirin.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine) Dîsa pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî, Remezanê bi ibadet derbas bike; îmana wî pê hebe û sewaba xwe ji Xuda hêvî bike, jê re gunehên wî yên ku derbas bûne, tên efûkirin.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

2. Kî rabe "şeva qedrê" bi ibadet derbas bike, gunehên wî yên ku derbas bûne, tên efûkirin. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî remezanê bigre; îmana wî pê hebe û ew sewaba xwe ji Xuda hêvî bike, jê re gunehên wî yên ku derbas bûne, tên efûkirin. Kî, rabe "şeva qedrê" bi ibadet derbas bike; îmana wî pê hebe û ew sewaba xwe ji Xuda hêvî bike, jê re gunehên wî yên ku derbas bûne, tên efûkirin.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

3. Ûmreyeke di remezanê de, bi qasî heceke digel pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re xwedî sewab dibe. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Ûmreyeke di remezanê de bi qasî heceke digel min xwedî sewab dibe.» (Mûslim rîwayet kiriye)

4. Meha Remezanê, têde derîyên cennetê tên vekirin, derîyên cehennemê tên girtin, şeytan tên girêdan û nefs jî berê xwe dide ser kirina xêrê. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema Remezan werê, derîyên asîmanî tên vekirin, derîyên cehennemê tên girtin û şeytan jî bi zincîran tên girêdan.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine) Naxwe divê misliman bilezûbez tobe bike, xwe ji kirina guneh û mûnkeran dûr bike û berê xwe bide Xuda Teala.

5. Meha Remezanê meha Qur'anê ye. Naxwe divê mirov têde Qur'anê zehf zehf bixwîne. Lewra Xuda [ezzewecelle] gotiye: {Meha Remezanê, ew meh e ku têde Qur'an hatiye xwarê; ewa ku ayetên wê ji bo mirovan rêber in û ji bo cudakirina heqîyê ji batilî jî delîlên eşkere ne.} [Beqere, 185]

6. Meha Remezanê meha comerdî, înfaq û sedeqa ye. Lewra ji Îbn Ebbas [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji bo kirina qencîyê ji hemû mirovan comerdtir bû. Comerdîya wî di remezanê de ji comerdîya wî ya di mehên din tevan de zehftir dibû. Cibraîl [silavên Xuda lê bin] her salê di Remezanê de dihat cem wî heta ew xilas dibû; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] Qur'an lê erz dikir. Dema Cibraîl [silavên Xuda lê bin] çav liv î diket pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji bo kirina qencîyê ji bayê bivîzevîz jî comerdtir dibû.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)



Hatina Remezanê bi çi tesbît dibe?

Hatina meha remezanê bi dîtina hîlalê [heyvê] tesbît dibe. Dema heyv di piştî çûn-ava ya tavê ya roja bîst û nehê şabanê de werê dîtin, bi wê têgotın meha remezanê hatiye. Dema piştî çûn-avaya tavê di şeva sihê meha şabanê de heyv neyê dîtin, yan jî ewr, yan toz, yan jî dû ji dîtina wê re bibe asteng, hingê mirov şabanê sih roj temam dike.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Ji bo dîtina wê rojî bigrin û ji bo dîtina wê bifitrin jî; heke meh ji we ve xuya nebe, wê sih roj bijimêrin.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Rojî negirtina di Remezanê de

Rojî negirtina di Remezanê de heram e, yek ji gunehên mezintirîn e. Kî, bê uzr rojekê bifitre û tobe neke, rojîya demê tevî jî cihê wê nagire, çendan ew temamê demê rojî bigre jî.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî, bê ruxseteke ku Xuda destûra wî dabe, rojekê ji remezanê bifitre, rojî-girtina temamê demê jî ji ber qezakirina wê ve çênabe.» (Ebû Dawud rîwayet kiriye)

Cezayê rojî negirtinê mezin e.

Lewra ji Ebû-umame el-Bahilî [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; min ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bihîst ku digot: «Demekê ez razayî bûm, du zilam hatin cem min bi nîvê herdu zendên min girtin. Ez anîm ber çîyayekî asê û ji min re gotin; hilgere jorê. Min got; ez nikarim hilgerim serê. Ji min re gotin; emê wê ji te re hêsan bikin. Ez jî hilgerîyam jorê heta ez gihame nîvê çîyê, ji nişka ve hinek dengên dijwar hatin min, min got; ev dengên ha çi ne? Ji min re gotin; ev qîrewîra ehlê êgir e. Paşê ez birim, min ji nişka ve xwe li cem komek mirov dît, bi lingên xwe yên paş ve daleqandî bûn, gurmikên wan qelaştî bûn, ji gurmikên wan jî xwîn dihat. Pêğemberê Xuda

[dirûd û silavên Xuda lê bin] dibêje, min ji wan re got; evên ha kî ne? Dibêje, ji min re gotin; evên ha, ew kes in ku bê ûzir difitrin.» (Îbn Hibban rîwayet kiriye.)

Halê selefan di rojîyê de

Nimûneya selefan Mûhemmed [dirûd û silavên Xuda lê bin] e:

Îbn Qeyyîm [rehma Xuda lê be] gotiye: «Şêwe û rêça pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di meha remezanê de ev bû: Wî her cûr ji îbadetan dikirin. Cibraîl [silavên Xuda lê bin] di remezanê de dersa Qur'anê didayê. Dema Cibraîl [silavên Xuda lê bin] lı bale bû, ew di kirina xêrê de ji bayê bivîzevîz jî comerdtir bû. Ew ji hemû mirovan comerdtir bû. Ew di remezanê de jî ji hemû wextên din comerdtir bû; wî têde zehf sedeqe didan, qencî dikirin, xwendina Qur'anê pir dikir, nimêj, zikr û îtîkaf dikirin. Wî di remezanê de hinek îbadetên taybetî dikirin ku wî ew di ti mehên din de nedikirin. Heta wî carina têde rojîya xwe bi hev û din ve dikir da ku saetên şeva xwe û naveroja xwe bi îbadetê tije bike." (Zadul Mead Fî hedyî Xeyrîl Îbad; 2/30)

Selef û Qur'an di remezanê de

Di wextên bi fezîlet de her wekî meha remezanê, bi taybetî di wan şevên ku şeva qedrê di wan de tê xwestin zehf xwendina Qur'anê û nirxandina zemanî mûsteheb e.

Ha va ye, îmam Buxarî [rehma Xuda lê be] dema dibû ewwelê şeva meha remezanê hevalên wî lê kom dibûn. Wî li pêşîya wan nimêj dikir û wî di her reketê de jî bîst ayet dixwendin her wiha Qur'an xetim dikir. Wî di seherê de ji nîvê Qur'anê heta bi sêyeka wê dixwend, û wî her şevê li dev îftarê Qur'an xetim dikir û wî digot li cem wetimkirinê dûa qebûl dibin. (Sifetus-Sefwe; 4/170)

Ji îmam Şafiî hatiye rîwayetkirin; wî ji bilî ayetên ku di nimêjê de dixwendin, di remezanê de tam şêst xetime dixwendin. (Sifetus-Sefwe; 2/255)

Selef û rabûna di remezanê de

Ji Saib kurê Yezîd hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Ew di serdema Ûmer kurê Xettab [Xuda jê razî be] de di meha remezanê de bi kirina bîst reketan ibadet dikirin û wan bi sedan ayet dixwendin. Wan di serdema Osman kurê Effan [Xuda jê razî be] de jî ji ber kerixîna ji rabûnê birha xwe didan ser kopalên xwe.» (Beyheqî ew di Sunenul Kubra ya xwe de; 2/699 de rîwayet kiriye)

Ji Ebdûllah kurê Ebûbekr [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; min ji bavê xwe bihîst ku digot; «Me di remezanê de silav dida û me ji tirsa vedana fecrê lez dikir; xwarina xizmetkaran zû dida wan.»(Mûweteu Malik t. Ebdul-Baqî; 1/116)

Ji Nafî ew jî ji Ebdûllah kurê Ûmer hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Ew di meha remezanê de li mala xwe ibadet dikir, heta dema însan ji mizgeftê vedigerîyan malê, wî radihişt meterê xwe yê avê, paşê ji mala xwe derdiket, diçû mizgefta pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin], paşê ew jê dernediket heta têde nimêja sibehê eda dikir.» (Beyheqî ew di Sunenul Kubra ya xwe de; 2/696 de rîwayet kiriye)




Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec





Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Ruknên rojîyê, mûstehebên wê, mekrûhên wê û mûfsîdatên wê

2 Ruknên rojîyê, mûbahên wê, mûstehebên wê, mekrûhên wê û mufsîdatên wê

Naverok

Ruknên rojîyê

Ruknê yekê; xwe girtina ji tiştên ku îftar bi wan çêdibe; ji vedana fecrê heta roj biçe ava ye.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Heta ji we re tayê sipî ji tayê reş diyar bibe, bixwin û vexwin. Paşê rojiya xwe heta şev bidomînin} [Beqere, 187]

Ji tayê sipî û tayê reş meqsûd; sipîtahîya naverojê û reşahîya şevê ye.

Ruknê duduyan; nîyet e.

Yanî rojîgir dê bi vê xwe girtina ji tiştên ku îftar pê çêdibe, îbadetê Xuda [ezzewecelle] qesd bike.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Emel bes bi nîyetan e. Kî, nîyeta çi kiribe, bes ew jê re heye.» (Buxarî û Mûslim ew rîwayet kirine)

Nîyet di rojîyê de

Bi şev nîyet anîna li rojîyê wacib e; dema ev rojî wacib be. Lêbelê dema ew [sunnet be, ne ferz] be, hingê bi şev anîna nîyetê ne wacib e. Ji xwe durust e mirov, di naverojê de jî nîyetê li rojîya nafîle bîne; heke mirov ya ku pê îftar çêdibe, nekiribe. Lewra ji dêya mûmînan Aîşe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] rojekê hate malê, got; «Ma ti xwarinek li dev we heye?" Me got; na, wî got: "Naxwe ez bi rojî me.» (Mûslim ew rîwayet kiriye)

Mûbahên rojîyê

1. Xwe şûştin û rûniştin di nav avê de ji bo xwe hînik-kirinê ye.

2. Daqurpandina tif û belğemê ye.

3. Te'amkirina xwarinê bi zimanî tenê ye; bi şertê ku tiştek ji wê jî nekeve qirikê.

4. Bêhnkirina bêhn û bêhn-xweşîyên hewayê ye.

Îstîmala [bikaranîna] sêwakê ji bo yê rojîgir

Îstîmalkirina sêwakê di her wextekî de meşrû û rewa ye, hîç ferq nake; çi ew berî nîvro be, çi jî piştî nîvro be, çi sêwak ter be, çi jî ew hişk be. Lêbelê heke sêwak ter be, bila ew miqate be, ji bo tiştek jê negihîje qirika wî; lewra ew pê difitire!



Mûstehebên rojîyê

1. Paşîv-xwarin û dereng xistina wê heta berî ezana fecrê ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Rabin paşîvê; lewra di paşîvê de bereket heye.» (Ehmed rîwayet kiriye)

Paşîv bi zehf xwarina xwarinê û kêm xwarina wê jî çêdibe; çendan ew qurtek av be jî.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Paşîv, xwarina wê bereket e, hûn terka wê nekin; çendan yek ji we qurtek av jî vexwe. Lewra Xuda li paşîv-xweran tê rehmê û melaîketên wî jî efûya gunehên wan dixwazin.» (Ehmed rîwayet kiriye)

Texîrkirina paşîvê mûsteheb e.

Lewra ji Zeyd kurê Sabit [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Em bi pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re rabûn paşîvê, paşê em rabûne nimêjê. Enes kurê Malik dibêje; min jê re got: Di navbera paşîv û nimêjê de çi qeder zeman hebû? Sabit jê re got; bi qasî xwendina pêncî ayetan zeman hebû.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Av - vexwarin di esnaya ezanê de

Dema rojîgir dengê ezanê bibihîze û vexwarina wî jî di destê wî de be, hingê ew dikare wê vexwe heta xilas bibe.

Lewra ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Dema yek ji we ezanê bibihîze û firağ li ser destê wî be, heta ew îhtiyaca xwe jê neqedîne, bila wê ji destê xwe nedeyne.» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

Aliman ev hedîs, bi "Şeka di hilatina fecrê de" mane kirine. Lêbelê heke rojîgir ji hilatina fecrê emîn be, hingê ew nikare xwarinê bixwe û avê vexwe. Heke digel ku ji hilatina fecrê emîn be jî dîsa ew tiştekê bixwe, yan jî vexwe, hingê rojîya wî betal dibe û divê ew wê qeza jî bike.

2. Lezkirina li fitarê ye

Ji bo rojîgirî, kengê ew ji çûna ava ya rojê emîn bibe, lezkirina li fitarê mûsteheb e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Însan her di xêrê de ne, heta ew lezê li fitarê bikin.» (Ebû Dawud rîwayet kiriye)

Fitarkirin bi xurmeyên ter mûsteheb e. Heke xurmeyên ter nebin, bila mirov bi xurmeyên hişk fitara xwe bike; bila xurmeyên fitarê kit bin. Heke xurme peyda nebin, bila mirov bi çend qurt av fitara xwe bike.

Lewra di vê xusûsê de hedîsa Enes kurê Malik [Xuda jê razî be] heye. Ew dibêje: «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] berî nimêj bike li ser xurmeyên ter difitirî. Heke xurmeyên ter nebûna, ew bi xurmeyên hişk difitirî. Heke xurmeyên hişk jî nebûna, ew bi çend qurt av difitirî.» (Tirmizî rîwayet kiriye) Heke tiştek bi dest wî nekeve, bila bi dilê xwe nîyeta fitarê bîne û ev jî têra wî dike.

3. Dûa li cem fitarê

Lewra sabit bûye ku dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] difitirî, wiha digot: «Tîbûn çû, ra şil bûn, Xuda hez bike ecr jî sabit bû.» (Ebû Dawud rîwayet kiriye)

Dîsa pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Ji bo rojîgirî li cem fitara wî dûayek heye, ew her qebûl dibe.» (Îbn Mace rîwayet kiriye)

Ewê ku bi şaşî bifitre, [rojîya wî çawa dibe?]

Dema rojîgir bi gumana ku roj çûye ava, yan jî fecrê nevedaye, xwarinê bixwe, paşê xîlafa gumana wî jê re xuya bibe, hingê qezakirin li ser wî ne wacib e.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Di gazîya ku hûn şaş bikin de; ji we re ti guneh nîn e.} [Ehzab, 5]

Hem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî gotiye: «Xuda, ji ser ummeta min şaşî, jibîrkirin û tişta ku kotekî li wan were kirin, rakiriye.» (Îbnmace ew rîwayet kiriye)

4. Terka leğiw û çêran

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema yek ji we bi rojî be, bila çêran neke û bila bi kesî re pev jî neçe, heke yek çêrî wî bike, yan jî şerrê wî bike, bila ew dîsa bibêje: Ez mirovekî bi rojî me!» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Dîsa pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî, gotina derew û emelkirina pê terk neke, îhtiyaca Xuda pê nîn e ku ew terka xwarina xwe û vexwarina xwe bike.» (Ebû Dawud rîwayet kiriye)

5. Zehfkirina îbadetan

Her wekî xwendina Qur'anê, zikrê Xuda, nimêja Terawîhan, rabûna şevê, rabûna şeva qedrê, sunnetên Rewatib, sedeqe, comerdî û înfaqkirina di rêya xêrê de û îftarkirina rojîgiran û çûna ûmrê. Lewra hesenatên di remezanê de sewaba wan qatbiqat e.

Lewra ji Îbnebbas [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye: «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji hemû mirovan comerdtir bû. Dema Cibraîl [silavên Xuda lê bin] di Remezanê de dihat balê, ew ji hemû wextên din comerdtir bû. Cibraîl [silavên Xuda lê bin] di her şeva remezanê de dihat balê, dersa Qur'anê jê re vedigot. Dema Cibraîl [silavên Xuda lê bin] dihat bale ew ji bo kirina qencîyê ji bayê bivîzevîz jî comerdtir bû.» (Buxarî rîwayet kiriye)

6. Xwe dana îbadetê, bi taybetî jî di deh rojên dawîn yê remezanê de

Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Dema deh rojên dawîyê yên remezanê dihatin, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] cilên xwe li xwe dişidandin, şeva xwe sağ dikir û ehlê xwe jî şîyar dikirin.» (Buxarî rîwayet kiriye.)



Mekrûhên rojîyê

1. Zêdahîyê di mezmeze [av li dev werdan] û îstinşaqê [av kişandina poz û jê derxistin û avêtin] de ye

Ev jî, ji ber ku tirs heye, av biçe nava wî. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Di poz werdanê de zêdahîyê bike; lêbelê ku tu bi rojî bî, têde zêdahîyê neke!» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

2. Ramûsana bi şehwet e

Ji bo rojîgirî, maçkirin û ramisîna jinê mekrûh e; heke ew ji xwe bitirse ku menî jê were, yan jî şehweta wî pê rabe. Divê rojîgir xwe ji her tiştê ku şehweta wî radike û wê dixe bizavê, dûr bigre. Lêbelê heke ew ji xwe emîn be ku rojîya wî xirab nabe, hingê maçkirin ğem nake.

Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi rojî hevserên xwe maç dikir û çermê xwe jî digihand çermê wan, wî ji we tevan bêhtir bi xwe dikarîbû; şehweta xwe bigre.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Çerm bi hev û din gihandin ji bo yê ciwan mekrûh e; ne ji bo yê kal.

Lewra ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Zilamekî ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] pirs kir; gihandina çermê mêr bi çermê jinê ve ji bo yê bi rojî çawa ye? Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji wî re ruxset da. Zilamekî din hate cemê û eynî pirs jê kir, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew li wî qedeğe kir. Ji me ve xuya bû, ewê ku ruxset jê re dayî kal bû, ewê ku ew lê qedeğekirî jî ciwan bû» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

Mûfsîdatên rojîyê

1. Di naveroja meha Remezanê de xwarin û vexwarina bi qesd e.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Heta ji we re tayê sipî ji tayê reş diyar bibe, bixwin û vexwin. Paşê rojiya xwe heta şevê bidomînin} [Beqere, 187]



> **Fitara ji bo kar û xebatê**
>
> Ew mirovên ku di firin û karên giran û zehmet de kar dikin ji bo wan fitar û rojî negirtin, ne mûbah e; lewra ew jî her wekî dîgerên xwe divê rojî bigrin.

Hişyarî!

Ew mirovê xwe ji bîr bike ku bi rojî ye, ji lewma tiştekê bixwe, yan jî vexwe, rojîya wî sehîh e. Lêbelê dema hate bîra wî divê ew di cih de xwe ji xwarin û vexwarinê bigre.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî bi rojî be û xwe ji bîr bike, ji lewma bixwe, yan jî vexwe, bila ew rojîya xwe temam bike. Lewra Xuda xwarin daye wî û ew av daye.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Rojî, bi her tiştê ku ji rêya dev û bêhvilê digihîje nava mirov, xirab dibe. Her wiha ew tiştên ku wezîfa xwarin û vexwarinê bicih tînin jî her wekî derzîyên ğizayî ew jî rojîyê xirab dikin. Lêbelê ew derzîyên neğizayî bin, her wekî derzîya pensilînê û yên wekî wan rojîya mirov bi wan xirab nabe; lewra ew ne xwarin û vexwarin û tiştên wekî wan e

Ew teleskop û xurtûma nefesê û yên wekî wan; ewên ku ji bo îhtiyacê ji rêya dev ve dikevin nava mirov, ew rojîya însên xirab nakin.

Kil û dilopa çav û guhan û yên wekî wan, rojîya mirov bi wan xirab nabe. Lewra ti delîl nîn e ku rojî bi wan xirab dibe. Hem jî çav, ji bo xwarin û vexwarinê ne quleke adetî ye, her wiha ye dilopa guh û poz jî. Lêbelê ya baş, bila mirov xwe ji dilopa poz biparêze. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji bo yê bi rojî zêdehiya di îstinşaqê [av kişandina poz û jê avêtin] de qedeğe kiriye. Lewra ew qul digihîje navê.



Oksîjena astimê rojî pê xirab nabe.



Kil, rojî pê xirab nabe.

Dema rojîgir wan tiştên ku nabin xwarin û ew zirar jî didin mirov her wekî çixarê, vexwe, rojî bi wan xirab dibe. Lewra ew wan di qula adetî de dikişîne nava xwe ku ew jî dev e. Her wiha ew jî wekî xwarin û vexwarinê ne.

Ew tiştên ku xwe parastina ji wan ne mûmkin e, her wekî toza rê û ew xwarinên ku di ber diranên mirov de dimînin, ew rojîyê xirab nakin.



Dermanên ku ğiza bi wan çêdibe, rojîyê xirab dikin.



Derzîya pensûlînê rojî pê xirab nabe.



Xwarinên di ber diranan de bimînin rojî bi wan naşike.



Bi çixarê rojî dişke.

2. Çûyîna Nivînê

Lewra Xuda Teala dibêje: {Di şeva rojîyê de çûyîna nav nivînên jinên we ji bo we hatiye helalkirin.} [Beqere, 187]

Kî bi rojî be û here nivîna jinê, rojîya wî pûç dibe. Divê ew rojîya wê rojê qeza bike û bi qezakirina wê re jî kefaretekî giran lê dikeve. Kefaret jî ev e: Divê ew koleyekî azad bike. Heke kole bi dest wî nekeve, ewê du mehan li pey hev rojî bigre. Heke ew nikaribe du mehan li ser hev rojî bigre, ewê xwarina şêst miskînan bide wan.

Lewra ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] sabit bûye, gotiye; «Zilamek hate cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin], jê re got; min xwelî li xwe kir. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got: "Te, çi ji xwe kir?" Wî jê re got; ez di remezanê de çûme nivîna jina xwe. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got: "Ma tu dikarî koleyekî azad bikî?" Wî jê re got; na, ez nikarim koleyekî azad bikim. Jê re got: "Ma tu dikarî du mehan li ser hev rojî bigrî?" Wî jê re got; nexêr, ez nikarim du mehan li ser hev rojî bigrim. Jê re got; "ma tu dikarî xwarinê bidî şêst miskînan?" Wî jê re got; nexêr, ez nikarim xwarina şêst miskînan jî bidim! Jê re got: "Rûne!" Ew jî rûnişt. Di vê navê de selikek52 ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re hat, têde xurme hebûn. Jê re got: "Raje vê, wê sedeqe bide." Wî jê re got; ma ez wê bidime mirovên ji xwe feqîrtir?! Vêca pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] pê kenî heta diranên wî yên kursîyan xuya bûn. Paşê jê re got: "Wan bide eyalên xwe.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Kefaret, divê li gorî wê rêza hatî, be: Heta ew karibe rojî bigre, xwarindayîn çênabe, heta ew karibe koleyekî jî azad bike, rojîgirtin çênabe.

Heke jinê jî di mijara kirinê de bi xebera mêrê xwe kiribe, divê ew jî kefaret bide. Lêbelê heke mêrê wê di mijara kirinê de kotekî lê kiribe, rojîya wê pê betal bûye, divê ew rojîya wê roja xwe qeza bike, lêbelê kefaret lê nakeve.

- Heke bi dilê mirov, menî ji mirovî were, ew jî wekî kirinê ye. Dema rojîgir bi keyfa xwe, bi maçkirinê, yan bi destdanê, yan bi menî-jixwe-anînê, yan jî bi tiştekе din menîyê ji xwe bîne, rojîya wî xirab dibe. Lewra ew ji şehwetê ye. Şehwet jî nakokîyê bi rojîyê re dike. Divê ew rojîya wê roja xwe qeza bike, lêbelê kefaret lê nakeve. Lewra kefaret bi kirinê tenê wacib dibe. Lewra ness [delîla qet'î] di bara kirinê tenê de hatiye.

- Dema rojîgir bedena xwe bigihîne bedena jinê, yan destê xwe bide wê, yan sipehîtîya wê bifikre û ji lewma mezî jê were, rojîya wî durust e. Lewra delîl li ser xirabbûna rojîyê bi mezîyê warid nebûye, nehatiye.

- Dema rojîgir raze û di xew de şeytan pê bikene, yan jî bê şehwet menî jê were, her wekî wî mirovê ku nexweş be, rojîya wî xirab nabe. Lewra di vê xusûsê de tercîh di destê wî de nîn e.

- Dema rojîgir ji kirine berî fecrê, yan jî ji [şeytan pê kenînê] bi cenabet lê bibe sibeh, rojîya wî durust e. Lêbelê divê ew zû xwe bişoyê ji bo bigihîje nimêja sibehê bi cemaetî.

Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] sabit bûye, wê gotiye; fecr digiha pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û ew hîn ji hevsera xwe bi cenabet bû, paşê wî xwe dişûşt û rojîya xwe digirt.

3. Xwe vereşandina bi qesd e

Ew bi qesd deranîna xwarinê, yan jî vexwarinê ji rêya dev e. Lêbelê dema vereşîn zorê lê bike, yan jî bê tercîha wî tiştek jê derkeve were, ew bandorê li rojîya wî nagire.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Vereşîn zorê li kî bike, qezakirin li ser wî nîn e. Lêbelê kî bi qesd xwe vereşîne, bila ew rojîya xwe qeza bike.»

4. Derhatina xwîna heyz û çêl e

Jin, çi dema xwîna heyzan, yan jî xwîna çêl bibîne, çendan di kêlîka dawîyê ya berî roj biçe ava de be jî, bila ew bifitre û qezakirin li ser wê wacib dibe.

Rojî



Feydeyek

- Qewlê xurt; hecamet -ew derxistina xwînê ji bedenê bi aletekî xusûsî ye- rojîyê xirab nake.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi rojî hecamet ji xwe berdaye.

Ji Ebûseîd el-Xudrî [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji bo rojîgir ruxseta maçkirin û hecametê daye. Lêbelê ew mekrûh e, lewra ew mirov zeîf dike.

Ji Enes kurê Malik [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; zilamekî ji min pirs kir; ma we ji bo rojîgirî hecamet mekrûh didît? Min jê re got; na, lêbelê mekrûhdîtina wê ji bo zeîfkirinê ye.

Derketina xwînê bi birînê, yan jî bi hilkirina diran, yan jî derketina xwînê ji bêhvila mirov, yan ji rêya enjeksîyonê ji bo wergirtina nimûneyan, yan jî ji bo wê bi xêra xwe bide dîgeran, zirar nade rojîgir û rojîya wî bi wê xirab jî nabe.




Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec





Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Uzrên rojî negirtinê di Remezanê de û qezakirina rojîyê

3

Uzrên rojî negirtinê di remezanê de û qezakirina rojîyê



Naverok

Uzrên rojî negirtinê di remezanê de

Qezakirina rojîyê

Uzrên rojî negirtinê di remezanê de

1. Nexweşî ye

Ji bo kesê nexweş [rojî negirtin] di remezanê de mûbah e.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Kî ji we nexweş be, yan jî rêwî be, bila bi qasî rojên ku xwaribe, di rojên din de rojî bigire.} [Beqere, 184]

Ew nexweşê ku jê re ruxseta rojî negirtinê jê re hatiye dayîn, ew nexweş e ku bi sebeb nexweşîya wî rojî jê re zehmet dibe, yan jî ew pê zirar dibîne.

Rojî negirtina yê nexweş

Dema nexweş bifitre -hem jî hêvî hebû ku nexweşîya wî şîfa bibe- kengê ew şîfa bibe divê wan rojên ku negirtibû, dîsa qeza bike.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Kî ji we nexweş be, yan jî rêwî be, bila bi qasî rojên ku xwaribe, di rojên din de rojî bigire.} [Beqere, 184]

Dema nexweşîya wî yek ji wan nexweşîyan be ku hêvî nîn e, ew şîfa bibe -her wekî ew nexweşîyeke kronîk [seraqetî] be, yan jî ew mirovek emr-mezin be, bi awayekî berdewam nikaribe rojî bigre- hingê ewê ji ber her rojekê ve bi qasî nîv saekê (Miqdarê saê çar kulm bi kulma zilamê normal e. Naxwe saek 2.25 kg e. Naxwe xwarin-dayîna ji ber her rojekê ve kêm-zêde 1.125 kg e) ji birinc, yan yên wekî birincê ji qûtê welatê xwe xwarina miskîneki bide.

2. Rêwîtî ye

Ji bo mirovê rêwî mûbah e, ew di remezanê de bifitre û li ser wî qezakirina wê jî wacib dibe.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Kî ji we nexweş be, yan jî rêwî be, bila bi qasî rojên ku xwaribe, di rojên din de rojî bigire.} [Beqere, 184]

Ew sefera ku têde fitar mûbah e, ew rêwîtî ye ku têde nimêj tê kurtkirin. Lewra li gorî urfa mirovan ew e, rêwîtîya ku jê re “sefer” tê gotin. Bi şertê ku ew rêwîtî jî sefereke mûbah be; naxwe heke ew sefera gunehkarîyê be, yan jî heke ew sefer ji bo bi hîlebazî bifitre be, hingê di vê seferê de fitar ne durust e.

Heke rêwî di seferê de rojî bigre, rojîya wî durust e û ew jê re çêdibe.

Lewra Enes kurê Malik [Xuda jê razî be] dibêje; «Em bi pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re diçûn seferê, yê bi rojî eyb ji yê nerojî re çênedikir û yê nerojî jî eyb ji yê bi rojî re çênedikir.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Lêbelê bi şertê ku di seferê de rojî jê re zehmetîyê çêneke. Heke rojî zehmetîyê jê re çêke, yan jî zirarê bide wî, ji bo wî fitar ji rojî girtinê çêtir e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di seferê de zilamekî bi rojî dît, ji dijwarbûna germê sih ji xwe re çêkiribû û însan jî li ser wî kom bûbûn, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got: «Rojîya li seferê ne ji xêrê ye» (Buxarî rîwayet kiriye)



3. Avisbûn û şîrdayîn e

Jina ducan û jina şîredar, heke ji xwe bitirse ku rojî bigre, ewê zirarê bibîne, hingê ewê bifitre û ew jî wekî yê nexweş, dê rojîya xwe qeza bike.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye; «Xuda Teala rojî û nîvê nimêjê ji ser yê rêwî rakiriye; ji ser jina avis û jina şîredar jî rojî rakiriye.» (Tirmizî rîwayet kiriye)

Lêbelê heke ew bi rojî-girtinê bitirse ku zirar li zarokê wê tenê bibe; ne ji xwe bitirse, hingê ewê bifitre, paşê rojîya xwe qeza bike û ewê ji ber her rojekê ve xwarina miskînekî bide.

Lewra gotina Îbn Ebbas [Xuda jê razî be] heye, dibêje: «Jina şîredar û jina ducan, dema ji zarokên xwe bitirsin, ewê bifitrin û xwarinê bidin.» (Ebû Dawud rîwayet kiriye)

4. Heyz û çêl e

Ew jina ku di remezanê de bikeve heyzan, yan jî ew xwîna çêl bibîne, hingê li ser wê wacib e ku ew bifitre û ji wê re rojî-girtin heram e. Heke ew rojî bigre jî rojîya wê ne durust e û divê dîsa ew wê rojîya xwe qeza bike.

Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] sabit bûye ku dema yekî jê pirs kir; ma jina di heyzan de rojîyê qeza dike û nimêjê qeza nake? Wê jê re got; «Em diketin heyzan ji me re dihat gotin; rojîya xwe qeza bikin; lêbelê ji me re nedihat gotin; nimêja xwe qeza bikin.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Qezakirina rojîyê

- Dema misliman rojekê di remezanê de bê uzr bifitre, divê ew tobe bike û lêborîna gunehê xwe jî Xuda bixwaze. Lewra ew sûcekî mezin û gunehekî giran e. Divê ew digel tobekirin û efû-xwestinê bi qasî wan rojên ku di wan de rojî xwaribe, ewqas roj qeza bike. Ji gotina aliman tê fehmkirin; divê ew rojîya xwe jî bilezûbez qeza bike. Lewra jê re ruxseta fitarê nebûye û esl jî ev bûye ku wî di wexta bi de rojîya xwe eda bikira.

- Dema misliman bi uzrekî ku fitarê mûbah dike her wekî heyz, çêl, nexweşî, rêwîtî û yên wekî van bifitre, li ser wî û wê qezakirina rojîyê wacib e. Lêbelê heke ew nikaribe rojî bigre, hingê bilezûbez qezakirin jî ne wacib e; belkî jê re wext heye ku ew heta remezaneke din bi bêhna fereh qeza bike.

Lewra hedîsa Aîşe [Xuda jê razî be] heye, dibêje: «Carina li ser min rojîya qezaya remezanê hebû, min nikarîbû wê qeza bikim heke ne di şabanê de bûya.” Yehya got; “meşğûlbûna ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] yan jî bi pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin].» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Lêbelê ji mirov re sunnet û mûsteheb e ku ew bilezûbez rojîya xwe qeza bike. Hem ew bi qezakirinê deynê xwe ji stûyê xwe eda dike, hem jî ev jê re îhtiyat e. Lewra dibe ku ew nexweş bikeve û rewşeke nû were holê ku ew êdî nikaribe rojîya xwe qeza bike.

- Heke mirov qezakirina deynê xwe yê rojîyê dereng bixe heta remezaneke din were, û di dereng-xistina wî de jê re uzr hebe, heke uzrê wî dewam bike, hingê divê ew piştî remezana duduyan wê qeza bike.

- Lêbelê heke mirov heta remezana duduyan were, bê uzr deynê xwe yê rojîyê qeza neke, -li gorî cumhûrê aliman- divê ew hem rojîya xwe qeza

bike, hem jî ji ber her rojekê ve ew ji qûtê welatê xwe nîvê saekê xwarina miskînekî bide. Lêbelê li gorî Henefî û Zahirîyan qezakirin tenê li ser wî heye; li ser wî ti fîdye nîn e.

- Di qezakirinê de li ser hev rojî-girtin ne şert e; belkî ew hem dikare wan li ser hev bigre, hem jî ew dikare ne li ser hev jî bigre.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Kî ji we nexweş be, yan jî rêwî be, bila bi qasî rojên ku xwaribe, di rojên din de rojî bigire} [Beqere, 184]

Xuda Teala li ser hev girtina van rojan bi şert nekiriye. Heke li ser hev girtina wan şert bûya, helbet Xuda yê ew jî eşkere bikira.

- Kî, terka qezakirinê bike heta ew bimre, heke ew ji bo uzrekî be, ji xwe tiştek li ser wî nîn e. Lewra wî ti îhmalkarî nekiriye. Heke ew ne ji bo uzrekî be, ji ber her rojeke wî ve divê di rojîya remezanê de xwarina miskînekî were dayîn. Lêbelê heke ew rojîya nezr be, welîyê wî dê ji ber wî ve rojî bigre.

Hinek ehlê îlmê dane zanîn ku kî, bimre û rojî li ser wî hebe, welîyê wî dê ji ber wî ve rojî bigre; hîç ferq nake, çi ew rojîya wî rojîya ferza remezanê be, yan jî rojîya nezr û yên wekî wê bin.

Lewra hedîsa Aîşe [Xuda jê razî be] berfereh e, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî bimre û rojî li ser wî hebe, welîyê wî ji ber wî ve rojî digre.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)


Hedîsa Îbnebbas [Xuda jê razî be] jî berfereh e, dibêje; zlamek hate cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin], jê re got; ya pêğemberê Xuda! Dêya min mir, mehek rojî li ser wê hebû, ma ez ji ber wê ve qeza bikim? Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got: «Belê, deynê Xuda ji bo qezakirinê li pêştir e.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Rojîya sinnet

4 Rojîya sinnet

Rojîya sinnet


Rojîya Sinnet, her rojî ye ku însan bi nîyeta nêzî Xuda Teala bibe, radibe wê digre.

Di rojîya sinnet de fezîleteke mezin û sewabeke zehf heye.

Hedîsa qudsî de, ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: “Her karê kurê Adem jê re tê zêdekirin, hesenetek bi deh sewaban zêde dibe, heta bi heftsedan jî zêde dibe. Xuda [ezzewecelle] gotiye; «Lê rojî na! Lewra ew ji min re ye û ezê mûkafata wê bidim» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine).

Hinek roj hene, rojî-girtina wan sunnet e

1. Şeş roj ji meha Şewalê ne.



Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî, rojîya Remezanê bigre, paşê li pey wê şeş rojan ji Şewalê jî bigre, dibe her wekî rojîya salewext.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Hîç ferq nake; çi mirov wan rojan li pey hev bigre, çi jî wan ji hev cuda cuda bigre.

2. Neh roj ji serê meha Zîl-Hiccê ne



Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Ti roj nîn in ku emelê salih di wan de li cem Xuda ji van deh rojên Zîl-Hiccê hezkirîtir be.” Me jê re got; ya pêğemberê Xuda! Ma cîhada di rêya Xuda de jî bi qasî wan ne hezkirî ye? Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: “Cîhada di rêya Xuda de jî ne bi qasî wan hezkirî ye; lêbelê cîhada wî zilamê ku bi canê xwe û malê xwe di rêya Xuda de derkeve cîhadê û bi tiştekê ji wan venegere, ew ji wan hezkirîtir e.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Sunnet e, mirov di wan deh rojan de zehf zehf îbadetê bike, zikrê Xuda, bike, laîlaheîllellah bibêje, Qur’anê bixwîne, sedeqeyan bide û rojîya wan jî bigre, lêbelê roja îdê na, lewra rojî-girtina wê heram e. Ji van rojan jî ya zehf xêr e mirov têde xêran bike û rojî bigre, roja Erefê ye, lê ne ji bo mirovê namzedê hacîtîyê be. Roja Erefê jî roja nehê Zîl-Hiccê ye.

Naverok



Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Rojîya roja Erefê, ez ji Xuda hêvîdar im ku ew pê sala berîya wê û sala piştî wê jî bide efûkirin.» (Mûslim rîwayet kiriye)

3. Rojîya Aşûrayê ye

Aşûra

Roja Aşûrayê, roja dehê meha Mûherremê ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Rojîya roja Aşûrayê ji Xuda hêvîdar im ku ew sala berîya xwe dide efûkirin.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Sebebê rojîya wê ev delîla ha ye: Ji Ebdûllah kurê Ebbas [Xuda jê razî be] hatiye riwayer kırın, gotiye; «Dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hate Medînê, wî cihû dîtin ku roja Aşûrayê rojî digirtin, wî got; “ev çi ye?” Jê re gotin; ev rojeke qenc e. Ev, ew roj e ku Xuda têde Benû-îsraîlî ji dijminên wan xilas kirine, Mûsa rojîya wê girtibû. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got; “ez ji bo Mûsa ji we lipêştir im.” Wî jî rojîya wê girt û bi rojî-girtina wê jî ferman kir» (Buxarî rîwayet kiriye)

Her wiha rojîya roja nehê jî mûsteheb e. Lewra di rîwayeta Mûslim de warid bûye, ku, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Heke ez heta sala werê sağ bimînim, ezê roja nehê jî rojî bigrim.» (Mûslim rîwayet kiriye)

4. Rojên sipî ji her mehê.

Rojên sipî:

Ew roja sêzdehê, çardehê û pazdehê her meha erebî ye. Çima ji wan re “rojên sipî” hatiye gotin? Lewra şevên wan ji ber tava heyvê sipî ne.

Lewra ji Ebdûlmelik kurê Minhal, wî jî ji bavê xwe rîwayet kiriye, gotiye; ew bi pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re bû. Wî got; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi rojî-girtina rojên sipî ferman dikir û digot: «Ew rojî-girtina salewext e.» (Îbn Hibban rîwayet kiriye)

5. Rojîya herdu rojên duşem û pêşemê ji her hefteyê ne.

Lewra ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Emel, rojên duşem û pêşemê li min tên erzkirin. Ez dixwazim dema bi rojî bim, emelê min were erzkirin.» (Tirmizî rîwayet kiriye)

6. Rojîya rojekê û xwarina rojekê

Çêtirîn rojîya sinnet, rojîya Dawud [silavên Xuda lê bin] e; wî rojekê rojî digirt û rojekê jî rojî nedigirt.

Ji Ebdûllah kurê ‘Emr [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Rojîya ku Xuda zehf jê hez dike, rojîya Dawud e; wî rojekê rojî digirt û rojekê jî difitirî.» (Nesaî rîwayet kiriye)

7. Rojîya meha Mûherremê ye

Ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Çêtirîn rojî, piştî Remezanê heyva Xuda Mûherrem e.» (Mûslim rîwayet kiriye)

8. Rojîya meha Şabanê ye

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi qasî ku di Şabanê de rojî digirt, wî di ti meheke din de ewqas rojî nedigirt.

Lewra ji Usame kurê Zeyd hatiye rîwayetkirin, gotiye; min got; "Ya pêğemberê Xuda! Min tu nedîtî ku bi qasî tu di Şabanê de rojî digrî, di meheke din de ewqas rojî bigrî, ev ji ber çi ye? Pêğemberê Xuda got: «Ew meh, însan di navbera Receb û Remezanê de jê ğafil dibin. Ew meh, têde emel hildigerin jorê, diçin hizûra Xudayê alemê. Ez hez dikim ez bi rojî bim û emelê min bi jorê ve were bilindkirin.» (Nesaî rîwayet kiriye)

Herçî ew qedeğekirina rojîyê ye, ewa ku di hedîsa pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] de warid bûye: «Dema Şaban bi nîvî bibe, heta Remezanê rojî negirin!» (Îbn Xuzeyme rîwayet kiriye)

Mirov dikare wê bi du awayan şîrove bike; ew texsîskirina nîvê paşîyê ji bo rojî girtinê ye. Yan jî ew bi hev û din ve nekirina Şabanê bi Remezanê ve ye.

Naxwe ew kesê ku di serê şabanê de rojî bigre û dawîya wê ji bo rojî-girtinê texsîs neke û wê negihîne Remezanê jî, di rojî girtina wî de ti tengasî nîn e.

Ew rojên ku rojîya wan heram e; ew rojên ku rojîya wan mekrûh e

Ya yekê: Ew rojên ku rojî-girtina wan heram e

1. Rojîya rojên herdu îdan heram e.

Lewra ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] rojîya rojên herdu îdan: Roja qurbanê û roja Fitrê qedeğe kirine. (Mûslim rîwayet kiriye)

2. Rojîya rojên Teşrîqan; ew her sê rojên piştî roja îda qurbanê heram e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Rojên Teşrîqan rojên xwarin û vexwarinê ne» (Mûslim rîwayet kiriye)

Lêbelê ji bo mirovê hacî rojî-girtina wan durust e; dema ew mûtemettî be, yan mûqarin be û qurban jî bi dest wî neketibe.

Lewra Xuda Teala gotiye: {Ewên ku nikaribin qurbanekê serjê bikin, bila sê rojan li hecê û heft rojan jî dema vegeriyan malê xwe bi tevayî deh rojan, rojî bigirin} [Beqere, 196]

3. Rojîya roja şekê heram e. Ew roja sihê şabanê ye. Dema şeva wê şeva biewr û toz be, dîtina heyvê asteng bike.

Lewra gotina 'Emmar [Xuda jê razî be] heye, dibêje: «Kî roja şekê rojî bigre, ew li hemberî Bavê Qasim [dirûd û silavên Xuda lê bin] rabûye.» (Tirmizî rîwayet kiriye û gotiye; hedîseke hesen û sehîh e)

Ya duduyan; ew rojên ku rojîya wan mekrûh e

1. Rojî-girtina meha Recebê bi tenê mekrûh e.

Lewra mezinkirina meha Recebê şîarek [sembolek] ji şîarên serdema cahîlîyetê ye. Naxwe rojî-girtina wê bi tenê jî dibe sağkirina şîarên ehlê serdema cahilîyetê.

2. Rojî girtina roja înê bi tenê jî mekrûh e.

Lewra rojî-girtina roja înê bi tenê hatiye qedeğekirin.

Ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Bila yek ji we roja înê bi tenê rojî negire. Lêbelê heke ew berîya wê rojî bigre, yan jî piştî wê rojî bigre, hingê ew ğem nake» (Mûslim rîwayet kiriye)

Lêbelê heke ew berîya wê û piştî wê jî rojî negire, lê rojî-girtina roja înê li rojî-girtina adeteke wî rast were, hingê rojî-girtina wê ne mekrûh e.

3. Wîsal jî mekrûh e.

Wîsal ew e; mirov rojîya rojekê -bêyî îftarkirin di navbera wan de- bigihîne rojîya rojeke din. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] wîsal qedeğe kiriye.

Ji Ebdûllah kurê Ûmer [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] wîsal qedeğe kiriye. Sehabîyan jê re got; tu jî wîsalê dikî! Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji wan re got: «Ez ne wekî we me; lewra xwarîn û av û av vexwaribe ji min re tê dayîn» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Hişyarî û areste

1. Divê misliman di îbadetê xwe de xwe pêbendê şerîeta Xuda be. Naxwe bila ew, wan rojên ku Xuda rojî-girtina wan qedeğe kiribe, rojî negre. Bila ew rojîyekê di hinek rojan de peyda neke ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî rojîya wan texsîs nekiribe. Her wekî rojîya 27ê Recebê, yan jî rojîya nîvê şabanê.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî di vî dînê me de tiştеke ku ne jê be, peyda bike, ew jê qebûl nabe» (Mûslim rîwayet kiriye)

2. Divê misliman xwe ji mezinkirina şîarên kafiran dûr bigre. Divê ew rojeke ku kafir wê mezin didêrin, bi awayekî xusûsî têde îbadetê neke û rojî negire.

Rojî di nêrîna Tibbê de


Rojî ji bo dermanên cildî bi feyde ye. Sebeba wê jî ev e; ew rêjeya avê di nav xwînê de kêm dike, tavilê rêjeya wê di çerm de jî kêm dike. Kêmbûna wê jî asêbûna çerm û berxwedêrîya wî li hemberî mîkrop û nexweşîyên mîdeyî yên mîkropîk xurt dike.



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Leyletûl Qedr

Rojî

5 Şeva Qedrê



Naverok

Çima jê re Şeva Qedrê hatiye gotin?

1. Hatiye gotin: Ji bo mezinkirina wê, jê re şeva qedrê hatiye gotin.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Wan Xuda bi mezinahîyeke layîqê wî, ew mezin nedêriyane} [Enam, 91]

2. Meneya ayetê ev e; ew xwedan qedr û qîmet e. Lewra Qur'an têde hatiye xwarê. Hem jî têde melaîket, bereket, rehm û meğfîret tên xwarê. Yan jî ewê ku wê îhya û sağ dike, pê dibe xwedan qedr û qîmet.

3. Hatiye gotin; qedr bi meneya teng-kirin e. Lewra Xuda Teala dibêje; {Ewê ku rizqê wî hatibe tengkirin jî, bila ji wî malê ku Xuda daye wî, nefeqê wê bide} [Telaq, 7]

Meneya tengkirina wê têde ev e; veşartina teyînkirinên têde ji zanînê ye. Yan jî ji ber ku erd ji melaîketan teng dibe, jê re şeva qedrê [şeva tengkirinê] hatiye gotin.

Hatiye gotin; qedr bi meneya qeder e. Meneya wê jî ev e; hukmên wê salê têde tên teqdîr û teyînkirin.

Lewra Xuda Teala dibêje; {Di wê şevê de, her karûbarê bi hikmet ji hev têne veqetandin} [Dûxan, 4] (Fethûl Barî, 4/255)

Fezîleta Şeva Qedrê û mezinahiya wê

1. Têde Qur'an hatiye xwarê.

Lewra Xuda [ezzewecelle] dibêje: {Bêguman me ew di şeva qedrê de anîye xwarê} [Qedr,1]

2. Ew ji hezar mehan çêtir e

Lewra Xuda Teala dibêje: {Şeva qedrê ji hezar mehan çêtir e} [Qedr, 3]

Yanî kar û emelê xêrê di şeva qedrê de ji kar û emelê xêrê yên hezar mehan çêtir e ku di wan de şeva qedrê nebe.

3. Melaîket û rûh têde tên xwarê

Lewra Xuda [ezzewecelle] dibêje: {Melaîket û rûh têde bi destûra Xudayê xwe ji bo her karûbarekî têne xwarê} [Qedr, 4]

Ji Rûh meqsûd, Cibraîl [silavên Xuda lê bin] e.

Ji Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Şeva Qedrê şeva bîst û heftan, yan jî bîst û nehan e. Melaîketê li erdê di wê şevê de ji hijmara ziğuran zehftir in» (Îbn Xuzeyme rîwayet kiriye)

4. Ew silav e

Lewra Xuda [ezzewecelle] gotiye; {Ew silav e, heta vedana fecrê} [Qedr, 5]

Yanî ew şev tev xêr e, ji serê wê heta bi vedana fecrê têde xirabî nîn e.

5. Ew şeveke mûbarek e

Lewra Xuda [ezzewecelle] dibêje; {me ew di Şeveke Pîroz de şandiye xwarê. Lewra em bi wê mirovan hişyar dikin} [Dûxan, 3]

Îbn Ebbas gotiye; ew şeva pîroz, şeva Qedrê ye.

6. Têde qederên salê têne teqdîr [dîyar] kirin.

Lewra Xuda [ezzewecelle] dibêje; {Di wê şevê de, her karûbarê bi hikmet ji hev têne veqetandin} [Dûxan, 4]

7. Kî bi îman pê anîn û sewaba xwe li cem Xuda hesab kirin, şeva qedrê îbadet derbas bike, gunehên wî yên ku derbas bûne, jê re tên efûkirin.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî, şeva Qedrê bı îbadet derbas bike, îmanê pê bîne û sewaba xwe li cem Xuda hesab bike, gunehên wê yên ku derbas bûne, jê re tên efûkirin.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Şeva Qedrê kîjan şev e?

Xuda ev şev, bi eşkerehî kufş nekiriye; ji bo misliman di deh rojên dawîya Remezanê de bi taybetî jî di kitên wê de lê bigere. Ew şevên kit yên Remezanê jî şeva 21, 23, 25, 27, 29’an e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Di kitên deh rojên dawîya Remezanê de li şeva Qedrê bigerin.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Ehlê îlmê delîlên wê tev berhev kirine û gotine; ew, di navbera wan şevan de tê guhastin.

Kar û emelên mûsteheb di şeva Qedrê de

1. Îtîkaf e

Îtîkaf, di her deh şevan tevan de ye, ne ji bo şeva Qedrê tenê ye.

Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di deh şevên dawîya Remezanê de diket îtîkafê.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

2. Bi îman-anîn û sewab li cem Xuda hesab kirin, derbazbûna bi ibadetê ye:

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî, bi îmanê pê anîn û sewaba xwe li cem Xuda hesabkirin, şeva Qedrê bi îbadet derbaz bike, gunehên wî yên ku derbas bûne, jê re tên efûkirin.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

3. Dûa ye

Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; min got, ya pêğemberê Xuda! Heke ez li şeva Qedrê rast werim, bila ez çi dûa bikim? Wî ji min re got: «Xudayê min! Tu, efûkar î, ji efûkirinê hez dikî, min jî efû bike.» (Tirmizî rîwayet kiriye)

4. Şîyarkirina malbatê ye, ji bo zehfkirina îbadetê:

Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Dema deh şevên dawîya Remezanê dihatin, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] cilên xwe li xwe dişidandin, şeva xwe ihya dikir û malbata xwe jî şîyar dikir.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Elametên şeva Qedrê

1. Ew şeveke, ne germ e; ne jî sar e!


Lewra ji Cabir kurê Ebdûllah [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Min şeva Qedrê dizanîbû, paşê min ew ji bîr kir. Ew di deh şevên dawîyê de ye. Ew şeveke rehete, rohniye, têde ne germ e, ne jî sar e.» (Îbn Xuzeyme rîwayet kiriye)

2. Roj di sibeha wê de sipî bê tîrêj derdikeve

Çi dema pirsa wê ji Ubeyy kurê Ke'b [Xuda jê razî be] hate kirin; elametê wê çi ne? Wî got: «Ew bi wan elametên ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji me re vegotine, tê zanîn; li wê rojê, roj bê tîrêj derdikeve.»

Di rîwayeta Mûslim de jî wiha ye: «Sipî ye, tîrêja wê nîn e.» (Tirmizî rîwayet kiriye)





Hişyari


1. Divê misliman di deh şevên dawîyê de îbadetên curecur zehf bike. Lewra ew çêtirîn şevên salê ne.

2. Divê misliman demên xwe yên baş û demsalên xêrê bi keyf, leystik, bazar û pirr çûn û hatina bê îhtiyac îsraf neke.

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Îtîkaf_Rojî

6 Îtîkaf

Îtîkaf di ferhengê de;

Pêbendbûna tişteké û nefs weqfkirina li ser wê ye.

Îtîkaf di navlêka fiqhî de;

Mayîna li mizgeftê ye, ji bo îbadetê Xuda Teala.

Meşrûîyeta îtîkafê

Îtîkaf, karek ji karûbarên qenc û taetên mezin e.

Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di dehekên dawîya remezanê de diket îtîkafê, heta ew wefat kir. Paşê jinên wî jî piştî wî ketin îtîkafê.» (Buxarî rîwayet kiriye)

Îtîkaf, hem ji bo me hatiye meşrûkirin, hem jî ew ji bo ummetên berîya me jî hatibû meşrûkirin.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Me soz ji Îbrahîm û Îsmaîl wergirt, me ji wan re got; hûnê mala min ji bo tewafkar, îtîkafkar, rukû'kar û sicûdkaran paqij bikin} [Beqere, 125]

Hukmê îtîkafê

Îtîkaf, di her wext û demê de sunnet e. Îtîkafa baştir di dehekên dawîya remezanê de ye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di dehekên dawîya remezanê de li ser îtîkafê berdewam kiriye. (Zadûl-Mead)

Şertên îtîkafê

1. Nîyet e

Îtîkafkar, nîyeta mayîna li mizgeftê tîne, ji bo xwe nêzîkkirin û îbadetkirina ji Xuda [ezzewecelle] re.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Emel, bes bi nîyetan e» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Naverok

2. Divê ew mizgefta ku îtîkafkar têde dikeve îtîkafê jî nimêja bi cemaetî têde were edakirin

Îtîkaf, di ğeyrê mizgeftê de ne durust e. Lewra Xuda Teala dibêje: {Dema hûn bi qesda îbadetê li mizgeftan di îtîkafê de bin, hîç neçin nivînên jinên xwe!} [Beqere, 187]

Hem jî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ketiye îtîkafê. Lewra ketina îtîkafê di mizgefteke ku nimêja bi cemaetî têde nayê edakirin, terka nimêja bi cemaetî lazimî xwe dike. Halev e ku ew jî wacib e. Yan jî heke ew here nimêja bi cemaetî, hingê ew dike lazimê xwe ku îtîkafkar her wext dubare dubare ji mizgeftê derkeve, ev jî berovajîyê meqsûda îtîkafê ye.

Herçî jin e, îtîkafa wê di her mizgeftê de çêdibe; çi nimêja bi cemaetî têde were edakirin, çi jî nimêja bi cemaetî têde neyê edakirin. Ev wisa ye, dema fitneyek li ser îtîkafa wê îcra nebe. Heke fitneyek li


ser îtîkafa wê îcra bibe, îtîkafa wê tê menkirin. Ya baş, bila ew mizgefta ku jin têde dikeve îtîkafê jî nimêja bi cemaetî têde were edakirin. Lêbelê ew ji bo îtîkafê ne şert e.



Mizgefta komkar

3. Tahirbûna ji bêdesmêjîya mezin e

Îtîkafa mirovê bi cenabet, jina di heyzan de û jina bi çêl, ne durust e. Lewra sekna van li mizgeftê ne durust e.




Rojî ji bo îtîkafê ne şert e

Rojî ji bo îtîkafê şert nayê jimartin.

Lewra ji Îbn Ûmer [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; Ûmer ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] pirs kir, got; min di serdema cahilîyetê de li xwe nezr kiribû ku ez şevekê li mizgefta Heramê bikevim îtîkafê, ez çi bikim? Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got: «Nezrê xwe bîne cih!» (Buxarî rîwayet kiriye) Heke rojî ji bo îtîkafê şert bûya, hemin îtîkafa wî dê bi şevê ne durust bûya. Lewra rojî bi şev çênabe.

Hem jî sabit bûye ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] «di dehekên pêşîn yên şewalê» (Mûslim rîwayet kiriye) de ketiyee îtîkafê. Di nav wan de rojên îdê jî hebûn. Di wan de rojî-girtin ne durust e. Her wiha ew herdu îbadetên ji hev cuda ne; ji bo yekî ji wan hebûna yê din ne şert e.





Zemanê Îtîkafê

Îtîkaf, di her wext û rojan de durust e. Lêbelê ya baş, bila îtîkaf ji şev û rojekê ne kêmtir be. Lewra ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û ji ti sehabîyekî wî nehatiye neqilkirin ku ew ji şev û rojekê kêmtir ketibin îtîkafê.

Îtîkafa dehekên dawîya remezanê

- Ew çêtirîn wextên îtîkafê ne.

Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] sabit bûye, gotiye; «pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di dehekên dawîya remezanê de diket îtîkafê, heta wî wefat kir. Paşê jinên wî jî piştî wî ketin îtîkafê» (Buxarî rîwayet kiriye).

- Kî, nîyeta xwe li îtîkafa dehekên dawîya remezanê bîne, ewê sibeha roja bîst û yekê di mizgefta ku têde nîyeta xwe li îtîkafê tîne, nimêj bike. Paşê ewê bikeve îtîkafê.

Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] her remezanê diket îtîkafê. Dema nimêja sibehê dikir, diçû cihê xwe yê ku têde diket îtîkafê» (Buxarî rîwayet kiriye) .

- Îtîkaf, bi roj-çûna ava ya dawîya roja remezanê xilas dibe. Ya baş, bila derketina ji îtîkafê di sibeha roja îdê de be. Ev ji gellek selefên ummetê sabit bûye.



Hikmeta îtîkafê

Hikmeta îtîkafê, qutbûna ji dinyayê û ji ehlê wê û xwe valakirina ji bo îbadetê ye. Divê îtîkafkar dilê xwe ji wê re vala bike.

Tişta ku ji îtîkafkarî re mûbah e

1. Ji îtîkafkarî re mûbah e; derketina ji mizgeftê ji bo tiştên ku pêdevi be. Her wekî derketina ji bo xwarin û vexwarinê; dema ti kes nebe wan jê re hazir bike û bîne. Hem jî derketina ji bo destavê jî.

Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] sabit bûye, gotiye; «Dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] diket îtîkafê serê xwe nêzîkî min dikir, min jî pora wî şeh dikir. Heke ne ji bo îhtiyaca însên ya normal bûya, ew nedihat mala xwe» (Mûslim rîwayet kiriye)

2. Şikinandin û şehkirina porê ji îtîkafkarî re mûbah e. Delîla vê ew hedîs e ku niha derbasbû.

3. Axaftina bi xelkê re di bara tiştên ku feyde bide wan de û pirskirina ji halê wan jî ji îtîkafkarî re mûbah in. Lêbelê bila ew di vê zehf axaftin û zehf pirsê neke. Lewra ew nakokîyê bi meqsûda îtîkafê re dike.

4. Zîyaretkirina hinek xizm û ehlê wî jê re û derketina wî ji îtîkafgeha xwe ji bo xatir xwestina ji wan ji îtîkafkarî re mûbah e.

Lewra ji Sefîyye keça Huyey [Xuda jê razî be] hatiye rîwayetkirin, gotiye; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di îtîkafê de bû, ez jî bi şev dihatim cemê, min ew zîyaret dikir û min pê re xeber dida. Paşê ez rabûm ji bo biçim, ew jî bi min re rabû ji bo min vegerîne mala min» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Pûçkeren îtîkafê

1. Bê îhtiyac, derketina ji mizgeftê îtîkafê betal dike.

Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] sabit bûye, gotiye; «Heke ne ji bo îhtiyaca însên ya normal bûya, ew nedihate mala xwe» (Mûslim rîwayet kiriye) Hem jî derketina ji îtîkafgehê seknê lê difewitîne û haleve ku ew jî ji bo îtîkafê rukn e.

2. Çûyîna nivînê jî îtîkafê betal dike; çendan bi şev be jî.

Lewra Xuda Teala gotiye: {Dema hûn bi qesda îbadetê li mizgeftan di îtîkafê de bin, hîç neçin nivînên jinên xwe} [Beqere, 187]

Bê kirin bi şehwet menî hatin, her wekî menî ji xwe anînê û bêgayîn jî bedenê xwe gihandina bedenê jina xwe jî dikevin ber hukmê kirinê.

3. Perardayîna ji bo qutkirina îtîkafê jî îtîkafê betal dike.

Heke mislimanek çend rojên diyarkirî nîyeta xwe li îtîkafê bîne, paşê ew îtîkafa xwe qut bike, jê re durust e, wê qeza jî bike.

Lewra ji Aîşe [Xuda jê razî be] sabit bûye, gotiye; «dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dixwest bikeve îtîkafê, nimêja fecrê dikir, paşê diket îtîkafgeha xwe. Ferman dikir ji bo çetra wî jê re were anîn, ew jê re dihat danîn. Wî xwest bikeve îtîkafa dehekên dawîya Remezanê. Zeyneb jî ferman kir ji bo çetra wê jê re were anîn, ew jî jê re hate anîn û ew hate danîn. Ji bilî wê jinên pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] yên din jî ferman kirin ji bo çetrên wan ji wan re werin anîn, ew jî hatin anîn û hatin danîn. Çi dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] nimêja fecrê eda kir, meyzand ku wa ye gellek çetr hatine danîn, got: "Ma hûn qesda xêrê dikin." Ferman kir çetra wî hate rakirin û terka îtîkafa di meha Remezanê de kir. Paşê ew di dehekên pêşîn yê şewalê de kete îtîkafê» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Di rîwayeteke din de jî wiha hatiye: «Dehekên dawîya şewalê»

4. Îtîkafkar naçe serdana nexweşan, beşdarî merasimên cenaze nabe û ew di îtîkafgeha xwe de ji bo îbadetê Xuda têkilîya xwe ji her karî qut dike.



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review

Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro

Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Zekat, hukmê wê û şertên wê

1 Zekat, hukmê wê û şertên wê

Zekat di ferhengê de;
Zêdebûn û pirrbûn e.

Zekat di navlêka fiqhî de;
Miqdarekî diyarkirî ji mal e, di wextekî diyarkirî de ji bo komeke mûeyyen tê deranîn.

Naverok

Merteba zekatê

Zekat, ferzek ji ferzên Îslamê ye. Ew ruknê Îslamê yê sisêyan e.Xuda [ezzewecelle] dibêje: {Nimêjê bikin, zekatê bidin} [Nûr, 56]

Hem jî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Îslam, li ser pênc esasan hatiye avakirin: Şehde dayîna ji Xuda pê ve ti îlah nîn in, Mûhemmed jî evdê wî û pêğemberê wî ye, kirina nimêjê ye, dayîna zekatê ye, çûna heca Beytê ye û rojîya Remezanê ye» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Hukmê manî'ê [astengkerê] zekatê

Mani'ê zekatê; yan ji ber ku wê înkar dike, li zekatê asê dibe; yan jî ji ber çikûsîya xwe li zekatê asê dibe.

1. Mani'ê zekatê ji ber ku wê înkar dike, lê asê dibe

Kî, wacibbûna zekatê înkar bike, ew bi îcmaa ummetê kafir dibe; dema ew wacibbûna wê zanibe. Lewra hingê ew tekzîba Xuda û pêğemberê wî dike.

2. Mani'ê zekatê ji ber çikûsîya xwe li zekatê asê dibe.

Kî, ji ber çikûsîya xwe li zekatê asê bibe, bi zorê jê tê standin û ew bi vê asêbûnê kafir nabe. Lêbelê ew sûcekî ji wan sûcên mezintirîn dike û guneh û webalê wê jî zehf mezin e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di bara mani'ê zekatê de dibêje: «Kîjan xwediyê zêr û zîv heqê wê zekatê jê eda neke, dema roja qiyametê tê, jê re dibin bistên hesinî ji êgir, ew di agirê cehennemê de li ser wî tên sincirandin; bi wan teniştên wî, enîya wî û pişta wî tê dağdan. Ew di rojeke ku miqdarê wê pêncî hezar sal de, çiqas sar dibe, jê re tê sincirandin, [dewam dike] heta di navbera mirovan de hukm tê kirin; vêca rêya wî tê dîtin, yan bi cennetê ve ye, yan jî bi êgir ve ye.» (Mûslim rîwayet kiriye.)

Heke ew şerr bike ji bo zekatê nede, şerrê wî tê kirin heta ew ji fermana Xuda [ezzewecelle] re berdest bibe û zekatê eda bike.

Lewra Xuda [ezzewecelle] dibêje: {Heke ew tobe bikin, nimêj bikin û zekata xwe bidin, rêya wan vekin. Bi rastî Ellah gunehbexş û dilovîn e.} [Tewbe, 5]

Hem jî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Ferman li min hatiye kirin ku ez şerrê mirovan bikim; heta ew şehde bidin ku ji Xuda pê ve ti îlah nîn in, Mûhemmed jî pêğemberê Xuda ye, nimêjê bikin û zekatê bikin. Dema ew vê bikin, ew xwîna xwe û malên xwe ji min biparêzin; lê ku bi heqê îslamê be, ew ne têde ye û hesabê wan jî li ser Xuda ye.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)

Ebûbekr [Xuda jê razî be] şerrê mani'ê zekatê kiribû û gotibû: «Ez bi Xuda sûnd dixwim, kî cudahîyê bixe navbera nimêj û zekatê ezê şerrê wî bikim! Lewra zekat heqê mal e. Ez bi Xuda sûnd dixwim, heke werîsekî ku didane pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji min asteng bikin, ezê ji bo wê astengkirinê jî şerrê wan bikim!» (Buxarî rîwayet kiriye.)

Hikmeta wacibbûna zekatê

1. Paqijkirina nefsê û temîzkirina wê ji, guneh û şaşîyan e. Xuda [ezzewecelle] gotiye; {ji malên wan sedeqeyekê wergire da ku tu pê wan paqij bikî, wan pak û bilind bikî û ji wan re dû'a bike.} [Tewbe, 103]

2. Paqijkirina mal, zêdekirina wî û bereket xistina nav wî ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Sedeqe tiştekê ji mal kêm nake.» (Mûslim rîwayet kiriye)

3. Ceribandina însên e, di bara îtaetkirina wî de ji bo fermanên Xuda û li pêşgirtina wî ya ji bo hezkirina Xuda li ser hezkirina mêl e.

Palpiştîya feqîrî û temînkirina îhtiyaca hewcedaran e. Ev jî di navbera zengîn û feqîran de hevhezîyê zêde dike û di navbera ferdên civaka misliman de bilindtirîn dereceyên palpiştîya civakî tehqîq dike.

Serfkirina li mirovan û înfaqkirina di rêya Xuda de ji însên re dixe şêwe û adet.



Fezîleta Zekatê

1. Ew ji bo gihiştina rehma Xuda sersebeb e.

Lewra Xuda [ezzewecelle] gotiye: {Rehma min jî dor li her tiştê girtiye. Ezê wê ji bo yên ku xwe diparêzin û zekata xwe didin û ewên ku îmanê bi ayetên me tînin, binivîsim.} [Eraf, 156]

2. Ew ji bo heqkirina arîkarîya Xuda şert e. Xuda [ezzewecelle] gotiye: {Bêguman kî arî Ellah bike, hemin ewê jî arî wî bike. Bêguman Ellah, xurt û destbilind e. Ewên ku heke em, li sererdê desthilatiyê bidin wan, ewê nimêjê bikin, zekatê bidin.} [Hec, 40-41]

3. Ew ji bo efûbûna gunehan sebeb e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Sedeqe gunehan veditemirîne, her wekî ku av jî agir veditemirîne.» (Tirmizî rîwayet kiriye.)

Ew malên ku zekat di wan de wacib e



Şertên wacibbûna zekatê

1. Îslam [mislimanbûn] e.

Zekat, ji mirovê kafir çênabe. Lewra Xuda kar û emelê kafiran qebûl nake.

2. Azadbûn e.

Zekat, li ser koleyan ne wacib e. Lewra malê wî jî milkê xwediyê wî ye.

3. Milkê nîsabê ye.

Nîsab,

Nîsab, miqdarekî mueyyen ji mal e. Dema mal bigihîje wî miqdarî hingê zekat têde wacib dibe.

Şertên nîsabê

a- Divê nîsab, ji îhtiyacên însên yên zerûrî zêde be. Îhtiyacên zerûrî ew in ku însan bê wan nikare bijî. Her wekî xwarin, cil û xanî. Lewra zekat ji bo palpiştîya feqîran wacib e. Naxwe divê xwediyê mal jî ne mûhtac be.

b- Divê nîsab [ew malê ku bi ber zekatê dikeve] bi awayekî tam milkê şexsekî mueyyen be. Zekat di malê ğeyrê şexsekî mueyyen de ne wacib e. Wek nimûne; ew malê ku ji bo avakirina mizgeftekê hatibe komkirin, yan ji bo berjewendîyên giştî hatibe weqifkirin, yan jî ew malên ku di sindoqên komeleyên xêrxwaz de hatine danîn.



4. Derbasbûna salê bi ser mal de ye

Sal,

Saleke temam ya hicrî ye.

Derbasbûna salê jî ev e; divê di ser nîsabê de diwazdeh mehên qemerî [heyvî] derbas bibin û ew mal jî hîn di milkê xwediyê xwe de be.

Ev şert di zêr û zîv, pertalên ticaretê, hêştir, dewar û pez tenê de lazim e. Herçî çandinî, fêkî, maden û defîne in, di wan de derbasbûna salê ne şert e.



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec







Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Zekata tiştên ku ji erdê derdikevin

2 Zekata tiştên ku ji erdê derdikevin

Tiştê ku ji erdê derdikevin;
Her tişt in, ku ji erdê derdikevin û îstîfadekirina ji wan jî mûmkin e.

Ew tiştên ku ji erdê derdikevin du celeb in: Hibûbat [dane], fêkî, maden û defîne

Naverok



Ya yekê: Hibûbat [dane] û fêkî

Hibûbat;

Ew her dane ye ku dibe qût, çi ceh be, çi genim be û çi jî dîgerên wan bin.

Fêkî;

Ew her fêkî ye ku dibe qût, çi xurme be, çi mewîj be, çi behîv be.

Hukmê zekata hibûbat [dane] û fêkîyan

Zekata hibûbat [dane] û fêkîyan wacib e.

Lewra Xuda [ezzewecelle] dibêje: {Heqê [zekata] wê roja çinîna wê bidin.} [Enam, 141]

Hem jî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dibêje: «Di ew tiştê ku asîman û kehnî wî av didin û ya ku bi xwe av vexwe de zekat dehyek e. Di wê ya ku bi rijandina avê li serê tê avdan de jî zekat nîvê dehyekê ye.» (Buxarî ew rîwayet kiriye.)

Şertên wacibbûna zekata hibûbat [dane] û fêkîyan

1. Divê ew bibe qût:

Heke ew nebe qût, ew ji bo xwarina rojane tenê be, hingê zekat têde nîn e. Lewra ewê ku nebe qût, malîyeta wî temam nabe; ji ber ku mirov nikare di mal de jê menfîet bibîne.

2. Divê ew were kişandin:

Divê ew bi wesqan were teqdîrkirin, ew jî kişandin e. Ev jî qebûlbûna wê nîşan dide.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Di hibûbat û xurmeyan de zekat nîn e; heta negihîjin pênc baran.» (Mûslim rîwayet kiriye.)

Heke ew neyên kişandin her wekî sebze û giyayan di wan de zekat nîn e.

3. Divê ew bi çandina însên ya di zevîya xwe de şîn bûbin:

Naxwe ewên ku bi xwe şîn bûbin, di wan de zekat nîn e.

4. Gihiştina nîsabê [miqdarê zekatê] ye:

Ew miqdar jî pênc bar in. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Di hibûbat û xurmeyan de zekat nîn e; heta negihîjin pênc baran.» (Mûslim rîwayet kiriye.)

Naxwe miqdarê nîsabê sêsed sae'ên nebewî ne. Ew jî 612 kgam ji genimê rind e. Ji berê [mehsûlê] salê yên yekcins hinek ji wan li ser hev tên komkirin ji bo bigihîjin ber nîsabê. Her wekî celebên xurmeyan. Naxwe xurmeyên sukkerî û xurmeyên berhî tên berhevkirin. Lewra ew herdu du celebên yekcinsî ne. Lêbelê ji bo gihiştina ber nîsabê du cins nayên berhevkirin. Wek nimûne; genim û ceh nayên berhevkirin û genim û xurme jî nayên berhevkirin.



Wextê wacibbûna zekata hibûbat [dane] û fêkîyan

Dema hibûbat [dane] bişide, zekat têde wacib dibe. Di fêkîyan de jî, dema belate bikeviyê; yanî êdî ew bibe fêkîyekî xweş ku were xwarin, hingê zekat têde wacib dibe. Naxwe kî, fêkî yan jî hibûbatan [daneyan] piştî têde wacibbûna zekatê bifiroşe, hingê zekat li ser firoşerî ye. Lewra di wextê wacibbûna zekatê de ew xwediyê wî bûye.

Miqdarê zekata wacib di hibûbat [dane] û fêkîyan de

1. Di wan hibûbat [dane] û fêkîyên ku bê kulfet û malîyet tên avdan de; her wekî yên ku bi ava baran û kehnîyan tên avdan, zekat 10% deh ji sedan [ji deh behran behrek] wacib dibe.

2. Di wan hibûbat [dane] û fêkîyên ku bi kulfet û malîyet tên avdan de; her wekî yên ku bi ava bîran tên avdan, zekat 5% pênc ji sedan [ji deh behran nîv behr] wacib dibe.

3. Di wan hibûbat [dane] û fêkîyên ku bi herduyan tên avdan de; her wekî yên ku carekê bi ava baranê û careke din jî bi ava bîran tên avdan, zekat 7.5 % sê parên çaryeka dehê yanî heft û nîv ji sedan [ji deh behran sê parên behrekê] wacib dibe.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Di yên ku baran, çem û kehnî wan av didin de zekat dehyek e; di yên ku bi heywanan tên avdan de jî zekat nîvê dehyekê ye.» (Mûslim rîwayet kiriye)



Telefbûna hibûbat [dane] û fêkîyan

Dema hibûbat [dane] û fêkî bê telefkirin û bê îhmalkarîya xwedî, telef bibe, zekat li ser wî nîn e. Heke piştî wacibbûna zekatê têde bi îhmalkarîya xwedî, yan jî bi qesd telef bike, hingê zekat ji ser wî nakeve, edakirina wê li ser wî wacib dibe.

Zekata hinguvîn

Îbn Ebdûlbirr [rehma Xuda lê be] ji cumhûrî [pirranîya aliman] radigihîne ku “zekat têde nîn e,” ev ya xuya ye. Lewra ne di Kîtabê [Qur’anê] de, ne jî di sunnetê de delîleke sehîh û eşkere nîn e ku wacibbûna zekatê di hinguvîn de nîşan bide. Esl jî bêrîbûn e, heta delîleke wacibbûnê ranebe pêşîya mirov.

Ya duduyan; maden û rîkaz in

Maden;

Maden, zêr, zîv, hesin, cewher û qela û yên wekî van e ku ji ğeyrê cinsê xwe ji erdê tên derxistin. Hem jî ew maddeyên xam in ku ji erdê tên derxistin.

Define;

Ew malê wekî zêr û zîv û yên wekî wan e ku bi kirina însên di zikê erdê de hatine veşartin.

Hukmê zekata maden û definan wacibbûn e.

Lewra Xuda Teala gotiye: {Gelî yên ku îman anîne! Ji malê pak yê ku we qezenc kiriye û ji yên ku me ji we re ji erdê derxistine jî înfaq bikin.} [Beqere, 267]

Hem jî gotina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye: «Di defîne de zekat pêncyek e.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)


Şertên zekata defîneyan

Ji bo zekata defîneyan ti şertek nîn e. Naxwe dema însan wan bidest bixe, ewê yekser zekata wan derxîne.

Miqdarê zekata wacib di maden û defîneyan de

Pêncyek di hindik û gelleka maden û defîneyan de wacib dibe. Lewra gotina pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gelemper e: «Di defîneyan de zekat pêncyek e.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)


Zêrê xam


Zîvê xam


Qelaya xam


Hesinê xam

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Zekata zêr û zîvan

Zekata herdu neqdan: Zêr û zîv



Naverok

Herdu neqd:

Zêr û zîv û ew bankanot in, ku îro di pîyasê de tên bikaranîn û dikevin cihên zêr û zîv.

Hukmê zekata herdu neqdan wacibbûn e,

Lewra Xuda [ezzewecelle] dibêje: {Ewên ku zêr û zîv berhev dikin û wan di rêya Xuda de înfaq nakin, mizgînîya ezabekî cansoj bide wan.} [Tewbe, 34]

Hem jî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dibêje: «Kîjan xwediyê zêr û zîv heqê wê zekatê jê eda neke, dema roja qiyametê tê, jê re dibin bistên hesinî ji êgir, ew di agirê cehennemê de li ser wî tên sincirandin; bi wan teniştên wî, enîya wî û pişta wî tê dağdan. Ew di rojeke ku miqdarê wê pêncî hezar sal de, çiqas sar dibe, jê re tê sincirandin, [ew wisan dewam dike] heta di navbera mirovan de hukm tê kirin; vêca rêya wî tê dîtin, yan bi cennetê ve ye, yan jî bi êgir ve ye.» (Mûslim ew rîwayet kiriye.)

Şertên wacibbûna zekata herdu neqdan

1. Bi ser de derbasbûna salê ye.
2. Ji xwediyê xwe re milkbûna tam e.
3. Gihiştina nîsabê ye.





Pelên neqdî;



Zîv



Zêr

Nîsaba zekata herdu neqdan

1. Nîsaba zêr bîst dînar [85 gram] e. Dînar ji zêr= çar gram û çaryeka girameke ye. Naxwe nîsaba zêr bi graman 4.25X20=85 gram ji zêrê xalis e.

2. Nîsaba zîv dused dirhem [595 gram] e. Dirhem ji zîv=2.975 gram e. Naxwe nîsaba zîv bi graman=2.975x200=595 gram ji zîvê xalis e.

3. Nîsaba pelên neqdî, li ser esasê bihayê nîsaba zêr yan jî zîv ya di wextê deranîna zekatê de tê hesabkirin û nirxandin. Dema nîsaba yekî ji wan bigihîje wî miqdarî têde zekat wacib dibe.

4. Wek nimûne; heke grama zêr=30 dolar be, dema li cem mirovekî 85x30=2550 dolar hebe, têde zekat wacib dibe.

Miqdarê herdu neqdan

Miqdarê zekata wacib di zêr û zîv û pelên malî de çaryeka dehyekê ye: 2.5% ji sedan e.

Di her bîst dinar zêr de nîvê dînarekê zekat tê derxistin. Ewa ku ji bîst dinar zêr zêde be jî çi hindik be, çi jî gelek be, li gorî wê tê hesabkirin.

Di her dused dirhem zîv de pênc dirhem zîv zekat tê derxistin. Ewa ku jê zêde be, li gorî wê tê hesabkirin.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dema dused dirhemên te hebin û sal jî di ser wan de derbas bibe, hingê di wan de pênc dirhem zekat heye. Di zêr de tiştek li ser te nîn e; heta ew ji te re bibe bîst dînar. Dema bîst dînar zêrên te hebin û sal jî di ser wan de derbas bibe, hingê di wan de nîv dînar zekat heye. Tişta ku ji wan zêde be, ew jî li gorî wê tê hesabkirin» (Ebûdawud ew rîwayet kiriye.)

Nimûneyeke tetbîqî

Zilamek 9000 [neh hezar] dolarên wî hene û li cem wî saleke temam di ser wan de derbas bû, gelo zekat li ser wî heye?

Ya yekê; emê nîsaba zekatê li gorî bihayê zêr û zîv wiha hesab bikin:

Nîsaba zekatê ji zêrê xalis heştê û pênc gram e.

= 85 gram zêrê xalis roja wacibbûna zekatê bihayê grama zêr bû, em bibêjin; grama zêr =30 dolar e.

= 85x30 = 2550 dolar e.

Nîsab =2550 dolar e. Naxwe malê vî zilamî gihaye nîsabê û salek jî bi ser de derbas bûye, naxwe hingê zekat li ser wî wacib dibe.

Ya duduyan; em miqdarê zekata ku li ser wî deranîna wê wacib dibe wiha hesab dikin:

Miqdarê zekatê=2.5% [ji çilan yek e]

=9000 x 2.5+100=225 dolar e.

Naxwe li ser vî zilamî wacib e, 225 dolar zekatê ji malê xwe derxîne.



Em nîsaba ku 85 gram ji zêrê xalis e, wiha hesab dikin û dibêjin; bihayê grama zêrê xalis di roja wacibbûna zekatê de 30 dolar e.

85

X

30

=

2550

Miqdarê nîsabê bi grama zêr

Bihayê grama zêr roja wacibbûna zekatê

Nirxê nîsabê bi neqdan





Hesabê miqdarê zekata ku deranîna wê wacib dibe, 2.5% ji nirxê mal e.

9000

X

2.5

÷ 100 =

225$

Zekata ku deranîna wê wacib e

Gelo zêr û zîv tên ser hev ji bo malê mirov bi ber zekatê bikeve?

Dema zilamek hinek zêr û zîvê wî hebe, lêbelê her yek ji wan nagihîje nîsabê. Qewlê racih; zekat li ser wî nîn e. Ewê zekata zêr li gorî miqdarê nîsaba wî bide û zekata zîv jî li gorî miqdarê nîsaba wî bide û ew ji bo temambûna nîsabê zêr û zîv nabe ser hev; lewra ew du cinsên ji hev cuda ne û delîlek jî warid nebûye, nehatiye ku lazim bike; mirov yekî ji wan bibe ser yê din da ku pê nîsab temam bibe.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dibêje: «Di miqdarê kêmî pênc weqîyan de zekat nîn e.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)

Naxwe ewê ku zêr û zîv bîne berhev, ew zekatê di kêmtirî pênc weqîyên zîv de wacib dike.

Zekata xişran

Xişr û zînet du qism in: Xişrên zêr û zîv hene, xişrên ne zêr û zîv hene.

1. Xişrên zêr û zîv

Qismê yekê; ew xişrên ku ji bo hilanîn û komkirinê tên hazirkirin, yan jî ewên ku bi nîyeta ticaret û bazirganîyê tên standin, zekat di wan de wacib e.

Qismê duduyan; ew xişrên ku ji bo îstîmal û bikaranînê tên hazirkirin, îhtiyat û tedbîr dixwaze, mirov zekatê ji wan derxîne ji bo tiştek di stûyê mirov de nemîne.

Lewra jinek hate cem pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin], keçeke wê jî pê re bû, di destê keça wê de du bazinên sitûr yên ji zêr hebûn, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re

got: «Ma hûn zekata van didin.» Wê jê re got; ne xêr! Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got: «Ma bi te xweş e ku Xuda roja qiyametê di şûna wan de du bazinên ji êgir bixe destên te.» Ew dibêje; min ew derxistin û ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re avêtin. Wê got; «bila ew ji Xuda [ezzewecelle] û pêğemberê wî [dirûd û silavên Xuda lê bin] re sedeqe bin.» (Ebû Dawud rîwayet kiriye.)

Hinek alim hene, di xişran de zekatê wacib nabînin. Lewra ev xişr ne malek e ku ji bo zêdebûnê hatibe komkirin. Lêbelê ew pertalekî şexsî ye, tê bikaranîn û îstîfade jê tê kirin, ew jî her wekî cil, hewcehîyên malê û pertalan. Xişr îhtiyac û zîneta jinê ye. Esl ev e; mal zêde bibe, yan jî qabilê zêdebûnê be, heta zekat têde tehqîq bibe.

Lê îhtiyat û tedbîr dixwaze, mirov zekatê ji xişrên ku ji bo bikaranîna mûbah û zînetê hatine hazirkirin jî derxîne. Lewra ev gotin, bi îhtiyattir e û bêhtir tiştek di stûyê mirov de nahêle.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Tişta ku te dixe gumanê terk bike û tişta ku te naxe gumanê wê bike.» (Buxarî rîwayet kiriye.)



Xişrên zîv



Xişrên zêr

2. Xişrên ne zêr û zîv:

Her wekî elmas, yaqût, mercan û yên wekî van, bihayê van çiqas giran be jî zekat di van de wacib nabe; lêbelê heke ew ji bo ticaretê hatibin hazirkirin, hingê ew jî dikevin çarçoveya pertalên ticaretê.

Mercan



Yaqût



Elmas





Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

[Zekata pertalên ticaretê [bazirganîyê



Zekata pertalên ticaretê

Naverok

Pertalên ticaretê;

Her tiştê ku bi qesda kar û qezencê ji bo kirîn û firotinê hatibin hazirkirin.

Çima jê re “pertal” hatiye gotin? Lewra di wan de îstiqrar çênabe, ew xuya dibin, paşê ji holê radibin diçin. Lewra bazirgan van pertalan bi xwe naxwaze; lêbelê ew kar û qezenca wan ya ji diravan dixwaze.

Pertalên ticaretê, temamê malên ji bilî dirav û pereyan di nav xwe de digrin. Her wekî taksîyan, cilan, qumaşan, hesin, texte û ji bilî van jî çi ji bo ticaretê hatibin hazirkirin ew pertalên ticaretê ne.

Hesin



Taksî



Texte



Cil û berg





Hukmê zekata pertalên ticaretê

Zekata pertalên ticaretê wacib e.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Gelî yên ku îman anîne! Ji qezenca xwe ya pak înfaq bikin.}[Beqere, 267]

Pirranîya ehlê îlmê dibêjin; ji vê ayetê meqsed "zekata pertalên ticaretê ye."

Lewra Xuda Teala di ayeteke din de jî dibêje: {Ji malên wan sedeqeyekê bistîne.} [Tewbe, 103]

Malê ticaretê ji malên din bêhtir xuya dibe, ji lewma zekat têde wacib e.

Şertên wacibbûna zekata pertalên ticaretê

1. Divê bihayê wan bigihîje nîsabê. Nîsab, bi bihayê zêr û zîv tê nirxandin û dîyarkirin.

2. Divê sal di ser wan de derbas bibe.

3. Divê ew ji bo ticaretê hatibin hazirkirin. Yan ew bi qesda kar û qenckirinê hatibin standin.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Emel, bes bi nîyetan e.» (Buxarî û Mûslim ew rîwayet kirine.)

Heke xwedî, nîyeta xwe ji ticaretê bi îstîmal û bikaranîna wan ya ji bo şexsê xwe, biguherîne, hingê sala ji bo hesabê zekatê qut dibe. Heke ew dîsa nîyeta xwe ji îstîmala şexsî bi ticareta ji bo kar û qezencê biguherîne, sala ji bo hesabkirina zekatê ji nû ve dest pê dike. Lêbelê heke qesda wî bi vê nîyet guherandinê hîlekirin be û qesda wî ji stûyê xwe xistina zekatê be, hingê sala ji bo hesabkirina zekatê qut nabe ew çax.

Nimûneya vê wiha ye: Heke mirovekî di meha Mûherremê de zevîyek bi qesda ticaretê kirrî, paşê wî di meha Şabanê de nîyeta xwe guherand ku wê bixe xanî ji bo têde rûne û bijî, hingê sala hesabkirina ji bo zekatê qut dibe. Paşê wî di meha Şewalê de nîyeta xwe ji çêkirina xanî di zevîya xwe de guherand û ji xwe re got; ezê têde ticaretê bikim, hingê ji meha Şewalê saleke nû dest pê dike. Lêbelê heke wî ev nîyet guherandina xwe ji bo hîlebazî bi qesda 'ji stûyê xwe xistina zekatê' kiribe, hingê ew sala ji bo hesabkirina zekatê qut nabe.

Awayê derxistina zekata pertalên ticaretê

Dema sal di ser pertalên ticaretê de derbas bibe, pertalên ku ji bo firotinê hatine rapêşkirin tên dîyarkirin û ew bihayê wan bi bihayê xwe yê halê hazir di bazarê de tê kufşkirin, paşê li gorî îhtiyaca feqîran zekat ji wan bi xwe, yan jî ji bihayê wan tê derxistin.

Tacir [bazirgan] zekata pertalên ticaretê çawa hesab dike?

1. Ew pertalên xwe yên ticaretê bi bihayê wan yê halê hazir dinirxîne.

2. Ew diravên xwe yên din jî tîne ser hev, hîç ferq nake; çi ew di ticaretê de bikaranîbin, çi jî ew di ticaretê de bikar neanîbin?

3. Ew deynên xwe yên li xelkê, ewên ku edakirina wan garantî ye, tîne ser hev.

4. Ew ji tevahîya van diravên xwe deynên xelkê yên li xwe ji wan dixe.

5. Zekat ji tevahîya diravên mayî tê derxistin. Ew jî çaryeka dehyekê ye. 2.5% du û nîv ji sedê ye.

[Zekata wacib = Bihayê pertalên ticaretê + dirav + deynên wî li xelkê, ewên ku edakirina wan garantî yedeynên xelkê li bazirganî] + [rêjeya zekatê li gorî sala heyvî 2.5% ji çil behran behrek tê derxistin].

- Ji bo hesabkirina zekata ticaretê, mirov li malên ku zekat lê dikeve yên mewcûd, li stoka wan û bihayê wan yê roja wacibbûna zekatê têde, dinêre. Di vê xusûsê de mirov arîkarîyê ji lîsteya navenda malî-budçê-dixwaze; lê bêyî ku mirov di hesabê kar û ziraran de li kar û zirarê binêre.

- Ew maddeyên ku ji bo ambalaj û pakêt-kirinê hatine hazirkirin nayên hesabkirin; dema wî ew bi qesda firotina parekende nekirrîbin. Lêbelê dema ew di firotina pertalên ticaretê de bên bikaranîn; vêca heke wekî 'poşetên taybet' ew bihayê wan pertalan zêde bikin, bihayê wan jî tê hesabkirin; lêbelê heke ew bihayê wan zêde nekin, her wekî pelên ambalajê, ew nakevin nav nirxandina mal û hesabkirina ji bo zekatê.

- Nirxandina mal, ji bo her bazirganî bi wî bihayê ku normal mirov dikare pê li cem paşîya salê mal pê bikirre, dibe -hîç ferq nake; çi ew bazirganê bi komelî be, çi jî ew bazirganê bi parekendeyî be- ew jî bi wî bihayê ku pê guhertin çêdibe tê hesabkirin. Ew ji bihayê firotinê -bihayê bazarê- ji malîyeta tarîxî, yan jî defterî diguhere.

- Dema nirxê pertalan di navbera roja wacibbûna zekatê û roja edakirina wê de biguhere, hingê nirxê roja wacibbûna zekatê derbasdar e. Hîç ferq nake; çi ew zêde bûbe, çi jî ew kêm bûbe.

- Zekata pertalên menqûl [guhêzbar] berî teslîm standina wan li ser xwediyê wan e. Milkbûn di pertalên firotî de bi salixê qebzkirinê hasil dibe. Naxwe ew pertalên firotî bi salixê di rê de, wek nimûne; heke li ser esasê teslîmkirina wan di bendera firoşerî de hatibin firotin, bi teslîmkirina wan ji bo barkêşê dibe milkê wî. Heke ew li ser esasê teslîmkirina wan di bendera kiryarî de hatibe firotin, bi gihiştina wê ji bo bendera gihanê dikeve ber milkê wî. (Li tewsîye û biryarên civîna heftan ya mijarên zekatê yên hevdem ya sala 1417h. 1997z. binêre!)

- Dema malên ticaretê di nav xwe de bankanotên cuda cuda, yan jî zêr û zîv bihewîne. Hingê ew radibe ji bo naskirina miqdarê derxistina wî wacib serî li wan bankanotan dide ku tacir [bazirgan] wan ji bo nirxandina pertalên ticareta xwe digre û ew jî li gorî nirxê derbasdar yê di roja wacibbûna zekatê de wan hesab dike.

- Malên ticarî, ewên ku kiryar lezê li dana heqê wan dike; lêbelê hîn ev mal teslîm negirtine, hingê zekata vî malî li ser kiryarî ne wacib e; lê ew li ser firoşerî wacib e.

Zekata maddeyên xam; ewên ku dikevin nav pîşesazîyê û maddeyên arîkar

1. Maddeyên xam -yên pêşîn- ewên ku hatine hazirkirin ji bo bikevin nav çêkirina maddeyên pîşesazîyê. Her wekî hesin di çêkirina erebe û taksîyan de û zeytan di çêkirina sabûnê de zekat di wan de wacib e. Ew jî li gorî bihayê wan yê ku mûmkin e mirov, di dawîya salê de pê bikirre, tê hesabkirin. Ev li ser heywan, hibûbat [dane] û giyayên ku ji bo pîşesazîyê tên amadekirin jî şamil tê.

2. Maddeyên arîkar, ewên ku nakevin nav çêkirina maddeyên pîşesazîyê her wekî şewatekê [sotemenî] di pîşesazîyan de, ew her wekî eslên sabit in, zekat di wan de nîn e.

3. Zekata malên neçêkirî û malên ku çêkirina wan hîn temam nebûye:

4. Zekat di malê çêkirî û malê ku çêkirina wan hîn temam nebûye de wacib e; zekata pertalên ticaretê li gorî nirxê wan di halê wan yê hazir yê di dawîya salê de tê hesabkirin.



Kombûna sebebekî din ji bo zekatê digel pertalên ticaretê

Dema digel pertalên ticaretê sebebekî din ji bo zekatê berhev bibe her wekî çandinîyê, ew zekata pertalên ticaretê dide.

Hinek cure malên ku zekat di wan de ne wacib e

- Ew tiştên ku ji behrê dertên, her wekî durr, mercan û masîyan zekat di wan de nîn e. Lêbelê dema ew bibin pertalên ticaretê, hingê zekat li wan dikeve.

- Ew pertalên wekî arsa, erebe-taksî û yên wekî wan, ewên ku ji bo kirê tên amadekirin, di wan de zekat nîn e. Lêbelê zekata di kirêya wan de heye, dema ew bigihe ber nîsabê û sal jî di ser de derbas bibe.

- Ew îhtiyacîyên ku însan wan ji xwe îstîmal dike û bikartîne her wekî taksîya wî û xanîyê wî, di wan de zekat nîn e.

- Dema digel pertalên ticaretê sebebekî din jî ji bo zekatê berhev bibe, her wekî zîraet û çandinîyê, ew zekata pertalê ticaretê dide.

Zekat li ser sermaye ye

Ew malê ku zekat lê dikeve, ew serê mal û sermaye ye; ewê ku tedawul pê çêdibe, ewê ku bi qesda kar û zirarê ji bo kirrîn-firotinê tê amadekirin. Herçî ew malê ku sabit be, ew li cem nirxandinê nayê hesabkirin û ji ber wî ve zekat jî nayê derxistin. Her wekî refan û berfgîrên ku mal di wan de tê parastin, hem jî ew erebeyên ku mal bi wan tê barkirin û birin û anîn û aletên ku mal bi wan tê rakirin û yên wekî van.

Milkê nîsabê

Gelo di temamê salê de ji serî heta bi dawiyê şert e milkê nîsabê li cem wî hebe? Yan têrê dike ku di serê salê û dawîya wê de milkê nîsabê li cem wî hebe? Yan jî derbasdarî bi dawîya salê tenê ye?

Derbasdarî, bi temambûna nîsabê ye hem di serê salê de, hem jî di dawîya salê de. Lewra nirxandina mal di temamê salê de pirr zehmet e. Serê salê hatiye qebûlkirin ji bo çêbûna sebebê wacibbûnê û dawîya salê jî ji bo hatina wextê ye. Ya hêsan ji bo mislimanî bila ew civanekî ji xwe re dîyar bike, her wekî meha Remezanê, yan jî meheke din, bila ew di vî civanê xwe de malê xwe binirxîne û zekata xwe bide.

Zekata pişkan

Hisse;

Perçeyek ji perçeyên wekhev e, ji serê malê [sermayeya] şirketa hevpişk.

Nimûneya vê wiha ye; şirketa hevpişk, sermayê wê sê mîlyon doloar e. Perçeyên serê malê wê di wexta vekirina wê de deh hezar perçe ne. Her perçeyek 300 dolar e. Ev perçe pişk e. Hissedar, yan jî xwediyê pişkê di şirketê de bi qasî pişka xwe şirîk e.

Hukmê tedawila pişkan,

Mûbah e, heta ku kar û emelê şirketê ne heram be, yan jî têde kar û dan-standina bi ribayê çênebe.

Awayê zekata pişkan

- Rêvebirîya şirketê, di şûna hissedarên xwe de zekatê ji hisseyên şirketê derdixe; dema di ristenameya wê ya esasî de ev madde hebe, yan jî pişkdaran ew di derxistina zekatê de kiribe wekîlê xwe.

- Dema şirket derxistina zekatê bixe dest xwe, komîsyona fiqhzanî ya ser bi rêxistina komcivîna îslamî ve eşkere kiriye ku zekat bi rêvebirîya şirketê ve girêdayî ye û ew şexsek qebûl kiriye. Ev qebûla wan, esas girtina tevlîhevkirinê ye; ewa ku di bara zekata çarpêyan de di sunneta pak de hatiye. Hinek aliman ew di temamê mal û samanan de umûmî qebûl kirine. Yanî malê temamê pişkdaran wek malê şexsekî tenê tê qebûlkirin û ji vî cîhetî ve zekat û miqdarê nîsabê têde tê ferzkirin û derxistin.

- Cumhûrê aliman di bara zekata şirketan de vî prensîpê tevlîhevkirinê esas nagirin û li pişka her şirîkî li gorî hisseya wî dinêrin.

Hêjayê gotinê ye; komcivîna duduyan ya komîsyona lêkolînên îslamî di vê mijarê de nêrîna cumhûrê aliman esas girtiye û prensîpa tevlîhevkirinê esas negirtiye. Lêbelê li her şirîkekî li gorî pişka wî meyzandiye.





Ji lewma wê ev qerar daye:

“Di wan şirketên ku di wan de gellek pişkdar hene, di tetbîqkirina van hukman de li tevahîya kar û qezenca şirketan nayê meyzandin; lêbelê li vî esasî dinêre ku her şirîkek pişka wî, wî elaqedar dike.”

- Di vê rewşê de divê rêvebirîya şirketê wan pişkên ku di wan de zekat ne wacib e, ji serê malê xwe bixe, wekî pişka weqfa xêrxwazî û pişkên alîyên xêrxwazî û eslên malên xwe yên sabit, ewên ku di wan de zekat nîn e, her wekî avahîyan, kargehan, kel û pelan û erebeyên ku ji bo bikaranînê û yên wekî wan in, ew malên mewcûdên ku zekat li wan nakeve.

Lêbelê dema rêvebirîya şirketê bi derxistina zekatê ranebe, divê pişkdarên şirketê bi xwe zekata pişka xwe derxînin.

Ew jî wiha çêdibe:

1. Pişkên şirketên çandinî, zekata wan tê derxistin her wekî zekata çandinî û fêkîyan.

2. Pişkên şirketên bazirganî, zekata xwe ji esl û karê pev re derdixin. Têde pişk bi bihayê xwe yê bazarê yên di roja wacibbûna zekatê de tên nirxandin.


3. Pişkên şirketên pîşesazî, zekata xwe ji karê xwe yê safî derdixin; ne ji hazirkirî, avahî û yên wekî wan:

4. Dema pişkdar pişka xwe di nav salê de bifiroşe, ew bihayê wan dixe nav malê xwe û dema sala zekata wî were, ewê pê re zekata wan jî bide. Herçî kiryar e, ew jî zekata pişka xwe wekî bûrî dide.
(Qedaya fiqhîye mûasere Dr. Selah es-Sawî, rûpel, 54 û yên piştî wê.)

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review

Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro

Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Zekata heywanên çarpê [hêştir, [dewar û pez

5 Zekata heywanên çarpê



Heywanên çarpê;
Hêştir , dewar û pez

Naverok

Hukmê zekata heywanên çarpêyan wacib e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kîjan xwediyê hêştir, dewar û pezan zekata wan nede, ew roja qiyametê bi mezintirîn qelewbûna xwe tê, bi qiloçên xwe lê dixe û bi simên xwe pêlê dike. Çi qas dawîya wan xilas dibe, ya pêşîya wan lê vedigere [ev wisan dewam dike] heta di navbera mirovan de hukm tê kirin.» (Mûslim ew rîwayet kiriye.)

Şertên wacibbûna zekata heywanên çarpêyan

1. Saleke temam li cem xwediyê wan di ser wan re derbas dibe. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Zekat di malekî de nîn e, heta sal di ser de derbas nebe.» (Îbnmace ew rîwayet kiriye.)

2. Divê ew bi devê xwe biçêrin. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Di her hêştira ku bi devê xwe diçêre de di her çilan de bintû lebûnek zekat heye.» (Nesaî ew rîwayet kiriye.)



Hêştirên ku bi devê xwe diçêrin; ew hêştir in ku bi devê xwe ji giyayên çêrîyê û pûşê helal xwedî dibin. Ew giya bi kirina Xuda Teala şîn dibe ne ku însanan ew çandiye. Lêbelê heke xureka wan ji çandinîya mirovan be, ew nayê jimartin ku bi devê xwe diçêre û têde zekat jî nîn e.

3. Divê ew werin xwedîkirin ji bo îstîfadekirina ji şîrên wan û sexlên wan; ne ko ji bo kar û şiğûl bin. Hêştira karker, ew hêştir e ku xwediyê wê, wê ji bo cot, avdana erdê, yan birina pertalan, yan jî hilgirtina baran, bikartîne.

Hêştirên karker, di wan de zekat nîn e. Lewra ew çax, ew dikeve nav îhtiyacên însên yên eslî yên wekî cil û bergan. Lêbelê dema ew ji bo kirêkirinê hatibe hazirkirin, zekat di qezenca wê de heye dema sal di ser de derbas bibe.

4. Divê çarpê bigihîjin nîsaba şerîî.

Nîsaba şerîî ji bo zekata heywanên çarpêyan

Ya yekê; nîsabên hêştiran [devehan] û miqdarê ku di her nîsabeke wan de wacib dibe

Enes kurê Malik [Xuda jê razî be] rîwayet dike: Ebûbekrê siddîq [Xuda jê razî be] ji wî re nivîsandibû: «Ev ferza sedeqê [zekatê] ye. Ewa ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li ser mislimanan ferz kiribû, ewa ku Xuda fermana wê li pêğemberê xwe [dirûd û silavên Xuda lê bin] kiribû; di bîst û çar hêştir û kêmtirî wan de, ji pez, ji ber her pêncan ve pezek zekat heye. Dema ew bigihin bîst û pêncan heta bi sih û pêncan di wan de bintû mexadeke (“Bintû mexad” Ewa ku salek temam kiribe.) mê zekat heye. Dema ew bigihin sih û şeşan heta bi çil û pêncan di wan de bintû lebûneke (“Bintû lebûn” Ewa ku du sal temam kiribe.) mê zekat heye. Dema ew bigihin çil û şeşan heta bi şêstan di wan de hiqqekek (“Hiqqe” Ewa ku sê sal temam kiribe.) zekat heye. Dema ew bigihin şêst û yekê heta bi heftê û pêncan di wan de cezeekek (“Cezee” Ewa ku çar sal temam kiribe.)zekat heye. Kî ji çar hêştirên wî pê ve nebin, di wan de sedeqe [zekat] nîn e; lêbelê heke xwediyê wan bixwaze tiştekê bide, ew cuda ye. Dema ew bigihin pênc hêştiran di wan de pezek (Di pezan de ya ku ji bo zekatê tê derxistin cezea ji mehan çêdibe. Ew jî ew berx e ku şeş mehî be, ji pezê reş jî senîye çêdibe. Ew jî ewê ku salek temam kiribe.) zekat heye.» (Buxarî rîwayet kiriye.)

Nîsab û zekatên hêştiran [devehan]

Hijmara hêştiran	Miqdarê zekata wacib têde
9:5	Pezek
14:10	Du pez
19:15	Sê pez
24:20	Çar pez
35:25	Bintu-mexad [ewa ku salek temam kiriye]
45:36	Bintu-lebûn [ewa ku du sal temam kiriye]
60:46	Hiqqe [ewa ku sê sal temam kiriye]
75:61	Ceze‘e [ewa ku çar sal temam kiriye]
90:76	Du Bintu-lebûn
120:91	Du Hiqqe
.......120	Di her çil hêştiran [devehan] de bintu-lebûnek û di her pêncî hêştiran de hiqqekek zekat heye.

Ya duduyan; nîsabên dewaran û miqdarê ku di her nîsabeke wan de wacib dibe

Mûaz kurê Cebel [Xuda jê razî be] dibêje: «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ez şandim Yemenê û ferman li min kir ku ez ji her sih dewaran nêr, yan jî mê zekat bistînim û ji her çilan jî nagohnekê ("Tebîî û Tebîe" Ew golikê ku salek temam kiribin.) bistînim. ("Mûsinne" Ewê ku du sal temam kiribin.)» (Ebûdawud rîwayet kiriye.)

Nîsab û zekatên dewaran

Hijmara dewaran	Miqdarê wacib di wan de
30:39	golik [ewê ku salek temam kiriye].
40:59	nagohn [ewê ku du sal temam kirine].
60:69	du golik
70:79	golikek nagohnek

Ya siséyan; nîsabên pez û miqdarê ku di her nîsabeke wan de wacib dibe

Di hedîsa Enes [Xuda jê razî be] ya bûrî de ev jî hatiye: «Di sedeqa [zekata] pez de di yên ku bi devê xwe diçêrin de, dema bibin çil heta bi sed û bîstan pezek zekat heye. Dema ew ji sed û bîstan zêde bibin heta bi du sedan du pez zekat hene. Dema ew ji du sedan zêde bibin heta bi sê sedan di wan de sê pez zekat hene. Dema ew ji sê sedan zêde bibin, di her sedekê de pezek zekat heye. Dema ew pezên mirov, yên ku bi devê xwe diçêrin ji çilan pezeke tenê kêm be, hingê di wan de zekat nîn e. Lêbelê heke xwediyê wan tiştekê sedeqe bide ew cuda ye.» (Buxarî ew rîwayet kiriye.)

Nîsab û zekatên pez

Hijmara pêz	Miqdarê zekata wacib di wan de
40:120	pezek
121:200	du pez
201:300	sê pez [çi qas sedek lê zêde bibe, pezek li zekata wî jî zêde dibe].

Di sifetê wacib de

Di zekatê de ya wacib ev e; ew ji malê navê dibe, ne ji qencê wî, ne jî ji xirabê wî. Naxwe bila erkedarê zekatê salên wacib li ber çavên xwe bigre. Lewra ji wê kêmtir çênabe. Ji ber ku ew ziraré digihîne feqîran. Ji wê bilindtir û çêtir jî nayê standin. Lewra ew jî zulm û tengavkirina zengînan e. Sewala nexweş, ya eybdar û yextîyara hizhizî jî nayên standin. Lewra ew feyde nadin feqîran, di hemberê van de ya dermale jî nayê standin. Dermale, ewa qelew e ku ji bo xwarinê hatibe xwedî kirin. Ewa avis û şîredar jî nayê standin. Şîredar ewa ku kehrê xwe xwedî dike. Ewa avis jî nayê standin û ewên qencên ku çav ji wan têr dibin jî nayên standin, lewra ew ji malên qenc in, standina wan jî zirarê digihîne zengînan.



Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Zinhar, xwe ji standina malên wan yên zehf baş biparêze!» (Buxarî ew rîwayet kiriye.)

Di bara xultetê [tevlîhevkirinê] de di heywanên çarpêyan de

Ew du celeb in:

Celebê yekê; tevlîhevkirina eynan e

Tevlîhevkirina eynan ev e; du mirov di malekî de hevşirîk in, ew di navbera wan de hevpar e, para yekî ji wan ji para yê din nehatiye veqetandin. Tevlîhevkirina eynan bi mîrasê dibe û bi kirînê jî dibe.

Celebê duduyan; tevlîhevkirina ewsaf e

Ew jî ev e; para her yekî ji wan ji para yê din veqetandî û pêzan e. Cîrantî tenê wan digihîne hev.

Ew bi herdu celebên xwe herdu malên tevlîhevkirî dixe wekî malekî tenê. Dema tevahîya herdu malan bibe nîsab. Divê herdu şirîkên malê wan tevlîhevkirî ji ehlê wacibbûna zekatê bin. Heke yek ji wan kafir be, tevlîhevkirin ne durust e û ew bandorê jî nake. Divê ew herdu malên tevlîhevkirî di hevşî [ew êwirgeh] de hevşirîk bin. Divê ew di çêregehê de hevşirîk bin, ew bi hev re herin çêregehê û ji çêregehê bi hev re jî vegerin. Divê ew di satilê, mera û nêrî de jî hevşirîk bin. Naxwe nêrîyê gohnxwarinê dê yek be û ew herdu jî dê têde hevşirîk bin. Dema ev şert li cih bin, herdu mal bi bandorê tevlîhevkirinê dibe wek malekî tenê.



Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Ji tirsa zekatê ne malê ji hev cuda tê komkirin; ne jî malê komkirî ji hev tê cudakirin. Ew malê ku ji tevlîhevkirinê be, ew di navbera wan de wekhev li wan vedigere.» (Îbnxuzeyme rîwayet kiriye.)

Naxwe tevlîhevkirin di wacibbûna zekat û saqitkirina wê de bandor û tesîrê dike. Ev jî di heywanên çarpêyan tenê de çêdibe; di ğeyrê wê de çênabe.

Nimûneya komkirina malên ji hev veqetandî wiha ye:

Sê şexs hene, her yek ji wan çil pezên wî hene. Tevahîya pezê wan sed û bîst pez çêdibe. Heke em her yekî ji wan yekî serbixwe qebûl bikin, li ser her sê yan sê pez zekat wacib e. Lêbelê dema em pezê her sêyan kom bikin, pezeke tenê zekat li malê her sêyan dikeve. Li vir, her sêyan malê xwe kom kirine, ji bo sê pez zekat li malê wan nekeve; lêbelê pezeke tenê zekat li malê wan bikeve.

Nimûneya ji hev veqetandina malê komkirî jî wiha ye:

Şexsek çil pezên wî hene. Dema pê dihese ku karmendê zekatê hatiye, ew pezê xwe ji hev vediqetîne, bîst pezan dixe cihekî û bîst pezên xwe yên din jî dixe cihekî din. Bi vî awayî, zekat ji wan nayê standin, lewra ew ji hev cuda nagihin ber zekatê. (Buxarî ew rîwayet kiriye.)

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Ehlê zekatê û deranîna zekatê



Hinek celebên din ji malên zekatê

Naverok

Zekata deynan

Deyn;
Ew malê ku divê deyndar wî eda bike.

Hukmê zekata deynên wacib ji bo dîgeran li ser zekatdarî

Dema li ser şexsekî deynek hebe, miqdarê wan bigihîje nîsabê, yan jî ji nîsabê kêmtir be, zekat li ser wî wacib nabe. Lêbelê dema deyn nîsabê kêm neke, ew bi qasî deyn ji mal dikeve û ew ji malê xwe yê mayî zekatê dide.

Nimûneya wê wiha ye:

Heke 10000 dolarên mirovekî hebin û deynên wî jî 10000 dolar bin, zekat li ser wî ne wacib e. Lewra deyn nîsabê tevî bi xwe re dibe. Her wiha heke deynê mirov 9950 dolar bin, ew nîsabê kêm dike, zekat li ser wî ne wacib e. Lêbelê heke deynê mirov 4000 dolar bin, ew bi qasî deyn ji mal tê xistin, 6000 dolarên wî dimînin, di wan de zekat wacib e.

Lêbelê heke deyndar deynan di ticaretê de bikar neyêne. Her wekî ew xanîyekî ji bo çend salan bi teqsîtan bikirre. Yan jî ew deynan di kirrîna hinek aletan de ji bo projeyeke mezin bikarbîne ku hecmê

wê bi mîlyonan be. Dibe ku bazirganek karê xwe fereh bike, ew bi mîlyonan xeteke nû ji bo hilberanê bikirre û wê li xeta hilberana xwe îlawe bike. Gelo ev deynên beranînê hemberê xwe ji malên zekatê yên mewcûd saqit dikin?

Gotina vê, meneya wê: Windakirina malekî zehf ji para feqîran ya ji zekatê ye!

Heke em vê gotinê esas bigrin, ew çax mirov dê bibêje; gellek ji bazirganên vê demê zekat li ser wan nîn e. Civîna duduyan ji bo mijarên hevdem yên zekatê, ewa ku di Zîlqade ya 1409h. Hezîran 1989z. hatibû lidarxistin de bi van qeraran bi dawî bûbû:



Ya yekê: Ew temamê deynên ku karekî bazirganî fînanse dikin ji malê mewcûd yê ji bo zekatê dixe, dema li cem deyndarî pertalên -eslên sabit- zêdeyî îhtiyacên wî yên esasî nebin.

Ya duduyan; ew deynên beranînê yên ku projeyên pîşesazî yên giranbiha fînanse dikin ji malên mewcûd yê ji bo zekatê dixe, dema li cem deyndarî pertalên -eslên sabit- zêdeyî îhtiyacên wî yên eslî nebin ku mûmkin be wan bixe hemberê wan deynan. Di rewşa ku ev deynên beranînê mûeccel [paşwext] bin, ew wan ji malên mewcûd yê ji bo zekatê para salane ya ku jê tê xwestin, dixe. Dema ew pertal hebin, ew dikevin hemberî deyn, dema ew pê xilas bibe. Ew çax, deyn ji malên mewcûd yê ji bo zekatê naxe, heke ew deyn têrê nekin, ew ji malên mewcûd yê ji bo zekatê ji yê mayî dixe [saqit dike].

Ya sisêyan; ew qerzên avasazîya mûeccel [paşwext], ewa ku normal bi teqsîtên demdirêj tên razandin, deyndar piştî birrîna para salane ya ku jê tê xwestin, ya di destê wî de mayî, zekatê dide, dema malê wî yê mayî nîsab û zêdetirî wê hebe.

Hukmê zekata deynên wacib ji bo zekatdarî li ser dîgeran

1. Dema deyn, standina wan zehmet be, wekî wan deynên li mirovê mûflis, yan li mirovê zengînê ku deynê xwe dereng dixe, yan jî li mirovê ku deynê xwe înkar dike, li ser xwediyê deynan ne wacib e ku her salê zekata wan bide; lêbelê dema ew deynê xwe bistîne, hingê ewê careke tenê zekata wan bide.

2. Dema deyn, standina wan ne zehmet be, wekî wan deynên li mirovê têrmal, ewê ku deynê xwe dereng naxe, hingê divê xwediyê deynan her salê zekata deynên xwe yên li xelkê bide; lewra ew di hukmê malê di destê wî de ye.

Zekata senedan

Sened;

Pêbawerîyek e, îdxalatçî bi mûcibê wê li cem teslîm girtina wan bihayê navdêrî dide barhilgirê wê, hem jî pê re feydeyeke din jî dide ku herdu terefan li serê îttîfaq kiriye li bihayê navdêrî yê senedê

Ev ribayeke eşkere ye û heram e. Lewra deyneke di hemberî feydeyekê de ye. Sened bi sûretê xwe yê giştî ne caiz e. Lewra ew qerzeke bi feydeyeke eşkere ye. Ewê ku bi vê emel dike, divê ew li ber destê Xuda Teala tobe bike.

Hukmê zekata senedan û miqdarê wê

Sened ji bo hilgirê xwe deynekî mûeccel e, li ser cîhetê ku ew derxistiye. Tavilê; zekata senedan hukmê zekata deynan werdigre. Têde zekat wacib e, dema ew bi xwe bigihîje nîsabê. Yan jî ew bi neqd û pertalên ticaretê yên ku xwediyê wan, wan tîne ser deynên xwe bigihîje ber nîsabê û salek jî di ser de derbas bibe, ji wê çaryeka dehyekê tê derxistin. Dema sened -heke ne piştî mûddetekî zemanî- vekirina wan ne mûmkin be, zekat ji wan nakeve; lêbelê zekat li cem vekirina wan ji bo her salên derbasbûyî tê derxistin.

Zekata îkramîya dawîya xizmetê û îkramîya xanenişînîyê û mûçeyên xanenişînîyê

Îkramîya dawîya xizmetê;

Miqdarekî malî yê qutkirî ye, karker li gorî qanûn û ristenameyan di dawîya xizmeta xwe de wê ji xwediyê kar heq dike; dema şertên diyarkirî têde pêkwerin.

Îkramîya xanenişînîyê;

Miqdarekî malî yê qutkirî ye, dewlet, yan jî dezgehên elaqedar wê didin karmend û karkerê ku dikevin ber qanûna sîgorta ya sosyal, dema temamê şertên xwestî ji bo heqkirina mûçeya xanenişînî pêk nehatibin.

Mûçeya xanenişînî;

Miqdarekî malî ye, karker yan jî karmend li gorî qanûn û ristenameyan mehane wê ji dewletê yan jî dezgehên elaqedar heq dike; dema şertên diyarkirî têde pêk hatibin.

Hukmê wê

Di dirêjahîya mûddetê xizmeta xwe de zekat li ser karker, yan jî karmendê ku van heqan bidest dixe, wacib nabe. Lewra di van îstihqaqan de hasilbûna milkê tam ya ku ji bo wacibbûna zekatê şert e, nîn e. Ji xwe ew nikare wan xerc bike û ew nikare di dirêjahîya mûddetê xizmeta xwe de xwe bigihîne heqekî ji van hiqûqên milkî jî.

Ev îstihqaq, dema qerar bi dîyarkirina wan û bi teslîmkirina wan ya careke tenê, yan jî çend teqsîtan di wextên dewrî de ji bo karmendî yan jî karkerî derkeve, ew jê re dibe milkê tam, hingê ewê ji wan îstihqaqên ku ketine destê wî zekata malê “bidestketî” bide.

Di kongreya zekayê ya yekê de ev îfade hatiye:

“Ew malê bidestketî, dema mirov wî bixe nav malê xwe yên din hingê mirov bi nîsab û sala malê xwe yê pêşî re zekata wan jî dide.” (Qedaya Fiqhîye Mûasere Dr. Selah es-Sawî, rûpel: 58.)

Zekata giranbihayan

Giranbiha;

Giranbiha, ew mal e ku ji bo kirê hatiye amadekirin. Ew ne ji bo ticaretkirina di eynên wan bi xwe de hatine hazirkirin. Her wekî arsa, erebe û fabrîkeyên hilberanê û yên wekî wan.

Ehlê îlmê li ser vê îttîfaq kirine: “Zekat di wan bi xwe de nîn e. Lêbelê zekata dahata wan tê dayîn. Ew jî di nîsab û salê de dikevin ser neqd û pertalên ticaretê yên xwediyê xwe yên din û ew eynî wekî zekata diravan zekata wan jî çaryeka dehyekê derdixe.” (Qedaya Fiqhîye Mûasere Dr. Selah es-Sawî, rûpel: 58.)

Zekata temînata ku kirêdar dide

Temînat;

Ew mal e ku kirêdar ji bo pêbawerîyê bi lez dide xwediyê malê kirê.

Zekata wan li ser kirêdarî ne wacib e; lewra ew ne di milkîyeta wî de ne, temamîya milkîyeta wan nehatiye cih ku ew jî di wacibbûna zekatê de şert e. (Qedaya Fiqhîye Mûasere Dr. Selah es-Sawî, rûpel: 60.)

Zekata hiqûqên menewî

Hiqûqên menewî,

Otorîteyeke ne maddî li ser şexsekî ye. Çi ew encameke fikrî be; her wekî heqê mûellifî di telîfên îlmî û edebî de; yan beraeta îcadê be, di îcadên pîşesazî de, yan jî berê failîyeteke bazirganî be, ku bazirgan pê radibe ji bo kişandina karkeran, her wekî di navê bazirganî û nîşanên bazirganî de.

Hukmê zekata hiqûqên menewî

Hiqûqên menewî, êdî di urfê de bihayekî wan yê malî çêbûye, şerîet jî wî qebûl dike. Li gorî rêz û rêçên şerîetê di wan de teserrufkirin jî durust e. Ew parastî ne, êrîşkirina li ser wan jî ne durust e.

Zekat di hiqûqên telîf û îcadê bi xwe de ne wacib e. Lewra şertên zekatê de têde nîn in. Lêbelê dema ew bêne nirxandin û kirêkirin, hukmê malê bidestketî li ser wan jî şamil tê. (Qedaya Fiqhîye Mûasere Dr. Selah es-Sawî, rûpel: 60.)



Zekata mûçe, meaş û qezencên meslekên serbest

Mûçe û meaş;

Ewa ku karker di hemberî karê xwe de werdigre.

Hukmê wê

Mirov di dema wergirtina van de zekatê nade; lêbelê wan di nîsab û salê de dixe nav malên xwe yên din yê ji bo zekatê. Hingê dema nîsaba wan û sala wan temam bibe, mirov zekata tevan dide. Ew qezenca ku di nav salê de ji wan hatiye bidestxistin jî mirov zekata wê di dawîya salê de dide; çendan saleke temam bi ser her perçeyên wê de derbas nebûbe jî, naxwe madem ji wexta ku zekatdar ew bi tevahî xistine ber milkê ve salek di ser wan de derbas bûye. Miqdarê zekata ku deranîna wê wacib e jî çaryeka dehyekê [2.5%] ye.

Zekata malê heram

Malê heram

Ew her mal e ku şerîetê bidestxistina wî yan jî menfîet jê dîtin qedeğe kiriye. Çi herambûna wî ji bo zirarê be ku têde heye, yan ji ber pîsîtîya wî be, her wekî mirar û meyê, yan herambûna wî ji bo dîgerê wî be, ji ber ku xirabî di rêya qezenckirina wî de heye, lewra wî ew ji xwediyê wî girtiye hem jî bê destûra wî, her wekî ğesbê, yan jî ji ber ku wî ew bi uslûbeke wisan jê wergirtiye ku şerîet wê qebûl nake; çendan bi rizamendîya xwedî be jî, her wekî riba û bertîlê.

Hukmê zekata malê heram

- Ew malê heramê ku ji bo xwe bi xwe heram e, wekî mey û berazî ne cihê zekatê ye. Lewra ew di nêrîna şerîetê de ne malekî xwedan qîmet e. Naxwe divê mirov bi wê rêya ku şerîet wê mûnasib dibîne, xwe ji wî malê heram xilas bike.

- Ew malê heramê ji bo dîgerê xwe, ewê ku asêpirsa şerîî di qezenckirina wî de heye, zekat têde li ser bidestxistiyê wî, ne wacib e. Lewra temambûna milkîyetê ya ku ji bo wacibbûna zekatê şert e, nîn e. Li gorî dîtin-nêrîna bijarte; naxwe dema ew li xwediyê xwe vegere, divê ew ji bo saleke tenê zekata wî bide; çendan gellek sal di ser de derbas bûbin jî.

- Ew mirovê ku malê heram ketibe destê wî, dema wî li xwediyê wî venegerîne û bi qasî miqdarê zekatê jê derxîne, ji ber malê ku di destê wî de ye, guneh di stûyê wî de dimîne. Ew qism li gorî şerîetê dibe derxistina perçeyekî ji zekata ku li ser wî deranîna wê wacib e. Ewa ku wî derxistî jî zekat qebûl nabe. Ew ji stûyê wî jî nakeve heta ku ew wî malî li xwediyê wî venegerîne heke ew wî nas bike; yan jî wî malî di şûna xwediyê wî de sedeqe nede; heke ji naskirina wî bêhêvî bûbe. (Qedaya Fiqhîye Mûasere Dr. Selah es-Sawî, rûpel: 61, û yên piştî wê.)

Hinek tewcîhat

Teserrufkirina di malê heram de çawa ye?

a- Ewê ku malê heram bi rêya xirab bidest dixe, ew mal nabe milkê wî çi qas li cem wî mayîna wî malî dem dirêj bibe jî. Her divê ew wî malî li xwediyê wî, yan jî mîratxwerên wî vegerîne, heke wî û wan nas bike. Heke ew hêvîya xwe ji naskirina xwediyê mal qut bike, hingê divê ew wî malî di rêyên xêrê de xerc bike, ji bo xwe jê xilas bike û bi qesda sedeqe ji ber xwediyê wî ve bide.

b- Dema însanek heqdestekê ji ber kirina karekî heram bistîne, ewê wê heqdestê di rêyên xêrê de xerc bike û wê li yê ku jê standiye, venagerîne. Lewra heke ew lê vegerîne, hingê ewê bibe arîkarîya wî ji

bo gunehkarîyê. Bi vî awayî, ji bo ewê ku mirovekî ji bo kirina karekî heram bi heqdest digre, nebe ku ew hem karê xwe yê heram bide kirin, hem jî di ser de heqdestekê jî wernegire.

c- Malê heram li wî yê ku ew mal jê hatiye wergirtin nayê vegerandin; heke ew li ser dan û standina ne rewa israr bike. Her wekî qezenca ribayê. Lêbelê ewê wî malî jî di rêyên xêrê de xerc bike.

d- Dema vegerandina malê heram bi xwe ne mûmkin be, hingê divê ew mirovê ku ew bidestxistî malekî wekî wî, yan jî bihayê wî li xwediyê wî vegerîne, heke wî nas bike. Heke nas neke jî, ewê malekî wekî wî, yan jî bihayê wî di rêyên xêrê de xerc bike, bi qesda ku ji ber xwediyê wî ve sedeqe dide. (Qedaya Fiqhîye Mûasere Dr. Selah es-Sawî, rûpel: 61, û yên piştî wê.)



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec











Dr. Abdullah Bahmmam

Review

Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro

Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Zekata fitrê

7

Ehlê zekatê û derxistina zekatê



Naverok

Ehlê zekatê

Ehlê zekatê; ewên ku zekat heqê wan e. Ew heşt sinf in, Xuda [ezzewecelle] hijmara wan dîyar kiriye û gotiye; ew heqê wan bi tenê ye: {Sedeqe wek ferzeke ji Xuda, bes ji bo feqîran, miskînan, karkerên li ser zekatê, mûellefetûl-qulûban [dan hezkirina dilên wan] koleyan, ğariman, di rêya Xuda de û rêwîyan e. Xuda zana û xwedî hikmet e.} [Tewbe, 60]

1. Feqîran

Feqîran geljimareya feqîr e.

Feqîr; ew kes e ku bi qasî têra xwarin, vexwarin, cil û meskenê wî û xizanên wî bike, malê wî nîn e.

Bi qasî ku heta saleke temam têra wî û malbata wî bike, ji malê zekatê jê re tê dayîn.



2. Miskînan

Miskînan, geljimareya miskîn e.

Miskîn; ew kes e ku malê wî têra nîvê îhtiyacên wî, yan jî hinekê ji nîvê îhtiyacên wî zêdetir, dike. Her wekî wî kesê ku sed dînarên wî hene; lê îhtiyaca wî bi du sed dînaran heye. Bi qasî ku heta saleke temam têra wî û malbata wî bike, ji malê zekatê jê re tê dayîn.



3.Karkerên li ser zekatê

Karkerên li ser zekatê;

Karkerên li ser zekatê; ew kes in ku rayedar û karbidest ji bo komkirina zekatê û parvekirina wê li mûhtacan wezîfê didin wan. Bi qasî heqdesta karê wan ji zekatê ji wan re tê dayîn, çendan ew zengîn bin jî. Lewra karker xwe ji bo vî karî vala û weqf dike. Lêbelê heke ji dewletê heqdestê, yan jî mûçeyeke wan hebe, ti parek ji zekatê ji wan re nayê dayîn.

Karkerên li ser zekatê, komkarên wê, nivîsevanên wê, pasevanên wê û belavkerên wê li ser xwedî heqan tev dikevin navê.



4. Mûellefetûl-qulûb [dan hezkirina dilên wan]

Mûellefetûl-qulûb;

Ew mezin in ku di nav qewmê xwe de bi xebera wan tê kirin. Ji lewma bi dayîna zekatê ji wan re mislimanbûna wan, rêgirtina li ber xirabîya wan, yan xurtbûna îmana wan, yan jî berevanîkirina wan ji mislimanan li dijî dijminekî ji dijminên mislimanan, tê hêvîkirin.

Bi qasî ku dilê wan bi îslamê xweş bibe û bi qasî ku vê meqsûdê hasil bike, ji malê zekatê ji wan re tê dayîn.




5. Rîqab

Rîqab;

Ew, koleyê mûkateb e. Mûkateb; ew kole ye ku xwe ji xwediyê xwe dikirre. Evê ha, bi qasî ku ew pê bikare deynên xwe yên "girêbesta xwe azadkirinê" eda bike, jê re zekat tê dayîn.

Ji bo her yek ji wan azad bibe, teserrufatîya wî bicih were, ew bibe endamekî bihavil di civakê de û ew jî bikare bi awayekî baş îbadetê ji Xuda Teala re bike. Her wiha mirov dikare ji vê beşa zekatê fidye di ber êsîrên mislimanan yên herbê de jî bide.



6. Ğarîmûn

Ğarîmûn geljimareya ğarim e.

Ğarim ew kes e ku deyn li ser wî hene.

Ğarîmûn du cure ne:

Ya yekê; ew kesê ku ji bo îhtiyacîya xwe deyn li ser wî hene. Evê ha, dema feqîr be, bi qasî ku pê bikare deynên xwe eda bike, ji zekatê jê re tê dayîn.

Ya duduyan; ew kesê ku ji ber du komên misliman lihev anîne deyn li ser wî çêbûne. Evê ha, çendan zengîn be jî, bi qasî ku ew pê bikare temamê wan deynên xwe eda bike, ji zekatê jê re tê dayîn.




7- Di rêya Xuda de

Di rêya Xuda de;

Ew kes in ku di rêya Xuda de cîhadê dikin.

Evên ha, bi qasî ku têra cîhada wan ya di rêya Xuda de bike, ji zekatê ji wan re tê dayîn. Gellek kar û xebatên dozdarî yên din jî hene ku di rêya Xuda de cîhad tên jimartin û ji bo wan sedeqe nayên dayîn da ku mirov pê rabin jî, dikevin nav vî beşê zekatê.



8- Rêwî

Rêwî;

Ew mûsafir û rêwî ye ku di sefera xwe de bêçare maye û pê re mal jî nemaye.

Evê ha, bi qasî ku ew pê bikare bigihîje welatê xwe, ji zekatê jê re tê dayîn, çendan ew zengîn be jî.



Hişyarî

1- Ji bilî wan sinifên navbûrî pê ve zekat, ji ti kesê din re nayê dayîn. Çendan ew di rêyên xêr û qencîyê de be jî; her wekî avakirina mizgeft, hicre, nexweşxane û dîgerên wan jî; ew karên xêrê yên ku mûmkin e mirov sedeqeyên xwe yên arzûmendane bide wan.

2- Li cem dabeşkirina zekatê, ne şert e ku ew her heşt sinif tev para xwe jê bigrin; lêbelê dayîna wê ji sinfekî tenê ji wan sinfan re jî durust e.

Ewên ku zekat ji wan re nayê dayîn

1. Dewlemend, xurt û kesibkar in

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Di zekatê de ji bo dewlemend, xurt û kesibkarî par nîn e.» (Ebûdawud ew rîwayet kiriye.)

2. Dê-bav, kur û nevî û jin e; ewên ku nefeqê wan li ser mirov wacib e

Ne durust e misliman, zekata xwe bide yekî ji wan kesên ku nefeqê wan li ser wan wacib e; her wekî bavan, dêyan, bapîran, dapîran, zaroyan, niviyan; lewra dana zekatê ji wan re, îhtiyaca wan bi nefeqê wacib nahêle û nefeqê wan ji ser mirovî dixe; ji lewma feyda zekatê li mirovî vedigere, naxwe ew jî dibe her wekî ku mirov zekat dabe xwe bi xwe.

3. Kafirên ku ne mûellefetûl-qulûb bin

Dana zekatê ji kafiran re, ne durust e; heke meqsûd jê ne dan nermkirin û hezkirina dilên wan ji bo îslamê be.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Ew [zekat], ji zengînên wan tê standin û li feqîrên wan tê vegerandin.» (Buxarî rîwayet kiriye.)

Bi nessa vê hedîsê zekat, ji zengînên mislimanan tê standin û ew ji feqîrên wan tenê re tê dayîn. Lewra yek ji meqsûdên zekatê jî zengînkirina feqîrên mislimanan, xurtkirin û sağlemkirina stûnên hezkirin û biratîyê di navbera endam û ferdên civaka misliman de ye. Ev jî digel kafiran ne durust e.

4. Alê [malbata] pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ye (Alê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] Benû Haşimî ne.)

Ji ber şerefmendî û qedrbilindîya wan zekat, ji ehl û malbata pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re ne helal e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Ev sedeqeyên ha, qirêjên mirovan e. Bêguman ew ji Mûhemmed û alê [malbata] Mûhemmed re ne helal e.» (Mûslim rîwayet kiriye.)



5. Azadkirîyên alê [malbata] pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ne

Azadkirî; ew kole ne ku alê [malbata] pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew azad kirine.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dibêje: «Sedeqe, ji me re ne helal e. Azadkirîyên qewmekî jî ji wan bi xwe ne.» (Tirmizî rîwayet kiriye.)

Maneya "ji wan bi xwe ne" Statûya wan jî wekî statûya azadkerên wan e. Naxwe çawa zekat ji Benû-haşimîyan heram be, eynî wisan ew, ji azadkirîyên wan re jî heram e.

6. Koleyê memlûk

Zekat, ji koleyan re nayê dayîn. Lewra malê kole dibe malê xwediyê wî. Naxwe dema zekat ji koleyekî re were dayîn, ew dikeve ber milkê xwediyê wî. Hem jî ji ber ku nefeqê wî li ser xwediyê wî ye zekat jê re nayê dayîn. Lêbelê ev hukmê ha, ji koleyên ku bi xwediyê xwe re girêbesta xwe azadkirinê kiribin re û ji koleyên ku karkerê li ser zekatê bin re jî ne derbasdar e. Lewra dema kole karkerê li ser zekatê be, ji wî re jî para zekatê tê dayîn; ji xwe hingê ew jî wekî karkerê bi heqdest e. Lewra mirov dikare bi destûra xwediyê wî koleyî bi heqdest bigre û bide xebatê.

Derxistina zekatê

Wextê wê

Derxistina zekatê di cih de bilezûbez wacib e; dema wextê wacibbûna wê were û mirov karibe wê derxîne jî. Heke zerûret nebe, derengxistina wê ji wextê wacibbûna wê ne durust e. Zerûret ev e; her wekî ew li devereke ji welatê xwe dûr be, yan jî ew ketibe hebs û zindanê û yên wekî van e.

Delîla wacibbûna wê ya bilezûbez ev gotina Xuda Teala ye: "Roja dirûna wê heqê wê [zekatê] bidin.} [Enam, 141] {Zekatê bidin.} [Nûr, 56]

Raweya fermanî jî kirina bilezûbez dixwaze.

Hukmê lezkirina li zekatê

Lezkirina li zekatê ji bo du salan û kêmtirî wan jî durust e; dema di wexta lezkirina li zekatê de nîsab temam bûbe.

Cihê derxistina wê

Ya baş; derxistina zekatê ji bo ehlê wî bajar û welatî be ku malê zekatê li wî ye. Lêbelê heke îhtiyac pê hebe, guhastina zekatê ji welatê malê zekatê ji bo welatekî din jî durust e; vêca hîç ferq nake, çi ew welat nêzîk be, çi jî ew dûr be. Her wekî ew welatê ku zekat ji bo wî hatibe guhastin

Dayîna karkerên li ser zekatê

Zekat, ji karkerê li ser zekatê û ji ğariman re jî tê dayîn; çendan ew dewlemend bin jî. Ew mirovê ku karibe kar bike; heke wî xwe ji bo teleba îlmê şerîî vala kiribe û malê wî jî nebe; lewra teleba îlmê jî cîhada di rêya Xuda de ye, her wiha ye mûcahid û mûellefetûl-qulûb jî zekat ji wan re tê dayîn. Lêbelê heke ew mirovê ku karibe kar û xebatê bike, abid be, wî xwe vala kiribe û terka kar û xebatê kiribe ji bo kirina îbadetên nafîle, zekat ji wan nayê dayîn. Lewra feyda îbadetê ji abid tenê re ye; lêbelê îlm ne wisa ye.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Gelî yên ku îman anîne! Ji tiştên xweş yên ku we bidest xistine û ji yên ku me ji bo we ji erdê derxistine înfaq bikin. Hûn ji malê xwe [ji bo sedeqe dayînê] qesda yê nehêja nekin; hûn wî înfaq dikin û hûn bi xwe jî nîn in ku wî wergirin; heke hûn çavên xwe jê negirin! Zanibin ku Xuda dewlemend û pesnande ye. Şeytan we bi feqîrtiyê ditirsîne û şîreta nemerdîyê li we dike. Xuda jî peymana meğfîreteke ji xwe û keremê dide we. Xuda kerem-fereh û zana ye.} [Beqere, 267-268]

feqîrtir be; yan jî hinek xizmên xwediyê zekatê li welatekî dûr bin û ew jî wekî feqîrên welatê wî jar û feqîr bin. Lewra di guhastina zekatê de ji bo wan hasilbûna meslehetê heye. Ew jî sedeqe û sileya rehmê ye. Ev dîtin-nêrîna ku dibêje; "guhastina zekatê ji welatekî ji bo welatekî din durust e"ya rast û durusttir e. Lewra gotina Xuda Teala: {Sedeqe, bes ji bo feqîr û miskînan e.} [Tewbe, 60] gelemper e. Yanî zekat ji bo her feqîr û miskînên li her cih û deveran e.

Ew malê ku ji zekatê derdikeve û ewê ku ji zekatê dernakeve

Ji zekatê, malê navîn tê derxistin; ne ji baştirê wî û ne jî ji nehêjayê wî. Naxwe xwediyê mal ne mecbûr e, sewalê xwe yê qelew, yan ya avis, yan jî nêrîyê xwe ji bo zekatê derxe, yan jî ew fêkîyên xwe yên baştirîn ji bo zekatê derxîne; lêbelê heke ev bi rizamendîya xwedîyê mal be û dilê wî jî pê xweş be, ew çêdibe.

Her wiha ne durust e, ew ji nav malê xwe yê baş jî malê nehêja ji bo zekatê derxîne; lêbelê heke malê wî tev ji çînîya nehêja be, yan jî sewalên wî hemû nexweş bin, hingê ji wî re durust e, ew zekatê ji wan derxîne.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Hûn ji malê xwe [ji bo sedeqe dayînê] qesda yê nehêja nekin; hûn wî înfaq dikin û hûn bi xwe jî nîn in ku wî wergirin; heke hûn çavên xwe jê negirin!} [Beqere, 267]

Di hedîsê de wiha hatiye: «Ji bo zekatê heywana pîr55, ya eybdar, gîskê nêr nayên derxistin; lêbelê heke zekatdar bixwaze, ğem nake.» (Buxarî rîwayet kiriye.)

Hem ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji Mûaz re gotibû: «Zinhar, xwe ji standina malên wan yên çêtirîn biparêze!» (Buxarî rîwayet kiriye.)

Tewcîhat

1. Divê zekatdar ji bo dana zekata xwe li mûsteheqan bigere û bila ew nebe adetekî salane ku wê bide ne mûsteheqan.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Têde para yê zengîn, yê xurt û yê kesibkar nîn e.» (Ebûdawud rîwayet kiriye.)

2. Divê zekatdar ji bo dana zekata xwe li feqîrên û mûsteheqtir bigere. Çiqas sifetên mûsteheqbûnê di şexsekî de zehf bin, ew ji bo wergirtina zekatê heqtir û lipêştir dibe. Her wekî feqîrê lêzim be, yan jî feqîrê talibê îlmê be. Her wiha ne, yên din jî.

> **Ewê ku ji bo wergirtina zekatê heqdartir e**
>
> Layiq e ku zekatdar ji bo dana zekata xwe li feqîrên mûsteheqtir bigere. Çiqas sifetên mûsteheqbûnê di şexsekî de zehf bin, ew ji bo wergirtina zekatê heqtir û lipêştir dibe. Her wekî feqîrê lêzim be, yan jî feqîrê talibê îlmê be. Her wiha ne, yên din jî.

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec







Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Sedeqa tetewi‘ê

8 Zekata fitrên

Zekata fitrên;

Sedeqeyek e, pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew li cem fitara Remezanê ferz kiriye.

Naverok

Çima jê re "zekata fitran" hatiye gotin? Lewra ew bi fitara ji Remezanê wacib dibe.

Hukmê zekata fitrên


Zekata fitran, li ser her mislimanî wacib e; ewê ku xwarina wî ji qûtê wî û qûtê xizanên wî yên roj û şeva îdê zêde hebe. Ewê saekê ji xwarinê derxîne.

Divê zekatdar, fitra serê xwe, fitra serê jina xwe û fitra yên ku nefeqên wan li ser wî wacib e jî, derxîne. Mûsteheb e ku mirov fitra sêxlê di zikê dêya wî de jî derxîne.

Delîla wacibbûna zekata fitrên ev rîwayeta Îbnûmer [Xuda jê razî be] e, ew dibêje: «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] zekata fitrê saek ji xurmeyan, yan saek ji ceh li ser mirovê kole, yê azad, mêr û jinê, biçûk û mezinê misliman ferz kir û got; bila ew berî derketina mirovan ji nimêjê were dayîn.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)



Xurme



ceh

Wextê derxistina zekata fitrên

Baştirîn wextê derxistina zekata fitrên, roja îdê, piştî derketina fecrê û berî nimêja îdê ye. Berî roja îdê bi rojekê, yan jî du rojan jî derxistina zekata fitrên durust e. Lewra sehabîyan wisan kiriye. Lêbelê dereng-xistina wê heta piştî nimêja îdê ne durust e. Lewra hedîsa Îbnûmer ya bûrî wisan ferman dike: «Bila ew berî derketina mirovan ji nimêjê were dayîn.»

Di hedîsa Îbnebbas jî dibêje: «Kî, berî nimêjê wê eda bike, ew zekateke meqbûl e. Kî, wê piştî nimêjê jî eda bike, ew sedeqeyeke normal ji sedeqeyan e.» (Ebûdawud rîwayet kiriye.)

Miqdarê zeka fitrên

Ji ber her ferdekî ve saek63 e. Ew ji xwarina mirovan çêdibe, her wekî birinc, xurme û genim.

Lewra hedîsa Ebûseîd el-Xudrî [Xuda jê razî be] heye, dibêje: «Me di serdema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] de roja [îda] fitrê saek ji xwarinê derdixist.»

Ebûseîd dibêje: «Xwarina me ceh, mewîj, şûrtan û xurme bûn.» (Buxarî rîwayet kiriye.)

Sae, li cem Henefîyan 3.25 kg e. Ew li cem cumhûrî 2.040 kg e. Ew bi çenga zilamekî normal çar çeng tê teqdîrkirin.



Cihên ku zekata fitrên li wan diçe

Sedeqa fitrê jî li her heşt sinifan diçe, ewên ku zekat ji wan re tê dayîn. Ew jî tevlî vê gotina Xuda Teala ye: {Sedeqe, bes ji bo feqîr û miskînan e.} [Tewbe, 60]

Hikmet ji zekata fitrên

1. Paqijkirina rojîgirî ji kelevajî û çêran e. Îbnebbas [Xuda jê razî be] rîwayet dike û dibêje: «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] zekata fitran ferz kir da ku ew ji bo rojîgirî bibe paqijkirina ji kelevajî û çêran66 û xwarin ji bo miskînan.» (Ebûdawud rîwayet kiriye.)

Ev jî wiha ye: Rojîgir, bi pirranî nikare xwe ji keyf, axaftina pûç û xeberên bê feyde biparêze. Ev sedeqe, ji bo rojîgirî dibe paqijbûna ji van peyvên heram û mekrûh, ewên ku ew ketibû nav wan; ji xwe ew jî sewaba emelan kêm dikin û rojîyê eybdar dikin.

2. Destferehî çêkirina ji miskîn û feqîran re ye û roja îdê jî temînkirina îhtiyaca wan e, da ku parsekîyê nekin. Lewra parsekî di roja îdê de zillet û perîşanî ye. Ji xwe roja îdê di eslê xwe de roja keyfxweşî û şadmanîyê ye. Da ku bi dana fitran ji bo wan ew jî di roja îdê de di keyfxweşîya mirovên din de bibin hevşirîkên wan.

Melûmatên mûhîm di bara zekatê de

Qîmet di zekatê de:

Esl, di zekatê de; deranîna wê ji eynê wî malî ye ku zekat têde wacib bûbe. Lêbelê heke îhtiyac pê hebe, yan mesleheta tercîhkar wê bixwaze, girtina qîmetê wê jî durust e.

Elaqeya dewletê bi zekatê re:


Esl, zekata mal ji selahîyeta îqtîdarê ye. Divê ew ji zekatdaran û teqdîra wan ya şexsî re nayê hiştin. Heke îqtîdar xwe ji vê erkê bide paş, hingê berpirsîya ferdî di stûyê her mislimanî de ye.

Beranîna malên zekatê ji bo mesleheta mûsteheqan:

Beranîna malên zekatê di projeyên ku menfîeta wan li mûsteheqan vedigere de durust e; dema cihê xerckirineke lezgîn nebe ku belavkirina di cih de ji bo malên zekatê bixwaze.

Gelo di mal de ji bilî zekatê heqekî din yê wekî bacan heye?

- Zekat, heqê dewrî ye, di mal de qerar pê hatiye dayîn û ew bi awayekî eynî li ser mirovên ku dikarin wê bidin, wacib e.





- Di mal de ji bilî zekatê hinek hiqûqên din jî hene. Ew nû peyda dibin û bi miqdarekî melûm jî nehatiye teqdîrkirin. Ew her wekî zekatê ne sabit in. Ew ne bi sebeb mal wacib in. Lêbelê ew bi sebebên arizî -nû peydabûyî- wacib in, mal jî ji bo wacibbûna wê şert e. Nimûneyeke wê; nefeqê dê-bavan, lêziman, jinê û rakirina ziraré li cem çêbûna karesatan e, dema jêderên malê beytûl-malê [xezîna dewletê] têrê nekin.

- Bac, çendan bi edalet be jî zekatê ji ser mirov ranakin. Lewra zekat îbadetek ji îbadetan e; bac jî berpirsîyeke medenî ye, naxwe yek ji wan ya dinê ji holê ranake.

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec







Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Hinek celebên din ji malên zekatê

9 sedeqa sünnet

Naverok

Sünnet;

Ew tişta ku ji bilî ferzan bi qesda xwe nêzîkkirina Xuda Teala tê dayîn e.

Bi vê pênasîyê, hedîye û yên wekî wê; ewên ku ji bo dostanî û hezkirinê tên dayîn jê tên derxistin. Ew nakevin ber pênasîya sedeqê ku di şerîetê de jê re hinek hukmên xusûsî hene.

Hukmê sedeqa sünnet

Sedeqa sünnet, di hemû dem û wextan de mûsteheb e. Nexasim dema îhtiyac pê hebe. Lewra hem Xuda di kitêba xwe de ew teşwîq kiriye, hem jî pêğemberê wî [dirûd û silavên Xuda lê bin] di sunneta xwe de sedeqe teşwîq kiriye.

Xuda [ezzewecelle] dibêje: {Ew kî ye ku qerzekî sipehî bide Xuda? Vêca ew jî wê jê re qat bi qat zehf zêde bike.} [Beqere, 245]



Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje: «Kî, bi qasî xurmekî ji kesba pak -ji xwe Xuda ji tişta pak pê ve qebûl nake- sedeqekê bide, Xuda wê bi destê rastê xwe qebûl dike. Paşê ew wê ji xwediyê wê re qat bi qat zêde dike, her wekî ku yek ji we ciwanîkê -weledê hesp e- xwe xwedî dike heta dibe wekî çîyê.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî ewê ku sedeqa xwe bi dizîkahî dide yek ji wan heft kesan jimartiye; ewên ku Xuda Teala wan dixe ber siha xwe, di wê roja ku ji siha wî pê ve ti sih nîn e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Zilamek e, bi dizîkahî sedeqe dide heta çepê wî nizane rasdtê wî çi înfaq kiriye.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)

Ke‘b kurê ‘Ûcre [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje: Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Sedeqe, şaşîyan ditemirîne, her wekî ku av jî agirî ditemirîne.» (Tirmizî rîwayet kiriye.)

Edebên sedeqa sünnet

1. Edebên wacib

a- Îxlasa ji bo Xuda Teala ye. Ewê zekata xwe bi qesda rizamendîya Xuda bide; ne ji bo riyakarî û nav û dengê xwe.

b- Xwe parastina ji minnet û êşandinê ye. Lewra Xuda [ezzewecelle] dibêje: {Gelî yên ku îman anîne! Sedeqên xwe bi minnet û êşandinê pûç nekin!} [Beqere, 264]

2. Edebên mûsteheb

a- Mûsteheb e, misliman sedeqa xwe bide lêzimên xwe yên mûhtac, ewên ku nefeqê wan li ser wî ne wacib be. Her wekî apên xwe û xalên xwe. Bila jin jî sedeqa xwe bide mêrê xwe yê xizan û dîgerên van jî. Lewra sedeqa li van ji sedeqa li dîgerên wan çêtir e.

Çawa ku Xuda Teala dibêje: {Sêwîyekî lêzim.} [Beled, 15]

Dı hedîsê şerîf jî dibêje: «Sedeqa li ser miskînî sedeqeyek e. Ya li ser lêzimî du sedeqe ye: Sedeqe ye û sileya rehmê ye.» (Nesaî rîwayet kiriye.)

b- Bijartina sedeqê ji malê xwe yê helal, yê pak û hezkirî ye. Lewra Xuda Teala dibêje: {Hûn nagihin xêrê heta hûn ji malê xwe yê ku jê hez dikin, înfaq nekin.} [Alî Îmran, 92]

c- Bi dizîkahî sedeqe dayîn e. Lewra ew ji îxlasê re nêzîktir e, ji riyakarî û nav û deng dûrtir e û ji qedr-girtina feqîrî re jî nêzîktir e.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Heke hûn sedeqeyên xwe bi eşkerehî bidin, çi rind e! Lê heke hûn wan bi dizîkahî bikin û wan bidin feqîran, ew ji we re çêtir e.} [Beqere, 271]

Heke di îzharkirina sedeqê de meslehetek hebe, her wekî çavlêkirina yekî din li wî di înfaqê de hebe û teşwîqkirina haziran hebe, îzharkirina wê mûsteheb e. Lêbelê dîsa divê misliman li nîyeta xwe û karê xwe şîyar be.

d- Çi ji mirov were, mirov wê sedeqe bide, çendan ew hindik be jî.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Xwe ji êgir biparêzin çendan bi şiqê xurmekê be jî.» (Buxarî rîwayet kiriye.)

Feydeyên sedeqa sunnet

Ya yekê; feydeyên ku li ferd vedigerin

1. Paqijkirina nefsê ye.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Sedeqekê ji malên wan bistîne, tu dê wan pê paqij bikî û wan pê temîz bikî.} [Tewbe, 103]

2. Xwe girtina bi mezinê me Mûhemmed [dirûd û silavên Xuda lê bin] e. Lewra comerdî û kerem exlaqê wî bû. Wî ewqas sedeqe didan her wekî mirovê ku hîç ji feqîrtiyê natirse. Wî ji Bîlal re digot: «Bîlal, înfaq bike û ji xwediyê erş ji feqîrtiyê netirse.» (Bezzar ew rîwayet kiriye.)

3. Ewê ku înfaqê dike, Xuda xelefa wê lê vedigerîne û nefsa xwediyê wê jî pê bilind dibe.

Lewra Xuda Teala di bara wê de dibêje: {Hûn çi înfaq bikin, ew şûna wî tije dike. Ew çêtirînê rizqdaran e.} [Sebe, 39]

4. Paqijkirina mal ji qîrewîra kirîn-firotinê ye.

Lewra Qeys kurê Ebûğerze [Xuda jê razî be] dibêje; me di serdema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] simsar teyîn dikirin. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di ber me de derbas bû, me ew bi navekî ji wî sipehîtir binav kir. Wî got: «Gelî koma bazirganan! Kirîn-firotin pûçî û sûnd tevlî wê dibe, sedeqê tevlî wê bikin.» (Ebûdawud rîwayet kiriye.)

5. Qezenckirina hesenatan û efûkirina gunehan e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê

bin] gotiye: «Kî, bi qasî xurmekî ji kesba pak -ji xwe Xuda ji tişta pak pê ve qebûl nake- sedeqekê bide, Xuda wê bi destê rastê xwe qebûl dike. Paşê ew wê ji xwediyê wê re qat bi qat zêde dike, her wekî ku yek ji we ciwanîkê -weledê hesp e- xwe xwedî dike heta dibe wekî çîyê.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)

6. Menfîet-dîtina mislimanî ji sedeqa wî ya carîye piştî mirina wî ye.

Lewra Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Dema misliman bimre, emelê wî qut dibe. Lê ji sê tiştan qut nabe; ji sedeqeyeke cariye, yan îlmekî ku menfîet jê tê dîtin, yan jî weledekî salih ku jê re dûa bike.» (Mûslim rîwayet kiriye.)

7. Sedeqe sersebebê zêdebûna mal û bereket ketina nav wî ye. Lewra ew îşaretek ji îşaretên şukrê nîmetbexşî ye. Ji xwe kî şukr bike, jê re soz heye ku Xuda nîmetê xwe ji wî re zêde bike.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Di bîra xwe bîne wê dema Xudayê te bang hildêrîya; heke hûn şukr bikin, ezê ji we re zêde bikim; heke hûn nankorîyê bikin, bêguman ezabê min dijwar e.}[Îbrahîm, 7]

Ya duduyan; feydeyên ku li civakê vedigerin

1. Sedeqe peyama zekatê ji bo civakan temam dike.


2. Peydakirina palpiştî, hevkarî, îstiqrar û hezkirinê di civaka misliman de ye.




Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec







Dr. Abdullah Bahmmam

Review

Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro

Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Pêşgotinên pênasî ji Hecê

1 Pêşgotinên pênasî ji Hecê

Mekke

Naveke ji peyva Beke ya Samî çêbûye. Ew bi meneya newal e.

Mekke di tarîxê û halê hazir de

Navê Mekkê di gotina Xuda Teala: {Bêguman mala pêşî ji bo mirovan hatiye danîn; ewa ku li Bekkê ye, mûbarek e, û ji cîhanîyan re serkehnîya hîdayetê ye.} [Alî Îmran, 96] de bi peyva Bekke hatiye.

Tarîxa xurt û sağlam ji bo avakirina Mekkê digihîje sedsala nozdehê berî mîladê. Ew jî di serdema mezinên me Îbrahîm û Îsmaîl [silavên Xuda li wan bin] de bûye. Lewra ew herdu mirovên pêşî ne, ku lê bicih bûne.

Xuda Teala di bara Îbrahîm de dibêje: {Xwedayê me! Min hinek ji zarokên xwe li newaleke bêçandinî, li cem mala te ya bi hurmet bicih kirine. Xwedayê me, da ku bi berdewamî û durustî nimêj bikin, êdî tu jî meyla dilên hinek mirovan bide aliyê wan û ji mêweyan rizq bide wan da ku ew sipasiya te bikin.}[Îbrahîm,37]

Bi feyz û bereketa dûaya meziné me Îbrahîm [silavên Xuda lê bin] Ava Zemzemê ji bin pêyên Îsmaîl [silavên Xuda lê bin] herikî, dema av û xwarin ji cem dêya wî Hacer xilas bûbû. Hê ji wê demê ve qebîle û êlan ji bo avê berê xwe dan Mekkê û têde jiyanê dest pê kir.

Êdî bû ku qebîle û êlan berê xwe dan Mekkê û lê zehf bûn, heta dewr giha Qureyşîyan ji bo hukm

Naverok



lê bikin. Qureyşîyan karûbarê wê îdare kir heta pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] lê xuyabû. Esera mezintirîn di guherandina heyatê de hem li Mekka mûkerrem, hem jî li temamê alemê jî ya wî ye.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li Mekkê hate şandin, Ke'be bû qibla mislimanan û Mekke jî bû dergûşa doza îslamê. Lêbelê xelkê wê ji her kesên din bêhtir ji doza îslamê nefret dikir û ehlê îslamê diêşandin. Heta paşê misliman mecbûr bûn hicret bikin, herin Medîna mûnewwer û li wir dewleta îslamê hate avakirin. Paşê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji wê vegerîya, hat Mekke azad kir. Ji wê rojê û pê de û heta vê serdema me Mekke bû welatekî mezin yê misliman.

Mekka mûkerrem, bi taybetî Herema Mekkê îhtîmam û elaqeyeke mezin ji xelîfan û hukmdarên misliman dîtîye. Ew bi pêşvebirin û ferehkirina wê rabûne û ew kirine merkez û navend, ronahîya îslamê ji wê derdikeve û li alemê tevî belav dibe.

Fezîleta Mekkê

1. Ew ji bo yên ku herin navê ewlegeh e

Lewra Xuda Teala gotiye: (A {Kî, here navê, ewle bûye.} [Al-î Îmran, 97] yanî Herema Mekkî

2. Deccal û Taûn naçin navê

Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Medîne û Mekke bi melaîketan hatiye dorpêçkirin. Li ser her neqebeke wê melaîketek heye. Deccal û taûn naçin navê.» (Ehmed ew rîwayet kiriye)

3. Nimêja di Mizgefta Heramê de bi sed hezar nimêj e

Cabir [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Nimêjeke di Mizgefta Heramê de ji sed hezar nimêjên di ğeyrên wê de çêtir e.» (Îbnmace ew rîwayet kiriye)

4. Ew, li cem Xuda hezkirîtirîn perçê erdê ye

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Ez, bi Xuda kim; tu, çêtirîn erda Xuda yî û li cem Xuda hezkirîtirîn erda Xuda yî!» (Tirmizî ew rîwayet kiriye.)



Mekka mûkerrem

Hukmên xusûsî di bara Mekke û Heremê de

1. Gefeke dijwar heye ji bo mirovê ku têde qesda xirabîyê bike; vêca çi wê bike, çi jî wê neke

Xuda Teala dibêje: {Kî, têde bi îlhadê bi zulmeke wiha bixwaze ji heqiyê bikeve, emê wî bi ezabekî cansoj bidin teamkirin.} [Hec, 25]

Îlhad, her mesîyet û bêemrîya Xuda ye.

Îbnebbas [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Mirovê ku ji hemû mirovan bêhtir Xuda jê hez nake, sê ne.» Yek ji wan jî «Mûlhidê li Heremê» (Buxarî ew rîwayet kiriye) jimart.

2. Têde şerr û rijandina xwînê heram e

Xuda Teala dibêje: {Di bîra xwe bînin wê dema me Ke'be ji bo mirovan kir civîngeh û ewlegeh} [Beqere, 125]

Kî biçe nav Mekkê, têde ewle dibe. Ji bo vê yekê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Ji bo yekî ji we ne helal e li Mekkê sîlahê hilgire.» (Mûslim ew rîwayet kiriye)

Dîsa pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Xuda Mekke mûhterem kiriye; ne însanan ew mûhterem kiriye. Naxwe ji bo yê ku îmanê bi Xuda û roja axretê tîne, ne helal e, ew li wê xwînê birijîne û li wê darê wê jî bibirre» (Buxarî ew rîwayet kiriye)



Şerr û rijandina xwînê

3. Hatina kafir û mûşrikan ji bo Heremê heram e

Xuda Teala dibêje: {Gelî yên ku îman anîne! Bi rastî mûşrik bes pîs in. Vêca bila ew piştî vê sala xwe nêzî Mizgefta Heramê nebin ha!} [Tewbe, 28]

Hem jî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li Mînayê ferman kir ku vê îlan bike: «Piştî îsal, yê mûşrik naçe hecê û yê tazî tewafa Beytê nake» (Buxarî ew rîwayet kiriye)

4. Nêçîr, birîna daran û standina male windabûyî li Heremê; -heke ne ji bo yê nas dike be- heram e

Îbnebbas [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Xuda Mekke heram kiriye, ew berî min ji ti kesî re helal nebûye û ew piştî min jî ji ti kesî re helal nabe. Ew di saeteke naverojê de ji min re hatiye helalkirin; têde giyayê wê nayê qutkirin, darên wê nayên birrîn, nêçîrên wê nayên tirsandin û malê windabûyê wê nayê wergirtin heke ne ji bo yê ku nas dike be.» (Buxarî ew rîwayet kiriye)

Meşaîrên Hecê


Meşaîrên Hecê

Nîşanên zahir yên ku îbadetê Hecê vediqetîne

1. Erefat e

Erefat, geljimareya erefê ye. Çima jê re Erefat hatiye gotin? Yan ji ber ku Adem û Hewwa li wir hev nas kirine, yan jî ji ber ku însan li wir sûc û gunehên xwe îtîraf dikin.

Ew meş'ereke, li derveyê tixûbê Heremê ye. Ew li başûrê rojhilatê Mizgefta Heramê dikeve, 22 km. jê dûr e. Erda wê 10,4 km çarçikî ye. Hacî di roja bîst û nehê meha Zîl-hiccê de li wir kom dibin.



Erefat

Mizgefta Nemîre

Nemîre, çîyayeke li rojavayê Mizgeftê ye. Ji ber wî çîyayî ji mizgeftê re jî “Mizgefta Nemîre” hatiye gotin.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li zikê newala Ûrene peya bû, li wir xutbe xwend û nimêj kir. Di serê serdema Xîlafeta Ebbasî de li zikê newala Ûrene li cihê xutbe û nimêja pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] mizgeft hate avakirin. Di serdema Siûdî de jî ferehkirin û temîrkirina wê pêkhat; heta paşê mesafa wê ji 110 metreyên çargoşe zehftir e. Hacî di roja nehê Zîl-Hiccê de li wê kom dibin.



Mizdefta Nemîre

Mizgefta Sixerat

Ew li Erefatê, li jêra çîyayê Rehmê li rexê rastê ye, li alîyê ku bi ber çîyê ve hildigere. Li wir zinarên mezin hene. Êvara Erefê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li wir weqfe kir. Hacî roja nehê meha Zîl-Hiccê li wir kom dibin.



Mizdefta Sexîrat

Çîyayê Rehmê


Ew çîyayekî biçûk e, ji ber û kevirên mezin pêktê. Ew 20 km. li rojhilatê Mekkê dikeve. Banê wî rast e, hawîrdora wî 640 metre ye. Hacî roja nehê meha Zîl-Hiccê li ser wî kom dibin.



Çiyayê Rehmeh

2. Mîna

Çima jê re “Mîna” hatiye gotin? Ji ber ku têde xwîn tê rêhtin. Ew li navbera Mekke û Mûzdelîfê dikeve. Ew 7 km. ji bakurê rojhilatê Mescîdûl Heramê dûr e. Hacîyên ku lezê dikin şevên 11 û 12ê Zîl-Hiccê lê dimînin û hacîyên ku dereng dimînin jî şeva 13 Zîl-Hiccê lê dimînin. Ew meşereke li hundurê tixûbê Heremê ye. Mizdefta Xeyf û hersê Cemre jî li wir in.



Mîna

Cemerat


Cemerat, geljimareya Cemre ye. Ew ziğurên [kevirkên] biçûk in. Cemreyên hersê Menasîkan li Mînayê ne. Ew Cemra Sûğra, Wusta û Eqebe ye. Ew stûnên kevirî ne, di nîvê sê hewzan de ne. Ew elamet e, ji bo cihê ku Şeytan lê xuyabûbû û mezinê me Îbrahîm [silavên Xuda lê bin] jî kevir avêtinbûnê. Mesafe, di navbera Cemra Eqebê û ya Wusta de 247 metre ye û di navbera ya Wusta û ya Suğra de jî nêzî 200 metreyan e.

Cemra Kubra	Cemra Wusta	Cemra Suğra



Mizdefta Xeyf

Ew dikeve qûntara başûrê çîyayê Mînayê, nêzîkî Cemra Suğra ye.



Mizdefta Xeyf

3. Mûzdelîfe

Mûzdelîfe, ciheke di navbera Mîna û Erefê de ye. Hacî piştî wiqûfa xwe li Erefê têde şeva xwe derbas dikin. Meşerûl Heram dikeve nîvê Mûzdelîfê. Ew, ew cih e ku ji hacîyan re mûsteheb e, li cemê rawestin, dûa ji Xuda bikin, zikrê wî bikin û spasîya wî bikin. Ew cihê şev bûrandina hacîyan e, wê dema ew piştî bi ava-çûna tava nehê Zîl-Hiccê ji Erefê peya dibin.



Mûzdelîfe

4. Mizdefta Heramê

Ke‘ba mûşerref

Ke‘ba mûşerref şeklekî kûpî werdigre.

Hicra Îsmaîl


Ew beşê bakurî yê Beytê ye. Ewê ku ji tevahîya avahîyê bi îmkanê Qureyşîyan tenê çêbûye. Ji ber ku avahî şamilî ser wî tê, dema wan xwestibû Beytê ava bikin. Wan dîwarekî şekl-kevanî li serê çêkirin ji bo hişyarî pê bidin ku ev perçe jî ji Beytê ye. Ev navêkirin, navlêkirineke gelêrî ye; ne şer’î ye.



Ke‘ba Mûşerref

Hecerê Eswed [berê reş]

Ew di ruknê başûrî yê Ke‘bê de, li çepê derîyê Ke‘ba Mûşerref e. Ew ji cennetê ye. Berê reş şikestîye, ji bilî heşt kevirkên zehf biçûk wekî xurmeyan tişteke din jê nemaye.



Berê Reş

Ruknê Yemanî,

ew ruknê başûrê rojavê Ke‘bê ye. Jê re “ruknê yemanî” tê gotin; lewra ew li terefê Yemenê ye. Taybetmendîya ruknê yemanî ev e; ew li ser bingehên pêşîn yên Beytê ye, ewên ku Îbrahîm û Îsmaîl [silavên Xuda li wan bin] ew ava kiribûn.



Ruknê Yemanî

Mûltezem,

Ew navbera berê reş û derîyê Ke‘bê ye. Miqdarê wê bi qasî du metreyan e. Ew cihê qebûlbûna dûa y e. Sunnet e, mirov li wir dûa bike û herdu dêmên xwe, singa xwe, herdu zendên xwe û herdu mistên xwe jî pêve bike.

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê


Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec











Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Hukmên Hec û Ûmrê



Hukmên Hec û Ûmrê

Naverok

Hec

Hec di ferhengê de;
Qesd û berê xwe - dan e.

Hec di navlêka Fiqhî de;
Di wextekî diyarkirî de, ji bo edakirina menasikên xusûsî qesda Mekkê ye.

Hukmê Hecê û Fezîleta wê

Hec, ruknek ji ruknên Îslamê ye. Xuda Teala ew li ser evdên xwe ferz kiriye.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Ji bo Ellah çûna Heccê li ser mirovan wacib e; li ser kesê ku ji aliyê rê ve karibe biçe; her kî jî wê mandel bike, bi rastî Ellah, ne hewcedarê alemêye.} [Alî Îmran, 97]

Hem jî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Îslam, li ser pênc esasan hatiye avakirin: Şehde-anîna; ji Xuda pê ve ti îlah nîn in û Mûhemmed jî evdê wî ye, kirina nimêjê ye, dana zekatê ye, heca Beytê ye û rojîya Remezanê ye.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Dîsa pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî, biçe Hecê, çêr neke û guneh neke, gunehên wî yên bûrî jê re tên efûkirin.» (Tirmizî rîwayet kiriye)

Hec, di emrê însên de careke tenê wacib e.

Şertên Hecê

1. Îslam mislimanbûn e.

Hec li ser yê kafir ne wacib e û ji wî durust jî nabe.

2. Eql biaqilbûn e.

Hec, li ser yê dîn ne wacib e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Qelem ji ser sê kesan hatiye rakirin; ji ser yê razayî heta şîyar bibe, ji ser yê biçûk heta şeytan pê bikene û ji ser yê dîn heta eqlê wî were serê wî». (Ebûdawud rîwayet kiriye)

3. Bilûğ baliğbûn e.

Hec, li ser yê biçûk ne wacib e; heke ji bo hecê îhram lê bên kirin, heca wî durust e; lêbelê ew ji ber heca îslamê ve çênabe; ewa ku piştî ew baliğ bibe, ewê li ser wî wacib bibe. Lêbelê ew jê re heca sunnet çêdibe.

Lewra hedîsa Îbnebbas [Xuda jê razî be] heye, dibêje; jinekê biçûkek rakir ber pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin], jê re got; ma ji vî re hec heye? Jê re got: «Erê, ji te re jî xêr heye.» (Mûslim rîwayet kiriye)



Îhram li xwe kirina yê biçûk ji bo hecê durust e.

4. Hûrrîyyet azadbûn e.

Hec, li ser yê kole ne wacib e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kîjan kole biçe hecê, paşê were azadkirin, li ser wî heceke din jî heye» (Mûslim ew rîwayet kiriye.)

5. Îstîtae ye karîn e.

Îstîtae, hebûna zad (Zad, xwarin, vexwarin û cil û bergên ku îhtiyaca wî pê heye.) û siwarekê ("Rahîle" siwarek e, ew erebe, firok û keştî ye ku însan lê siwar dibe.) ye.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Ji bo Ellah çûna Heccê li ser mirovan wacib e; li ser kesê ku ji aliyê rê ve karibe biçe.} [Al-î Îmran, 97]

6.Hebûna mehremekî digel jinê ye

(Mehrem, ew zilam e ku zewaca bi jinê re lê heram e; bi sebeb bavîtî û biratîyê, yan jî bi sebebekî mûbah, her wekî mêr, bavê mêr, bav û birayê ji şîr û yên wekî van)

Lewra hedîsa Îbnebbas [Xuda jê razî be] heye, dibêje; min ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bihîst ku digot: «Jin naçe seferê; heke ne bi mehremekî xwe re be.» Zilamekî jê re got; ya pêğemberê Xuda! Jina min ji bo îhtiyacê derketiye û min jî navê xwe ji bo çûna vê ğezwê û wê ğezwê nivîsandiye, ev çawa dibe? Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got: «Here, bi jina xwe re hecê bike.» (Buxarî û Mûslim ew rîwayet kirine.)

Di hecê de wekalet

Kî, -ji bo kalîtîyê, yan ji ber nexweşîya ku hêvîya şîfabûna ji wê nîn e, yan jî ji bo zeîftîyeke di bedena wî de heye ku ew nikare siwar bibe,- nikaribe biçe hec û ûmrê, divê ew bi wekalet yekî din ji ber xwe ve bişîne hecê, yan jî ûmrê, ev hec jî ji wî durust e; çendan di piştî wekîlê wî bikeve îhraman ji bo hecê, yan jî ûmrê, ew şîfa jî bibe.

Lewra Fedl kurê Ebbas [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; «jineke ji Xesʻemîyan got; ya pêğemberê Xuda! Bavê min ferza Xuda hec, gihaye wî, lê ew kalekî mezin e, nikare xwe li ser pişta hêştirê rast bike û bigre, bila ew çi bike? Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jê re got: «Tu, ji ber wî ve biçe hece» (Tirmizî ew rîwayet kiriye.)



Zilamê ku nikaribe biçe hecê

Ew însanê ku di wekaleta yekî din de biçe hecê, divê di wî de du şert hebin:

1. Divê ew şertên bûrîn yên hecê di wî de hebin.

2. Divê wî heca xwe jî kiribe. Heke însanek di wekaleta yekî din de biçe hecê lêbelê hê wî bi xwe, heca xwe nekiribû, ew heca wî ji ber dîgerê wî ve çênabe, ew jê re dibe heca wî. Ew ji wî re heca îslamê tê jimartin.

Delîla vê ev hedîs e, ewa ku Îbnebbas [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje: «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bihîst ku zilamekî digot; lebbeyke ji ber Şebrûme ve. Jê re got; Şebrûme kî ye? Wî got; ew birayê min e, yan jî lêzimekî min e. Jê re got; ma te heca xwe kiriye? Wî got; na! Jê re got; heca xwe bike, paşê ji ber Şebrûme ve hecê bike.» (Ebûdawud ew rîwayet kiriye)





Ûmre

Ûmre di ferhengê de;

Zîyaret û serdan e.

Ûmre di navlêka fiqhî de;

Zîyareta Beytê ye, di her wextekî de ji bo edakirina hinek mensîkên mexsûs.

Hukmê Ûmrê û fezîleta wê

Ûmre, her wekî hecê di emrê însên de careke tenê wacib e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dibêje: «Îslam, ew e, tu şehda xwe bîne ku; ji Xuda pê ve ti îlah nîn in, Mûhemmed jî pêğemberê wî ye, tu nimêjê bikî, tu zekatê bidî û tu heca Beytê bikî û ûmrê bikî, tu xwe ji cenabê bişoyî, tu desmêja xwe tam bigrî û tu rojîya remezanê bigrî» (Îbnxuzeyme rîwayet kiriye)

Dîsa pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dibêje: «Ûmre heta bi ûmrê ji bo gunehên navbera wan kefaret e. Heca meqbûl jî, ji bilî cennetê mûkafateke wê ya din nîn e.» (Buxarî û Mûslim ew rîwayet kirine)

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê


Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec











Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Mîqat

3 Mîqat

Mîqat di ferhengê de;
Tixûbê di navbera du tiştan de ye.

Mîqat di navlêka fiqhî de;
Ew zeman û mekan e ku şerîetê ji bo îbadetê kiriye tixûb û wext.

Cureyên Mîqatê

Ya yekê: Wextên Mîkatê

Cîhên Mîkatê
Ew cih in ku şerîetê ew ji bo îhraman dîyar kirine.

Ji bo însanê ku dixwaze biçe hecê, yan jî ûmrê ne durust e ji wan derbas bibe; heke ihram li xwe nekiribin. Ew jî pênc mîqatin (El-Mewaqîtû we evadûha, ya Şêx Ebdûllah el-Besam, mecelletû Mecmeûl-Fiqhûl Îslamî, hijmara 3, cuzuya 3, rûpel, 1553.)

1. Zûl-Hûleyfe:

Zûl- Hûleyfe, vêga li alîyê başûrê Medîna Nebewî ye. Jê re "Ebyarû 'Elî" tê gotin. Ew kêm-zêde 420 km'an ji Mekkê dûr e.

Ew mîqata xelkê Medînê ye.



Zûl-Hûleyfe

Naverok

2.Cûhfe ye:

Cûhfe, ew nêzîkî bajarê Rabiğ e. Ew kêm-zêde 186 km'an ji Mekkê dûr e.

Ew mîqata xelkên Şam, Misr û Meğribê ye.



Cûhfe

3. Yelemlem:

Ew newaleke mezin e, di rêya xelkê Yemenê ya ji bo Mekkê de ye. Ew îro, bi “es-Se‘dîye” tê navkirin. Ew kêm-zêde 120 km’an ji Mekkê dûr e.



Yelemlem [es-Se‘dîye]

4. Qernûl Menazîl:

Ew vêga bi “Seylûl Kebîr” tê navkirin. Ew kêm-zêde 75km’an ji Mekkê dûr e. Ew mîqata xelkê Necd û Taîfê ye. Li jora wê, li ser rêya Taîfê li rexê hediyê ciheke heye jê re “Wadû Mûhrim” tê gotin. Ew herdu jî mîqata xelkê Necdê û her mirovî ne, ku ji rêya Taîfê ve tên.



Qern [el-Menazîl es-Seyl]

5. Zatû Îrq:

Ew, vêga bi “ed-Darîbe yan jî el-Xerîbat” tê navkirin. Ew, ciheke li rojhilatê Mekkê ye. Ew kêm-zêde 100km’an jê dûr e. Ew, vêga çol û şemirandî ye.

Ew mîqata xelkên rojhilatê ye [Îraq, Îran û yên li pişt wan e].

Delîla van mîqatên bûrîn ev rîwayeta Îbnebbas [Xuda jê razî be] e, dibêje: «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji bo xelkê Medînê Zûl-Hûleyfe, ji bo xelkê Şamê Cûhfe, ji bo xelkê Necdê Qernûl Menazîl, ji bo xelkê Yemenê Yelemlem, mîqat kufş kir û got: «Ev, ji bo wan e û ji bo wan mirovan e, yên ku dixwazin biçin hec û ûmrê, heke ne ji ehlê wan bin jî; lê ji rêya wan ve werin. Ewên ku ji bilî wan bin jî, ji kuderê ve bixwaze, heta [mîqata] xelkê Mekkê jî ji Mekkê ye.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)

Herçî Zatû Îrq e, di vê hedîsa bûrî de behsa wê nehatiye kirin. Ew jî Ûmer kurê Xettab [Xuda jê razî be] ew dîyar kiribûye. (Buxarî rîwayet kiriye)



Zatû Îrq [el-Xerîbat]


Zûl-Hûleyfe
[Ebyarû 'Elî]
El-Cûhfe
[Rabiğ]
Zatû Îrq
[el-Xerîbat]
Qern
[el-Menazil es-Seyl]
Yelemlem [es-Se'dîye]

Hinek mijar

- Kî, bê îhram ji van mîqatan derbas bibe, heke îmkan hebe, divê ew dîsa lê vegere. Heke îmkan ji bo vegerîna wan nebe, fîdyekek li ser wî lazim dibe. Ew jî bizinek e. Ewê wê li Mekkê serjêke û wê li miskînên Heremê belav bike.

- Kî, di ser van mîqatan de derbas bibe û ne ji xelkên wan be, ewê ji wan îhraman li xwe bike. Heke mirovek ji xelkê Necdê ji rêya Medînê ve were, ewê ji Ebyarû ‘Elî îhraman li xwe bike.

- Kî, mala wî li kêmtirî cihên mîqatan be, li terefê Mekkê be. Ewê ji cihê xwe ji bo hec û ûmrê îhraman li xwe bike. Her wekî xelkên Cidde, Behre û Şeraî‘ê.

- Kî, ji rêyekê ve were ku ew di ber mîqatan de derbas nabe; her wekî bi rêyên bejî, behrî û hewayî were, dema ew were dehma nêzîktirê mîqatan, ewê ji wir îhraman li xwe bike.

Lewra Ûmer gotiye: «Ji rêya xwe ve li dehma wan binêrin.» (Buxarî rîwayet kiriye.)

- Kî, li nav Mekkê nîyeta hecê bike, çi ew ji xelkê wê be, çi jî ne ji xelkê wê be, ewê ji wê îhraman li xwe bike. Herçî ûmre ye, ewê ji cihê nêzî hillê îhraman li xwe bike, her wekî Teîm û Cî‘eranê. Ev cih, li derveyî tixûbê Heremê ye.

Ya duduyan: Wextên Mîkatê

Wextên zemanî

Wextê Hec û Ûmrê

a- Wexta mîqata Hecê:

Mehên hecê: Şewal, Zûlqade û dehê ji Zîl-Hiccê ne.

b- Wextê miqata Ûmrê:


Tevê salê ye



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review

Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro

Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Îhram

4 Îhram

Îhram di ferhengê de;
Men e.

Îhram di navlêka fiqhî de;
Nîyeta ketina nisûkê û pê re destpêkirina bi emelekî ji emelên hecê ye.

Îhram bê nîyet çênabe. Însan, bi ezmkirina hec û ûmrê tenê nabe îhram- wergir; lewra ew ji wê dema ku ji welatê xwe dest bi seferê dike ve, ezma hec û ûmrê dike, ew bê nîyeta ketina nisûkê bi jixwe-kirina cilên dirûtî û bi telbîyê tenê nabe îhramwergir.


Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Emel, bes bi nîyetan e. Her kesî çi nîyet kiribe, ew jê re heye.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Mûstehebên îhramê

1. Xwe şûştin

Xarîce kurê Zeyd kurê Sabit ji bavê xwe rîwayet dike, dibêje wî got; «Min pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dît, wî cilên xwe xwe ji bo îhlala xwe ji xwe kirin û xwe şûşt.» (Tirmizî rîwayet kiriye)





Naverok

2. Xwe paqij kirin.

Ew, bi hilkirina mûyên binçengên xwe û rûvê xwe û kurtkirina simbêlên xwe û jêkirina neynokên xwe çêdibe.









3. Bêhna xweş.

Lewra Aîşe [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje: «Ji bo îhram li xwe kirina wî, dema wî îhram li xwe dikir, min jî bêhna xweş li pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dikir.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Lêbelê mirov bêhna xweş li cilên xwe nade.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Hûn ji cilan tiştekê li xwe nekin; ku zeferan, yan jî wers (Wers, giyayekî zer e, bêhna wî pirr xweş e, ew ji bo boyaxê bikar tê.) lê ketibe» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)



Tîb

4. Jixwekirina zilamî ye, ji bo cilên dirûtî berî îhraman ew pêşmaleke sipî û ebayekî sipî li xwe dike û pêlavekê dixe pêyên xwe.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dibêje: «Bila yek ji we îhrama xwe pêşmalekî, ebayekî li xwe bike û du fer pêlav bixe lingên xwe. Heke ew du fer pêlav nebîne, bila du xufikan bixe pêyên xwe; bila wan biqetîne ji bo ew heta bi gwîzekan bibin» (Ehmed ew rîwayet kiriye)

Herçî jin e, ew ji cilan kîjanê bixwaze, ewê îhraman li xwe bike. Jê re rengekî mûeyyen jî nîn e. Lêbelê bila ew xwe ji şibihandina zilaman û ji cilên zînetê biparêze. Ew di îhramê de nîqab û

lepikanwernagire. Lêbelê dema zilamên ecnebî hazir bin, hingê bila ew rûyê xwe binixumîne, yanî bila ew cilê xwe ji ser serê xwe ve bi ser xwe de berde.

Lewra Aîşe [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; «siwar di ber me de derbas dibûn, em jî bi pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] re di îhraman de bûn. Dema ew dihatin dehma me, yekê ji me, ji ser serê xwe ve cilbaba xwe bi ser rûyê xwe de berdida. Dema ew ji me dibûrîn me jî rûyê xwe vedikir» (Ebûdawud rîwayet kiriye)



Pêşmal û eba ji bo îhramwergirî



Pêlav ji bo îhramwergirî



Lepik ji bo îhramwergirê



Nîqab ji bo îhramwergirê

Qedeğeyên îhrame

1. Serê xwe nixumandina zilamî bi melasiqê

Îbnûmer [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; zilamekî got; ya pêğemberê Xuda! Îhramwergir kîjan cilan li xwe dike? Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Serkirasan, şaşan, derpêyan û bornozan wernegirin» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)

Dîsa pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] di bara wî yê ku di îhraman de miribû de gotiye: «Çarikê nedin serê wî; lewra ew roja qîyametê lebeykebêj tê şandin.» (Buxarî ew rîwayet kiriye)

Heke wî serê xwe girê nedabe, her wekî ew sihwanekê , yan çadirekê, yan banê malekê, yan jî taksîyekê bikarbîne, jê re guneh nîn e.



Şaş ji bo îhramwergirî



Kum ji bo îhramwergirî



Lixwe-kirina derpê ji bo îhramwergirî



Sihwan ji bo îhramwergirî

2. Lixwe-kirina cilên dirûtî ji bo mêran e

Ji mexîtê meqsed; ew cil e ku li gorî bedenê, yan jî hinekî ji bedenê, hatibe dirûtin e. Her wekî cil, derpê, kiras, xufik, gore, lepik û yên wekî van e.

Lewra Îbnûmer [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje: «Kiras, şaş, derpê, bornoz û xufikan wernegirin» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Dema mirovê ku îhraman dixwaze, pêşmalek bi dest wî nekeve, ew dikare derpêyekî li xwe bike, heta ew ji xwe re pêşmalekî peyda bike. Dema ew du fer pêlav nebîne, ew dikare du xufikan wergire.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Heke ew du fer pêlav bidestnexe bila xufikan wergire, bila ew wan biqetîne ji bo ew heta bi herdu gwîzekan bibin» (Îbnxuzeyme rîwayet kiriye)



Lixwe-kirina cilên dirûtî ji bo îhramwergir



Pêlav



Xufik ji bo îhramwergir

3. Kuştina nêçîrên bejîyê, yan jî nêçîrkirina wan e

Lewra Xuda Teala dibêje: {Dema hûn di îhraman de bin, nêçîrê nekujin!} [Maîde, 95] Yanî dema hûn ji bo hec û ûmrê ketibin îhraman.

Dîsa Xuda Teala dibêje: {Heta hûn di îhraman de bin nêçîra bejîyê ji we re hatiye heramkirin.} [Maîde, 97] Ji nêçîra bejîyê meqsed; ew heywan û teyrên wehşî yên mûbah in.

Herçî heywanê kedî ye, ew ne nêçîr e. Ji bo îhramwergir serjêkirina mirîşk, heywanên çarpê û yên wekî wan durust e.

Herçî nêçîra behrê ye, ji xwe ew durust e.

Lewra Xuda Teala dibêje; {Nêçîra behrê û xwarina wê jî we re hatiye helalkirin.} [Maîde, 96]

Herçî ew heywan e ku xwarina goştê wan heram e, her wekî mar û dûpişk, kuştina wan durust e. Her wiha ji bo îhramwergir kuştina her heywanê ku êrîşî wî bike, durust e; heke bê kuştina wî nikaribe wî ji ser xwe def bike.



Dûpişk



Mar



Nêçîra behrê ji bo îhramwergir durust e



Serjêkirina heywanên çarpê durust e



Nêçîra teyrên bejî

4. Kurkirina mûyan, yan kurtkirina wan, yan jî hilkirina wan e

Lewra Xuda Teala dibêje: {Serê [pora] xwe kur nekin heta hedîy bigihîje cihê xwe.} [Beqere, 196]

Qedeğekirin, şamilî ser mûyên bedenê tevan tê. Ew jî li ser pora serî hatine qîyaskirin.



Kurkirin û kurtkirin

5. Jêkirina neynokan e

Hîç ferq nake; çi neynokên destên wî bin, çi jî yên pêyên wî bin.



Jêkirina neynokên pêyan



Jêkirina neynokên destan

6. Bêhna xweş di beden û cilan de ye

Ji bo îhramwergir - piştî ew bikeve îhraman- qedeğe ye, ew bêhna xweş li bedena xwe, yan jî li cilên xwe bide, yan jî qesda bêhnkirina wê bike.

Lewra hedîsa Îbnûmer [Xuda jê razî be] heye, dibêje: «Hûn ji cilan tiştekê li xwe nekin; ku zeferan, yan jî wers lê ketibe» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)

Dîsa hedîsa wî yê ku di îhraman de miribû, heye, dibêje: «Henûtê li wî nekin.» (Buxarî rîwayet kiriye)



Bêhna xweş li bedenê dan ji bo îhramwergir



Bêhna xweş li cilan dan ji bo îhramwergir

7. Eqda nîkahê ye

Lewra hedîsa Osman [Xuda jê razî be] heye, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Îhramwergir nîkah nake, li xwe nîkah nake û jinan jî naxwaze.» (Mûslim rîwayet kiriye)

8. Cîma ye

Ew, kutana di quz de ye.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Kî, di wan de hecê li xwe ferz bike, cîma nîn e.} [Beqere, 197]

Îbnebbas [Xuda jê razî be] dibêje: «Ew cîma ye.»

Ew jî dijwartirîn qedeğeya îhraman e.

9. Çerm pev gihandina di ğeyrê quz de ye

Her wekî ramûsan û destdanê ye. Lewra ew navgîna kutana heram e.

Qedeğeyên îhraman ji jinê re

Jin di bara qedeğeyên îhraman de wekî mêr e. Lêbelê ew di van xusûsên jêrîn de ne wekî mêr e:

Ew cilên dirûtî li xwe dike.

Ew serê xwe dinixumîne.

Ew poşîk û lepikan wernagire. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Jina îhramwergir poşîkê nade ber rûyê xwe û lepikan jî wernagire.» (Buxarî ew rîwayet kiriye)

Jin li cem mêrên bîyanî be rûyê xwe dinixumîne; yanî ew ji alîyê serê xwe ve cilên xwe bi ser rûyê xwe de berdide û wergirtina zîneta zêr jî jê re mûbah e.



Tewcîhat

1. Ti esl, ji bo wê nimêja ku jê re "nimêja sunneta herdu reketên îhramê" tê gotin nîn e. Her wekî ku xwe pêgirtina bi dûayeke mûeyyen li cem ihram wergirtinê jî meşrû nebûye.

2. Heke rêwî rêwîyê bi firokê be û tirsa wî hebe ku ewê nikaribe cilên îhraman li xwe bike, hingê dema ew bigihîje cihê mîqatan, ewê wan ji mala xwe, yan jî ji firokxanê li xwe bike. Ew bi wê nabe îhramwergir heta nîyeta nisûkan neke, berî were dehma mîqatan.





Îtîbaa

3. Hinek hacî bi li xwekirina cilên îhraman re milên xwe yên rastê vedikin, ji vê re îtîbaa tê gotin. Ev, ne sehîh e. Lêbelê îtîbaa, li cem tewafûl qudûmê tenê dibe. Lêbelê mirov di ğeyrê wê de herdu milên xwe dinixumîne.

Hinek nesîhetên giştî ji bo hacîyan

Dema misliman biçe sefera hecê, yan jî ûmrê, li ser wî wacib e, li pey van rêşanîdanên tên, biçe:

1. Bila ew wesîyeta "teqwa Xuda [ezzewecelle]" li malbata xwe û hevalên xwe bike. Teqwa Xuda, kirina fermanên wî û xwe dûrkirina ji qedeğeyên wî ye.

2. Bila ew deynên xwe yên li xelkê û yên xelkê jî yên li xwe binivîse û ew li ser vê jî şahidan rake.

3. Bila ew lezê li toba nesûh ya ji hemû gunehan bike. Gelî mûmînan! Li ber Xuda Teala tobe bikin ji bo hûn biserkevin.

Xuda Teala dibêje: {Gelî yên ku îman anîne! Bi tobeyeke ji dilûcan ji gunehên xwe vegerin û li ber Ellah tobe bikin. Dibe ku Rebbê we li gunehên we bibuhure û we bixe bihiştên ku di bin koçkên wan de çem diherikin} [Tehrîm, 8]

4. Heke wî di bara can, yan mal, yan jî îrzê de zulmek li yekî kiribe, bila ew berî sefera xwe wê neheqîyê li xwediyê wê vegerîne, yan jî wê li xwe bide helalkirin. Wekî ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman kiriye, gotiye: «Kî, di bara mal, yan jî îrzê de zulmek li birayê xwe kiribe, bila îro ji wî helalbûnê bixwaze; berî ku dînar û dirhem nebin. Heke wî emelê salih hebe, bi qasî neheqîya wî jê tê standin. Heke xêrên wî nebin, ji günehên hevalên wî tên standin û li wî tên barkirin.» (Buxarî ew rîwayet kiriye)

5. Bila ew ji bo hec û ûmra xwe nefeqekekî pak ji malê xwe yê helal bibijêre.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman kiriye, gotiye: «Xuda Teala pak e, ji tiştê pak pê ve qebûl nake. Xuda Teala çi ferman li pêğemberan kiribe, ew ferman li mûmînan jî kiriye. Xuda Teala gotiye: ''Gelî pêğemberan! Ji malê pak bixwin û emelê salih bikin'' Xuda Teala gotiye: ''Gelî yên ku îman anîne! Ji malê pakê ku me rizqê we daye we bixwin û spasîya Xuda bikin heke hûn ji wî tenê re îbadet dikin.'' Paşê behsa wî zilamî kir, ew sefera xwe dirêj dike, di nav toz de maye, destê xwe bi asîmanî ve dirêj dike: Ya Reb, ya Reb! Xwarina wî heram e, vexwarina wî heram e, cilên wî heram in, bi heramîyê hatiye xwedîkirin, vêca bersiva wî dê çawa were dayîn?!» (Mûslim ew rîwayet kiriye)

6. Bila ew bi heca xwe û ûmra xwe razîbûna Xuda û mala axretê qesd bike û di wan cihên şerîf de bi gotin û kirinên ku Xuda razî dikin xwe nêzî Xuda Teala bike. Bila ew tam şîyar be, ji bo bi heca

xwe qesda dinya û pertalên wê, rîyakarî û nav û deng û pesn û şehnazîyê neke.

7. Bila ew di hec û ûmra xwe de tiştên jê re meşrû hîn bibe, xwe rohnî û zana bike û tiştên ku di vê xusûsê de nizanibe jî bipirse ji bo bi zanîn hec û ûmra xwe eda bike. Lewra mixabin gellek hacî hene, diçin hecê; lêbelê di bara awayê edakirina hecê de ti agahîya wan nîn e, ew hinek ferzên wê zayî dikin ku ew jî heca wan pûç dikin.

Hinek ji hukmên Îhraman

Îhramwergir, dema li cem desmêjê, yan jî şûştinê çend mû ji serê wî bikevin, ew zirar nade wî. Her wiha ye, heke tiştek ji simbêlên wî, yan ji riha wî, yan jî ji neynokên wî jî bikeve, dîsa zirar nade wî; madem wî bi qesd ew jê nekiribin. Di vê de mêr û jin wekhev e. Heke mûyek yan jî neynokek ji jinê jî bikeve, ew zirar nade wê.

Ji bo îhramwergir durust e bendekê li ser lingê xwe deyne; heke îhtiyaca wî pê hebe, yan jî di vê de mesleheteke wî hebe.

Şertkirin di nîyetê de

Kî, nexweşîyeke wî hebe, yan jî bitirse ku rewşek lê peyda bibe, nehêle ew nisûkên xwe temam bike, hingê jê re mûsteheb e li cem îhram lixwekirinê, ew şert bike û bibêje; ‘’Lebbeyke Xudayê min ez ji bo ûmrê, yan dîgerê wê îhram werdigrin; lê heke astengek li pêşîya min derkeve û nehêle ez nisûkên xwe temam bikim, li wir ez ji îhramê derketime.’’

Aîşe [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hat cem Dûbbae keça Zûbeyr, jê re got; ‘’Dibe ku tu qesda hecê dikî?’’ Wê got; ez bi Xuda kim; ji êşê61 pê ve nabînim! Jê re got; «Hecê bike û şert deyne, bibêje; Xudayê min, ez li kuderê bêm astengkirin, ez li wir ji îhramê derketime.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.) Dema ew vê bibêje û astengek jê re çêbibe, bê tiştek jê re durust e ji îhraman derkeve.






Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec




Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso


Nisûk û Telbîye

Nisûk û telbîye

Nisûk

Nisûk di ferhengê de;
Îbadet e.

Nisûk di navlêka fiqhî de;
Ew tişt e ku hacî, yan jî ûmreker dibêje û dike.




Naverok

Nîyeta nisûkê

Dema îhramwerger ji şûştina xwe û paqijkirina xwe vala bibe, cilên îhramên xwe li xwe bike û zilam jî cilên dirûtî ji xwe bike, ew ji bo hecê, yan jî ûmrê nîyeta ketina nisûkê dike. Mûsteheb e, ew nîyeta nisûkê ku nîyet kiriye, teleffuz bike û ew li cem qesda ûmrê piştre temettûê ji bo hecê bibêje: “Lebbeyke Xudayê min, ez qesda ûmrê dikim, paşê temettûa hecê dikim” yan jî “Lebbeyke Xudayê min, ez qesda ûmrê dikim” paşê li cem hecê jî bibêje: “Lebbeyke Xudayê min, ez qesda hecê dikim” û ewê mûqarin jî dibêje: “Lebbeyke Xudayê min, ez qesda hecê dikim” ewê mûqarin di navbera hec û ûmrê de jî dibêje: “Lebbeyke Xudayê min, ez qesda hec û ûmrê dikim.”

Lewra Enes [Xuda jê razî be] rîwayet dike û dibêje: “Min ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bihîst ku digot: «Lebbeyke Xudayê min, ez qesda Hec û ûmrê dikim» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine) Heke ew bi devê xwe tiştekê nebêje jî nîyeta bi dilê wî tenê têra wî dike.



Cureyên nisûkan

1. Temettû’ e:

Temettû, ew e; mirov di mehên hecê de îhraman ji bo ûmrê li xwe bike, jê vala bibe û ji îhraman derkeve. Paşê di eynî salê de ji bo hecê îhraman li xwe bike. Temettûkar, dema bigihîje Mekkê, ew emelekî ji emelên ûmrê dike, ew jî: Tewaf, Seyî, helq, yan jî teqsîr e. Paşê ew ji îhramên xwe derdikeve û cilên xwe li xwe dike. Dema roja heştê Zîl-Hiccê jî were, ew ji bo hecê îhraman li xwe dike, piştre emelên hecê dike. Li ser wî wacib e, ew ji bo temettûa xwe jî hedîyekî serjêke.

2. Qîran e:

Qîran ev e; mirov ji bo hec û ûmrê pev re îhraman li xwe bike. Yan jî ji bo ûmrê îhraman li xwe bike, lêbelê paşê berî dest bi tewafa wê bike, hecê jî bixe ser wê. Qarin di îhramên xwe de berdewam dibe; heta emelên hecê jî xilas dike. Lêbelê bi qîrana wî hedîyek li ser wî lazim dibe.

3. Îfrad e:

Îfrad, ev e; mirov ji bo hecê tenê îhraman li xwe dike. Îfradkar di îhramên xwe de berdewam dibe heta emelên hecê xilas bike. Lêbelê li ser wî ti hedîyek nîn e.

Nisûka çêtirîn temettû ye. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi kirina wê ferman li sehabîyê (Hedîsa Aîşe ye, di Sehîha Mûslim de ye) xwe kiriye. Paşê Qîran e, paşê jî îfrad e.

Ferq di navbera hersê nisûkan de

	Temettû	Qîran	Îfrad
Wesf	*Ûmre ye, paşê hec e.	*Ûmre û hec e.	*Hec tenê ye.
Îhram	*Mirov du îhraman li xwe dike, ya yekê; ji bo ûmrê ye. Paşê mirov îhraman ji xwe dike, paşê ji bo hecê dîsa îhraman li xwe dike.	*Ew ji bo hec û ûmrê careke tenê îhraman li xwe dike.	*Ew careke tenê ji bo hecê tenê îhraman li xwe dike.
Telbîye	*Li cem îhrama yekê, mirov dibêje: "Lebbeyke ez qesda ûmrê dikim." Paşê mirov li cem îhrama hecê jî dibêje: "Lebbeyke ez ez qesda hecê dikim." Yan jî mirov dibêje: "Lebbeyke ez qesda ûmrê dikim, ez pê temettûê dikim û hecê jî dikim."	*Ew li cem îhram lixwekirinê dibêje: "Lebbeyke, ez hec û ûmrê dikim".	*Ew li cem îhramlixwekirinê dibêje: "Lebbeyke ez hecê dikim."
Hedîy	*Têde hedîyek wacib dibe.	*Têde hedîyek wacib e.	*Têde hedîyek ne wacib e.
Tewaf	*Têde du tewaf hene. Ya yekê; ji bo ûmrê ye. Ya duduyan; ji bo hecê ye.	*Têde tewafeke tenê lazim e. Ew jî tewafa hecê ye.	* Têde tewafeke tenê lazim e. Ew jî tewafa hecê ye.
Seyî	*Têde du seyî hene. Ya yekê; ji bo ûmrê ye. Ya duduyan; ji bo hecê ye.	*Têde seyîyeke tenê heye. Ew jî seyîya hecê ye.	* Têde seyîyeke tenê heye. Ew jî seyîya hecê ye.

Telbîye

Telbîye;

Gotina îhramwergir e: "Ferman bike Xudayê min, ferman bike. Ferman bike, ti şirîkê te nîn in, ferman bike. Hemd, nîmet û milk her ji te re ne, ti şirîkê te nîn in."

Lewra hedîsa Îbnûmer [Xuda jê razî be] heye, dide nîşan ku telbîya pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî her wisan bûye.

Meneya «LEbbeyke Ellahumme lebbeyke» (Mûttefequn eleyh [Buxarî û Mûslim ew rîwayet kirine]) Ez her bersiva te didim û li ber fermana te amade me.

Telbîye, di nav xwe de pesnên Xuda, spasîya wî, bersivdana fermana wî, îzharkirina yekdêrîna wî û beraeta ji şirkê, dihewîne.

Hukmê Telbîyê

Telbîye sunnet e. Mêr wê bi dengê bilind dibêjin û jin jî ji tirsa fitnê wê bi dengê nizm dibêjin.


Wextê telbîyê û cihên wê

Îhram ergir di piştî îhram lixwekirinê de dest bi gotina telbîyê dike û ew di rêya xwe de jî wê zehf zehf dibêje.

Ew di gellek cihan de mûekked [gotina wê zehf baş] e. Hinek ji wan cihan jî ev in:

Dema ew hilgere ser cihên bilind, yan xwe berde newalekê, yan nimêja ferz eda bike, yan şev berê xwe bide û were, yan jî naveroj berê xwe bide û were.


Îhramwergir di ûmrê de dema Beytê bibîne û berê reş îstîlam bike, telbîya xwe qut dike; di hecê de jî dema ew roja îdê dest bi remîya Cemra Eqebê dike, telbîya xwe qut dike.



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Sifetê Hec û Ûmrê



Sifetê Hec û Ûmrê

Sifetê Hecê

Kî, bi qesda hecê were, yan ewê mûtemetî be, yan qarin be, yan jî mûfrid be. Herçî Mûtemettî be, ew piştî ûmra xwe dike, ji îhramên xwe derdikeve. Herçî qarin û mûfrid bin, ew di îhramên xwe de berdewam dibin û emelên hecê jî ji roja heştê destpê dike, heta bi dawîya roja sêzdehan.


Ev jî li gorî rojan beyankirina wê ye:

Roja sêzdehan ji meha Zîl-hiccê [roja Terwîyê ye] (Ji vê rojê re "Roja Terwîye" tê gotin. Lewra hacî ji bo Mîna û Erefatê têra xwe avê werdigrin. Lewra av li wir nîn e.)

1. Di roja heştan de sunnet e mirov berî nîvroyê ji bo hecê îhramên xwe li xwe bike û ewê ji mekanê xwe bikeve îhraman. Heke ew li Mekkê be, ewê ji wir bikeve îhraman. Heke ew li Mînayê be, ewê ji wir bikeve îhraman. Ewê xwe bişoyê, bêhna xweş li xwe bide, cilên îhraman li xwe bike û ji bo hecê lebbeyka xwe bîne û bibêje: «Ferman bike Xudayê min, ferman bike. Ferman bike, ti şirîkê te nîn in, ferman bike. Hemd, nîmet û milk her ji te re ne, ti şirîkê te nîn in» (Buxarî ew rîwayet kiriye.)


Naverok

2. Ew berê xwe dide Mînayê, têde nimêja nîvro, esr, meğrib, eşa û fecrê eda bike. Ji roja talîyê her nimêjekê di wextê wê de bike û nimêjên çar reketî jî kurt bike. Ew li Mînayê dimîne heta derketina tavê di roja nehan de ye. Zehf telbîyekirin jî sunnet e.




Îhram


Bêhna xweş li xwe dan


Xwe şûştin


Mîna

Roja nehê meha Zîl-Hiccê roja Erefê ye.

1. Dema tava vê rojê derkeve, hacî bi lebbeykê ber bi Erefê ve dimeşin. Sunnet e, hacî berê xwe bidin Nemîrê. Ewê li wir bimîne heta tav zaîl bibe, heke ev jê re hêsan bibe. Dema tav zaîl bibe û wextê nîvro were, ji îmamê mislimanan, yan jî cîgirê wî re sunnet e, xutbeyeke mûnasibî rewşa wan ji hacîyan re bixwîne. Ewê têde tewhîdê iqrar bike û wan hînî hukmên hecê û erkên wan yên dînî bike.

2. Paşê ew li wir nimêja nîvro û esrê bi cemû-teqdîmî eda dike û ew nimêjê kurt dike. Di vê rojê de ji hacîyan re meşrû ye ku berê xwe bidin qiblê û zehf dûa bikin. Bila zehf xwe bidin dûa û ew zarzarkirin, xwe rebenkirin, bêçaretî û mûhtacbûna xwe ya bi Xuda [ezzewecelle] xuya bikin. Bila ew di dûayan de îlhah bikin û wan dubare dubare bikin.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Dûaya çêtirîn dûaya roja Erefê ye. Çêtirîn tişta ku min gotî û ya ku pêğemberên berîya min jî gotin: «Ji Xuda pê ve ti îlah nîn in, ew yek e, ti şirîkê wî nîn in, desthilatî ya wî ye û hemd her ji wî re ye. Ew li ser kirina her tiştê kare ye.» (Tirmizî ew rîwayet kiriye)

Heta jê were bila ew ji xwe re dûayên mesûr bike û bila ew xwe ji dûayên peydakirî yên zehmet dûr bigre. Heke ew tiştekê ji Qur'anê bixwîne sipehî ye. Bila ew zehf selewatan li ser pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bide.

3. Hacî piştî roj biçe ava ji Erefê vedigere Mûzdelîfê û ne durust e, ew berî roj biçe ava vegere. Heke ew berî roj biçe ava jê derkeve, heke bi şevê be jî dîsa ewê li wê vegere. Heke ew venegere wê, divê ew xwînekê bide. Ew jî pezek e, yan heftyeka hêştirê ye, yan jî heftyeka dewarekî ye.






Mûzdelîfe



Nemîre



Erefat

Tewcîhat

1. Wiqûfa Erefê, bi hebûna hacî li Erefê ya di roja nehê de bicih dibe. Hîç ferq nake; çi ew jipêya be, yan rûniştî be, yan gêrkirî be, yan jî siwar be. Wateya wê ne jipêyabûn e.

2. Wiqûfa li Erefê ruknek ji ruknên hecê ye. Bêyî wê hec ne sehîh e. Dema wiqûf ji dest mirov biçe, hec jî ji dest mirovî çûye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Hec Erefe ye!» (Ehmed ew rîwayet kiriye)

3. Wextê wiqûfa li Erefê ji vedana fecra roja nehê destpê dike heta bi vedana fecra roja dehê dewam dike. Naxwe kî, di vî wextî de li Erefê wiqûfê bike çendan kêlîkek be û ew jî ji ehlê wiqûfê be, heca wî durust e. Kî jî di vî wextî de wiqûf jê re hasil nebe, heca wî ne sehîh e.

Lewra Îbnebbas [Xuda jê razî be] bi merfûkî rîwayet dike û dibêje: «Kî berî vedana fecrê bigihîje Erefê, ew gihaye hecê» (Elbanî ew di Sehîha el-Camîê de bi jimara [5995] sehîh dêrîyaye)

4. Erefe tev cihê wiqûfê ye. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] li cem çîyê nêzîkî zinaran berê xwe da qiblê û wiqûfa xwe kir û hilnegerîya ser çîyê.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Min ha li vir wiqûf kir, Erefe tev cihê wiqûfê ye» (Mûslim ew rîwayet kiriye)

Heke ji hacî re hêsan bibe, ew li wî cihê ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] lê wiqûf kirî, wiqûfa xwe bike, bila bike. Heke ew jê re hêsan nebe, li her cihekî Erefê wiqûf çêdibe. Wiqûf li newala berî Erefê ne sehîh e. Navê wê newala "Erene" ye. Ew naçe ser çîyê û hilnagere ser zinaran jî. Herçî Erefe ye, tixûbê wê melûm e. Li ser wan elamet hene, ew ji berê de li ser wan hatine danîn. Vêga jî li ser wan hinek elametên nû yên mezin û zehf eşkere hatine danîn. Ew ji hemû alîyan ve tixûbê wê eşkere dikin.

5. Divê hacî mezinbûn û fezîleta vê rojê di bîra xwe bîne [û zanibe ku] Xuda têde qencîyê li evdên xwe dike, bi wan hewayê diavêje melaîketên xwe û têde mirovan zehf zehf ji êgir azad dike.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Rojek nîn e ku Xuda ji roja Erefê zehftir mirovan têde ji êgir azad bike. Xuda nêzîk dibe. Paşê bi wan hewayê diavêje melaîketan û dibêje: Evên ha çi dixwazin?» (Mûslim ew rîwayet kiriye) Divê hacî saetên vê roja qenc binirxîne, toba xwe nû bike, nefsa xwe mûhasebe bike û ew wê bi gerê, axaftina zêde û nîqaşê zayî neke.

Şeva dehê vegera ji bo Mûzdelîfê û şev-bûrandina li wê ye

1. Hacî piştî roj diçe ava ji Erefê vedigere Mûzdelîfê. Ji bo hacî sunnet e, bi hêdî hêdî û sergiranî vegere ji bo mirovan neêşîne. Bila ew leybbeyke bibêje û zehf zikrê Xuda [ezzewecelle] bike.

2. Dema hacî bigihîje Mûzdelîfê, ew berî pertalên xwe û tiştên xwe peya bike, dest bi nimêja meğrib û eşayê bi cemû-teqdîmî dike û eşayê jî bi kurtînî dike.

3. Divê hacî di vê şevê de şeva xwe li Mûzdelîfê derbas bike, li wir nimêja fecrê zû eda bike û ew berî fecrê ji Mûzdelîfê naçe; heke ne ji bo uzrekî be; her wekî jin û zarokên zeîf û yên ku hevaltiyê bi wan re dikin, yan jî ew mirovên bi xizmeta hacîyan radibin, dema heyv here ava, ji wan re durust e ew dawîya şevê ji Mûzdelîfê vegerin.

4. Dema hacî nimêja fecrê eda bike, mûsteheb e, ew were cem Meşirûl Heramê, berê xwe bide qiblê, destê xwe bilind bike û zehf zikr, tekbîr û dûa bike. Ewê wisan dewam bike, heta roj tam zer bibe. Ew li Mûzdelîfê li kîjan cihî rawest, durust e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Min ha li vir wiqûf kir, Mûzdelîfe cihê wiqûfê ye.» (Mûslim ew rîwayet kiriye)

5. Dema hacî ji Mûzdelîfê vegere, jê re mûsteheb e, raje heft kevirkan ji bo avêtina Cemra roja yekê tenê. Herçî rojên mayî ne, ew kevirkên xwe ji Mînayê werdigre, ew ji kîjan mekanî kevirkan wergire, durust e.

Roja dehê meha Zîl-Hiccê roja Îdê ye

1. Ew nimêja fecrê eda dike. Paşê heta berî derketina tavê, xwe ji bo zikr û dûa vala dike.

2. Hacî berî derketina tavê ji Mûzdelîfê vedigere û berê xwe dide Mînayê. Ew di rêya xwe de jî telbîyê zehf dibêje. Dema ew bigihîje newala Mûhessir lezê dike. Ew newal berî Mînayê ye, di navbera wê û Mûzdelîfê de ye. Dema ew bigihîje Mînayê bi emelên roja îdê radibe. Ew emel jî bi kurtî ev in: Remîya Cemra Eqebê, qurban, helq, yan jî teqsîr, tewaf û seyî ye.

3. Dema hacî bigihîje Mînayê, ew berê xwe dide Cemra Eqebê, ew ji cîhetê Mînayê ve dawîya Cemreyan e; ji cîhetê Mekkê ve jî cemra yekê ye. Dema hacî bigihîje wê, telbîya xwe qut dike û heft kevirkan li pey hev diavêje wê; ew bi her kevirkekî re tekbîr tîne. Wextê wê yê mûsteheb ji fecra roja îdê destpê dike. Heke ew dawîya şevê, berî fecrê jî remîya wê bike, sehîh e û jê re çêdibe. Wextê remîyê heta vedana fecra roja yazdehan jî berdewam dibe.

Tewcîhat

- Divê misliman li cem remîya wî ji bo cemreyan û edakirina wî ji bo şîarên hecê yên din jî, xwe ji êşandina birayên xwe hacîyan biparêze.

- Divê hacî emîn bibe ku kevirkên wî ketine kortên remîyê. Lewra hinek însan şaş dikin û zen dikin ku remî ji bo cihê sabit e, kevirk nakevin kortên avêtinê. Hinek însan jî ji mesafekeke dûr remîyê dikin, kevirkên wan nakevin kortên avêtinê. Yên wekî van waciba remîyê eda nekirine.

- Divê misliman xwe ji mûbaleğekirina di remîyê de biparêze. Her wekî remîya bi kevirên mezin, yan jî bi pêlavan. Sunnet e, hecmê kevirkan piçekê ji liba nokan mezintir be.

Lewra hedîsa Cabir kurê Ebdûllah [Xuda jê razî be] heye, têde dibêje: «Min pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dît remîya Cemrê bi kevirkên wekî kevirên berkehnîkê kir» (Mûslim ew rîwayet kiriye Kevirkên xezfê, kevirkên biçûk in, însan wan dixe navbera her du telîyên xwe şehdê û davêje.)

- Dema hacî kevirkên xwe tevan careke tenê bavêje, ew jê re kevirkekî tenê tê hesabkirin. Heke ew, wan bê avêtin, di kortan de deyne jî ne sehîh e; divê her avêtin û remî hasil bibe.

4. Zilam serê xwe kur dike, yan jî ji tevî kurt dike. Helq [kurkirin] ji teqsîrê [kurtkirinê] çêtir e. Herçî jin e, ew jî bi qasî serê telîyê ji serê xwe kurt dike.

5. Hacî li Mekkê peya dibe, tewafa îfadê dike. Di vê tewafê de ne remel heye; ne jî îtîbaa heye. Hacî piştî tewafê du reket nimêj dike. Di vê tewafê de ya baş; hacî cilên îhraman ji xwe bike, piştî remî û helqê, ew cilên xwe yên adetî li xwe bike û bêhna xweş jî li xwe bide.

Lewra Aîşe [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje: «Min bêhna xweş li pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dida ji bo îhramên wî dema wî îhram li xwe dikirin û ji bo îhram jixwekirina wî jî berî ew Beytê tewaf bike.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)

6. Wextê tewafê piştî vedana fecra roja îdê destpê dike. Ew ji şeva îdê di dawîya şevê de, berî fecrê jî caiz e; ji bo yên ku ji ber zeîftîya xwe ji Mûzdelîfê lezê dikin. Durust e ew, wê ji roja îdê texîr bike jî lêbelê xîlafa ya baş e.

7. Piştî tewafa îfadê, divê mûtemettî seyîya di navbera Sefa û Merwê de bike. Herçî mûfrid û qarin in, heke wan piştî tewafûl qudûmê seyî kiribin, ji xwe piştî tewafa îfadê ti seyîyek li ser wan nîn e. Dema hacî ji tewafa îfadê û seyîyê xilas bibe -heke seyî li ser wî hebe- emelên roja îdê jê re temam bûne. Lêbelê divê ew li Mînayê vegere ji bo şeva yezdehê li wê derbas bike.

Tertîba emelên roja îdê:

Sunnet e tertîba emelên roja îdê wekî rêza bûrî pêkwere: Remî, paşê qurban, paşê helq, paşê tewaf, paşê seyî ji bo yê ku seyî li ser wî hebe. Heke ew hinekan ji wan emelan li pêşîya hinekan ji wan emelan bike jî caiz e. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ruxset ji bo vê daye. Heke hacî pêşî helqê bike, paşê remîyê bike, ev durust e. Heke pêşî qurbanê bike, paşê tewafê bike, paştir remîyê bike, ev jî sehîh e. Her wiha ye yên din jî. Lewra di vê rojê de çi tişta ku hatibe teqdîmkirin, yan jî texîrkirin ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hatibe pirskirin, her wî gotiye: «Bike, ti tengasî nîn e» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)



Remîya cemra eqebê



Serjêkirina qurbanê




Porkurkirin yan jî porkurtkirin



Tewaf



Seyî di navbera Sefa û Merwê de



Şevbûrandina li Mînayê

Tehellûla yekê û tehellûla duduyan:

Tehellûla [îhram ji xwe kirina] yekê: Mûbahbûna hemû qedeğeyan e ku ew bi sebeb îhraman ji îhramwergirî re heram bûne; ji bilî kutana jinan, mûbaşereta [çermê xwe gihandina çermê] wan, yan jî eqda nîkahê; ev jê re helal nabin. Tehellûl jî bi kirina du tiştan hasil dibe. Ew herdu tişt jî remîya Cemra Eqebê ye, helq e, yan jî teqsîr e, tewaf digel seyîyê ye ji bo yê ku seyî li ser wî hebe.

Tehellûla [îhram ji xwe kirina] duduyan: Mûbahbûna hemû qedeğeyan e ku ew bi sebeb îhraman ji îhramwergirî re heram bûne. Tehellûla duduyan bi kirina wan hemû tiştên bûrî, hasil dibe.

Ti elaqa serjêkirina qurbanê bi tehellûlê re nîn e. Heke hacî serjêkirina qurbana xwe heta bi roja yazdehê texîr bike û emelên din yên roja îdê bike, ew tehellûl dike; çendan qurbanê serjê neke jî.

1. Rojên teşrîqê

Rojên teşrîqê, sê roj in: Roja yazdehê, roja diwazdehê û roja sêzdehê meha Zîl-Hiccê ne. Çima ji wan re “rojên teşrîqê” hatiye gotin? Lewra goştên qurbanan di wan de tê qutkirin, perçekirin û li ber tavê tê hişkkirin.

Ji xwe pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî di bara van rojan de gotiye: «Bila haya we jê hebe ku ev rojên ha, rojên xwarin, vexwarin û zikrê Xuda ezzewecelle ne.» (Ebûdawud ew rîwayet kiriye)

Roja yezdehê û şeva wê

Roja yazdehê şevbûrandin li Mînayê wacib e. Di roja yazdehê de piştî zewala tavê remîya hersê cemreyan jî tê kirin; her cemrekek bi heft kevirkan tê avêtin (Ew sê kort in. Di her kortekî de stûnên sabit hene. Ew ji aliyê Mekkê ve dikeve dawîya Mînayê. Ya yekê; cemra suğra [biçûktirîn] ye. Paşê cemra wusta [navê] ye. Paştir jî cemra kubra [mezintirîn] ye. Ew jî cemra Eqebê ye. Ew ji rexê Mekkê ve tixûbê Mînayê ye.).

Sifetê Remîyê

Remî, bi cemra yekê tê destpêkirin: Hacî heft kevirkan li pey hev diavêje wê û bi her kevirkekî re jî tekbîr tîne. Divê ew kevirk jî bikevin kortê. Paşê ew piçekê ji wê bipêşve diçe, radiweste, destên xwe bi jorê ve radike û dûa ji Xuda [ezzewecelle] dike.

Paşê jî cemra wusta [navê] tê: Hacî her wekî cemra yekê heft kevirkan diavêje wê, piştî wê herdu destên xwe bi jorê ve radike û dûa dike.

Paşê Cemra Eqebê tê: Hacî heft kevirkan divêje wê jî û piştî wê ji bo dûa jî ranawestê.


Cemra ûla [yekê]


Cemra Eqebê


Cemra wusta [navê]

Roja diwazdehê û şeva wê

Şeva diwazdehê şevbûrandina li Mînayê wacib e. Dema tav zaîl bibe, mirov remîya hersê cemreyan dike, wekî ku di roja yazdehê de jî derbas bû.

Heke hacî di vê rojê de lezê bixwaze, ew remîyê dike û berî roj biçe ava ji Mînayê derdikeve. Heke roj biçe ava û ew hê jî li Mînayê be, hingê divê ew şevbûrandina li wê bike û di roja sêzdehê de jî remîyê bike. Ev jî, ji wî re zêdebûna xêrê ye.

Xuda Teala dibêje: {Kî, di du rojan de lezê bike, jê re guneh nîn e; kî, texîr jî bibe, guneh jê re nîn e, ji bo yê xwe biparêze.} [Beqere, 203]

Meqsûd jê ev e: Kî, di du rojên teşrîqan de lezê bike, ew jî roja yazdeh û diwazdehê ye, yan jî texîr bibe û roja sêzdehê jî temam bike.

Roja sêzdehê û şeva wê

Hacî roja sêzdehê di piştî zewalê de remîya hersê cemreyan -bi sifetê ku di roja yazdehê de derbas bûye- dike û bi çûna ava ya tava vê rojê re wextê remîyê jî xilas dibe, diqede.

derengxistina remîyê

Heke hacî remîya cemreya rojekê heta roja piştî wê texîr bike, durust e. Heke ew wê heta roja dawîyê jî texîr bike, dîsa durust e. Lewra rojên teşrîqê tev, ji bo remîyê wext e.

Sifetê remîyê, dema ew wê texîr bike

Hacî ji ber roja yekê ve dest bi remîya di hersê cemreyan de, dike. Paşê ew ji cemra suğra vedigere, ji ber roja pey wê jî remîyê dike û her wiha ne, yên din jî. Ew jî piştî zewalê, dibe.

Tewafûl Weda‘a

Dema hacî bixwaze ji Mekkê derkeve, ew tewafa weda‘ê [xatir-xwestinê] dike. Ew ji wacîbatên hecê ye. Di piştî wê de seyî nîn e. Tewafa weda‘ê ji ser jina di heyzan de û ji ser jina bi çêl dikeve.

Texîra tewafa îfadê heta bi weda‘ê

Heke hacî tewafa îfadê texîr bike heta dema weda‘ê, ev durust e. Lêbelê xîlafa ya baştir e. Jê re sehîh e, ew bi tewafa îfadê ji ber tewafa weda‘ê bes û îktîfa bike; bi şertê ku nîyet ji ber tewafa îfadê be, ji wî re ji ber weda‘ê ve têrê dike; çendan piştî wê seyîyê jî bike.

Hikmet ji tewafê

Hikmet ji tewaf, seyî û remîyê bicihanîna zikrê Xuda ye.



Sifetê Ûmrê

1. Dema mûtemir [ûmre-xwaz] bigihîje mîqatê, ew xwe dişoyê, bêhna xweş li xwe dide, cilên îhraman li xwe dike, bi: «Ferman bike, ez dixwazim ûmrê eda bikim» nîyeta xwe li ûmrê tîne.

2. Ew bi: «Ferman bike Xudayê min, ferman bike, ferman bike ti şirîkê te nîn in ferman bike, hemd, nîmet û milk her ji te re ne, ti şirîkê te nîn in.» (Buxarî ew rîwayet kiriye.) dest bi telbîyê dike. Ew her telbîyê dibêje, heta Beytê dibîne û berê reş îstîlam dike.

3. Ew diçe ji bo bikeve Mescîdûl Heramê, ew bi rastê xwe destpê dike û bi dûaya çûna mizgeftê dûa dike.

4. Ew telbîyê qut dike û dest bi tewafa Beytê dike. Ew bi berê reş destpê dike û maç dike -heke ew jê re hêsan bibe- heke ew jê hêsan nebe, wî îşaret dike.

5. Ew Beytê dixe çepê xwe û heft şewtan [tûran] tewafê dike. Ew bi berê reş destpê dike û pê bidawî jî dike.

6. Sunnet e, ew di sê şewtên pêşîn de remelê bike. Remel; lezkirina di meşîyê de digel nêzî hev kirina gavan bêyî pengizîn e. Sunnet e, ew di vê tewafa xwe tevî de îttîbaê bike. Ew jî wiha dibe; milê xwe yê rastê vedike û ji bin wî ve dikeve ebayê û herdu terefên xwe jî dixe ser milê xwe yê çepê.

Şertên Tewafê

Di tewafê de nîyet, teharet û setra ewretî şert in. Ew heft caran tewaf dike. Ew bi berê reş destpê dike. Ew Beytê dixe rexê çepê xwe û di navbera şewtên wê de li pey hev dike; lêbelê heke nimêj were qametkirin, yan jî cenazeyek hazir bibe, hingê ewê nimêj bike, paşê ewê şewtên xwe yên mayîn temam bike. Divê tewafa wî bi temamê Beytê be. Heke ew ji Hicrê ve bikevîyê tewafa wî ne durust e; lewra Hicre ji Ke‘bê ye.



Şûştin



Îhram



Bêhna xweş

7. Ew di tewafê de ji dûayan çi bixwaze, ji xwe re dûa dike. Dema ew were dehma ruknê Yemanî wî îstîlam dike û tekbîr tîne. Heke ew nikaribe [wî îstîlam bike], wî îşaret nake, tekbîr jî nayêne

û ew di navbera ruknê yemanî û Hecerê Eswed de dibêje: «Xudayê me! Li dinyayê ya sipehî bide me û li axretê jî ya sipehî bide me û me ji ezabê êgir biparêze!» (Ebûdawud ew rîwayet kiriye)

8. Dema ew şewta hefttan xilas bike, herdu milên xwe bi ebayê xwe dinixumîne û terka îttîbaê dike; lewra îttîbaa, di tewafa ûmrê û tewafa qudûmê tenê de sunnet e.

Paşê ew berê xwe dide meqamê Îbrahîm [silavên Xuda lê bin] -heke ew jê re hêsan bibe- ew li piştî wî du reket nimêj dike û di reketa yekê de piştî fatîhê sûretê "Kafîrûn" û di reketa duduyan de jî sûretê "Îxlas" dixwîne. Heke nimêja li pişt meqamî jê re hêsan nebe, kuderê bixwaze, li wir nimêj dike.

Tewcîhat

1. Divê misliman di nav tewafkaran de îzdîhamê çêneke û di îstîlama berê reş, yan jî maçkirina wî de zehmetîyê hem ji xwe re, hem jî ji wan re çêneke. Her wiha ye, bila ew remelê jî neke, heke ew bi remela xwe ezîyetê bide tewafkaran.

2. Di tewafê de çi jê re hêsan bibe, bila ew wê dûayê ji xwe re bike. Ji bilî tişta bûrî, ji bo tewafê ti dûayeke taybetî nîn e. Heke ew di tewafê de Qur'anê jî bixwîne, ğem nake.

3. Îttîbaa, di tewafa ûmrê, yan jî qudûmê de di her şewteke [tûreke] tewafê de sunnet e.

4. Bila jin xwe di tewafa xwe de ji îzharkirina zînet û bêhnên xweş û bilindkirina dengê xwe bi zikr û dûa biparêze.

5. Ew derdikeve Sefayê, dema nêzîkî wê dibe jî, vê gotina Xuda Teala dixwîne: {Bêguman Sefa û Merwe ji nîşanên Ellah in. Naxwe kî bi sedema Heccê, yan jî 'Ûmrê here serdana Beytê, jê re ti guneh nîn e ku di navbera herduyan de se'îyiyê bike. Kî, bi dilê xwe bixwaze qenciyekê bike, bêguman Ellah, spasdar û zana ye.} [Beqere, 158]

6. Ew hildigere Sefayê, berê xwe dide qiblê, herdu destên xwe bi jorê ve bilind dike, Xuda mezin didêre, hemdê wî dike û dibêje: «Ji Xuda pê ve ti îlah nîn in, ew yek e, ti şirîk jê re nîn in, milk her jê re ye, hemd her jê re ye. Ew li ser kirina her tiştê kare ye. Ji Xuda pê ve ti îlah nîn in, ew yek e, wî peymana xwe anîye cih, arîkariya evdê xwe kiriye û wî bi tenê hevalbend bezandine.» (Buxarî rîwayet kiriye.)

Paşê ew di navbera wê de dûa dike. Hedîs jî "sê caran" wekî vê dibêje û têde ev jî heye: «Ew wekî li ser Sefayê kirî li ser Merweyê jî dike.» (Mûslim ew rîwayet kiriye)

7. Ew ji Sefayê peya dibe, berê xwe dide Merwê û ew di navbera herdu alayên kesk de di meşa xwe de lezê dike. Ew hildigere Merwê; wekî ku li Sefayê kirî her wisan li Merwê jî dike.

8 Ew di navbera Sefa û Merwê de heft caran se'îyê dike. [Çûn şewteke û hatin jî şewtek e].

Di se'îyê de teharet sunnet e. Heke ew bêdesmêj se'îyê bike jî dîsa sehîh e. Her wekî mûwalat [li pey hev] jî di navbera se'î û tewafê de sunnet e.

9. Ew di piştî se'îyê de pora serê xwe kurt dike; bi awayekî wisan ku ew di serê wî de tam xuya be. Jin jî ji her terefên pora xwe bi qasî sertelîyekê jê kurt dike.



Ji bo mêr porkurkirin ji porkurtkirinê çêtir e.

Lewra Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Xudayê min, li porkurkeran bibûre!» Sehabîyan got; ji bo porkurtkeran jî? Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] sê caran got: «Xudayê min, li porkurkeran bibûre!» Sehabîyan got; ji bo porkurtkeran jî? Û got: «Ji bo porkurtkeran.» (Buxarî rîwayet kiriye.)

Heke ew mûtemettî be ji ûmrê, ber hecê ve û li wir mûddetek nebe ku têde pora wî dirêj bibe, hingê porkurtkirin çêtir e. Bila ew porkurkirinê ji bo hecê texîr bike.

10. Ew ji îhramên xwe derdikeve.

Bi vê, ew ûmra xwe xilas dike.

Jin jî di se‘yî û tewafê de wekî mêr e. Lêbelê ev ferq heye; ew di tewafê de remelê nake û di se‘ya navbera herdu sitûnên kesk de jî lezê nake, ew pora xwe kur nake; lê ji temamê terefên wê bi qasî sertelîyekê jê kurt dike. Sertelî, movika telîyan ya jor e.




Se‘îyî di navbera Sefa û Merwê de




Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec








Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Rukn, wacîbat û sunnetên Hecê



Rukn, wacîbat û sunnetên hecê

Naverok

Ruknên hecê

1. Îheram e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Emel, bes bi niyetan e. Kî, niyeta çi kiribe, bes ew jê re heye. Naxwe kî hicret kiribe ji bo dinya li para wî bikeve, yan jî ew jinekê li xwe nîkah bike. Wî ji bo çi hicret kiribe, hicreta wî ji bo wê ye» (Buxarî rîwayet kiriye)

2. Se‘ya navbera Sefa û Merwê ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Se‘yê bikin. Lewra Xuda se‘yî li ser we nivîsandiye» (Ehmed rîwayet kiriye)

3. Sekna li Erefê ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Hec Erefe ye» (Tirmizî rîwayet kiriye)

4. Tewafa Îfadê ye.

Lewra Xuda Teala gotiye: {Bila mala kevnar tewaf bikin.} [Hec, 29]

Şîyarî

Kî, terka ruknekî ji ruknên hecê bike, heke ew rukn îhram be, nisûkê wî çênabe. Lewra wî niyet nekiriye û îbadet jî bêniyet çênabe. Heke ew ruknekî ji bilî îhramê be, nisûkê wî çênabe; heta ew wî neke.

Wacîbatên hecê

1. Îhram ji mîqatê ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî, hec û ûmrê bixwaze, ev dever ji bo wan û ji bo ğeyrên wan jî yên ku bi wan re werin mîqat e» (Buxarî rîwayet kiriye)

2. Wiqûfa li Erefê ye, heta roj biçe ava ji bo yên ku naverojê wiqûf lê kiribin.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] heta rojavayê wiqûf kiriye.

3. Şevbûrandina li Mûzdelîfê ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] şeva xwe lê derbas kiriye û gotiye: «Ji bo ummeta min nisûkê xwe wergire. Lewra ez nizanim, dibe ku ez piştî vê sala xwe çav li wan nekevim» (Îbnmace rîwayet kiriye)

Hem jî pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] piştî nîvê şevê destûra mislimanên zeîf daye. Ev jî nîşan dide ku şevbûrandina li Mûzdelîfê lazim e. Xuda jî li cem zikrkirina Meş‘irûl Heramê bi wê ferman kiriye.



4. Şevbûrandina li Mînayê ye di şevên teşrîqê de.

«Lewra sabit bûye ku pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ji şivanan re ruxset daye di şevbûrandina ji Mînayê de» (Ebûye‘la di Mûsneda xwe de rîwayet kiriye) Ev jî nîşan dide ku esl wacibbûna şevbûrandina li Mînayê ye.

5. Remîya Cemran e.

Lewra Xuda Teala gotiye: {Di rojên melûm de zikrê Xuda bikin.} [Beqere, 203]

Rojên melûm ji rojên teşrîqê ne. Ji xwe remîya cemran bi xwe jî perçekek ji zikrê Xuda ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Tewafa Beytê, se‘îya navbera Sefa û Merwê û remîya cemran hatine wacibkirin ji bo bicihanîna zikrê Xuda» (Ebûdawud rîwayet kiriye)

6. Helq [porkurkirin] yan jî teqsîr [porkurtkirin] e.

Lewra Xuda Teala gotiye: {Sûnd be, hûnê bi destûra Xuda; bi ewleyî û bêtirs herin Mescîdul Heramê. Hinek ji we pora xwe tevî biqusînin û hinek ji we jî kurt bikin.} [Feth, 27]

7. Tewafûl Weda ye.

Lewra Îbnebbas [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje: «Ferman li mirovan hatkirin ku bila dawiya ehda wan bi Beytê be, lêbelê ev ji ser jina di heyzan de hate sivikkirin» (Mûslim ew rîwayet kiriye)

Sunnetên hecê

1. Xwe şûştin û bêhna xweş li xwe dan ji bo îhramê ye.

2. Lixwekirina pêşmal û ebayekî sipî ye.

3. Telbîyekirin ji dema îhram lixwekirinê heta bi remîya cemra Eqebê ye.

4. Tewafûl Qudûm ji bo mûfrid û qarin e.

5. Remelkirin di hersê şewtên pêşîn yên tewafûl qudûmê de ye.

6. Îttîbaa di tewafûl qudûmê de ye. Îttîbaa ev e; mirov nîvê ebayê xwe dixe bin milê xwe yê rastê û herdu terefên wî jî datîne ser milê xwe yê çepê.

7. Bihurandina şeva Erefê li Mînayê ye.

8. Maçkirina Berê reş e.

9. Cemû-teqdîmkirina navbera meğrib û eşayê ye.

10. Wiqûfa li Mûzdelîfê ye li cem Meş‘erûl Heramê ji fecrê heta rojhilatê. Heke ev hêsan bibe; heke hêsan nebe jî, ji xwe Mûzdelîfe tev cihê wiqûfê ye.


> **Sunneta Hecê**
>
> Kî terka sunnetekê ji sunnetên hecê bike, tiştek li ser wî nîn e û heca wî jî sehîh e.


> **Wacibê Hecê**
>
> Kî, terka wacibekî bike, li ser wî xwînek heye ji bo ew cihê vê kêmasîyê tije bike.

Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec

Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

ukn, wacîbat û sunnetên Ûmrê

8 Rukn, wacîbat û sunnetên Ûmrê

Ruknên ûmrê

1. Îhram e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Emel, bes bi niyetan e. Kî, niyeta çi kiribe, bes ew jê re heye. Naxwe kî hicret kiribe ji bo dinya li para wî bikeve, yan jî ew jinekê li xwe nîkah bike. Wî ji bo çi hicret kiribe, hicreta wî ji bo wê ye» (Buxarî rîwayet kiriye)

2. Se‘ya navbera Sefa û Merwê ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Se‘yê bikin. Lewra Xuda se‘yî li ser we nivîsandiye» (Ehmed rîwayet kiriye)

3. Tewaf e.

Lewra Xuda Teala gotiye: {Bila mala kevnar tewaf bikin.} [Hec, 29]



Îhram

Naverok





Wacîbatên Ûmrê

1.Îhram ji mîqatê ye.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Kî, hec û ûmrê bixwaze, ev dever ji bo wan û ji bo ğeyrên wan jî yên ku bi wan re werin mîqat e» (Buxarî rîwayet kiriye.)

2.Porkurkirin yan jî porkurtkirin e.

Lewra Xuda Teala gotiye: {Sûnd be, hûnê bi destûra Xuda; bi ewleyî û bêtirs herin Mescîdul Heramê. Hinek ji we pora xwe tevî biqusînin û hinek ji we jî kurt bikin.} (Feth, 27)

Sunnetên ûmrê

Ji bilî rukn û wacîbatan, yên din sunnet in. Ew jî wiha ne:

Şiyarî


1. Kî terka ruknekî ji ruknên ûmrê bike, nisûkên wî temam nabin; heta ew wî ruknî jî bicih neyêne.

2. Kî terka wacîbatekî ji wacîbatên ûmrê bike, xwînek li ser wî heye [serjêkirina pezekê, yan heftyeka dewarekê, yan jî heftyeka devehekê ye].

3. Kî terka sunnetekê ji sunnetên ûmrê bike, tiştek li ser wî nîn e û ûmra wî jî sehîh e.



Îhram



porkurkirin û porkurtkirin




Xwe şûştin



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Fîdye û hedîy

9 Fîdye û hedîy

Ya yekê; fîdye

Fîdye;

Ew tişta ku ji ber terka wacibekî, yan jî ji ber kirina qedeğeyekî li ser hacî, yan jî ûmrexwazî wacib dibe.

Ya yekê; Fîdya terka wacibî

Kî, terka wacîbatekî ji wacîbatên hecê, yan jî ûmrê bike, her wekî wî yê ku terka şevbûrandina li Mûzdelîfê, yan porkurkirinê û ğeyrê van bike, fîdyek li wî dikeve. Ew jî xwînek e. Xwînek heftyeka hêştirekê ye [çi nêr be, çi jî mê be], yan heftyeka dewarekî ye, yan gîskek ji pez e, kavirek ji mêşanan e. Ew li herama Mekkê tê serjêkirin û li nav feqîrên wê tê dabeşkirin. Heke fîdye bi dest wî nekeve, ewê deh rojan rojî bigre; sê rojan li hecê bigre -heke îmkana wî çêbibe- heft rojan jî dema vegere nav malbata xwe, bigre.

Xuda Teala dibêje: {Ewên ku nikaribin hedîyekê serjêkin, bila sê rojan li hecê û heft rojan jî dema vegeriyan malê xwe bi tevayî deh rojan, rojî bigirin. Evên ku hatin gotin, ji bo wan kesan e ku malbatên wan ne li dorhêla Mizgefta Heramê be. Xwe ji Xuda biparêzin û bizanin ku ezabê Xuda, ezabê dijwartirîn e} [Beqere, 196]

Naverok



Ya duduyan; fîdya fiêla qedeğe

1.Fîdya lixwekirina cilên dirûtî, nixumandina serî, lixwe dana bêhna xweş, kurkirina porê û jêkirina neynokan e.

Evê ha di kirina yekê ji sê tiştan de bi keyfa xwe ye:

a- Rojîgirtina sê rojan e.

b- Xwarindana ji bo şeş miskînan e. Ji bo her miskînekî nîv kulmek ji xwarina birinc û yên wekî wî ye.


c- Serjêkirina pezekî ye.

Delîla wê gotina Xuda Teala ye: {Heta hedîy negihîje cihê xwe, pora xwe kur nekin. Kî, ji we nexweş be, yan jî di serê wî de êşek hebe, divê wek fîdiya wê, yan rojî bigire, yan sedeqeyekê bide, yan jî hedîyekê serjêke} [Beqere, 196]

Kî bi qesd qedeğeyekî ji her pênc qedeğeyên navbûrî bike, yan jî îhtiyaca wî bi kirina yekî ji wan çêbibe û ew jî wê bike. Wekî ku ji bo Ke'b [Xuda jê razî be] hasil bûye. Hingê ewê fîdye bide û ewê bi navnîşan jî bike; fîdya eziyetê.

Kî, bi ji ber jibîrkirinê yekî ji van qedeğeyan bike, tiştek li ser wî nîn e.


Jêkirina neynokan


Kurkirina porê


Bêhna xweş li xwe dan


Nixumandina porê bi şepqê


Lixwekirina cilên dirûtî

2. Fîdya mûbaşereta [çerm bi hevgihandina] di ğeyrê quz de, cîmaa li hecê di piştî tehellûla yekê de ye

Ev jî her wekî fîdya eziyeta bûrî ye.

3. Fîdya cîmaa li hecê ya berî tehellûla yekê ye


Ew serjêkirina devehekê ye, heke ew wê peyda neke, bila ew sê rojan li hecê û heft rojan jî dema vegere nav ehlê xwe, rojî bigre. Ew heca wî îfsad dike, divê ew heca xwe temam bike û sala werê jî wê dîsa qeza bike.

4. Fîdya cîmaa di ûmrê de ye


Pezek e

Ew pezek e û ûmra wî jî fasid e, divê ew wê qeza bike.

5. Fîdya kuştina nêçîrê ye


Hêştirek e

Heke ew nêçîr, yên wekî wê hebin, ew bi keyfa xwe ye; yan bila yeke wekî wê derxe, yan bila wê bi dirheman binirxîne, bi bihayê wê jî xwarinê bikirre, xwarinê li ser kulman dabeş bike û ji bo her miskînekî du kulman (Mûddan; nîvê saekê ye. Ew jî kêm-zêde 1020 gram e.) bide. Yan jî bila ew ji ber her du kulman ve rojekê rojî bigre.

Ji nêçîra ku yên wekî wê hebin meqsed; ewa ku hinekên piçekî dişibihinê, yan jî nêzîkî wê bin; ne ku meqsed jê, tibatib wekî wê be. Lewra ev ne mûmkin e.

Nimûneya wê wiha ye: Heke ew nêçîra teyrê ne'aman bike, di wê de yek ji hêştiran wacib e. Lewra têde şibiha hêştirê heye, yan jî ewê bihayê wê binirxîne, bi bihayê wê xwarinê ji birinc, yan jî genim bikirre û ji bo her miskînekî jê du kulman bide wan, yan ji ber her du kulman ve rojekê rojî bigre.

Heke ew nêçîra kerekî wehşî bike, têde dewarek heye û her wiha ne, yên din jî.

Heke ew nêçîr, yên wekî wê ji heywanên çarpê nebin, her wekî kuleh û çûkê beytik. Di vê de ew bi keyfa xwe ye; heke bixwaze, bila bi bihayê wê xwarinê bikirre û bide miskînan. Yan jî bila ji ber her du kulman ve rojekê rojî bigre. Ewê ku bihayê wê diyar bikin jî dê du mirov ji ehlê pisporî û edaletê bin.

Eqda nîkahê di hec û ûmrê de ne sehîh e û têde fîdye jî nîn e.

Hinek ji hukmên Hedîyê

Dema hacî qarin be, yan mûtemettî be, jê re durust e ku mirovekî din ji bo xwe bike wekîl ji bo di şûna wî de bi serjêkirina hedîyê rabe. Heke wekîl mirovekî pêbawer û ewle be. Ya baş; bila hacî bi xwe bi wê erka xwe rabe. Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bi xwe ew kiriye.

Fîdye ji ber qurbanê ve çênabe. Lewra fîdye ji bo mûtemettîî ye. Herçî qurban e, ew hem ji bo hacî hem jî ji bo ğeyrê wî sunnet e.

Ya duduyan; hedîy

Hedîy;
Ew heywanên çarpê ne, yên ku ji bo xwe nêzîk-kirina Xuda Teala ji heremê re tên hedîyekirin, yan jî ewa ku bi sebeb temett'ê, yan qîranê, yan jî îhsarê wacib dibe.

Cureyên hedîyê

1. Hedîya temettû'ê û qîranê ye

Li ser mûtemettîî û qarinî hedîy wacib e. Hedîy; pezek e, yan heftyeka hêştirekê ye, yan jî heftyeka dewarekê ye. Heke ew wê peyda neke, bila ew deh rojan rojî bigre; sê rojan li hecê û heft rojan jî dema

vegere nav ehlê xwe. Ev li ser wî kesî wacib e, ewê ku ne ji ehlê Mekkê be. Heke ew ji ehlê Mekkê be, ji xwe hedîy û rojî li ser wî nîn e.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Kî bixwaze heta rojên hecê ji ûmrê sûde wergire, divê hedîyeke ku jê re hêsan be, serjêke. Ewên ku nikaribin hedîyekê serjêkin, bila sê rojan li hecê û heft rojan jî dema vegeriyan malê xwe bi tevayî deh rojan, rojî bigirin. Evên ku hatin gotin ji bo wan kesan e ku malbatên wan ne li dorhêla Mizgefta Heramê be} [Beqere, 196]

2. Hedîya tetewi'ê ye

Ew hedîya ku hacîyê mûfrid, yan jî ûmrexwaz bi rizamendiya xwe, yan jî mûtemettî û qarin zêdetirî ya wacib, yan jî mirovê ne di îhraman de wek hedîye ji Mekkê re dişîne ji bo ew were serjêkirin ji bo xwe pê nêzîkî Xuda Teala bike. «Pêğember [dirûd û silavên Xuda lê bin] sed hêştir hedîye dane» (Buxarî rîwayet kiriye)

Hedîya tetewi'ê, temettû'ê û qîranê, ji xwediyê wan re durust e ku jê bixwe. Heta xwarina ji hedîya tetewi'ê mûsteheb e; lewra pêğember [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî ew kiriye. «Pêğember [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman da ku hinek goştê hêştirê bînin, anîn û ew goşt hate pehtin û ji şorba wê vexwar» (Tirmizî rîwayet kiriye)

3.Hedîya hîsarê ye

Îhsar, mena ji temamkirina hec û ûmrê, yan jî ji herduyan pev re ye.

Naxwe kî ji bo hecê, yan jî ûmrê îhraman li xwe bike, lê dijminek wî ji çûna Beytê asteng bike, yan jî tiştek lê peyda bibe, ew nikaribe bigihîje Beytê, hingê ewê li mekanê xwe hedîyekê serjêke. Paşê ewê ji îhramên xwe derkeve.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Heke hûn ji wan bêne astengkirin, ji heywanên ku dibine hedîy, hûn çi karibin, wê bikin hedîy.} [Beqere, 196]

Hedîya îhsarê; pezek e, yan heftyeka hêştirekê ye yan jî heftyeka dewarekî ye.

Mekanê serjêkirina hedîyê

Hedîya temettû'ê, qîran û tetewi'ê, di nav tixûbê Heremê de tên serjêkirin û li ser miskînên wê jî tên belavkirin. Heke ew hedîya xwe li derveyî tixûbê Heremê serjêke, ew çênabe.

Hedîya îhsarê, li cihê ku têde hatibe îhsarkirin, tê serjêkirin.


Wextê serjêkirina hedîyê

1. Hedîya temettû'ê, qîran û tetewi'ê, ye

Wextê wê ji piştî nimêja îda roja qurbanê destpê dike heta dawîya rojên teşrîqê roj biçe ava, dewam dike. Roja dawîya rojên teşrîqê jî roja sêzdehê ye.

2. Hedîya îhsarê ye


Wextê wê li cem îhsarê ye.



Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec



Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Dehîye

Dehîye

Dehîye;

Ew heywanên çarpê ne, ku ji bo xwe nêzîk-kirina Xuda Teala di rojên qurbanê de tê serjêkirin e.

N a v e r o k

Hukmê dehîyê

Ew sunneteke mûekked e.

Lewra Xuda Teala dibêje: {Ji Xudayê xwe re nimêj bike û qurbanê serjêke} [Kewser, 2]

«Hem jî Pêğember [dirûd û silavên Xuda lê bin] du beranên reşesipî (Emleh, ewê têde reş û sipî heye, lêbelê sipîtahîya wî ji reşahîya wî zehftir be.) yên bi hêstir (Eqren, ewê ku hêstir û quloçên wî hebin.) kirin qurban, ew bi destê xwe serjêkirin, bismillah got, tekbîr anî û pêyê xwe jî danî ser herdu sukrên wan» (Tirmizî ew rîwayet kiriye)

Wextê serjêkirina qurbanê

Wextê serjêkirinê, ji piştî nimêja îda roja qurbanê destpê dike, heta dawîya rojên teşrîqê roj biçe ava, her dewam dike [roja yezdehê, diwazdehê û sêzdehê meha Zîl-Hiccê].

Ji bo dehîyê [qurbanê] heywanên ku çêdibin

1. Pezek, ji ber şexsekî ve çêdibe. Lêbelê ew kê bixwaze, dikare wî di sewabê de bixe şirîkê xwe. Lewra çi dema pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] xwest qurbana xwe serjêke, got:





«Bi navê Xuda, Xudayê min, wê ji Mûhemmed, ji malbata Mûhemmed û ji ummeta Mûhemmed qebûl bike» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

2. Hêştirek û dewarek, ji ber heft kesan ve çêdibe. Naxwe durust e, heft kes di deveheKê, yan jî dewarekê de bibin şirîk.

Lewra Cabir dibêje; «Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ferman li me kir ku her heft kes ji me di hêştir û dewêr de bibin şirîk (El-Bedene, hêştir e, çi nêr be, çi jî mê be.)» (Mûslim rîwayet kiriye)

Salên ku ji bo qurbanê çêdibin

- Cezee ji mêşinan, ew e ku şeş mehên xwe temam kiribe.

- Senîye, ji pezê reş û çûr, ew e ku saleke xwe temam kiribe.

- Senîye, ji dewêr, ew e ku du salên xwe temam kiribe.

- Senîye ji hêştiran, ew e ku pênc salên xwe temam kiribe.

Qurbanê çêtirîn

Ji heywanan tevan yên ji bo qurbanê çêtirîn, hêştir e; heke ew bi temamî were derxistin. Lewra bihayê wê zehftir e û feyda wê jî ji b o feqîran çêtir e. Piştî hêştirê dewar e; heke ew bi temamî were derxistin. Piştî dewêr pez e. Paşê heftyeka hêştirê ye, paştir jî heftyeka dewêr e.

Eybên qurbanê

1. Eybên ku nahêlin ew ji bo qurbanê çêbibe

- Korbûn e:

Ew heywanê ku di çavên wan de korîtî heye. Nebîntî jî dikevin ber hukmê wê.

- Kulekbûn e:

Ew e ku heywan nikaribe bimeşe.

- Bêmixbûn e:

Ew hizhizî ye ku têde mix nîn e.

- Ew nexweşa ku nexweşîya wê eşkere ye.

Delîla van jî hedîsa Berra kurê Azib [Xuda jê razî be] e, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Ji bo qurbanê heywana kor a ku korîtîya wê eşkere be, şehta ku şehtîya wê eşkere be, nexweşa ku nexweşîya wê eşkere be û hizhizîya ku mixê wê nîn e, çênabe» (Mûslim rîwayet kiriye)

Eybên wekî van û yên ji van qebîhtir jî di hukmê wan de ne.

2. Eybên ku ji bo qurbanê ğem nakin

- Betra ye:

Ewa ku dûvê wê nebe.

- Cemma kol] ye:

Ewa ku quloçê wê nebe.


- Xesî:

Xesandîyê ku gunên wî hatine xesandin.


- Ewa ku guhê wê qelaştî yan jî qul be, yan jî quloçên wî şikestî be. Ew tiştên ku ji bo qurbanê hatin gotin, çêdibin, yan jî çênabin, her wiha ew ji bo hedîy û fîdyê jî wisan e.



Bêmix



Kor



Kulek



Quloç-şikestî



kol



bêdûv

Parvekirina qurbanê

Xwediyê qurbanê, dikare sêyeka qurbanê bixwe, sêyeka wê hedîye bide û sêyeka wê jî sedeqe bide. Heke ew temamê wê sedeqe bide jî durust e; heke ew pirranîya wê jî bixwe, dîsa durust e.

Feydeyeke mûhîm

Kî, bixwaze qurbanê serjêke, dema dehê mehê were, jê re ne durust e, ew tiştekê ji mûyên xwe, neynokên xwe û laşên xwe wergire; heta ew wê serjêke.

Lewra hedîsa Ummû-seleme [Xuda jê razî be] heye, dibêje: «Dema dehê mehê were û yek ji we jî bixwaze qurbanê bide, bila ew dest nede tiştekê ji mûyên xwe û laşê xwe» (Mûslim rîwayet kiriye.)


Herçî ewê ku mirov qurban ji ber wî ve bide, her wekî malbat û zarokên mirov, ji bo wan tiştek ji van ne heram e.




Fiqha Îbadetan a bi wêne

Raxistin û hînkirina hukmên Îslamê

Teharet | Nimêj | Rojî | Zekat | Hec




Dr. Abdullah Bahmmam

Review
Dr. Abdul-Razzaq Abdul Majeed Alaro
Dr. AbdulRaheem Kajogbola Omoloso

Zîyareta Medînê, fezîleta wê û cihê wê



Zîyareta Medînê, fezîleta wê û cihê wê

Naverok

- Navên Medîna nebewî
- Fezîleta Medîna nebewî
- Hinek xusûsîyetên Medîna nebewî
- Hukmê zîyaretkirina mizgefta Pêğember [dirûd û silavên Xuda lê bin]
- Hukmê zîyaretê û edebên wê
- Hinek xeta û şîyarî di zîyaretê de

Navên Medîna Nebewî

1. Medîne

Lewra Xuda Teala dibêje: {Ew dibêjin; heke em vegerin Medînê, yên ezîz wê yên zelîl jê derxînin!} [Mûnafîqûn, 8]

2. Tabe

Cabir kurê Semûre [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; min ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] bihîst ku digot: «Xuda navê Tabe li Medînê kiriye.» (Mûslim rîwayet kiriye)

3. Teyyîbe

Zeyd kurê Sabit [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Ew teyyîbe ye; ew gunehan jêdibe, wekî ku agir jî qirêja zîv jêdibe.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

Fezîleta Medîna Nebewî

Se‘d kurê Ebûweqqas [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Medîne ji wan re çêtir e; heke ew bizanin; kî ji bo dilê wî di yeka ji wê çêtir de hebe, terka wê bike, Xuda dê di şûna wî de yên ji wî çêtir bîne wê. Kî li ser dijwarîya wê û tengasîya wê sabit bimîne, ezê roja qiyametê jê re şefaetkar -ango- şahid bim.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Bi cihbûna li gundewarekî (Ferman bi gundekî kir; yanî bi hicretkirin û çûna gundekî, bicihbûna li wî û peyabûna li wir ferman kir.) ferman li min hatiye kirin, ew gundewaran meğlûb (Gundewaran dixwe; ehlê wê mirovên deverên din meğlûb dikin û ew dibe navenda artêşa Îslamê.) dike, Yesrîb dibêjin, ew Medîne ye. Ew mirovan (Mirovan paqij dike; neqencan ji mirovan derdixe.) paqij dike, wekî ku kurh (Kurh, ewê ku hesinbirr pê pif dike hesin.) jî zengara hesin (Zengara hesin; qirêja wî ye.) jêdibe» (Buxarî û Mûslim ew rîwayet kirine)

Hinek xusûsîyetên [taybetmendîyên] Medîna Nebewî

1. Ew ji navbera ‘Eyr û Sewrê -du çîyan e- herem e. Darên wê nayên birrîn û sewalên wê jî nayên nêçîrkirin.

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Medîne, ji ‘Eyr heta bi Sewr herem e. Kî têde bîd‘etekî peyda bike, yan jî xirabekî li wê bihewîne, laneta Xuda, melaîket û însanan tevan li wî bibare; Xuda roja qiyametê ji wî fîdye û gerewekê qebûl nake» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)


Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ew kiriye herem, wekî ku Îbrahîm [silavên Xuda lê bin] jî Mekke kiribû herem.

Ebdûllah kurê Zeyd [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Îbrahîm [silavên Xuda lê bin] Mekke kiribû herem û jê re dûa kiribû. Min jî Medîne kiriye herem, wekî ku Îbrahîm [silavên Xuda lê bin] jî Mekke kiribû herem, min di bara mûdda [çenga] wê û saa wê de dûa jê re kiriye, wekî ku Îbrahîm [silavên Xuda lê bin] jî ji Mekkê re dûa kiribû» (Buxarî rîwayet kiriye)

Ferq di navbera Herema Mekkê û herema Medînê de; herembûna Mekkê bi ness û îcmaê sabit e. Di herembûna Medînê de îxtîlaf heye; lê ya sehîh, ew jî herem e.

2. Nimêja li Medînê qatbiqat e

Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] gotiye: «Nimêjeke di vê mizgefta min de ji bilî mizgefta Heramê, ji hezar nimêjên di ğeyrên wê de çêtir e!» (Buxarî rîwayet kiriye)



Çîyayê sewr



Çîyayê ‘Eyr

3. Bexçekek ji bexçeyên cennetê li wê ye, nimêjkirina li wê sunnet e.

Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Navbera mala min û Mînbera min bexçekek ji bexçeyên cennetê ye. Mînbera min jî li ser hewzê min e» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine.)


Rewza pîroz

4. Mesîhê Deccal di axir zemanê de nakeve nav Medînê û êşa taûnê jî.

Enes kurê Malik [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Deccal tê ku were nav Medînê, melaîketan dibîne ku nobetê lê digrin. Xuda hez bike, ne taûn tê navê, ne jî Deccal.» (Tirmizî rîwayet kiriye)

5. Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] dûa bereketê jê re kiriye.

Enes kurê Malik [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Xudayê min! Du caran bi qasî bereketa ku te xistî Mekkê, bereketê bixe Medînê.» (Buxarî û Mûslim rîwayet kirine)

6. Nêçîra Mekkê têde hem guneh, hem jî ceza heye. Nêçîra Medînê jî têde guneh heye, lê ceza nîn e. Gunehê ku ji nêçîra Mekkê tê, ji gunehê ku ji nêçîra Medînê tê, mezintir e. (Li [kitêba] Mûmetti'ê cildê 7, rûpela, 257'an binêre!)

Hukmê zîyareta Mizgefta Pêğember [dirûd û silavên Xuda lê bin]

Zîyareta Mizgefta Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] ne ji şertên hecê, ruknên wê û wacîbatên wê ye. Lêbelê ew sunnet e, di her gav û demê de rewa ye.

Divê ji zîyaretê meqsed, nimêja di mizgeftê de be, ne di qebrê de.

Lewra Ebûhûreyre [Xuda jê razî be] rîwayet dike, dibêje; pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] got: «Sefer ji bo sê mizgeftan tenê tê kirin: Mizgefta Heramê, Mizgefta Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û Mizgefta Eqsayê.» (Mûslim rîwayet kiriye)

Şeyxûl Îslam Îbnteymîye gotiye: "Heke ji seferê qesda wî serdana qebra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] be; ne nimêja di mizgefta wî de be.. bi dîtin-nêrîna îmaman û pirranîya aliman; ev ne rewa ye û ferman jî pê nehatiye kirin.... Hedîsên di bara serdana qebra pêğemberê Xuda

[dirûd û silavên Xuda lê bin] de bi îttîfaqa ehlê îlmê tev zeîf in; heta ew lêanîn in, ti kesê mûtemed ji ehlê Sunenan tiştek ji wan rîwayet nekirine û ti kesî ji îmaman jî tiştek ji wan delîl qebûl nekiriye." (Mecmûûl-Fetawa, cild, 27, rûpel, 26)

Hukmên zîyaretê û edebên wê

1. Dema zîyaretkar bigihîje Mizgeftê, jê re sunnet e lingê xwe yê rastê pêşî bavêje û bibêje; «Xudayê min, derîyên rehma xwe ji min re veke!» (Mûslim rîwayet kiriye.)

2. Ew du reketên hedya mizgeftê nimêj dike. Heke ew wan di Rewza Şerîf de bike, hîn çêtir e.

3. Zîyaretkirina qebra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û herdu hevalên wî jî sunnet e. Ew bi edeb, dengê nizm û sergiranî li ber qebra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] radiweste û dibêje: "Ey Pêğember! Silav, rehm û bereketa Xuda li ser te be. Xuda meqamê te mezin bike û ji ummeta te mûkafata xêrê bide te."

Paşê ew lingê xwe yê rastê gavekê, yan jî du gavan diavêje ji bo li pêşberî Ebûbekr [Xuda jê razî be] rawest, silavê lê dike û dibêje: "Ey Ebûbekr, xelîfê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin]! Silav, rehm û bereketa Xuda li te be. Xuda ji te razî be û ji ummeta Mûhemmed [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî mûkafata xêrê bide te."

Paşê ew lingê xwe yê rastê gavekê, yan jî du gavan diavêje ji bo li pêşberî Ûmer [Xuda jê razî be] rawest, silavê lê dike û dibêje: "Ey Ûmer, mezinê mûmînan! Silav, rehm û bereketa Xuda li te be. Xuda ji te razî be û ji ummeta Mûhemmed [dirûd û silavên Xuda lê bin] jî mûkafata xêrê bide te."

4. Ji bo zîyaretkarê Mizgefta Pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] sunnet e, her pênc nimêjên xwe yên ferz di mizgefta pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] de eda bike û têde zehf zikrê Xuda bike, zehf zehf jê dûa bike, nimêjên sunet zehf bike, bi taybetî jî di Rewza Şerîf de bike.

5. Ji bo zîyaretkarî sunnet e Mizgefta Qubayê jî zîyaret bike ji bo têde nimêj bike. Heke zîyareta wê di roja Şemîyê de be hîn çêtir e.

Lewra hedîsa Îbnûmer [Xuda jê razî be] heye, dibêje; «pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] hem bi siwarî, hem jî bi peyatî dihate Mizgefta Qubayê, têde du reket nimêj dikir.» Di rîwayeteke din de dibêje: «Ew dihate Qubayê» yanî her şemîyê dihatiyê. (Mûslim rîwayet kiriye)

6. Zîyaretkirina qebrên Beqîê, şehîdan û qebra Hemze jî sunnet e.

Lewra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] diçû serdana wan, ji wan re dûa dikirin û digot: «Gelî ehlê xanîyên mûmîn û mislimanan! Silav li we be. Xuda hez bike, em jî tên digihîjin we. Ez ji bo me û we efîyetê ji Xuda dixwazim.» (Mûslim rîwayet kiriye.)

Xeta û şîyarî di zîyaretê de


1. Sefer û girêdana karwanan e, ji bo qesda zîyareta qebr û cihên eserî yên li Medînê. Lêbelê ya rewa, di bara girêdana karwanan de ji bo zîyareta Mizgefta Pêğemberî û nimêja têde, zîyareta qebrê jî di navê de ye.

2. Berê xwe dana qebrê li cem dûa ye.

3. Dûaya ji pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin] û xwestina îhtiyacan ji wî ye; ne ji Xuda [ezzewecelle], ev ji şirka mezintirîn e.

4. Xwe meshkirina bi dîwanê hicrê ye bi qesda bereketê. Ev ji bîd'etên heram e û yek ji navgînên şirkê ye.

5. Bilindkirina dengê xwe li cem qebra pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin], rabûna dirêj, ji dûr ve dubarekirina silavê ye çi qas biçe hundur, danîna destê rastê li ser destê çepê ye li ser singê di esnaya silavê de ye her wekî awayê nimêjê.



Malperên dostane

أكاديمية البلـدة الطيبة
Balda Tayiba Academy

Imam Academy
أكاديمية الأئمة والخطباء

أكاديمية شيخ الإسلام ابن تيمية

حوّاء
أكاديمية

الهدى أكيدمي

Al-Huda Academy

AIA
African Islamic Academy

AIA
African Islamic Academy

ইলম একাডেমি
2024

أكاديمية الإمامين
علم
ابن باز - ابن عثيمين

KAP
KNOWLEDGE ACADEMY
PHILIPPINES
2024

تدارس

جامعة ابن كثير الدولية
Ibn Kathir International University
of Humanities and Islamic Sciences